# ROJNIVÎSÊN BERXWEDANA SÛRÊ



Weşanên Komîteya Xebatên Şehîdan A PKK'ê

**Ji Bo Bîranîna Şehîdên Di Berxwedana Dîrokî**
**Ya Sûrê De Gihaştine Şehadetê...**

# ROJNIVÎSÊN BERXWEDANA SÛRÊ

**WEŞANÊN KOMÎTEYA XWEBATÊN ŞEHÎDAN A PKK'Ê**

CIHÊ ÇAPÊ: MATBAAYA AZADÎ
DÎROKA ÇAPÊ:  PAYIZA 2017’yan

# NAVEROK

PÊŞEKÎ 7

ROJNIVÎSA YEKEM 21

BEŞA YEKEM 25

BEŞA DUYEM 43

ROJNIVÎSA DUYEMÎN 61

ŞEHÎDÊN BERXWEDANA SÛRÊ 163

# PÊŞEKÎ

## BERXWEDANA SÛRÊ Û TERZA ŞERÊ PÊVAJOYA NÛ

Du elementên jiyanê pêk tînin hene: Raz û beden. Dema em hewl didin şîfreyên razan deşîfre bikin, hewa, av, agir yan jî yên din ji tiştên em lê diqelibin-jê sûd werdigirin yan jî ji bedenên em lê dikin pêk tên.

Weke mirov, demên ku em bi wate dijîn-difikirin, bi qasî rast û têra wê watedayina razên ji beriya me hatine fêmkirin, demên ku bi hewldanên afirandina razên nû hatine honandin in.

Raz, wateya li ser lêkolîn dibe.

Beden jî hêz û qûwetê dide sînorên hebûnê yên ku wateyên li ser lêkolîn dibe.

Di mirov de çand bedenek e, sînorek e. Mirovahiya ku dike di nav bêsînoriyekê de wenda bibe, encax di asta pêşxistina pênaseyan de mimkun e xwe bi jiyanê ve bigire. Mirov dema ji bo xwe pênaseyan bi pêş dixe, sînorên jiyana

xwe lê dike, li derûdora jiyana xwe bi feraseta jiyana xwe razekê dihone.

Dema ku mirov fêm dike, raz fêmkirin-deşîfrekirin li gel mirovbûnê heman tişt e, dest pê kiriye bê hesibandin ku xwediyê mîraseke mezin a mirovbûnê ye. Bedenên ku ji beriya hezar salan ji aliyê kêdeke pir mezin a mirovan ve hatiye lê kirin jî, mîrasê çandê, mîrasê tevahiya mirovahiyê tê hesibandin.

Her çendî em nikaribin weke gavên mirovbûnê bihesibînin jî, weke mirovên serdemê bedenên me zêde ne. Em behsa wan beden û astengên sîstem datîne li pêşberê me û neçar dihêle bi her li wan qelîbînê em bijîn, nakin. Ew, ne yên me ne. Yên wê qerebelixiya dagirker ku li pêşberê mirovbûnê di prîmatbûnê de israr dikin in. Em behsa yên aîdê me ne dikin.

,Sûrên dîrokî yên Amedê ku rengê mirov ê dîrokî, dengê mirov ê dîrokî, reç û dewsên mirov ê dîrokî hilgirtine jî yek ji van in. Ew beden şênberbûna wate ne û ji bo ku ew bi xwe jiyana xwe ji nû ve şîn bike şert û mercan amade dike.

Sûrên Amedê di dîrokê de gelek caran ji êrîş, berxwedan û gefên hatin hilweşandinê re şahidî kirine û tevî her tiştî hebûna xwe domandine û karîne heya bi îro li ser lingan bimînin. Mirovên xwe spartine sîbera wê jî şibiyane wê.

Bajarê Sûrê yê dîrokî, di mehên dawî yên sala 2015’an de bû şahidê berxwedaneke nû. Bi meha Kanûna 2015’an ve ev pêvajoyê têkoşînê ket qonaxeke nû. Ji wan rojan pê ve Bedenên Amede ji bo berxwedaneke dîrokî malovanî kirin.

Ciwanên egîd ên Kurdistanê ku karîne dil û mêjiyên xwe saxlem ragirin li Sûrê destanek nivisîn û ev serketina xwe tevlî xerca bedenan kirin. Dema ku ji aliyêkî ve artêşa KT’ê ya faşîst, polîsên wê û bi her awayî hêzên wê yên çete bi hemû

hêza xwe êrîş dikirin, ciwanên Kurdistanê parastina rêveberiyên xweser kirin. Piştî ku li Bakurê Kurdistanê rêveberiyên xweser ên demokratîk avabûna xwe îlan kirin û di navbera xwe û çeteyên dewletê yên faîst de bedenên civakî lê kirin, dewleta faşîst a Tirk, di dîroka 2'ê Kanûnê de dest pê kir bi tangan êrîşê taxan bike. Di pey wê re ciwanên Kurdistanê li dijî çeteyên faşîst ji bo ku kolanên xwe, taxên xwe û hemû qîmetên civakî biparêzin berxwedan bilind kirin.

Kesên li ber xwe didin encax dikarin wê berxwedanê vebêjin. Berxwedana wan, wan vedibêje. Lê wan qîma xwe bi vê neanîn, bi zanebûna ku tiştên ew dijîn dîrok e, ji bo me ji dilên xwe, ji keda xwe, ji xwêdana xwe û ji xwîna xwe rêzikên zêrînî hiştin.

Rojnivîsên Sûrê weke vegotinên herî xwerû yên berxwedana li sed rojî derbas dike, di dîrokê de cihê xwe girt. Di rojnivîsan de berxwedêr dibêjin “eger em şehîd nekevin, daxwaza me ew e, em romana vê berxwedanê binivîsin yan jî filmê wê bikêşînin”. Ev berxwedana dîrokî vegotin, ne bi nivîsekê û ne jî dikare bi çend gotinan di asteke têrê dike de were pêkanîn. Lê bi qasî şênberkirina jiyana ku li Sûrê pêk hatiye, terza jiyana li Sûrê, awayê têkiliyên wê, li Sûrê jin bûn, li Sûrê bûn fermandareke/î ku di zanebûna berpirsiyariyên dîrokî de ye ku tenê kêliyekê jî, vê ji dest bernade, li Sûrê dayik bûn û zarok bûn, heta xwe gihandin wateya li Sûrê pişikek li kolanê bûn, ew wate hemû berbiçavkirin; ew wate pratîze kirin, anîn warê jiyana asayî ya rojane, dikare bibe sernivîsên ku berxwedanê vebêjin. Tenê dikare bi zimanekî dîrokî û destanwarî berxwedana Sûrê ya dîrokî bê vegotin. Vegotina dîrokî ku di pey vê berxwedanê re pêk bê jî, tenê dikare bi jiyana azad gengaz be.

Di ser berxwedana Sûrê re bi temamî salek derbas bû. Me ev salek çawa derbas kir? Me çi tişt kirin? Me çawa berxwedan bi dest girt û kîjan ders jê derxistin? Her pirseke wê weke libekî ji agir ku dibe êşeke li canê mirov dikeve, li ser benekî qut nabe yê me bi jiyanê ve girêdide, li ser esasê ku hema niha bikeve sukra me, li pey hev pirs zêde dibin. Di pey berxwedana Sûrê ji xwe pirs pirsîn û li bersivan gerîn, erka herî bingehîn a cih girtina di nav têkoşîna şoreşê de ye.

Hin caran, qirika mirov dişewite, ji mêjiyê mirov ber bi qirika mirov dest pê dike agirek biherike. Di qirika me de dimîne asê, dişewitîne û her dişewitîne. Tê yan daqurtînî û bibî sedem ku berwext bê dinyayê yan jî destûrê bidî ku ewqasî rê bimeşe û biçe nava çavan û di wê derê de bihele. Bi awayekî di herî kûr de jiyankirina êşê, li pêşberê berxwedana Sûrê, awayê herî takekesî yê jiyankirina êşê ye. Serpêhatiyên gelekî jiyaye, ji bo gelêkî ku ji mêjve di ezmûna ji êşan hilberîna azadiyê re derbas bûye,tenê dikare bibe sedem ku bikeve nav legera jiyaneke nû.

Dema ku fêrî êşê bûyin bi pêş dikeve, wê demê ji bûn rewşek ku hewce dike li dijî wê bertek bê nîşan dayin û ji holê were rakirin derdikeve, weke parçeyeke xwezayî ya hebûnê lê tê. Jixwe ev jî koletî ye.

Di pey berxwedanên rêverberiyên xweser, eger her êşa me jiyaye nabe sedem ku em bi hezaran pirsên nû bikin, bersivên nû peyda bikin tê maneya ku êşan maneya xwe ji dest dayine.

Zêdetir ji bersivên dirêj ên pirsan, em kîjan pirsan di kîjan rewşan de dikin, ji wan re bersivên çawa peyda dikin girîngtir e. Tebî ne ku bersiv-helwestek şirîk ku ji bo hemûyan bê diyarkirin jî tine ye. Em dikarin di navenda hemû pirsên ‘çawa’

de rastiya ku heyî em ê ti car ji bîr nekin bi cih bikin û vê helwesta xwe aşkere bikin.

Divê em beriya her tiştî bizanibin, rakirina tola ciwanên li Sûrê şehîd bûne, sedema jiyan û têkoşîna me ye, di her kêliya jiyanê de vê zanebûnê hilgirin, vê zanebûnê zindî bikin, pratîze bikin û hewl bidin fêm bikin.

Divê çanda şerê nû, çanda jiyana nû û çanda mirovê nû ku li Silopya, Cizîr, Nisêbîn, Hezex, Şirnex, Varto, Wan û Sûrê, di hemû berxwedanên rêveberiyên xweser ên demokratîk de derketine holê rast bê naskirin, rast bê pênasekirin û bê vegotin. Rêbertiya me di 2016'yan de gotibû, "em ê ne weke berê şer bikin, ne weke berê bijîn"; ev gotin bi berxwedanên rêveberiyên xweser watedar bûn û bûn rastî.

Tevî ku li pêşberê van berxwedanan mîraseke çanda berxwedanê ya çil salî hebû, têkoşîna wan destpêkek bû. Ji ber ku di berxwedana Sûrê de weke berê şer nehate kirin, weke berê jî nehate jiyîn. Ew, bi destpêkeke ku jiyîne, bûn ji destpêkên me. Dema ku Cizîr bû nûbûna ruhê berxwedana 14'ê tîrmehê û hêza wê ya îradeya azad û fermana ji xaliyên xwe, xwe ji nû ve afirandinê diafirand, berxwedana Sûrê jî bû mînakek ku dê Dawiyeke Bi Heybet çawa be, çawa bê şerkirin.

Berxwedana Sûrê, pratîzebûna Kurdistanî ya jiyana civakî ya komînal ku li Komîna Parîsê hatiye ceribandin e. Berxwedana Sûrê, di nava xwe de gelek şoreş û derfeta şoreşan dihewîne. Tam jî ji ber vê yekê êrîşa li ser Sûrê, tê wateya êrîşa li dijî vê jiyanê. Dawiya Bi Heybet ku hevalê Çiyager aniye ziman, israra jiyana azad û komînal û israra di avakirina vê jiyanê de ye. Li Sûrê berxwedanek ku ji çanda berxwedan û rêveberiyên xweser ya Komîna Parîsê xwe bi xwedî kiriye û jê derbas kiriye hate pêşxistin. Her yek ciwanê/a berxwedêr ê

şoreşger, bi baweriya xwerû ya piştî xwe avakirina jiyana civaka azad şer kirin. Berfîn, Nûcan, Çiyager, Delîl, Hogir, Afad, Rêber, Ruken, Şîlan, Zîlan û gelek şehîdên leheng ên din, bûn şênberbûna wê baweriyê. Şehîdên me yên Cizîr û Sûrê bi awayekî herî mezin nîşan dan ku wê di ti şert û mercan de teslîm nebin, her berxwedanê bilind bikin, baweriya wan bi laş û ruhê xwe, bi baweriya xwe û avakirina jiyana azad heye û bi vê baweriyê ew ê berxwedanê bilind bikin. Zanîbûn ku her kêliya jiyîne bikin heqîqet. Ji ber ku xwediyê wê zanebûnê bûn, tam jî di nîvenga berxwedaneke li dijî jiyanên sexte ne. Her çalakiya wan, her gotina wan, her gava wan kêliyên herî dînamîk ên dîrokekê pêk dianî. Tiştê ku bi hevalê Çiyager ew gotinên dîrokê dayê gotin, ya ku hêza nîşandana wê sekna abîdeya mirovahiyê ye daye jî ew bawerî û zanebûna bûn takekesê civaka azad biserxistin bû.

Wêneyên li serê çiyan ê hevalê Çiyager dibînim. Weke li azmanê şîn binêrim li çavên wî mêze dikim. Çiqas jî li ezmanên ku pênaseya azadî û hetahetayî ye tê. Li çiyan, çeman, daristanan, lûtkeyên çiyan, Rojê û mirov... Çiqasî li azadî û berxwedanê tê.

Em ji dengê wî, bi dengê wî dibêjin Dawiya Bi Heybet. Çi ye dawiya bi heybet? Dawiya bi heybet, biryardariya berxwdêrên Sûrê ya berxwedan gihandina serkeftinê ye. Dawiya bi heybet, hilgirtina derfeta jiyaneke ji xwe piştrast e ku wê piştî mirinê jî bi rola xwe rabe û ji serî heya bi binî bajarekî bi vê derfetê nû bike.

Di kesayetiya hevalê Çiyager de dawiya bi heybet dîtin, dihate kîjan wateya têkoşîna azadiyê? Legerîna wateya ku bi hevalê Çiyager ew analîza dîrokî daye kirin û peydakirin wê, îro jî ji bo jiyaneke watedar pêwîstiyek e.

Dawiya bi heybet, hevalê Çiyager bi xwe ye. Kesayet û sekna wî dawiya bi heybet nîşanî me dide. Bûn weke Wî, bûn ew, xwe gihandin sekna Wî ya milîtan dawiya bi heybet bi xwe ye.

Dema rojnivîs tên xwendin mirov dixwaze li wê derê be, ji dîroka li wê derê re şahidî bike, bibe dîrok. Piştî rojnivîs tên xwendin, mirov fêm dike ku tenê dikare piştî berxwedana Sûrê, destana azadiyê li dijî bi her awayê zalimtiyê, bi îdîa û israra mirovê nû yê azad bê nivisandin. Ji ber ku piştî me ev gotin xwendin û bihîstin, yan em ê bimirin yan jî em ê bibin afirînerên jiyana azad.

Razên jiyanê û razên bajaran dişibin hev. Bedenên jiyanê û bedenên bajaran jî dişibin hev. Di jiyana mirov de, kesên di nav mirinê de bêmiriniyê diafirînin hene. Abîdeyên mirovahiyê hene ku çawa xwe digihînin asta bêmiriniyê, di heman demê de bêmiriniyê diafirînin navnîşana wê nîşanî her kesî didin. Yên ku li Sûrê raza jiyanê çareser kirine û razeke nû afirandine, bi xwe ev abîdeyên mirovahiyê ne.

Hûn dema çîrokên kesên ku li Sûrê bûne raz û Sir guhdar bikin hûn ê bixwazibin biçin gel her yek berxwedêrekî/ê û nefesa wî/ê hîs bikin. Hûn ê bixwazin porê Nûcanê şe bikin; bi destê Agirê ku tenê yek kêliya dema berxwedanê jî li xwe, li laşê xwe xerc nake bigirin û cilê wî bişon. Hûn ê bixwazin destê xwe bidin ser birînên Şîlanê û jê re bibin derman.

Hûn ê bixwazin destê xwe bidin berên Sûrê û wan keviran yek bi yek rakin bînin barîkatan.

Eger hebe di goşeyekî çenteyê we de eynikek, hûn ê bixwazin bigirin û bidin destê Saryayê.

Hûn ê bixwazin li Sûrê bibin Sir û Raz.

Di têkoşîna me ya azadiyê de berdevkên dawî yên kevneşopiya me ya lehengiyê, yên bi têkoşînên xwe ya di sedsala bist û yekemîn de bi cih kirine, serdemeke nû ya wate û azadiyê dane destpêkirin, berxwedêrên rêveberiyên xweser in, fermandarên pêşeng ên şerê gel ê şoreşgerî ne. ... Di kesayetiya fermandar Çiyager de mînakek ku şênber bûyî ya lehengiya hemdem e ku dê karibe ji bo her yek berxwedêrê ciwan, ji bo her mirovê/a di her temenî de û ji bo her beşa civakî pêşengî bike.

Hostetiya tektîkî, hevaltiya Apoçî û lehengiya Egîd, baweriya azadiyê û biryardariya berxwedanê ku hevalê Çiyager li Sûrê nîşan dide di dîroka têkoşîna me de ev berxwedan xeleka dawî ya xeta lehengiyê ye, lehengiya sed sala 21. bi terza Çiyager e.

Fermandar Çiyager, sekn û helwesteke wisa ye, kesayetiya xwe ya ku bi felsefeya Rêbertiyê afirandiye, zêhniyeta xwe û hemû feraseta xwe, di hemû jiyan û xebata xwe ya şoreşgerî de daye der, hemû çalakiyên xwe, hemû kêliyên pratîk û jiyana xwe, li gel felsefeya Rêbertiyê yek kiriye. Weke çemeke dîrokî û civakî ku her diherike strana PKK'ê bi jiyana xwe dibêje, nefesê dide û distîne, bi me re jiyan dike. Ji kêliya ku dest bi berxwedana rêveberiyên xweser kiriye pê de heya bi kêliya şehîd bûye di her kêliyeke xwe de, bi her yek reftariya xwe, bi hemû hebûna xwe, xwe daye têkoşîna azadiyê û bi sekna xwe, li ser wateya azadiyê wate zêde kiriye sekna ku karibe mirovekî mînak nîşan bide nîşan daye. Vaye ji ber vê yekê bûye civak û dîrok.

Lehengiya hevalê Çiyager ew e ku xwe kiriye civak û dîrok. Di heman demê de di çalakvaniya Wî ku Ew li serdema di navê de ye derbas kiriye û di wê gotina di ferqa vê de ye û

wisa tîne ziman ku dibêje “dê dawî bi heybet be”. Ji ber ku ya hevalê Çiyager dibêje, avakirina jiyana azad ku hê pêk nehatiye ya tenê bi berxwedana ku di xeta wî de bê mezinkirine.

Li gel hevalê Çiyager ku biryardariya azadbûnê bi qasî biryardariya berxwedanê ye, bi qasî di her kêliyê de bi derbeyên li dijmin dide, bi hêza Apoçî ku li gel hevalên xwe ava dike jî şoreşên zêhnî yên derbe li dijmin danê jî pêk tîne. Ji xwe re kiriye felsefeya jiyanê ku derbeyên mezin li dijmin bide, bi qasî di oxirê de bimire ji jiyanê hez bike, eger canekî bê fedakirin hebe li dijmin giran bikelifîne û di vê zanebûnê de be ku sekna rast a Apoçî ev e, her kêliya xwe bi zanebûn bijî.

Her heval û kesê ku di nava berxwedanê de cih wergirtiye, bi wî re axifiye, pê re hev nas kiriye, têkilî daniye, xebat meşandiye, kariye di mêjiyê xwe de ji bo xwe welatekî azad ava bike; ev bi wê re têkildar e ku hevalê Çiyager di mêjî û dilê xwe de Kurdistaneke azad ava kiriye. Ji ber ku yên nikarin di mêjiyê xwe de Kurdistanekê ava bikin, nikarin di mêjiyên cuda de jî ti avakirinan pêk bînin.

Hevalê Çiyager pêşengê jiyan û şer e. Meşandina jiyanê û hostetiya birêvebirana şer di sekna wî de di heman xetê de bûne yek. Bi qasi wêrekî û fedakarî, hostetiya wî ya tektîkî, afirîneriya wî, berxwedana wî ku bi zanebûneke mezin a rêgez ji nav jiyanê derxistinê, tevî ku derbên mezin dane dijmin, li gel berxwedêran jî pênaseya jiyan û mirovê nû hê jî berbiçavtir kiriye.

Dema ku li aliyekî zarokên biçûk ên pêşeroja me ne, bi awayekî ku hê xeyalên wan nebişkivîne sekinîne, li aliyekî dema dayik di her berxwedêrekê/î de zarokên xwe dibînin, dema ji bo berxwedêran nan dipêjînin, xwarinê amade dikin, dema ji aliyekî ve di her temenî de mirov ji aliyekî berxwedanê

digire, hevalê Çiyager, navê lehengiya mezin a temsîlkirina hemû civakê, ji bo hemû civakê şer kirinê û di dilê hemû civakê de ji xwêdana xwe, ji xwîna xwe, bi keda xwe Kurdistaneke biçûk avakirinê ye. Ya wî ne bi tenê şer kirin û bedel dayin girtine ber çavan e; Bersiva pirsa "divê em çawa bijîn" ku bi berxwedanê, bi şerkirinê, bi azadbûnê hatiye honandin dayin e, her reftariya wê avakirin e.

Em di her rêza rojnivîsan de wî dibîn. Dema ew serçavên hevalekî/e birîndar dişo, em wî dibînin. Yan jî dema di dest de balyoz, dîwarê bexçeyekî dişkîne û rê vedike em wî dibînin. Yê ku di dest de çek di mewziya xwe de şer dike û li aliyê din ê mewziyê leşkerên dijmin dişopîne, plansaziya çalakiyê dike jî dîsa ew e. Dema zagonên şer tên binpêkirin yê ku helwesta herî dijwar raber dike û zagonên jiyanê vedibêje jî dîsa ew e.

Em di her bîranîna ku wî ji me re hiştiye de rêgezeke gerîlatiyê, regezeke berxwedêriyê dibînin. Dema em îro pirsên weke "divê em çawa bijîn, çawa şer bikin, çawa bi xwe re gerîlabûnê ava bikin, çawa bibin fermandar?" dipirsin, awayê herî destdayî yê bersiv dayinê hevalê Çiyager pênasekirin e. Berxwedana Sûrê ya dîrokî, ew derfet daye serdema xwe û ew şens nas kiriye ku vê lehengiyê bibîne.

Sekna hevalê Çiyager, milîtaniya serkeftinê pênase dike. Em ji wî fêr dibin ku ji bo jiyîna li gel Rêbertiyê, ji bo xwe gihandina terza Rêbertiyê hewce dike em di her kêliya jiyanê de vê terzê pêk bînin. Di serî de bûn hêza çareseriyê, biryadarî, giştîbûn, misogerîbûn mezintiya bi cihanîna hemû pêwîstiyên hevaltiyê, em weke Apoçîtiyeke di laşê wî de kom bûyî ye dibînin. Ji vî aliyê xwe ve hevalê Çiyager bi qasî ew bi xwe ye, ewqas jî sekneke kolektîf e. Bi xwe di vê nuxteyê de civakîbûn jî derbas kiriye, kariye di takekesbûna xwe de bibe civak. Gotina "vê artêşa qerase ya sêyemîn a cîhanê bi van şêst kesan nekariya"

di serî de hevalê Çiyager, bi wê re têkîldar e ku her berxwedêrekê/î kariye xwe bike civak. Jixwe di her hevalekî/ê de civakek heye.

Gotinên weke “şehadeta me dê bibe jiyîna hevalên din. Em ê paşve nekişin, paşve kişîn teslimiyet e, teslimiyet jî îxanet e. Em ê xeyalên vî gelî neherimînin. Dibe ku îro ev berxwedana em li dar dixin neyê fêmkirin, lê di pêşerojê de dê her kes fêm bike. Jixwe em li vê derê berxwedaneke dîrokî li dar dixin û di vê berxwedana dîrokî de navê we jî wê hebe.” Hin gotinên ku baweriya hetahetayî bi jiyana azad û serkeftinê, li ser berxwedan û ferasata xwe, jiyanê dineqişe yên gihaştina me ne.

Jiyana azad û sekna serkeftinê, dema ku kêliya fedakirinê hat, yên hewce dike bên fedakirin, ji îro ve li gel xwe afirandinê mimkûn e. Hevalê Çiyager milîtanek ku kariye bibe Egîdê serdema nû yê wisa ye, dema kêliya wê hat mînaka herî jiyanî, herî civakî û herî dîrokî ya xwe fedakirinê nîşan daye.

Di dawî de, em lêpirsîna xwe ya li pêşberê berxwedana Sûrê hineke din kûr bikin û dikarin vê bînin ziman: berxwedanên rêveberiyên xweser, li pêşberê analîza Rêbertiya me ya ku gotiye “hûn ji lidarxistina şoreşê ditirsin”, rexnedana ciwanên Kurdistanê ye. Bi vê berxwedanê derketiye holê ku dema hemû berxwedan didome hewce ye ji lidarxistina şoreşê tirs nebe, çawa bê jiyîn û şer çawa were meşandin. Ji ber vê yekê ye ku divê em Rojnivîsên Sûrê dubare bixwînin. Ji bo em fêr bibin em ê çawa bijîn, em karibin di serdema modernîteya kapîtalîst de, li dijî hemû êrîşên vê serdemê şer bikin û erkên afirandina dawiya ku Fermandar Çiyager mizgîniya wî dayî derxin zanebûnê, divê em bixwînin.

Yan jî dibe ku ji bo em bibin mirov divê em bixwînin.

Silav û Rêzên Şoreşgerî
Dilzar Dîlok





# ROJNIVÎSA YEKEM

**Berxwedan bi serkeftinê, pasîfîzm bi binketinê, teslîmiyet bi îxanetê encam dibe...**

**Ji berxwedana Sûrê ku her rojeke wê weke hezar salî derbas bûye...**

**Sûr wê bibe Kela Dimdimê...**

Ev rojnivîs, ji notên kurt ku li ser israra hevalê Çiyager hatine nivisîn pêk tê. Ev rêzên ku ji hezar parê, pareke ku tiştên hewce bûn werin nivisîn in, eger bibe tenê yek dilopa ji dîrokê jî, li gorî me biqîmet e.

Xemgîn Roj (Elî )

Dîroka dest bi nivîsandinê kirinê: 21’ê Çileya 2016’yan

## BEŞA YEKEM

Dema ku di hilbijartinên giştî yên 7'ê Hezîrana 2015'an de siyaseta demokratîk serkeftin bi dest ve anîbû, çetetiya AKP'ê di meclîsê de piraniya hêvî dikir nekarîbû bi dest bixe, li gel vê rewşê pêvajoyeke nû bi pêş ket. Dijmin çawa ku diyaloga di navbera Rêber Apo û xwe de hilweşand, pêvajoya îmha û tasfiyeyê dubare xiste rojevê. Komkujiya Pirsûsê û êrîşa hewayî ya berfireh ên hema li pey wê li ser Qadên Parêstinê Yên Medyayê hatine kirin, dida hewcekirin ku berxwedana nû li ser esasê şerê gel ê şoreşgerî were bidestpêkirin. Di meha Tebaxê de li ser esasê parastina reveberiyên xweser, li gelek navçeyan hatine îlankirin, avakirina yekeyên xwe parastinê û pêşxistina berxwedanek ku bi gel re di zikhev de ye, weke pêwîstiyeke şerê gel ê şoreşgerî derdiket holê. Ji ber vê yekê li gelek navçeyên weke Varto, Ferqîn, Cizîr, Nisebîn û Dêrikê dest bi berxwedanê hatibû kirin. Li navçeyên navêndî yên bajarekî wekî Amedê jî, bi pêşxistina berxwedanê rewşek ku li ser hemû Kurdistanê bandora xwe hebe dê derxista holê. Li ser vê bingehê pêvajoyek ku dihate xwestin li Sûr û Rêzan (Bağlar) were pêşxistin, bi xwe re qonaxeke nû afirand, bi mewziyên Sûka Mast (Yoğurt Pazarı), Mînareya Bi Çar Lingan (Dört Ayaklı Mînare), Karwanseray û Firina Eminiyetê dihate wê wateyê ku qad hatibû girtin, dihate qontrolkirin. Di saet 11'ê

şevê de êrîşa dijmin dest pê kiribû. Ji ber ku di encama vê êrîşê de kepçeyên di destê me de texrîb bibûn, du mayinên li gel me bûn nekarîbû di cihê bên teqandin de bên bi cihkirin. Pevçûn, heya bi sibeyê berdewam kiribûn û hevalê Berxwedan şehîd ketibû.

Tevî ku qonaxa zehmet didomiya, êdî tecrûbeyeke nû jî hatibû qezenckirin. Qada bihata qontrolkirin ji nû ve di ber çavan re hate derbaskirin û bi rêbazeke hê bimantiq amadekariyên hewldaneke nû hate kirin. Dê bi qadeke hê tengtir ku erebe û amûrên din ên dijmin zehmetî bikişînin bikevinê, bihata destpêkirin û hedefa bingehîn ew bûya, her diçe qad bê berfirehkirin.

Bi teqwiyeya nû ya cebilxaneyê re êvara 5'ê Îlonê berxwedan dubare hate destpêkirin. Mewziyên me yên esasî ku hejmara wan 7 bû ev bûn; Mînareya Bi Çar Lingan, Firina Eminiyetê, Kolana Qeredenîz, dibistanên seretayî yên Silêman Nazîf û Deriyê Mêrdînê (Mardin Kapı), Mizgefta Qurşunlu (Kurşunlu Camisi) û Sûka Mast (Yoğurt Pazarı). Bêyî ku pir dereng bimîne dîsa êrîşa dijmin dest pê kiribû lê çalakiya hevalê Yilmaz a li ser Qereqola çarşiyê kiribû ku dijmin paşve bikişe. Ev jî dihate maneya ku heya bi sibehê dema me hebû. Me ev firsend bi kar anî û heya bi sibehê hemû mewzî hatin çêkirin. Dijmin nêzîkî saet şeşê dîsa dest bi êrîşê kir û heya bi nîvro saet 12'yê pevçûnê berdewam kir. Nêzîkî 10 kuştî û gelek birîndarên dijmin hebûn. Cara yekemîn di vê pêvçûna di 6'ê Îlonê de gel alîkariyeke mezin dida. Heya bi 10'ê Cotmehê her çendî bi vî şiklî hin roj bi pevçûn derbas bin jî qontolkirina qadê berdewam kir.

Di heştê Cotmehê de hevala Berfîn di encama biserdegirtina malekê de bombeya xwe bi xwe de teqandibû û şehîd ketibû. Ev bûyer xwediyê wê taybetmendiyê bû ku dubare dianî bîra me hewce ye berxwedaneke çawa were lidarxistin. Hevala Berfîn ku bi temamî bi ruhekî fedaî bi rola

xwe ya pêşengiyê rabibû yek ji lehengên herî mezin ên berxwedana Sûrê bû.

Dijmin di 10'ê Cotmehê dubare êrîşên xwe dan destpêkirin. Êrîşên wî yên vê carê cuda bûn; êrîşa ku Tîma Esedulah (versiyona DAIŞ'ê ya KT'ê) ji nû ve derketiye holê, navê wê dihate bihîstin bû. Piştî ku ji sibehê heya bi êvarê şer berdewam kir, di saetên şevê de paşvekişîn hate pêkanîn. Operasyona dijmin 4 rojan berdewam kir.

Êvara 5'ê Mijdarê (roja seyemîn a êrîşa li ser Ferqînê) dubare dest pê kir qada berê dihate qontrolkirin bê qontrolkirin. Ji ber êrîşên dijmin bi zehmetî mewzî hatin çêkirin.

Dê berxwedana vê carê cuda bûya, neçar bû wisa bibe. Sibeya 6'ê Mijdarê êrîşên dijmin dubare dest pê kirin. Ji ber êrîşên zêde yên dijmin nekarîbû mewziyên Kurşunlu û Sûka Mast (Yoğurt Pazarı) bihatana çêkirin û vê rewşê qederekê zehmetî da me. Di şerê heya bi êvarê berdewam kiriye de hevalê Avesta (Ferhad Doğru) şehîd ket û di encama derbeyên giran ên li dijmin hatine dayin de, dijmin neçar ma paşve bikişe. Êrîşa destpêkê ya dijmin hatibû şikênandin û ji nû ve baweriya xwe bi xwe bi pêş ketibû. Êdî rewş girêdayî wê bû ku bêrawestan amadekarî bên kirin. Girêdana bi Şehîd Avesta jî ev dida hewcekirin. Gotina destpêkê ya Şehîd Avesta ku ji rêxistinkirina YPS'ê kelecaneke mezin distend ev bû; "ez ê bibim şehîdê destpêkê yê YPS'ê". Hevalê Avesta çûbû alîkariya hevalên ku li Sûka Mast (Yoğurt Pazarı) li du hevalan mane, piştî ku bombe avêtibû ser dijmin birîndar bibû û şehîd ketibû.

Êdî ji bo me her roj weke zêr biqîmet bû. Diviyabû qasî karibe mewzî bihatana zêdekirin û qad bihatana berfirehkirin, xanî bihatana kunkirin û xet bihatana çêkirin, bihata rêxistinkirin, derbaskirina cebilxane û hevalan bihata kirin. Mayin li ser rêyan bihatana çandin û ji herêmê tevlîbûna ciwanan bihata rêxistinkirin. Me bi wê zanebûna ku dikare li

ser bingeha amadekariyan şer were biserxistin tevger dikir lê em ê paşê jî pê bihesîna ku amadekariyên me pir sînordar bûne.

Eleqadariya gel qederekê mezin bû. Weke ku li ber qereqola dijmin mayin bê çandin, bi şiklekî bêdeng bingehên mewziyan dihate danîn. Li kolanên Sûrê xendek çêkirin, ji bo çêkirinê hewl dayin bêwate bû, ji ber ku di nîv metroya destpekê de jî qebloyên elektrîkê û boriyên avê derdiketin li pêşberê me. Li şûna vê hê zêdetir çêkirina mewziyên sergirtî (mewziyên şer) hate nîqaşkirin û beşeke wan hate çêkirin jî. Dê şiklê pevçûnan pir cuda bûna. Dema amadekariyê tiştê herî zêde me hewce dîtiye kepçe û xîz bû, lê pêşketinên di vê mijarê de bi awayekî zelal nekêrhatin û bêxemiya hin kesan nîşanî me da. Eger me karîba têra xwe xîz peyda bikin dê me karîbana hê bi lez amadekariyên xwe pêk bînin. Dîsa ya din jî hebûna kepçeyeke me dibe ku bibûna sedem em karibin pişta xwe bidin bedenên dîrokî yên Sûrê. Hema bêje ti tiştê me ji bo kepçeyê nekiriye nemabû. Eger kepçe hebûya dibe ku me karîbûna li ser Deriyê Nû û Bexçeyên Hevselê qontrolê ava bikin. Kepçe nekarîbû bihata birêxistinkirin, karîbû bi zor û zehmetî hinek xîz bê peydakirin.

Ji 5'ê Mijdarê heya bi 28'ê Mijdarê her roja derbas dibû firsendeke mezin bû. Eger me ev firsend çendî rast bi kar bianiya em ê di vî şerî de ewçend bi ser biketana. Bi vê zanebûnê her tişt dihate kirin. Nêzîkî 80'yî heval û yeke hatibû bi rêxistinkirin, cebilxane hatibû depokirin. Ji Firina Eminiyetê heya bi Karwansarayê, ji Kolana Qeredenîzê heya bi Deriyê Nû (Yeni Kapı), ji Qurşunluyê heya bi Sûka Mast û Mînareya Bi Çar Lingan çêkirina mewziyan hatibû temamkirin. Di asta rêveberiyê de hevalên bihêz hatibûn rêxistinkirin. Texmînî di 26'ê Mijdarê de şehadeta hevalê Mezlûm ku di taxima bi tevger de cih distend hatibû jiyîn. Dema dijmin dixwaze du hevalên piştî merasîma hevalê Şehîd Mezlûm dizivirîn Sûrê, nêzîkî Mînareya Bi Çar Lingan bide sekinandin, du polîs hatibûn kuştin, hevalan karibûn bi saxlemî vegerin qadê. Lê belê di

encama gulebarana giran a dijmin de tahir Elçiyê ku ji bo Mînareya Bi Çar Lingan daxwuyaniya çapemeniyê dide, ji aliyê dijmin ve hatibû şehîd xistin. Hema di pey re îlana qedexeya derketina kolanan û êrîşa dijmin a li ser qadê dest pê kiribû. Ji bo vê êrîşê dijmin pir bêamadekarî bû. Di van pevçûnên seranserê van du rojan hatiye jiyîn de derbeyên giran li dijmin hatin dayin. Li nêzîkî Mînareya Bi Çar Lingan di encama mayina ku bi erebeke zirxî de hatiye teqandin, erebe ji binî ve hatibû îmhakirin û li aliyê Deriyê Nû (Yeni Kapı) û Firina Eminiyetê jî derbe li dijmin hatibû dayin.

Dorpêça ku êvara 29'ê Mijdarê rabibû, piştî navbereke bi du rojan di 2'yê Kanûnê de, danê sibê dubare dest pê kir. Diyar bû êrîşa vê carê hê berfirehtir bû. Piraniya sivîlan ji qadê derketibû lê dîsa jî yên li malên xwe dimînin hebûn. Di deh rojên destpêkê de zehmet be jî, hatin û çûna sivîlan pêk dihat. Em li benda êrîşeke berfireh bûn. Baweriya me ya bi xwe pir mezin bû. Kûrbûna me ya nû û li gorî demên borî ji ber derbaskirina tengasiya me ya heval û cebilxaneyê me texmîn dikir em ê zêde zehmetî nejîn. Me bi vê baweriya xwe bi xwe ya bi şiklê 'ka bila carekê werin' û me nobeda xwe ya li mewziyan didomand.

Me pir-hindik îstihbarat girtibû ku dê êrîş bê destpêkirin û em li bendê bûn. Roja 1'ê Kanûnê, saet derûdora 12'ê li meydana Mizgefta Qurşunlu (Kurşunlu Camisî), mayinek bi dewre ku me berê çandibû teqiya û di encama şenseke mezin de bêyî birîndariyê heval xelas bûn. Ji bo ku neyê fêmkirin çala pir mezin di encama teqîna mayinê de vebûye, kamûfle hate kirin û birandeyeke spî hate kişandin ser. Dijminê ku di rojên 4 yan jî 5'ê pevçûnan de fêm nekiriye çi bûye, gelek hewldan pêşxistin lê her carê bi mayin û roketên nû pêşî li hate girtin ku vê razê fêm bike.

Êrîşa destpêkê ya dijmin di saet şeşê 2'yê meha Kanûnê de li ser Mizgefta Qurşunlu pêk hat. Çeka ku bi kar anî jî, bombeavêja ji bo dijmin di asta destjênabe de bû.

Baş e, dijmin evqas cebilxanê li dijî kê bi kar dianî? Hema gotina ku dijmin li dijî dîwar, pencere, mizgeft, avahî û banê avahiyan şer dike, nabe li ser zêdekirin. Ji ber ku dibe ji her aliyê ve êrîş bên ser û yekane rêya pêşî girtina li vê di şer de raseriya xwe ya gulebarandinê bikaranîn bû. Dibe ku em li her malê bin û ji pencereyeke wan malan yan jî, ji kuneke ji bo pevçûnê hatiye vedan guleyeke baş nîşana wê hatiye girtin biavêjin dijmin! Wê demê wexta wisa fikirîn çêdibe yanî ji aliyê dijmin ve li bûyerê tê mêyzekirin, her mal heta her tiştê bi ber qada dîtina dijmin dikeve dibe hedefekê. Tê fêmkirin ku karê dijminê me jî zêde ne hêsan bûye...

Roja destpêkê bi zehmetî derbas dibû. Hevala Rûken ku diviyabû li aliyên Elîpaşe (Alipaşe) be, di pevçûna ku li Meydana deriyê Çiyê ketiyê de şehîd bû. Hevala Rûken hevalek ku nû hatiye qadê, ji bo tevgera veşartî û deşîfrebûnê pir bi baldarî tevdigere bû. Bi zindîbûna xwe di demeke kurt de rengê xwe dayibû jiyanê. Bi şehadeta wê re dijmin neçar ma Meydana Deriyê Çiyê (Dağkapı Meydanı) jî, bixe nav herêma qedexekirî.

Di roja 2. a berxwedanê de êrîşên dijmin hê zêdetir bûn û hevalê Zinar (Mehmet Demirel) gihaşt şehadetê. Her du şehadetên di qadê de hatine jiyîn, ji nezanîna bi temamî ku dê gule ji ku bên û ji hişyar tevnegerînê çavkaniya xwe distend. Li cihên ku şerê germ pêk dihat hê şehadet pêş neketibûn.

Mizgefta Qurşunlu di dîroka xwe ya 500 salî de tiştekî wisa nedîtibû, berê hemû çekan zivirandibûnê û bi dîwarên xwe yên kunkunî bûye, agir girtibûyê, bi qirçeqirçeke mezin dişewitiya û dibû xalî. Ji saya avaniya xwe ya xurt a dîrokî hilneweşiya lê nekarî xwe ji texrîbateke mezin jî xelas bike. Pir girîng bû ku dijmin li Mizgefta Qurşunlu bi cih nebe. Ji ber ku mînareya wê bi qasî avahiyeke 10 qat bû û li ser esasê ku li ser gelek kolanan hakim bin dibe ku sekvan lê bi cih bibin. Lê timî rewşek ku bêhna me fireh dikir hebû; ew jî ew bû ku hevalê Mustafa li wê derê bû. Her cara dijmin xwe diceriband, dizanî

derbe lê bide û nehelê Kurşunlu bikeve. Tevî ku me tenê yek gule jî neavêtibû Mizgefta Qurşunlu, dijmin tiştê ku wî dikir berevajî dikir û hewl dida bi şerekî taybet ê mezin biavêje ser me. Bi rastî jî digotin ku terorîst li mizgeftê didin, ji vî aliyî ve tiştên dihatin gotin rast bûn; rêxistina terorê ya DAIŞ-KT-AKP'ê li mizgeftê dida...

Me texmîn dikir dijminê nikare bi pêş bikeve dê bişkê û paşve bikişe lê paşê dubare êrîş bike. Dijminê ku di 9 rojên destpêkê de wendahiyên giran dayibû û nekarîbû bi pêş bikeve, îlan dikir ku qedexeya 17 saetan radibû. Dorpêç ranebibû, tenê 100 metro paşve kişiyabû, hatin û çûna sivîlan di bin qontrolê de hatibû pêkanîn. Di 10'ê Kanûnê de bi vê pêkanînê li qada me hatin û çûna bi hezaran sivîlî pêk hat û piraniya sivîlên ku mane jî ji qadê derketin.

Dema ku êvarê saet bû 4 destpêkê bêdengiyeke mezin girte ser qadê, û di pey re ji cihê mayî pevçûn berdewam kirin. Mezinahî û awayê êrîşa vê carê pir cuda bû. Hêzên taybet ku bi me nekarîbûn, agahî dabûn apên xwe yên di artêşê de û apên wan bi tang, top, hewan û bi hezaran leşkeran hatibûn hawara wan. Xuya bû pir zêde ji gotina me ya bi awayê "hele bila carekê bên" dilê xwe hiştibûn. Me got "hele bila carekê bên lê ne ewqas jî, şerm e, li beramberê hejmareke evqas kêm, bi teknîkeke wisa û bi hezaran leşkeran teyî! Madem tu bi hêzeke wisa êrîş dikî, wê demê ji bo çend rojan rê veke em jî, hinekê teqwiye bistînin. Wê demê were û em te bibînin, kî xurt e? Tebî dîrok ne dîroka kevn e; merdî nemaye, destûrê nadin ku tenê derziyek bikeve hindûr. Li gorî dihate fêm kirin, ne tenê hêza me ya leşkerî diceribandin, di heman demê de diceribandin ku em ê li beramberê birçîbûn, têhnbûn, bêcixarebûn û bêelektirîkbûnê çiqasî li ber xwe bidin, îradeya me û hêza me ya psîkolojîk çiqas e. Em dizanin armanca wan ew e îradeya me bişkînin. Ji ber vê yekê em di wê zanebûnê de bûn ku em çiqas wendahî didin bila em bidin, heya ku ji me yek sax dimîne, divê ev şer, ev berxwedan bê domandin.

Dema ku artêş jî tevlî şer bû, êrîşên dijmin ên ji aliyê Qurşunluyê ve pêk dihatin pir hêdî bibûn û aliyê êrîşan dest pê kiribû ji Birca Bizinê (Keçi Burcu) ber bi Deriyê Nû (Yeni Kapı) ve biguhere. Ji êrîşên li ser mewziya hevalê Hebûn pêk dihat me fêm kiribû ku êrîşan berê xwe guhertiye.

Hevalê Hebûn: Ew mewziyên me yên li pêş tine bûn...

A: Erê...

Hebûn: Êdî ew tine ne.

A: Çawa yanî ‘tine ne’?

Hebûn: Dijmin bi tiştekî lê dide.

A: Ka em biçin lê binêrin.

Dema çûn û lê mêze kirin dîtibûn ku bi rastî jî tiştek nemaye. Ji ber ku hê bi tangan re rû bi rû bûyin bi pêş neketibû destpêkê nedihate fêmkirin ku çi lê daye. Lê gava ku parçeyekî guleyê tangê hate dîtin rewş zelal dibû. Bi vî awayî ji 12’ê mehê pê ve me li gel tangê hev nas kir. Belavelabûna mewziyên me zêde tiştek nediguhert, ji ber ku li ber mewziyên me mayinên me yên me xistibûn tupên mezin hebû. Her wiha me nedifikirî ku hatina tangê, me zêde bi bandor bike.

Du çekên me yên dijmin bidin sekinandin, li ser kepçeya wî ya bi zirx bandor bike hebûn. Yek B-7 û ya din jî çeka Zagros bû. Me her du çek jî qederekê bi bandor bi kar anî lê erebeya derbe distend, dibirin û li cihê wê, yeke nû dianîn. Ji ber ku guleyên me yên B-7’ê kêm bûn diviyabû em bi dîqet bi kar bînin. Dijminê me nizanim artêşa mezin a çendemîn a NATO’yê bû. Tu li tanga wî didî, di cih de yeke nû tîne cihê wê. Li kepçeya wî ya zirxî didî, dotira rojê yeke zirxî ya pêşketîtir tîne, li yekîneya wî ya piyade didî dotira rojê yekîneyeke nû tîne. Dema psîkolojiya leşkeran xerab dibe. Gava psîkolojiya leşkerên wî têkdiçe, ji Bolu û Kayseriyê leşkerên xwe yên bi bereyên cuda tîne. Anîna wan têrê nake bi ser de jî, di medyayê de bi qîr û hawar progandaya wan dike. Yên dibihîzin yan dibînin dibêjin qey ev ê hema biçin û di cih de pirsgirêkê çareser bike, leşkerek filan di berdela cîhanê de

ye. Lê her çendî ti kes nizanibe jî, em dizanin xwe diherimînin û direvin.

Dijmin di 17'ê mehê de Dibistana Deriyê Mêrdînê xiste bin qontrola xwe û dest pê kir dibistana 3 qat weke qereqol bi kar bîne. Di heman rojê de pevçûnên giran hatibûn jiyîn û hevalê Şervan ji serê xwe giran birîndar bibû. Şensa wî ya jiyanê hema bêje qet tine bû. Du guleyên li rastê seriyê wî ketibûn, hema bêje derizeke bi qasî 2 cm kûr vedabûn. Mêjiyê heval weke bûyî xuya dibû. Ti kesî karibûya amaliyatê bike tine bû. Di mijara ku em ê çawa dest werdin de jî, fikreke me ya sererast tine bû. Doxtorên me yên ji tendirustiyê kêm-zêde fêm dikin (hin heval bi pratîkên xwe yên vê derê qederekê bibûn xwediyê tecrûbe) her çendî dest werdabin jî xuya dikirin ku hewce dike bi lezgînî bê gihandin naxweşxaneyê. Li ser vê bingehê, şeva wê rojê hevalê Şervan hate xistin tabûtekî (ji bo ku mêjiyê wî neleqe) hewl hate dayin ku bê gihandin derve. Lê belê nekarîbû bihata gihandin derve û dubare paşve hate anîn. Heta dikare romaneke wê şeva ku hevalê Şervan bi wê rewşa xwe ya birîndar hemû şevê ji derve li ber sermayê mayî, nehatin tedawîkirina wî û îhtimala ku bikeve destê dijmin hatiye jiyîn were nivîsandin. Hevalê Şervan li ber xwe da û karîbû xwe bi jiyanê ve bigire. Ya ku pêk hatiye tenê dikaribû mucîzeyek be. Tevî ku destwerdaneke asayî ya tibî nehate kirin (ji derveyê serûm û derziyan), xweragirtina hevalê Şervan ji bo hemû hevalan dibû moraleke mezin. Zanebûna wî, hefizeya wî, biryardariya wî li şûnê bû, asta biryardariya wî ji me hemûyan li peştir bû.

Bi cihbûna dijmin li Dibistana Deriyê Mêrdînê, çavkaniya xwe ji hin kêmasiyên û bêtecrûbebûna me stendibû. Ji ber lêdana tangê 6-7 mal paşve kişandin dihate çêkirin. Li gorî me, dema wesayiteke zirxî hatibe pêşberê malekê me digo, em nikarin li wê derê bimînin. Lê di vê qonaxê de destwerdana çalak a hevalê Çiyager di guherîna vê mijarê de qederekê bandor kir.

Di bîst rojên destpêkê de li ser mewziya xweser a firina Eminiyetê (Eminyet fırını), Mînareya Bi Çar Lingan (Dört Ayaklı Minare), Sûka Mast (Yoğurt Pazarı) û Deriyê Nû (Yeni Kapı) hema bêje qet êrîşên dijmin pêk nehatibûn. Timî bombeavêjen gule diavêtin lê timî bi vekirî hiştina deriyan û bi karanîna tunelan ji ber girtina tedbîran pêşî li birîndarbûnê dihate girtin. Piştî ku dibistan ket bin qontrola dijmin, berdewam kir ku aliyê êrîşê ber bi Deriyê Nû ve bi pêş bikeve. Mewziya ku hevalê Afad jê berpirsiyar bû qadeke berfireh bû û di cadeya fireh de bipêşketina dijmin hê hêsantir dibû. Tangê dest pê kiribû bi zanebûn malan bike hedefa xwe û lê bide. Dijmin li Qurşunluyê li mala ku hevalan tê de nobed digirtin xistibû û guleyê tangê di nav malê de, li aliyê hindur ê ban (tavan) teqiyabû. Hecî, Agir û Çîyager (Çiyagerê ciwan) bi çendek birînên sivik ev êrîş derbas kiribûn. Ev heval, hevalên destpêkê ku bi lêdana tangê birîndar bûyibûn. Her sê heval jî piştî pansumanên xwe vegerîbûn mewziyên xwe û tevlîbûnên xwe yên bi moral domandibûn.

Li ser Sûka Mast (Yoğurt Pazarı) êrîşa dijmin pêk nedihat lê ji roja destpêkê pê de hevalê Delîl ku di nav lêkolîn û lêgerekê de bû, karîbû çalakiyê li dar bixe. Berpirsiyariya qada ji Mînareya Bi Çar Lingan heya bi mewziya Hemama Çardakli hevalê Dêlîl girtibû ser xwe. Tevî wî bi xwe, bi çendek hevalên temenên wan nêzîkî 13-14 ewlekariya wê qadê pêk dianî. Tevî vê jî ti car negot, “pêwîstiya me bi hevalan heye”. Hevalê Delîl ku di seranserê qonaxa amadekariyê de tenê bi çêkirina yek mewziyê elaqadar bû, dema ku pevçûn dest pê kiribûn di nav çend rojan de qada ew lê bû, berfireh kiribû û dest pê kiribû mewziyên nû çêbike. Hevalê Delîl timî di nav ponijandina li dijmin dayinê de bû. Li vê derê, yanî li Sûrê mezin bibû û li ser hemû kolanan qederekê hakim û serwer bû. Bûyerên di 23’yê Kanûnê de hatine jiyîn, em hemû xistin nav rewşeke zehmet. Çawa dema hevalê Mustafa li Qurşunluyê bû, me digot “pişta me saxlem e”, ji bo Sûka Mast (Yoğurt Pazarı) jî hevalê Delîl

heman bawerî dida me. Lê belê vê carê rewş bi şiklekî cuda bi pêş ketibû. Li ser gumanên ku ji dibistanê deng tê, bi armanca derbe li dijmin dayinê li ser israra hevalê Delîl, bi terzeke pir zêde şaş hewl hatiye dayin ku bikevin dibistanê, ji ber ku dijmin ji qatê destpêkê yê avahiyek ku li bexçeyê dibistanê dinêre bi rêbaza dîwar kûnkirinê bi alîkariya derincokê li avahiyeke cuda ku li bexçeyê dibistanê mêze dike bi cih bûyibû, hevalê Mezlûm (İsa Oran) û Delîl (Mesut Seviktek) şehîd bibûn.

Rîskên bi awayê dîwar kunkirin û bipêşde çûnê zêde hebûn. Mirov nedizanî ku li pişta dîwêr çi heye û dîsa, eger dijmin hebûya jî aşkere xuya bû dê kemîn danîna û li bendê bisekiniya. Ji ber ku dema dîwar dihate şikênandin hema bêje heya bi 100-150 metroyê dengê şikênandinê belav dibû. Çawa ku me bi caran dijminê ku heman rêbazê bi kar tîne derb kiribû, diviyabû me texmîn bikira ku dijmin jî dê bi heman awayî di kemînê de bisekine û derbe li me bide. Ji bo ku cenaze bên wergirtin tevî ku zêde mûjilbûn bi pêş ket, ji ber ku dijmin di kemînê de bû li pêşiya vê yekê bû asteng. Ji aliyê din ve, belavbûn bi şiklekî agahiya ku dijmin cenaze birine, asteng kiribû ku em hewldanên nû bi pêş nexin. Dijmin cenaze nebiribûn û di kemînê de her sekinîbû. Heval di 23'yê Kanûnê de şehîd bûn, me di 10'ê Çileyê de ferq kir ku cenaze nehatine birin. Her du heval jî di pozîsyona destpêkê ku şehîd ketine de bûn û ji ber berfa dibare, serçavên wan tam xuya nedibûn. Bi rêya darekî, çeka hevalê Mezlûm hatibû stendin. Ji bo cenaze wergirtinê, dubare tevgerek bi pêş ket lê hê dijmin di kemînê de bû. Her çendî pir li zora me çû jî, ji ber ku dê hewldanên me yên wergirtina termên hevalan bê berdêl nebûya û îhtimal mezin bû ku wendahiyên nû bên dayin me nedikarî hevalên xwe bînin. Termên her du hevalan jî nêzîkî demeke bi qasî mehekê li wê derê ma. Hevalê Mezlûm hevalekî ku di rêveberiyê de cihê xwe distîne bû. Bi zindîbûn û zekaya xwe ya pratîkî xwediyê taybetmendiyeke bi hêsanî çareserî diafirîne û

biryar dide bû. Tevî ku tecrûbeya wî ya leşkerî zêde tine bû, piştî ku dîwar hate şikênandin diyar kiribû ku hewce dike ew danekevin jêrî lê li ser israra hevalan qebûl kiribû û ew ketibû pêş. Hevalê Mezlûm ku Komalên Ciwan bû, li ku derê pêwîstî hebû di wê mewziyê de cihê xwe digirt û hêz dida wê. Ji rêveberiyê şehadeta hevalê Mezlûm û şehadeta hevalê Delîl ku berpirsiyarê mewzıyê bû, bibû wendahiyên me yên herî giran. Li cihê hevalê Delîl ku Sûka Mast (Yoğurt Pazarı) bi du ciwanan ve digirt, karibû bi çêkirina vesaziya şeş hevalan valahiya wî bê dagirtin. Li şûna hevalê Mezlûm jî vesaziya hevalê Dewrîm çêbû.

Hevalê Dewrîm hevalêkî ku di asta rêveberiyê de di berxwedanê de cihe xwe distîne bû. Di destpêka hatina xwe de kete nav pratîka Hasirli. Bêyî ku zêde li qadê bigere û dîsa, bêyî ku şerê bajêr çawa ye fêm bike, ket nav şer. Her çendî demên destpêkê hinek hatin-çûn jiyan kir lê di demeke kurt de bû yek ji hevalên xwediyê tevlîbûneke herî çalak û hêzeke mezin dide.

Di 22'yê Kanûnê de hevalê Ararat (Serhat Doğan) şehîd ket. Hevalekî wisa bû ku ji destpêka berxwedanê ve timî ji bo bikaranîna çeka Qernasê israr dikir. Piştî ku çekê distîne çend rojan, li aliyê Çardakliyê derdikeve banê avahiyekê, 3-4 guleyan diavêje û li wê derê ji ber ku cihê wî deşîfre dibe ji serê xwe derb distîne û şehîd dikeve. Piştî ku hevalê Ararat şehîd ket termê wî hate derxistin ji derve. Li mewziya Ocaxa Saxlikê (Saglık Ocağı) di seranserê 20 rojan de qet şer û êrîşên dijmin nesekinî; hevalê Ararat li vê derê tevlîbûna herî bimoral nîşan da. Bi israreke mezin dixwest qirnasê bi kar bîne. Li ser vî esasî daxwaza wî hate bicihanîn. Hem ji banê avahiyan sekvanî kirin pir rîsk dihewand û li şûna yekê, ji yekê zêdetir gule hatibû berdan û cihê wî desşîfre bûyibû. Dijmin ji roja destpêkê ve weke hedefên bingehîn li banê avahiyan dinêrî û timî ev der dikir hedefa xwe. Ji ber vê yekê diviyabû kêliyên kurt bên bikaranîn yan jî qet neyên bikaranîn.

Piştî ku dest pê kiribû Dibistana Deriyê Mêrdînê (Mardin Kapı Okulu) weke qereqol were bikaranîn, dijmin li ser mewziya ku me di navbera xwe de weke mewziya xweser bi nav dikir, ji du aliyan ve êrîş dabû destpêkirin. Mewziya ku 2 metro bilind û 2 metro fireh bû, piştî çend derbên tangê hilweşîbû. Hedefa dijmin a nû Dibistana Silêman Nazîf ( Süleyman Nazif Okulu) bû û ji du xetan ber bi dibistanê ve bi pêş diket. Ji bo xeta yekemîn cadeyeke berfireh hebû, ji bo xeta duyemîn, malên kolana teng ku mewziya xweser lê bû bi derbeyên tangê dihatin hilweşandin û piştî ku bi kepçeyê dihate paqijkirin, cade dihate çêkirin. Ji kolana ku erebeyên zirxî jî nekaribûn derbas bin, tang hate derbaskirin û xwe gihandin dibistanê. Kêlî bi kêlî hewl hate dayin bi pêşde hatina dijmin bê derbkirin, di vê pêvajoyê de di 30'ê Kanûnê de şehadeta yek ji hevalên herî ciwan, hevalê Dewran (Ramazan Öğüt) hate jiyankirin. Hevalê Dewran dema bi dûrbîna şevê cade qontrol dikir, ji serê xwe derb stendibû û şehîd ketibû. Tevî hemû hişyariyên bikarneanîna cadeyê, cade hatibû bikaranîn û di heman şevê de hevalê Qesab jî ji lingê xwe derb stendibû û giran birîndar bibû. Xetereya jiyanî ya hevalê Qesab tine bû lê hestiyên lingê wî şikestibûn.

Hejmara birîndarên me her diçû zêde dibû, vê jî em tengav dikirin. Di 13'ê Kanûnê de hevala Zozan ji lingê xwe birîndar bibû û zêdetirî mehekê li erdê mayibû. Dîsa, hêvala Nûda (Nucan Malatya) ji lingê xwe ve birîndar bibû nêzîkî mehekê nekarîbû rabe. Hevalê İsmaîl (Lezgîn) ji lingê xwe birîndar bibû û piştî demekê îstirehet kiribû, bi rewşa xwe ya birîndar li maleke sabît, ji bo qontrola kolanê dest bi nobedê kiribû. Ji ber ku parçe li hestî ketibû dikarî hê kulek bimeşe.

Sedem ew bû ku me xwe vekikişandibû xeta dibistana Silêman Nazîf (Süleyman Nazif); dîsa, xeta me hatibû qutkirin û îhtimala ku heval derbeyê bistînin mezin bû. Xeta me ya nû bi şiklê Ocaxa Tendirustiyê (Sağlık Ocağı), Silêman Nazîf (Süleyman Nazif) û Dibistana Deriyê Mêrdînê (Mardin Kapı

Okulu) bû. Dijmin hewl dida êrîşên xwe bi awayekî hemwext bimeşîne. Li rojhilatê vê xeta nû ku di serê salê de weke xîzikekê pêk hatibû de dijmin, li rojavayê wê jî em hebûn. Aliyê êrîşê yê esasî ji rojhilat ve bi pêş diket lê ji aliyên din ve jî amadekariyên dijmin ên êrîşê berdewam dikirin. Di van rojan de ji ber barîna berfê balafirên kişfê nedikarîn bigerin. Me hewl da bi şiklê derbe li dijmin dayinê û qada em qontrol dikin firehkirinê ji vê firsendê sûd wergirin û ev hewldanên me bi bandor bûn jî. Me esas digirt ku em xeta me ya Sûka Mast (Yoğurt Pazarı), Mînareya Bi Çar Lingan (Dört Ayaklı Minare) ber bi Cadeya Gaziyan (Gaziler Caddesi) ve –ber bi mewziyên dijmin ve- berfireh bikin. Bi pêşketin li ser esasê kunkirina dîwaran pêk dihat.

Ji ser dijmin çek rakirin weke hedefekê, timî di rojeva me de bû. Barîna berfê weke firsendekê hate bikaranîn, em ketin xetên operasyonên ku dijmin berê li dar xistibûn û çekeke melez ku dema ji pevçûnên ji beriya niha reviye li cihê xwe hiştiye li gel dûrbîneke termal hate bidestxistin. Vê li gel hemû hevalan moraleke mezin dayibû peydakirin û hedefa rakirina çekan hê zêde kiribû rojev. Vê gavê (roja 67.) 4 çekên melez, 2 dûrbînên termal, 2 mertal, malzemeyên jiyanî û çend çenteyên dijmin hatibûn bidestxistin. Her çendî me xwe negihandibû cenazeyên ku dijmin li pey xwe hiştibû jî, bi desxistina malzemeyên li pey xwe hiştine ji aliyê hêza moralê ve girîng bû.

Ji bo ku dijmin karibe bikeve Dibistana Silêman Nazîf, hewce bû berê li qadên me vala kirine, operasyon li dar bixista, zelal bikira ku em li wan deran in yan na. Çend mayinên me yên bi pêlî kirinê diteqin bi dijimin ve teqiyan û vê rewşê neçar hişt hê bi tedbîr bi pêş de biçe. Vê jî bi me dem da qezenckirin û kir ku em amedekariyên xwe yên nû xûrtir bikin. Me şaşitiya ku me li Dibistana deriyê Merdînê kiribû, li vê derê dûbare nekir û vê carê di nav dibistanê de jî mewzî hatin girtin. Ketina dijmin a dibistanê li ser demeke dirêj belav bibû û karîbû roja

9. (roja 9. ku me xwe kişandibû Dibistana Silêman Nazîf) ev pêk bê.

Di vê xeta ku bi kolanên xwe yên teng me ji bo xwe weke xetên sor bi nav kiribû de, em di pozisyona em ê karibin derbeyan li dijmin bidin de bûn û wisa jî pêk dihat. Lê belê pirsgirêkek hebû, ew jî ev bû ku her ku dijmin nedikarî bi pêş bikeve, xwe diavêt ber bextê teknîkê, zêde zêde bi kar dianî. Malên me tê de mewzî girtibûn yek bi yek dihatin derbkirin. Her ku dem diborî teknîka ku dijmin bi kar dianî jî zêde dibû. Ji nîviya meha çileyê pê de, ji guleyên neteqîne, me fêm dikir ku dest pê kiriye hewanên 60 mm jî bi kar bîne. Em dizanin gelek curên çek û bombeyên me nekarîne nas bikin jî, bi kar tîne lê belê em nikarin bi temamî fêm bikin ku kîjan çek in.

Li aliyê herî çepê yê xeta me ya rojhilat avahiya mewziya me ya Ocaxa Tendirustiyê hevalê Agir (Velat bilen), li avahiya aliyê wê yê rastê hevalê Rêber, Cahîd û Felat diman. Li paş dibistanê jî hevalê Xerzî, Şehîd Yilmaz (Turgay Girçek) û tevî hevala Delal, Sarya, nêzîkî panzdeh heval diman. Berpisiyara vê eniyê hevala Şîlan bû. Lê ji destpêkê ve li eniya ku timî şer û pevçûn di asteke herî jor de ye hevalê Çiyager bi xwe cih digirt û bi helwesta xwe ya ku di mewziyan de li gel hevalan nobed jî digirt hêzeke mezin dida me hemûyan. Ji bo qada ku li malên aliyê rastê yê Dibistana Silêman Nazîf mewzî giritibûn vesaziya hevala Delal, Bêrîvan û Sarya pêk hatibû. Ew mal ji aliyêkî ve ji aliyê tangan ve dihatin derbkirin û ji aliyê din ve jî îhtimala sizmekirina dijmin mezin bûn. Her sê hevalan jî bi pêşniyarên xwe yên “em ê li wê derê bimînin” helwesteke mînak nîşan dabûn.

Hevala Sarya yek ji hevalên me yên herî ciwan bû. Ne tecrûbeyên wê yên şer û ne jî perwerdeyeke cuda dîtibû. Lê daxwaz û wêrekiya wê ya li dijmin dayinê jî, seknek ku karibe mînak bê girtin bû. Hevala Sarya li eniya xwe paçekî sor girêdida. Ji ber wê yekê dest pê kiribû em jê re bêjin “Artêşa Sor”. Di demek ku hatibû fêmkirin xeter e, ji bo tevgera dijmin

bê şopandin mirov serê xwe ji pencereyê derxe û mêze bike û hişyarî hatibû dayin, bêyî bi karanîna eynikê ji pencereyê mêyzekirin pêk hatibû û hevala Sarya ji seriyê xwe derb stendibû. Dersên şehadeta ku di 8'ê Çileyê de hatibû jiyîn mezin bûn.

Cihê ku me ji destpêkê ve digirt bi ketina destê dijmin a dibistana Silêman Nazîf, nîvî bibû. Dewleta KT'ê weke ku êrîşê erdên nû yên nehatine dagirkirin bike, bi hemû artêş û teknîka xwe êrîş dikir û ji bo teslîmgirtinê hemû rê rêbaz diceribandin. Di şert û mercên ku wî bi xwe hema bêje ji 10 rojan carekê hêza xwe diguhert û nû dikir, tevî birîndar û şehadetên em didin em neçar bûn hê zêde li ber xwe dayinê esas bigirin. Hêsabên li ser bingeha nêzîkbûneke wisa dihatin kirin, "dorpêç bike, elektirîkê qut bike, hemû cebilxaneya artêşê weke dixwazî bi kar bîne, li wê derê bila berxwedêr bê lojîstîk bimînin û teslîm bin", ne digirtin û dikirin nedikirin berxwedan nedişkest. Ev jî dibû sedem ku her roja derbas dibe hêrsa dijminê me zêde be û hê dîn û hartir bibe. Bila dîn û har bin, berxwedan dê neşkê!

Lêxistina derbeyên giran li dijminê ku êrîşên xwe yên rasterast ji aliyê Deriyê Nû (Yeni Kapı) ve pir zêde kiribûn berdewam dikir. Li gel dijminê ku ketibû avahiyekê pevçûn derketibû. Bi rêya leşkerên Kurd û qorîçiyan, bi Kurdî bangawaziyên "teslîm be" dihatin kirin lê hevalan jî ev bangawazî li wan vedigerandin û bi Tirkî digotin ku ew ê heya bi dawiyê li ber xwe bidin. Li gel dijmin bi vî awayî gelek diyalog hatin pêşxistin. Gelek caran sînorê di navbera me de malek yan jî kolanek teng bû. Bombeyên destan ên hatine avêtin lê neteqiyane me ji hev re dişand, bi gotinên weke, "binêre neteqiya" me hanekên xwe bi dijmin dikir û ew tehrîq dikir. Me hewl dida li paş perdeyên bi kolanan ve hatine hilwesandin bi bezînê derbasî aliyê din ê kolanan bibin. Ji ber ku êdî destpêkiribû kolan hê xeteretir bin û ji bo tedbîra lêdana tangan jî tunelek ku nîv binerd bû ya ji Deriye Hemama Paşa, ji

kolana Deriyê Nû (Yeni Kapı), derbasî aliyê hemberê bibe hatibû çêkirin.

Ji Rêveberiyê hevala Nûda (Nucan Malatya) û hevalê Delîl jî birîndar bibû. Hevalê Delîl di 5'ê Çileyê de birîndar bibû û neçar mayibû 10-12 rojan îstirehet bike. Birîndariyên di asta rêveberiyê de hem li ser morala hevalan bandor dikir û hem jî dibû sedem ku qontrol lewaz bibe. Ji ber ku hevalên birîndar jî ev dizanîn ji aliyê psîkolojîk ve nedikarîn rehet bin.

Di rewşek ku hê şoqa birîndarbûna hevala Şîlan di 13'yê Çileyê de nehatibû derbaskirin de birîndarbûna hevalê Yilmaz (Turgav Girçek) bi pêş ket. Derbeya guleya ku di serê xwe de girtibû pir giran xuya nedikir lê tevî ku nehatibû fêmkirin gule derketiye yan jî hê di hindur de ye bi nobeda sarayê ketina hevalê Yilmaz, rewşa wî hê jî girantir kir û bû sedem ku di 16'ê Çileyê de şehîd bikeve. Ji bo destwerdana tibî têra xwe tinebûna amadekariyên me, dibû sedem ku gelek hevalên me şehîd bikevin û ji ber vê rewşê hem me û hem jî hevalên bi kar û barê tendirustiyê re mijûl dibûn zehmetî dikişandin.

Hevalê Yilmaz hevalekî ciwan bû. Hevalê Yilmaz ku ji roja destpêkê ve (Tebax) tevlîbûneke herî çalak nîşan dayibû bi çalakbûn û bi zêhniyeta xwe ya leşkerî derbe li dijmin dida, efsaneyek bû. Wêrekiya wî, wêrekî dida me hemûyan jî. Gelek hevalan dixwest hevalê Yilmaz li kîjan cihî ye li wê derê bin. Timî li mewziyên herî pêş, li mewziyên herî şer giran cihê xwe digirt. Eger Mizgefta Qurşunlu demeke dirêj neketibe, dijmin nekaribûye bikevê, herî zêde jî ji saya hevalê Yilmaz bû. Di destpêka şer de taximeke bi tevger pêk anîbû û berpirsiyariya wê, wî bi xwe meşandibû. Hevalê Yilmaz gelek caran ji hevalên li cem xwe re gotibû, "ez ti car hevalên xwe nahêlim û naçim" û heya bi şehadetê jî li ser wî esasî li gel hevalên xwe li dijî dijmin şer kir.

Di vê berxwedanê de şûna ti hevalan nayê dagirtin lê ji bo me nebûna hevalê Yilmaz bû çûyina herî giran. Li Sûrê mezin bibû û kolanên vê derê pir baş nas dikir. Li ku derê û çawa dê li

dijmin bide, ji berê de plan dikir û bi zekaya xwe ya pratîk, di cih de bersiva êrîşên dijmin dida. Ji bo pratîk û potansiyela wî ya heyî gotina “li beramberê dijmin artêşek bi serê xwe bû” şaş nabe. Hevalê Yilmaz li ser zimanê me hemûyan bû. Heya ku em hebin dê li ser zimanê me hemûyan be, di dilê me hemûyan de be. Tê neyê jibîrkirin, eger em nebin jî tê neyê jibîrkirin. Pêwîst e tu bêyî vegotin, beyî zanîn û bêyî naskirin. Tişta te herî zêde dixwest ew bû ku tu weke şehîdê YPS bêyî bibîranîn bû; em ê hewl bidin vê daxwaza te pêk bînin.

Roja 15’ê Çileyê hevalê Rojhat (Gündüz Akşemet) di lingê xwe de bi giranî birîndar bû û hema di pey şehadeta hevalê Yilmaz de şehîd ket. Hevalê Rojhat tevî ku zewicî bû, di vê berxwedanê de cih girt û bû xwediyê sekneke xurt; yek ji hevalên ku ji ber têrê nekirin, kêmbûna destwerdana tibî şehîd ketî ye. Di roja 16’ê Çileyê de hevalê Xemgîn (Elî ) ji milê xwe birîndar bû û heya bi serê meha Sibatê li erdê ma.

## BEŞA DUYEM

### Roja 51. A Berxwedanê
### 21'ê Çileya 2016'yan

Dijmin bi hemû teknîka xwe êrîşa xwe didomîne. Di şerên hatine jiyîn de herî kêm 4 kuştî û 7 birîndarên dijmin hene. Doh hevalek birîndar bû. Lê xetereya jiyanî pê re tine ye. Lê belê xetereya jiyanî ya hevalê Welat ku ji beriya hefteyekê birîndar bibû didome. Li nexweşxaneyê pirsgirêka derman pirsgirêka herî bêzarker e. Hema bêje dike ku dermanê herikîna xwînê disekinîne biqede, serûm peyda nabe.

Di vê rewşê de destwerdana hevalên giran birîndar hema bêje tê rewşeke ne mimkûn. Ji ber ku em nikarin alîkariya hevalan bikin, kêlî bi kêlî çûna wan a şehadetê dişopînin weke bêçareseriyeke herî giran me tengav dike. Gule li pişta hevalê Welat ketiye û ji ber bêderfetiyê ji laşê wî gule nikare bê derxistin.

Çekên bombeavêj hê zêde dikarin li hedefên xwe bidin, gule hê di nêzîk re derbas dibin. Wisa bûye ku tang ji dûr ve gule diavêje û navenda pevçûnan bûye Firina Eminiyetê. Çar jê giran birîndar donzdeh birîndarên me li naxweşxaneyê dimînin. Tevî vê biryardarî û helwesta me ya heya bi dawî liberxwedanê didome.

**Roja 52. A Berxwedanê**
**22'yê Çileya 2016'yan**

Hevalê Welat (Hakan Aslan) di roja 7. a birîndarbûna xwe de şehîd bû. Tevî ku pir li berxwe da, me nekaribû bi derfetên di destê xwe de wî rizgar bikin. Doxtorên ku ji tendirustiyê fêm dikin lê di wateya rastîn de ti perwerde nedîtine, piştî ku herêma zik vekirin û paqijkirin hevalê Welat şehîd ket. Hevalê Welat ku yek ji hevalên ku sekneke herî biryardar ji destpêkê ve nîşandaye bû, tevî birîna wî ya giran di van 7 rojan de têkoşîna jiyanê meşand û hêviya xwe jê qut nekir ku dê çareseriyek were peydakirin. Vê şehadetê careke din nîşanî me da ku di vî şerî de mijareke bingehîn ku amadekariya wê kêm hatiye kirin jî mijara pêkanîna amadekariya doxtor û dermanan e. Em fêm dikin ku me ji bilî çend kesên ji tendirustiyê fêm dikin û derman û malzemeyên ji beriya pevçûn dest pê bikin ji Ocaxa Tendirustiyê û eczaneyan girtiye (jixwe ew jî xelas dibin) amadekariyeke cidî nekiriye. Di berdêla êşeke giran de be jî, em fêr dibin ku amadekariya ku me kiriye ne çareseriyek e.

Di nava rojê de operator û fermandarê yekeyekê bi sekvaniyê hate kuştin. Dijmin hewl dide her roj bi xistina dewreyê ya teknîkeke nû bi pêş bikeve. Piştî êrîşên hewayî bi topeke du ling ku li Birca Bizinê (Keçi Burcu) bi cih kirine dest bi avêtina topan jî kir. Diyar e hilweşandina malan û rêyên nû çêkirina dijmin, dijmin rizgar nekiriye. Dema nikare îradeya li berxwe dide bişkîne hê jî êrîşkar dibe. Dikare bi şiklekî li pey hev biavêje û bi bombeavêjekê avahiyekê hilweşîne. Di avahiyeke 5 qat de tevî ku ji demeke dirêj e pê de bibû hedefa gule, bombeavêj û gelek çekan, destûr nehatibû dayin ku dijmin bikevê. Li avahiyê sekinîn, li benda hatina dijmin mayin rewşeke wêrekî dide hewcekirin e. Lê tevî vê hevalê Xerzî û Îhsan nobeda xwe ya li wê derê domandin. Herî dawî avahî êdî ji bombeyan bê teqat dikeve û ji binî ve hildiweşe. Ev hilweşîn

dê karê dijmin qederekê bi zehmet bixista. Kêf kêfa hevalê Xerzî ye. Tevî hemû hewldanên dijmin parastina avahiyê hatibû kirin, ji ber ku êdî hatiye rewşa ku nikaribe li ser lingan bisekine hilweşiyaye. Hevalê Xerzî bi wê sekna xwe ya timî bi moral dema gotiye "êdî avahî bi ewlehî ye" dest bi govendê kiriye; ev rewş bûye moral û govenda berxwedanê.

## Roja 53. A Berxwedanê
## 23'yê Çileya 2016'yan

Her çendî li gorî ya berê bi pêşde hatina dijmin hêdî bûyîbe jî bi rêbazên nû êrîşên xwe didomîne. Yekîneyên piyade mal bi mal bi pêş dikevin û li ser esasê di wan malan de bicihbûnê, hewl didin herêma di bin qontrola me de teng bikin. Rewşa ku nuxteya dawî ku lê bi cih dibe berdayin û paşde çûyîn, ji ber ku dibe sedem em dubare bi pêşde werin, mal bi mal dixe bin qontrola xwe û hewl dide bi pêşde bê. Li Kolana Qurşunlu dema dijmin hewl dide bi heman rêbazê bi pêşde were, heval xefikek ku berê di malê de bi cih kirine bi dijmin de diteqînin. Du kuştiyên dijmin ên ji Polîsên Tevgera Taybet (Özel Hareket) di nav wê malê de dimînin. Piştî ku dubare cenaze tên gulebaran kirin, hewl tê dayin ku çûna ser bê pêkanîn. Lê ji ber ku dijmin jî pir zêde li malê dixe, heval nikarin biçin ser. Kolana Deriyê Nû (Yeni Kapı.), Kurşunlu û Sûka Mast (Yoğurt Pazarı) weke cebheyekî nû hate birêxistinkirin. Hevalên herî bijarte di vê cebheyê de bi şiklekî bi tevger hatine bicihkirin. Em hewl didin herêma di navbera Mînareya Bi Çar Lingan û firina Eminiyetê de hê xurtir bikin; bi awayê hê zêde heval li vê derê bicihkirinê em hewl didin ber bi Cadeya Gaziyan (Gaziler Cadesî) ve bi pêş bikevin. Esas tê girtin ku li gorî êrîşên dijmin, li gorî çawanî û çendaniya hevalan xetên parastinê bên pêkanîn.

Her çendî di mijara cebilxaneyê de tengezariyeke cidî tine ye jî bi awayê reşandinê gule avêtin hate qedexekirin. Qet nemayina gubreyên me yên kîmyewî me tengav dike.

Hevalê Rodî ji hatina xwe ya qadê pê ve bi çeka qirnasê çalakî li dar dixe. Hevalekî wisa ye ku her çalakiya li dar dixe bi şiklekî nivîskî dide rêveberiyê û bi awayê devikî jî dide hemû hevalên dibîne û bi vê taybetmendiya xwe tê naskirin. Hin rojan dema tekmîla wî weke li ser zêdekirî tê dîtin, di navbera hevalan de dibe sedema hanekan. Her çendî di demên wisa de ecziyekê bijî jî, tevî nexweşiya xwe qet bêyî ku xwe bide paş xebatên xwe dide domandin.

## Roja 54. A Berxwedanê
## 24'ê Çileya 2016'yan

Malên bi tangê hatine derbkirin, avahiyên bi hewanê hatine hilweşandin û rêyên nû yên bi kepçeyê hatine vekirin... Encax dikare bêadeletiya şer evqas bibe. Em bi qilêşê li kepçeyê didin, bi B-7'ê li tangê didin. Derbe distînin û paşve dikişin. Lê bi vî awayî dan sekinandin pir zehmjet e. Li pêşberê van sekinîn tebî wêrekî û îrade dide hewcekirin. Her tişt li aliyekî em fêrî van êrîşên dijmin bûn lê pirsgirêka cixareyê me tengav dike. Jixwe cixareyên siyasî ji mêjve qediyane. Hin caran dema ji dukanên nû hilweşîne cixare derdikevin hevalan pir kêfxweş dike. Êdî em li benda titûn û ya herî girîng jî li benda pelên cixareyê ne. Pelên cixareyê jî xelas dibin lê bawer im çareserî xelas nabin; ji bo karibe titûn bê kişandin li ser rêbazên nû xebat tê meşandin. Her wiha çalakiya îro ya hevalê Hebûn qederekê girîng bû. Ji aliyê tektîkî û stratejîk ve nêzîkbûneke nû îfade dikir. Di rewşek ku dijmin pir nêzîk e de dukanek ku dikeve menzîla tange tê kunkirin tam 37 lib kaxizên cixareyê hatin bidestxistin. Her desteyek bi awayekî

adil li ser hevalan hate parkirin. Di encamê de bi vî şiklî, temenê berxwedanê hatiye dirêjkirin...

Dîsa, pêşketineke girîng a tektîkî jî ji aliyê hevalê Harûn (Kovboy Harûn ) ve pratîze dibe. Di rêza Otêla Qlas (Klas Otel) de di çarçoveya hewldanên berfirehkirina qada me de hewce dikir xebata kunkirina dîwaran bihata meşandin. Lê ji ber ku nêzîkî dijmin e dibe ku deng biçe dijmin. Ji bo ku pêşî li vê bê girtin, hewce dikir dijminê li vê otelê bi cih bûye gule biavêje ku dengê dîwêr nebihîzin. Li ser vê yekê hevalê Harûn montekî leşkerî bi darekî ve girêdide û li kolanek ku otel karibe bibîne, dest pê dike li ba bike. Dema dijmin dest bi gulebaranê û avêtina guleyên bombeavêje dike heval dibêjin ‘desto bi qurban’ xebata kunkirinê tê domandin. Ev tektîka afirîner herî kêm bi qasî tektîka hevalê Hebûn (Balyozcu Hebûn) girîng e. Her du tektîk jî ji ber ku xwediyê taybetmendiyên dirêjkirina temenê berxwedanê bûn, divê mirov teqdîr bike.

## Roja 56. A Berxwedanê
## 26’ê Çileya 2016’yan

Dijmin hewl dide bi rêbaza zêde bikaranîna teknîkê xetên me parçe parçe bike û qada me li me teng bike. Ji ber ku dizane em ê li gel hev bimînin û hewl bidin berxwedanê bidomînin, dijmin, hewl dide xetên me yên derbasbûnê qut bike û me bi paşve bide. Kolana ku ji Kolana Deriyê Nû (Yeni Kapı Sokak) ber bi Mînareya Bi Çar Lingan ve diçe, nîvenga qada me ye. Bûna hedef bi giştî ya vê xetê, ji ber ku dê derbas bûnê bi zehmetî bixe, em ê neçar bimînin tercihekê bikin. Yan em ê bi şiklê du parçe bidomînin rîskeke mezin bigirin ber çavan û yan jî em ê hêza xwe ya Qurşunlu-Sûka Mast (Yoğurt Pazarı) bikişînin xeta Mînareya Bi Çar Lingan-Firina Eminiyetê. Rîskên vê jî hene lê li gel hev mayin îhtimala avakirina xeteke parastinê ya hê baştir e, mezintir dike. Li ser vî esasî biryarek

hate girtin ku biqasî ji destê hevalan hatiye em ê nehêlin hewldanên dijmin ên qutkirina xetê bi ser bikeve û di kêliya herî tengav dibin de jî hevalên li xeta Qurşunluyê bên kişandin.

Dijminê deh qatê teknîka ku DAIŞ'ê jî nekariye li Kobanêyê bi kar bîne, bi kar tîne, tevî ku bi hemû hêza xwe êrîş dike, em destûrê nadin ku weke ew dixwaze bi pêş bikeve. Eger ji malekê tenê yek gule hatibe berdan bi hewanan, bi bombeavêjê û eger bikeve ber dîtina tangê jî bi tangê ew mal tê îmhakirin. Berevajî, nikare bi pêş bikeve. Di nava rojê de kepçe û erebeyeke zirxî bi B-7'an hate derbkirin, dîsa hêza dijmin ku li malekê bi cih bibû bi B-7'ê tê derbkirin. Di encama sizmeyê de yekîneyek hate derbkirin û leşkerek mir. Ji malek ku bi lêdana tangê hilweşiye, hevalekî karîbû bi birîndarî xwe xelas bike. Hevalê Xebat ku birîndar bûye, ji destpêkê ve di cebheyê ku dijmin bi tangê lê dida de cihê xwe distend. Tevî ku di mijara tangê de xwediyê tecrûbe bû, cihê nobedê ku bi ber dîtina tangê dikeve bi sedema ku "dê heval rexne bikin" bernade. Hevalê Xebat di 12 cihên xwe de birîndar bûye, lê tevî vê yekê di rewşek ku di demeke kurt de rabe ser lingan de ye.

Gelek heval (hin heval zêdetirê 40 rojan) ji demeke dirêj e pê de nikarin pêdiviya xwe ya paqijiyê pêk bînin. Hevalên di mewziyan de ji ber şerê giran dibe, nikarin ji mewziyên xwe dûr bikevin, hevalên birîndar jî bêyî ku bi temamî birînên wan sax bin dubare dizivirin mewziyên xwe. Psîkolojiya birîndarbûnê qederekê giran dibe. Ji aliyekî ve di demek ku kêmbûna hevalan tê jiyîn de birîndarî, birîndar bûn, di rewşek ku nikare tiştekî bike de bûn hem ji aliyê hevalên birîndar ve û hem jî ji aliyê hevalên din ve zehmetî dide jiyîn. Ji bo pêşî li birîndarbûnê were girtin timî heval tên hişyarkirin û hewl tê dayin tedbîrên nû bên pêşxistin. Timî bal tê kişandin û tê nîqaşkirin, hewce ye li şûna kolanan tunel bên bikaranîn, li şûna qatên jor eger gengaz be qatên jêrzemînê bên bikaranîn, dema cihê nobedê bi ber dîtina tangan dikeve hewce ye heval

derbasî malên li rex bin. Tevî her tiştî em ê bi vê rewşa xwe herî kêm hê 150 roj li ber xwe bidin. Em ê bi vê moralê hê 150 rojên din jî li ber xwe bidin.

## Roja 57. A Berxwedanê
## 27'ê Çileya 2016'yan

Êdî divê li cihê rojan meh bên jimartin. Dema meha duyemîn bi dawî dibû, dijmin êrîşa xwe ya herî berfireh bi alîkariya du helîkopter û balafireke kişfê pêk anî. Piştî zêde zêde bikaranîna teknîkê, derbeyên herî giran ên demên dawî li dijminê ku hema bêje hewl dida ji her derê ve sizme bike hatin xistin. Destûr nehat dayin ji ti derê ve bi pêşde were. Li sê cihên cuda cuda xefikên bi pêlîkirinê diteqin ên me çandibûn bi dijmin ve teqiyan, li 6 cihên cuda jî pevçûn bi pêş ketin û herî kêm 20 leşker hatin kuştin. Di nav yên hatine kuştin de yuzbaşiyek jî heye. Di her du pevçûnên hatine jiyîn de hevalan li pey dijminê revîbû du çekên melez desteser kirin. Ji hevalên rêveberiyê her yek dema êvarê hatin cem hev, difikirîn ku qey tenê li cem wan pevçûn hebûye. Lê tabloya derketiye holê em hemû matmayî hiştin. Û derbeyên giran ên li dijmin hatine xistin moraleke mezin da. Hêza me ya şer li gorî demên borî di asteke hê li pêş bû. Tecrûbeyên hatine qezenckirin û hewldana dijmin ku hê bêhtir mal bi mal bi pêşde were, qebiliyeta me ya li dijmin danê zêdetir dike.

Eger dijmin pir zêde teknîkê bi kar bîne û li cihekî bide, di nav çend rojan de teqez hewl dide li ser wê derê sizme bike û wê mal yan jî herêmê bixe bin qontrola xwe. Eger bi tang, hewan û doçqayê yan jî bi bombeavêjê lê bide, hewce dike tedbîr bên stendin û amadekariyên nû bên kirin. Ji aliyê din ve eger bêdengî hebe, hewce dike hesabê wê bê kirin ku dibe ku dijmin hewl bide ji cihekî ve sizme bike û ji bo wê hişyar be.

**Roja 58. A Berxwedanê**
**28’ê Çileya 2016’yan**

Ma teknîk dikare çarenûsa şerekî diyar bike? Misoger e ku faktoreke girîng e. Lê Rêbertî timî balê dikişîne li ser û dibêje, “teknîka herî mezin mirov e”. Em dizanin, teknolojiya herî pêşketî ji aliyê mirov ve hatiye afirandin. Li dijî vê teknîkê jî, tenê dikare zekaya mirov tedbîr bi pêş bixe û vê teknîkê vala derxe. Qadên vekirî, kolan dibin hedefên vekirî. Li beramberê vê rewşê qorîdorên ji malan derbasî malan dibin tedbîrek e, li beramberê derbeyên tang û hewanan jî qatên jêr û qatên jêrzemînê tedbîreke din a girîng e.

Ji dema ku tang hatiye xistin dewreyê pê de hevalê Hebûn ku mewziya wî bi ber hedefa tangê dikeve, ji destê wî balyoz nakeve xarê. Balyozê ku di her mewziyê de weke çekeke herî girîng tê bikaranîn, herî zêde jî di destê hevalê Hebûn de bi kêr tê. Ji ber ku xetên ji malan derbasî malan dibe, di encama lêdana tangê de hildiweşin, hewce dike yan yên nû bê vekirin yan jî eger paşvekişaneke bi şûnde derket holê, hewce dike dîsa balyoz bikeve dewreyê. Lê belê ji ber ku dîwarên malên li Sûrê xwediyê avaniyeke dîrokî ne, qederekê stûr in û şikênandina wan jî wisa ne hêsan e. Ji ber vê yekê balyoz, levye, çakûç û mûrç weke çekeke girîng tên bikaranîn.

Di pevçûnên li aliyê Qurşunluyê hatine jiyîn de 4 kuştiyên dijmin, li Mînareya Bi Çar Lingan jî kuştiyekî dijmin heye. Şervan (ji Komalên Ciwanan) cara duyemîn ji heman çavê xwe birîndar bû.

## Roja 62. A Berxwedanê
## 1’ê Sibata 2016’yan

Dijmin hema bêje ji sê rojan carekê bi şiklekî rûtîn bi yekîneyên xwe yên piyade êrîşê her deverê dikir û operasyon pêk dianî. Du rojên destpêkê zêde zêde teknîkê bi kar tîne û roja seyemîn jî dikeve şer. Îro jî yek ji rojên ku pevçûnên giran dihate jiyîn bû. Li aliyê Qurşunluyê 10 kuştiyên dijmin hene. Dîsa, dijminê ku dixwaze ji aliyê Firina Eminiyetê ve sizme bike tê derb kirin. Dema heval hewl didin biçin ser cenazeyên dijmin, hevalê Afad (Piling Amed) şehîd dikeve. Leşkerê birîndar ku nehatibûye ferqkirin, dibe sedem ku ev şehadet bi pêş bikeve. Şehîd Afad, hevalek ku bi şervantiya xwe, xwe îsbat kirî bû. Roja 24. a berxwedanê birîndar bibû, bêyî ku bi temamî sax bibe dubare çûbû mewziya xwe. Hevalekî kedkar ku hem di nav hevalan de û hem jî di nav gel de jê tê hezkirin, dilpak û rastgo bû. Ji bo me şehadeta wî pir giran bû.

Di 30’ê Çileyê de yanî du roj berê, me hevala Nûda (Nûcan Malatya-Sonay Engîn) di qezaya mayinê de şehîd da. Ji ber ku cihê mayina bi pêlîkirinê diteqe şaş hatiye hilbijartin, dema heval ji bo qontrolê diçin malan di pêşiyê de hevala Nûda, li pey hevalê Dewrîm (Raman) pêlî mayinê dikin û şehadeta ku ji bo me pir giran bû tê jiyîn. Hevalê Dewrîm bêyî ku bi awayekî cidî birîndar bibe xelas bû. Li ser hevala Nûda nivisîn qederekê rewşeke zehmet e. Her tişt li aliyekî, di nîvenga şer û pevçûnan de tiştên tên jiyîn nivîsandin li min pir zor û zehmet bên jî, ji bo ku ev berxwedan bê zanîn, hewl didim weke erkekê pêk bînim. Bêyî nivîsandina li ser hevala Nûda (Nûcan) nabe. Bêyî nivîsandina li ser hevalê Afad (Piling) nabe. Lê bawer dikim di vê qonaxê de erkekeke bi qasî nivîsandinê zehmet e jî tine ye.

Hevala Nûda hevalek ku di rêveberiyê de cihê xwe digire bû. Her tişt li aliyekî em ê kenê wê çawa ji bîr bikin. Hevala min a weke fêrîşteyan, ma ez çawa li ser te binivîsînim? Hê di

demek ku me firsend peyda nekiriye em bi rehetî, têra xwe bigirîn, tê li qirika me disekine ez ê çawa biwêrim li ser te binivîsim? Çûyina te, çûyina we, me zêde dixe zehmetiyê lê zêde derbas nabe em ê jî li cem we bin. Em ê wê demê li wê derê serhildaneke nû, berxwedaneke nû bidin destpêkirin, em ê hesab bipirsin, em ê bêjin ‘ma çima hûn timî ji aliyê zaliman digirin, çima we cîhaneke hê adil neafirand...?’

Ji bo ku em we bispêrin xakê, em nikarin bi sererastî cihekî jî peyda bikin; wê firsenda ku em tev bi hevalan re we veşêrin jî... Me çend hevalan di tariya şevê de bi şiklekî bê deng, hûn veşartin. Em soz didin em ê êşa we, bikin tolhildan.

## Roja 66. A Berxwedanê
## 05’ê Sibata 2016’yan

Ji ber nêzîkbûna bê xem a çend hevalan, heval neçar man êvara 3’yê Sibatê ji binî ve cebheyê Kurşunlu û Sûka Mast (Yoğurt Pazarı) berdin. Li ser vî cebheyê ku hevalê Çiyager bi xwe disekinî, gelek derbeyên mezin li dijmin hatin dayin; ji ber ku ev xeta cebhe hate qutkirin, heval derbasê cebheyê Mînareya Bi Çar Lingan û Firina Eminiyetê bûn (Cebheyê Dawî). Di 3’yê Sibatê de li Cebheyê Kurşunlu di encama derbeya ku li dijmin hatiye dayin de herî kêm 8 leşker hatin kuştin û tevî belgeya ku navên fermandarên beşdarê operasyonê bûyine li gel hin malzemeyên jiyanî hatin desteserkirin. Em ji belgeyê navê operasyonê fêr bûn: Operasyona Sûrê, Bayrak-12.

Qada di bin qontrola me de her kêm dibe; dijmin ji vê cesaretê distîne û hê dijwartir êrîş dike, di heman demê de dest pê kir bangawaziyên ‘teslîm bin’ zêde bike. Lê em weke her tim bûye, bi guleyan bersivê didinê. Di şer û pevçûnên îro hatine jiyîn de herî kêm 6 kuştiyên dijmin hene.

Di 2’yê Sibatê de hevalê Qivircix (Cihat morgül) bi parçeyên hewanê giran birîndar bû û di 4’ê Sibatê de şehîd ket.

Parçeyê ku ji piştê ve lê ketibû, di nav zikê wî de mayibû lê rewşa wî weke baş be xuya dikir. Tê texmîn kirin şehadeta piştî 2 rojan hatiye jiyîn ji ber xwîn çûna ser mêjî be. Hevalê Qivircix ji destpêkê berxwedanê ve di mewziyan de bû û hevalê me yê herî ciwan ku li gel Şehîd Delîl (Mesut Seviktek) mayî bû. Li rexê Şehîd Afad hate veşartin.

Îro di saet derûdora 7:30'an de hevalê Agir (Velat Bilen) dema hewl dida di kuna ji bo pevçûnê tê bikaranîn de mêze bike, bi guleya sekvanên dijmin şehîd ket. Ji ber derbeya ku di serê xwe de girtibû, di van mercên me de şensa wî ya jiyanê tine bû. Me dubare ji kûr ve êşa nekarîna hevalê xwe dan jiyankirinê dît. Hevalê Agir qadroyê Ciwanan bû û dema li hêviyê bû ku vesaziya wê bê kirin, dorpêçê dest pê kiribû û bi awayekî herî çalak tevlî berxwedana li vê derê bûyibû. Bi bêdengiya xwe, aramiya û xwînsariya xwe, dîsa bi wêrekiya xwe di mewziyên herî zehmet de mayibû, hêzeke mezin dabû mewziyên lê maye. Di seranserê mehekê de li mewziyek ti kesî newêraye rêya xwe pê bixe ya nêzîkî Ocaxa Tendirustiyê ku jê re 'avahiya Agir' dihate gotin maye û destûr nedayibû ku dijmin bikevê. Me hevalê Agir ku ti tiştê wî yê taybet tine bû, gilî û gazinc nedikir, kîjan cih dibe bila bibe li wê derê bi şiklekî herî baş xwe baş tevlî dikir jî veşartibû.

Her çendî şehadet li ser hevalan bandor dikin jî hêrsa derbe li dijmin dayinê jî zêde dibe. Di mewziya ku hevalê Agir şehîd ketibû de, di saetên nîvro de weke ku tola wî were rakirin derbe li dijmin hate xistin. Her çendî hewl hate dayin cenaze werin stendin jî ji ber gulebarana zêde zêde û bombeya mijê û li cem hevalan nebûna amûra pê cenaze tê kaşkirin ev mumkûn nebûyibû.

**Roja 67. A Berxwedanê**
**6'ê Sibata 2016'yan**

Dema em roja 67. a şer û pevçûnên di 2'yê Kanûnê de dest pê kirine, li pey xwe dihêlin, ji saya baranê rojeke bi kêm êrîş hate derbaskirin. Dijmin hê zêdetir teknîkê bi kar tîne û em jî ji bo şer û pevçûnan hê ji nêzîk ve amadekarî dikin. Li ser bingeha kunkirina dîwaran, xetên derbasbûnê tên çêkirin, hewl tê dayin bi mewziyên şer jî parastina me were xurtkirin. Di meha Kanûnê de ji bînî de ti tişt nebarî bû. Di pêvajoya berf yan jî barana di destpêka meha Çileyê de derbeyên giran li dijmin hatibûn dayin û hem jî êrîşên dijmin kêm bûyibûn. Rewşa hewayê ya bi berf yan jî bi baran, ji bo me firsendeke mezin bû. Ji ber ku balafirên kişfê û helîkopterên dijmin nedixebitîn. Dijminê ku nedikarî ji jor ve, ji hewa kişif bike, nedikarî pêş bikeve jî. Dijminê ku nekare ji jor ve kişif bike, bi tang û teknîka xwe ya din bi awayekî serasera mal û avahiyan bombebaran dike û bi erdê re dike yek.

Nota ku Hogir Amed Li Rojnivîsê nivîsandiye:

"Ka were û li vê ecêbê binêre! Me ji destpêka şer, 49 rojan Mizgefta Qurşunlu û mînareya wê diparast, piştî roja 64. em dêra Katolîkan û birca zenga wê diparêzin!"

Silav û Rêzên Şoreşgerî
Mustafa Yılmaz (Hogir Amed)

**Roja 69. A Berxwedanê**
**8'ê Sibata 2016'yan**

Ji ber ku doh jî dinya ne xweş bû, ji sibeyê heya bi êvarê êrîşên dijmin pir sînordar bû. Lê îro ji sibeyê ve dijminê ku hewaya vekirî û bi tav weke firsend zaniye, bi alîkariya

helîkopteran weke golikên mozgirtî û dîn û harbûyî, dîsa bi giranî bi teknîk bikaranînê ji her aliyî ve dest bi êrîşên xwe kir û heya bi êvarê bênavber domand. Me ti carê evqas nexwestibû ku hewa ne baş be. Hewaya vekirî tê wateya helîkoptera kişfê, Heron û Dron (balafira biçûk a kişfê); em ji ber vê yekê qet naxwazin dinya xweş be û tav derkeve.

Li ser bingeha agahiyên hevalan daye, hate diyarkirin ku di Dêra Katolîkan de tuneleke 30 km. heye. Li gorî tarîfê, destpêk hate dîtin lê hindurê wê berê bi awayekî tije ax bûye. Dema em vê axê derdixin em bi av û avzemekê re rû bi rû dimînin. Elektîk tine, ji bo jeneratorê qadehek benzin maye. Hewce ye em avê derxin û avzemê zuwa bikin, xwe bigihînin binê wê odeya 6 $m^2$ ku dişibe sandoqa pîrejinan (dibe ku bi qasî 2-3 metro kûr be). Me hewl da bi tulumbayê vala bikin lê nebû; di heman demê de bi bîdonan jî tê valakirin dîsa nebû. Şûna ava tê valakirin dîsa av tije dibe û asta avê nakeve xarê. Dema av nayê derxistin, derxistina axa ku di binî de dimîne jî pir zehmet dibe. Lê ti çareseriyên din jî tine ye; axa di binê avê de, tevî avê dê were derxistin. Ji bo vê erka zehmet (weke bi derziyê bîr kolandinê) çar heval hatin erkdarkirin. Zêde hêvî nede jî weke gotina ‘ronahiya li aliyê din ê tunelê’ em hewl didin xwe bigihînin destpêka tunelê. Ji aliyekî ve malek maye ku dijmin li ser dêrê hakimiyeta xwe ava bike, ji aliyê din ve jî av, herî û avzem... Dema li ser vê, bûyerên li Cizîrê jî hatine jiyîn zêde dibin xuya ye qonaxeke kompleks û zor û zehmet li benda me ye.

## Roja 70. A Berxwedanê
## 9’ê Sibata 2016’yan

Ji ber ku qada di bin qontrola me de teng dibe, qebiliyeta me ya tevgerê jî kêm dibe. Ji aliyekî ve tang ji xwe re cihên nû yên êrîşê pêk tînin, ji aliyekî ve rewşa birîndarên me û nebûna

ti têkiliyên me bi derve re, îfadeya qonaxa zor û zehmet e. Tang lê didin, hildiweşînin û kepçe paqij dike û cadeyên nû çêdike. Di dest me de qet mayin neman. Dûrahiya me ya herî zêde ji dijmin (yanî ji bo qada nîvengê) bi qasî 150 metro ye. Çi dibe bila bibe, wê dawî biheybet be. Hema bêje misoger e ku em ê hemû şehîd bikevin. Em vê dizanin. Hema bêje derfeta me ya ev guherînê tine ye. Sedem jî ev e ku em li vê defterê hin tiştan dinivîsin. Her çendî cewhera tiştên li vê dere tên jiyîn jî be bi armanca ku bê zanîn; ji bo ku em bên fêmkirin û em bên zanîn em dinivîsin. Zêde baweriya me tine ku em ji derve tên fêmkirin jî. Ev berxwedana ku her roja wê weke salekê ye, encax dikare yên li vê derê cih girtine fêm bikin. Hêza me ya xwe ragirtinê neşkest û dê neyê şikênandin. Em weke qadroyên bingehîn ên Tevgera Azadiyê dizanin ku em ê bi şiklekî biheybet li ber xwe bidin. Eger em hemû şehîd bikevin jî em dizanin û baweriya me ew e; yên ku di encama vî şerî de bi ser ketine û bi ser bikevin dê bibin em. Heta dibe ku ji bo nivîsandina rojên ji vê bi şûnde em firsendê jî peyda nekin lê weke hevalê Çiyager dibêje, "Dawî Çawa dibeyê bila bibe Wê Biheybet be".

Eger em bijîn me yê bixwestana romana vê berxwedanê binivîsin yan jî filmê wê bikêşînin. Dibê ku wê demê em hê baştir bihatana fêmkirin. Dema em dibêjin em nayên fêmkirin, em dizanin em ne bi tenê ne, di asta cîhanê de ewir li ser me ne lê ji bo guhertina tiştên li vê derê têrê bike çi tê kirin?

## Roja 72. A Berxwedanê
## 11'ê Sibata 2016'yan

Dijmin bi anonsan şerekî psîkolojîk ê giran dimeşîne. Bangawaziyên bi vî awayî dike; "me Silopya û Cizîr paqij kir, em ê we jî bişînin cihenemê. Eger hûn bixwazin bijîn teslim bin". Doh li cebheyê Mînareya Bi Çar Lingan zêde zêde êrîş

pêk hatin. Li van deran di hewldanên sizmeyê de derbeyên giran xwarin. Ji leşkerên ketine malekê yek hate kuştin û cenazeyê wî li erdê ma. Dijmin ji bo ku cenaze bistîne bi zêde zêde bikaranîna gazê, bombeyên destan û bi bombeyên mijê êrîş kir. Ji van leşkeran 2'yên din hatin kuştin û 3 cenaze demeke dirêj di bin qontrola me de man. Piştre dijmin amûra cenaze kaşkirinê (kanca) bi kar anî û cenazeyê leşkerê destpêkê hatibû kuştin stend. Dema hewl dide bi heman rêbazê cenazeyên din ên leşkerê xwe jî bistîne, bi wan ve mayin teqiya. Heya bi sibê, hem me û hem jî dijmin li ser cenazeyan nobed girt. Me jî ji bo ku cenazeyan bistînin amûra cenaze kaşkirinê (Kanca) bi kar anî lê ji ber ku dîwar dibû asteng me nekarîbû bistînin. Di heman demê de dijmin jî nedikarî cenazeyan bigirin. Ji bo wan jî derincok asteng bû. Du roj bûn li heman cihî (li cihê cenazeyan) nobed tê girtin. Em texmîn dikin ku hê cenazeyek li wê derê ye. Ji ber îhtimala kemînê em nikarin bi xweşikî li cihên cenaze lê ketine binêrin. Ji ber ku em jî bi heman awayî di kemînê de ne, dijmin jî nikare cenazeyên xwe bistîne. Îhtimaleke mezin e ku hê cenazeyekî xwe nestendiye. Ji ber ku cihê dijmin li wê derê derbe distîne, di cih de xwedayê (tang) xwe tîne û wî cihî bi erdê re yek dike. Lê tevî ku ev der bi rehetî bi ber dîtina tangê dikeve, hê êrîşeke cidî li dar nexist. Rêya herî baş a xwe ji tangê parastinê, mayina li nêzîkî dijminê ku li malan bi cih bûyî ye. Eger tang li cihekî bide, tê fêmkirin ku wê kêliyê dijmin ne dikare li ser wê derê sizme bike û ne jî nêzîkê wan deran e. Ya herî baş ew e, xwe kişandina cihekî saxlem (weke jêrzemînê) li hêviya xelasbûna lêdana tangê sekinîn e. Ji doh ve şeş heval birîndar bûn. Hevalê Armanc ji ber derbeyên tangê bi giranî birîndar bû. Hevalê Harûn bi bombeavêjê, dîsa çar heval jî bi guleyan birîndar bûn. Hevala Jiyan jî ji ber ku gule serê wê dişermixîne û derbas dibe birîndar dibe. Bi giştî pazde heval birîndar in û ji van şeş jî bi giranî birîndar in. Ev şeş heval demeke dirêj dê nikaribin tevlî

şer bibin. Dîsa, gelek heval tevî ku birînên wan nû ne lê ji ber neçarbûnê diçin mewziyan.

Derman dike biqedin. Ji ber ku dermanên tevizandinê qediyaye bêyî tevizandinê birîn bi ta û derziyên dirûtinê tên dirûtin. Di vê rewşê de hevalên birîndar dema tedavî dibin êşa mezin a duyemîn dijîn. Wisa xuya ye ku dê di demên pêş de bi misogerî pirsgirêka ard bê jiyîn. Her çendî pirsgirêka qutên zuwa nayê jiyîn jî, ji niha de tengasiya nan tê jiyîn. Cixare û titûn jixwe demên xwe yên dawî dijîn. Kîsek maltepeyên bîst sal ji beriya vê hatine hilberîn ku tesadufî hatine dîtin, weke ku marlboro bên kişandin bi qîmet in. Tevî ku 50 roj e elektirîk tine ye hê jî di dolaban de goştê xerab nebûyî û xwarinên di rûn de sor kirî peyda dibin. Hevalê Rêber ji aliyekî ve ji bo ku dijmin cenazeyên xwe nestîne nobed digire û ji aliyekî ve jî daye pey mirîşkên sax mayî û ketiye wê xemê ku 20 metro dûr ji dijmin, xwarina êvarê amade bike. Ji ber ku li qada me firinên saxlem nemayîne, me bi nanê di rûn de sorkirî û bi goştê mirîşkên ku hevalê Rêber serjê kirine û di avê de kelandine, xwarina êvarê xwar. Ji bo ku bêhna wan biçe dijmin jî hestî hatin avêtin ser pelên agir. Bangawaziyên dijmin ên teslîm bin bi vî awayî hatin bersivandin. Ti tiştê me yê ku em wenda bikin tine ye. Madem wisa ye ya herî baştir ew e, em ji we jî gelekan li gel xwe bibin!

Bişirîneke şêrîn li ser çavên hevalan xuya dibe, li pey hev esprî û hanek hev dişopînin û heval tije bi moral dibîn. Lê her çendî derbeyên giran li dijmin tên dayin ji piştî 5 deqîqeyan fikarên me, me dide hizirandin. Xema me ya herî mezin jî birîndarên me ne. Em ê heya bi guleya xwe ya dawî li ber xwe bidin lê birîndarên me yên giran dê çi bikin? Hema bêje yekane derdê me hevalên birîndar in û hewce ye ji bo hevalên ku hê jî birîndar bikevin em çareseriyekê peyda bikin. Xeyala me ya tunelê ji ber avê têkçû. Lê dikaribû ji bo birîndarên me bibûya derman...

**Roja 81. A Berxwedanê**
**20’ê Sibata 2016’yan**

Di 12’ê Sibatê de gava ku di Kolana Bi Pir re (Köprülü Sokak) derbas dibû hevalê Botan (Erhan Keskin) şehîd ket. Ji ber ku tunela ji bo derbasî wî Elî cadeyê bûnê hê neqediyayibû, heval di cadeyê re derbas dibûn û hê ti kes nebibû hedefa sekvanên dijmin. Şehadeta hevalê Botan bi şiklekî biêş nîşanî me da ku êdî hewce ye cade neyê bikaranîn. Termê heval li ser lêva cadeyê mabû û ji bo xwe gihandinê, hewce dikir dîwar bihatina kunkirin û mirov xwe bigihanda nuxteya herî nêzîk. Lê belê ji ber ku dijmin pir zêde bombeavêj bi kar dianî, nedihişt ku dîwarên hewce dikir bihatana kunkirin bên kunkirin. Termê hevalê Şehîd Botan nêzîkî deh saetan li kolanê ma. Di heman demê de ji bo ku derbasbûna di cadeyê re bên pêkanîn hewldan hebûn perde bê daliqandin. Dema ev xebat dihate meşandin, hevalê Lezgîn ku bi tenê zendê wî di pencereyê re xuya dikir bibû hedefa sekvanê dijmin û dîsa, benê di destê wî de ketibû. Bi vî şiklî hevalê Lezgîn cara duyemîn jî, ji zendê xwe yê rastê birîndar dibû. Dijminê ku dixwest xebatên daliqandina perdeyê jî asteng bike weke ku tola cenazeyên xwe yên doh demeke dirêj di bin qontrola me de maye bistîne bû. Hema li pey birîndarbûna hevalê Lezgîn  hevalê Delîl jî bi bombeavêjê bi giranî birîndar bibû û xwîn wenda dikir. Nexweşxane li wî aliyê cadeyê bû û diviyabû bi misogerî perde bihata daliqandin. Dema me hewl dida em xwe bigihînin termê hevalê Botan du hevalên din jî birîndar bibûn. Tunela di binê cadeyê re (dirêjahiya wê 10 metro bû) dihate kolandin karibû encax di saetên dereng ên şevê de were qedandin. Tevî ku ev demeke dirêj e dest bi çêkirina wê kiribû encax piştî dayina berdêlê karibû bê temamkirin.

Di 13’ê Sibatê de hevalê Diyar (M...han Yılmaz) li aliyê Firina Eminiyetê –di navbera firin û dêrê de bi bombeavêjê şehîd ket. Termên hevalê Diyar û Botan li rex hev, li rex hevalê

Agir hate veşartin. Nasnameyên wan hat xistin qawanozekî ji camê û hat danîn ber serê wan.

Divê bê nivîsandin, li ser egîdan bê nivîsandin, divê ev bên xwendin ku mirovtiya mirov bê bîrê. Divê hevalên bi qasî ferîşteyan dilpak, bi awayekî bê teredut, bi temamî bi her tiştê xwe ve tevlî bûne neyên jibîrkirin. Ew, sembolên berxwedanê ne; di heman rojê de gihaştin şehadetê. Bûn navê biwêrekî êrîşê dijminkirinê û bi serbilindî li ser lingan sekinînê. Hevaltiya herî watedar a jin û mêr, ji bo di heman rêyê de ji bo azadiyê canê kirin mertal, ji bo bûn hevalên hevalan tiştê hewce bû herî baş we pêk anî. Dema ku Kurşunlu dihate gotin Tu dihate bîra her kesî, me digot pişta me di saxlemiyê de ye. Tu li ku derê bûya dijmin nedikarî bi pêşde were. Ji ber vê yekê me xwest parastina dêra katolîkan tu pêk bînî. Weke ku te jî nivîsandibû, vaye tê parazvaniya hêviyên me bikira, fermandarê Biryargehayê bakûr Genaral Maksîmûs... Hê zû bû te ji me dest berda û çûyî. Tu çûyî û dem tine ye em ji bo te şînê girêbidin; dijmin bi nemerdî êrîş dike û ji bo em xwe biparêzin divê em hê zêde bixebitin. Lê meraq neke, em ê di demeke kurt de bên cem we. Ev, nayê wateya ku me hêviya xwe wenda kiriye, berevajî, ji ber ku em rasteqînî nêzîk dibin. Diviyabû tu di Dawiyayê Bi Heybet de hê zêde li tenişta me bûya. Lê te lezand. Hevalê Hogir (Mustafa) bizane ku em ê espriyên te, xweşxeberbûna te, tevlîbûna te ya bi moral ji xwe re mînak bigirin. Mixabin ew dema me tine ye em dûr û dirêj li ser te binivîsin, te vebêjin. Herî zêde ya ku dilê me disojîne jî ev e. Me dixwest te bi hemû aliyên te ve binivîsin, bê sekin bi rojan ji her kesî re vebêjin. Lê rastî ne wisa ye, hawîrdora me nemerdî û pûştî ye û her diçe nêzîk dibe.

Hevala hevalan, Hevala Bêrîvan (Mizgîn-Asya Taşçı) baş e, em ji bo te bêjin çi? Em ê sekna te ya milîtaniya bijarte, hêrsa te ya ji bo dijmin çawa bînin ziman? Em ê çawa ji bîr bikin ew sekna te ya ku timî li beramberê bi her awayê zehmetiyê wisa bi serbilindî û serfirazî tê dikoşî? Weke her çûyinê, çûyîna we jî em pir xistin zehmetiyê. Lê di heman rojê de çûyina we, pir zêde em xistin zehmetiyê. Roja 81. a berxwedanê (20’ê Sibatê) dîroka neyê jibîrkirin a çûyîna we ye.

# ROJNIVÎSA DUYEM

Roja destpêkê ku çûbûm Sûrê tê bîra min. Çûm gel Mizgefta Bi Çar Lingan. Li jêra wê barîqatek û piştî 10 metro barîqateke din hebû; navê wê mewziyê cebheyê Şehîd Avesta (Ferat Doğru) bû. Ez (R.), Emîne, Hatîce, Fatma, Ayhan, em çûn mewziya Mînareya Bi Çar Lingan. Dê qedexe di saet 16:30 bihata pêkanîn. Fatma ma, em ê biçûna. Di saet 16:15 de ji nişka ve zenga telefona min lê da. Hevserokê me Remazan bû. Dema got ku hewce ye yek ji me li Sûrê bimîne, min got, jixwe ez li Sûrê me û dikarim bimînim. Piştre li Zeynebê ya li navçeyê bû geriyam û min ji wê pirsî ku ji tiştekî wisa agahiya wê heye yan na. Got, "temam, temam". Piştre min ji Rêberê ku berpirsiyarê Mînareya Bi Çar Lingan bû re got, ez li vê derê dimînim. Pir kêfxweş bû, ji ber ku ji bo li Sûrê bimînim, nekarîbû min îqna bike. Piştre Mezlûm (İsa Oran) got, "mayina te baş bû". Jinên din çûn, ez û Fatma Man. Ma çima nabêjî, Fatma xwe weke ceraheke giştî daye naskirin, mam heyirî, lê qet min ew derew dernexist. Em li Mînareya Bi Çar Lingan li (Dört Ayaklı Minare) derdora agirê ku di tenekeyekî mezin de dişewtî, li ser kursiyan rûniştin.

Ji Dem-Genç'a Stenbolê Umît weke xebatkarê çapemeniyê hatibû Sûrê. Ji DİHA'yê Mezlûm, ji YPS'ê Mahsum Polat, Bahozê biçûk, Şoreş, Merwan, Cano û Nûman li wê derê bûn. Dema li ser kursiyê rûniştim tiştekî got, "miyaw", min lê mêze kir tiştekî nerm e, kêliya min dikir pêlî bikim di cih de min lingê xwe kişand. Pişikeke biçûk, nû ji dayik bibû ya reş, bin zikê wê spî, weke miribe radiza. Ji ber sermê, xwe bi tenekeyê ve kiribû, hewl dida xwe germ bike. Di wê kêliyê de Jînda hate cem me. Serçavên wê girtî bûn. Rêber ji wan re got ku bila ji bo me malekê eyar bikin, lê li ser zêde kir ku hewce dike maleke nêzîkî nexweşxaneyê be jî. Li gel Jîndayê ji Komalên Ciwan-Stenbol jineke bi berçavk hatibû. Ji min re wisa hatibû ku pir tirsonek e, nizane biaxife, min qet ew bi cidî negirtibû. Jîndayê, li hemberê nexweşxaneyê hinekê li pêş, maleke biçûk, saloneke wê ya 3 metro heye û du odeyên

wê di zikhev de ne, mitfeq û tuwaleta wê li derve ye nîşan da. Ji ber ku tewlewziyonê wê tine bû, min ew mal qebûl nekiribû. Ya din jî zêde xwîna min lê nekelîbû, li xweşiya min neçûbû. Dibe ku li benda maleke hê rêk û pêk bûm. Paşê em li maleke li tenişta wê malê bi cih bûn.

Tevî Fatmayê em ketin malê. Dema mirov diket malê, hewşek û li aliyê rastê yê deriyê destpêkê tuwaletek, di nava hewşê de li aliyê rastê mitfeqek, li tenişta mitfeqê hemam hebû. Dema ku mirov dihate nîvenga hewşê, ber bi jor ve du derincok hebûn. Ji derincokan yek ber bi rastê ve û yek jî ber bi çepê ve bilind dibû. Li dawiya her derincokê odeyek hebû. Dema mirov ji hewşê rast diçû, tam li hemberê odeyek hebû, di nava odeyê de telewziyonek, li erdê kîlîmek, mînder û cihê nivînan lê datînin hebû. Di nava heman odeyê de deriyekî din hebû. Li wê dere tenê kîlîmek hebû. Ji ber ku boyaxa dîwaran diweşî li erdê boyaxa ji dîwêr weşiyayî hebû. Binê wê çîmento bû. Li çar dîwarên boyaxa wan weşiyayî qet pencere nebû. Ji ber vê yekê li dêvla ku em li wê derê bimana, me rojên xwe li nexweşxaneya li hemberê malê derbas dikir. Deriyê nexweşxaneyê dar û wisa qewisokî bû. Dema mirov deriyê dar vedikir, li pişta derî tuwaletek ku deriyê wê yê şikestî ji daran hatibû çêkirin hebû. Tuwalet pir teng bû. Dema mirov ji deriyê derve rasterast çûba, tam li hemberê mitfeq, li aliyê rastê ode, li aliyê çepê saloneke biçûk, li aliyê wê yê rastê odeyeke biçûk hebû. Ev ode weke cihê amaliyet-destwerdana destpêkê dihate bikaranîn. Li aliyê rastê jî odeyek ku nexweş bimana hebû. Li odeyê du cihê nexweşan hebû. Diyar bû hê kes birîndar nebibû. Li odeya ameliyat-destwerdanê 2 dolab hebûn, nava dolaban tije qutiyên biçûk ên çar goşe bû. Di her dolabê de nêzîkî 20 qutî hebûn û di nav qutiyan de jî derman hebû. Dermanên herî girîng di nav qutiyên herî jor de bûn. Di nîviya odeyê de darbestek hebû. Darbestek jî li hewşê bû. Ya din jî li hewşê du kanepe hebûn. Ser hewşê girtî bû. Ji ber wê yekê vê derê weke nexweşxane hatibû hilbijartin. Dema helîkopter bigeriya ji bo

ku jê dîmen negire, ji bo neyê fêmkirin ku nexweşxaneye weke cihekî herî bi ewlehî hatibû hilbijartin. Dîsa, li odeya ameliyat-destwerdanê du mase li rexê hev hatibûn danîn. Ser her du maseyan tije malzeme bû. Betadîn, tendirdîot, lepik, êşbir, derzî, jetokîn (derziya tevizandinê), derziyên xwînê qut dikin, tije qutiyekê melhemên cuda cuda, makas û hwd. li binê maseyan jî enjektorên zêde, spancên pembo, lepikên zêde, alkol, bandaj û paçên didin ser birînan hemû li gel hev bûn.

Di vê odeyê de pencereyek ku hema bi hewşê ve vedibe hebû. Li binê pencereya odeyê, ocaxek bi sê çavî ku ji bo germkirinê dihate bikaranîn hebû. Odeya ameliyat-destwerdanê bi vê germ dibû. Di destpêka mitfeqa ku li hemberê hewşê bû de maseyeke çargoşe ya rengê wê spî ya ji plastîk û li derûdora wê jî sê kursî hebûn. Li pişta maseyê cihê qut lê danînê û di navê de jî kabên sergirtî yên çînko hebûn. Û ew cih bi tiştekî hatibû nuxumandin. Li pêşberê maseyê dezgehek ku rengê dolabên wê reş û spî, mermerê wê grî û spî hebû. Li aliyê rastê yê deriyê mitfeqê makînaya cilan, li cem makînaya cilan amûra germkirinê ya li ser elektrîkê kar dike, li gel vê cihê çêkirina çayê hebû. Me jî çenteyên xwe li mala xwe ya nû hiştibû û em li mitfeqa nexweşxaneyê runiştibûn. Tebî me cixare dikişand. Her roj lojîstîkê cixareyên me datanîn nexweşxaneyê, me ji wê derê distand. Ez û Remziye li mitfeqê li ser kursî rûniştibûn. Dema du roj qedexe li ser Sûrê hatibû danîn, ez û Remziye bi hev re mabûn, min ji wê derê ew nas dikir. Me bi Remziye re krîtîka Sûrê dikir û cixareyên xwe dikişand. Fatma pir vala diaxifiya, lê ji ber temenê wê em heses nêzîkê wê dibûn da ku neşkê. Rêber û Cotkar ketin mitfeqê û pirsîn ku em çi dikin. Min got, ez pir ji qewheyê hez dikim û em ê qehweyê vexwun. Cotkar got, “nobeda min heye” û çû. Rêber rûnişt, me qehwe çêkir û li maseyê vexwar. Min, Rêber, Remziye, Fatma û apekî extiyar ku piştre tevlî bibû –doxtor bûye, lê her kesî jê re digot beytar-, me qehweyên xwe qedandin û berevajî kirin û min li fala wan mêze kir. Piştre Rêber xatirê xwe xwest.

Fatmayê banî Rêber kir û got; “kurê min, kurê min ez ê ji we re di demeke dereng de kulîçe çêbikim”. Bi rastî ji ber ku me hê yên din nas nekiribûn û nedizanîn tenê em ji bo mewziya Mînareya Bi Çar Lingan dixebitîn. Fatnayê kulîçe çêkirin, di vê navbera de Delal hat, wê jî kulîçe xwarin. Delal xwendevana tibê bû. Ji refa duyemîn tevlî PKK’ê bibû. Jineke xweşik ku hinekê bi kîlo, serçavên wê xweşik û çîlspî bû. Çek û malzemeyên leşkerî yên li ser wê pir lê dihat. Got, “ma hûn çima hemû xwarinên çêdikin dişînin Mînareya Bi Çar Lingan?” û li ser zêde kir; “mewziya herî feqîr Mizgefta Qurşunlu ye, hûn çima naşînin wê derê?”. Fatmayê got; “ez ê sibeyê dolme çêbikim, çawa bişînim Mizgefta Qurşunlu?”. Delalê got, “hûn bişînin cihê xweser em ê rê bikin” û piştî ku kulîçeya xwe xwar çû mewziya xwe. Di vê navbera de, bêjim, Delal ji Erganiyê (Erxenî) bû. Remziye ji min re got, ew bi xwe jî ji Erganiyê bû. Piştî ku Delal çû, Rêber hat. Kulîçe xwarin, yên mayî jî ji hevalên xwe yên li mewziyê re bir. Remziyê mirûza xwe kir, ji min re got, R., ev der nexweşxane ye, Fatma, li vê derê xwarin çêdike, her kes dê ji mewziyên xwe biherike nexweşxaneyê. Di encamê de dê hem xwaringeha giştî vala derbixe û hem jî ji ber ku heval pir tên û diçin dê cihê nexweşxaneyê deşîfre bibe, ya din jî ji ber ku li gorî xwestekê xwarin çêdike, eger jinên li xwaringeha giştî xwarin çêdikin bêjin, “em careke din xwarin çênakin”, wê demê dê Fatma neçar bimîne xwarinê çêbike. Li gorî ku dê nikaribe ji bo evqas mewzî xarin çêbike, bila êdî li nexweşxaneyê xwarin çeneke”. Min jî ji Fatmayê re got, hewce ye êdî li nexweşxaneyê xwarin çêneke. Ecz bû û bi eczî got, “ez ê jî li malê çêbikim”.

Em çûn mala li hemberê nexweşxaneyê. Li mitfeqê pir kêmasî hebûn. Banê wê pir nizim bû. Cihekî bi pirsgirêk bû. Em çûn malê, me telewziyon vekir û di vê kêliyê de Ümîtê ku me li Mizgefta Bi Çar Lingan nas kiribû kete hindur. Lewaz, bêdeng û şermoke xuya dikir. Got ku ew ê telefona xwe dayne ser şarjê, me got, temam. Telefona xwe danî ser şarjê. Telefona

xwe ya din vekir, dê li nûçeyan temaşe bikira. Înternetê nedikişand. Çû ber pencereyê telefona xwe rakir jor, hewl da li twitirê binêre, lê înternet pir hêdî dixebitî. Ez jî pir bifikar bûm, pir dereng bibû. Min digo, hevserê min ê li min bigere û ez diqutifîm. Min ê çi ji wî re bigota, min ê çi bersiv bida? Lê ez neçar bûm telefon bikim, eger min telefon nekira dê dest pê bikira li min bigeriya û her der rakira ser lingan. Li min gerî, dilê min lê dida. Di cihê xwe de rabûm ser lingan û sekinîm. Di telefonê de ji min re got, “ma tu li ku derê yî?”. Min got, “ji bo nobeda çadirê hatim Sûrê û ji ber qedexeya derketinê, asê mam”. Bi ser min de qîr kir û telefon qut kir. Min jî pîlê telefonê derxist û girt. Hem bi fikar û hem jî rehet bûm.

Her êvar em diçûn Mizgefta Bi Çar Lingan tevî hevalan nobed digirt. Min dîsa pêlî wê pişika jar û lewaz kiribû, piştre min ew hemêz kir û min dest pê kir wê mist bidim. Parçeyên B-7 li difna wê ketibûn û difna wê şewitîbû, dema min ev bihîst hê zêdetir gunehê min pê hat. Umît jî bi ereboka destan hin tişt dibir û dianî, di çêkirina mewziyan de alîkariya hevalan dida. Li ser wî montekî bi kum hebû. Mezlûm (ji DİHA) di telefonê de bûyerên li derve nîşanî hevalan dida. Me wê rojê heya bi saet 6’an nobed girt. Dema ku nobed hate guherîn em jî hatin mal. Fatmayê ji xwe re nivînek danî. Ez jî dihizirîm li ser mînderê razêm. Em li bataniyan gerîn tine bûn. Me li hewşê mêze kir, kêliyek ku helîkopter ne li ser me bû, em derketin qatê jor û me bataniye, nivîn, balgîf anîn.

Di vê navberê de min ji Mînareya Bi Çar Lingan ew pişika ku li wê derê bû jî, li gel xwe anîbû. Yek ji şîrên zarokan ên li malê, min vekir û xiste lalîkeke biçûk û da ber. Pişikê dest pê kir vexwe û paşê çû ber sobeya li ser elekrîkê pê dikeve, xwe dirêj kir û raza. Di vê navbera de Umît ji bo ku telefona xwe bistîne hatibû. Dema fatma jê re got, “kurê min tu jî li vê derê bimîne”, Umît got, “temam”, hinekê nerehet bibûm, min nedixwest Umît bimîne, lê min dengê xwe nekir. Min got, li ser vê mînderê razê! Min cihê xwe da Umît. Dubare çûm qatê jor û

min ji xwe re mînder û bataniye anîbû. Telewizyon nêzîkî cihê pêncereyê bû. Her yek ji me li ber dîwarekî odeyê raza. Umît dema radiza weke ku bataniye serçavên wî bigire, radiza. Bala min kişandibû. Min ji xwe re gotibû, dibe ku şerm dike û wisa radize. Lê hê jî ez ji hebûna wî nerehet bûm. Ji ber ku ev der cihekî xweser bû. Û min digo, gelo heval ê çi bêjin.

Sibe bibû, me dê taşte bixwarana. Min nivîn rakirin, Fatmayê dest bi amadekariya taşteyê kir. Umît hê radiza. Me qet ew şiyar nekir. Hewce bû em cilên ku dê me li derve li xwe bikirana biguhertana. Dema ku qedexe rabûya wê demê me dê ew li xwe bikirana û bi şiklekî paqij derketana. Ji bo vê yekê hewce dikir em cilên li gorî xwe peyda bikin. Ji ber ku lewaz bû Fatmayê dikarî di her malê de ji xwe re cilên li gorî xwe peyda bike. Lê cilên li gorî min hinekê zehmet bû. Bejna min 1.70 cm û 75 kg bûm. Me dest pê kir mala em lê diman qontrol bikin. Piştre li odeya razanê ya qatê jor tîşortên nû yên zilaman û eşofman min dît. Min go, eger bibe dibe ku ev li min bibe û min ew ji xwe re girtin. Fireh û rehet bû. Min cil û bergên ku min dê derve li xwe bikira, xiste çekmeceyekê û tîşort û eşofman li xwe kir. Fatmayê eşofmanekî li gorî xwe yê lacîverd û qazaxekî lacîwerd li xwe kir. Porê wê weke bonûs lûle lûle bû. Xera xweda, eşarp dida serê xwe. Nexwe mirov ji porê wê ditirsiya. Werhasil me taşte amade kir û em rûniştin.

Ji bo taşteyê, min Umît jî şiyar kir û banî kir. Wî jî dest û rûyê xwe şûstin û li ser taşteyê rûnişt. Dema me taşte dixwar Şoreş hat. Min jê re got, kurê min. Navê malê yê Şoreş, Baran bû. Bi min re li heman sîteyê rûdinişt; yanî li Kayapinarê. Li gorî ku digot, bavê wî muteahît bûye. Ew çû, Remziye hat. Di pey re jî Nûda hat. Nûda gerîlayeke bejn kurt, rûliken bû. Dişibiya keseke pir paqij. Ji Meletî bû, lê digot ku ew ji Semsûrê ye. Piştî taştiyê Umît got, “ez ê biçim mewziyê”. Ji bo ku montê xwe li xwe neke, dema ez hatibûm Sûrê, min montê yê bi kum û fermûar ê kurê xwe yê bi navê Ehmed li xwe kiribû, ew dayê. Min jê re got, montê xwe dema tu derdikevî

derve li xwe bike, bila qirêj nebe. Dema ew çû, ji yên mayine re min got, ez ê qehweyê çêbikim. Nûda got, "ez ê li mewziyan bigerim" û çû. Di wê navê de hevsera kekê Cengîz, Emîne jî hat. Min ji wê re jî fîncanek qehwe çêkir, me vexwar û her kesî bi dorê dest pê kir berevajî bike. Dixwestin li fala wan binêrim. Yayê rab, her roja derbas dibû, telmeya binê fîncana min zêde dibû. Tevî ku Emîne ji min biçûk tir bû, min jê re xwîşka min a mezin (abla) digot. Ji ber ku her kesî jê re digot "xwîşka min a mezin". Keça wê ya herî biçûk jî hê dema 15 salî bû tevlî gerîla bibû. Ji ber wê yekê dixwest li fala wê binêrim.

Min yek bi yek li fala hemûyan mêze kir. Piştre ji bo ku montekî li xwe bikim çûm odeya din. Min dît pişikê ser qartonê pişta sobeya li ser elektrîkê herimandiye. Min lepikek kir destê xwe û ji bo kes nebîne, bi destmaleke kaxiz paqij kir. Paşê min dîsa şîr û pênir da pişikê. Ya din jî pişikê pir ji aliyê hevîr ê nan hez dikir. Min hindûrê nan dayê, xwer. Fatmayê qet ji pişikê hez nedikir. Her cara didît, radikir û diavêt wî milî, lingê xwe tê ve dida. Dema min didît, min bi ser de qîr dikir û xwe pêde ecz dikir. Tenê bi wî şiklî disekinî. Gelek karên bên kirin hebûn. Tiştên mitfeqê kêm bûn, jixwe gelek mal li Sûrê vala bûn. Me dê kêmasî ji wan deran peyda bikirana. Diviyabû me ji mitfeqê re mase, sê kursî, sobeyek û kîlîmek peyda bikira. Ya din jî min ji Beytar, ji bo li ser rûniştinê mînder, mase û kursî xwestin. Got ku ew ê bîne. Li nexweşxaneyê zêde sobe hebû. Ji mala li tenişta me –mala ku ji bo me amade kiribûn- min kîlîm anî. Me selik, kevçî, qadeh, ocax tup peyda kir. Beytar jî maseyek mobîlya ya qehweyî ya şeş kesî û sê kursî anî. Min hemû li mitfeqê bi cih kirin û rêk û pêk kirin. Êdî mitfeq bibû cihekî germ.

Yê ku herî zêde rêya xwe bi me dixist Rêber bû. Weke zarokekî nesekinî bû, timî dikeniya. Bi çeka xwe ya M-16 digeriya. Paçekî keskê leşkerî bi pêşiya çeka xwe ve kiribû, qederekê bifors xuya bû. Rêber ciwanekî bejn û bala wî dirêj, girs û lihevhatî bû. Taybetmendiyeke wî ya rûliken û kêfxweş

hebû. Bêyî bikene, bêyî hanek bike tebata wî nedihat. Her kes ecz dikir, li gel her kesî hanekên xwe dikir. Li serê wî eşarpeke kesk-xemrî ya bi gulî hebû. Rojeke em li Mînareya Bi Çar Lingan rûniştibûn Rêber destê xwe avêt berîka xwe û got; "ez ê tiştekî nişanî we bidim". Dema em jî li bendê bûn çekekê derxe, poşetek şekir derxistibû. Her kesî dest pê kiribû bikene û şekir li ser her kesî belav kiribû û gotibû; "yanî hûn li hêviyê bûn ez çekekê derxim, ma mirov her tim de çekan derxe". Rojekê jî banî min kiribû û gotibû, "heval ma nikarî werî, ez ê tiştekî nîşanî te bidim?" Û min jî weke wî kiribû. Ez birim ber deriyê malekê, hêdîka derî veda û got, "agir bibeze. Min carekê lê mêze kir ku çi mêze bikim, kuçikekî mezin û spî tê min. Rêber jî digot, "agir êrîş bike". Min bi qîr û hawar dest bi bezê kir. Hem ber bi Mizgefta Bi Çar Lingan dibêzîm û hem jî min digot, hawar polîs, ev terorîst li min êşkence dikin, alîkariya min bidin. Dema min xwe gihand Mînareya Bi Çar Lingan her kesê ez dîtime dest bi revê kir. Ez ketim yek ji wan malên ku deriyê wan vekirî bû û min derî li ser xwe girt. Rêber jî êdî bi dengê bilind dikenî dest bi ken kir. Min jî keleşa Bahoz (Bahozê biçûk) girt û got, yan tê vî kuçikî bigirî bibî, yan jî ez ê li wî bidim. Lê min ne dizanî keleşê çawa bigirim û ne jî dizanî çawa bi kar bînim...

Rêber ji kûçikan hez dikir lê qet ji pişikan re kêfa wî nedihat. Ya din jî pir ji tiştên şêrîn hez dikir. Pir şekir dixwar. Fatma diket malên vala, cil û berg û tişten xwarinê kom dikir, xwarin çêdikir. Tevî sebzeyên ji bo zivistanê hatine hişkirin, li malekê bîdonek aprax (yaprak) dîtibû, wê dolme çêbikira. Ji ber ku soz dabû Delalê. Wê bişanda mewziya Mizgefta Qurşunlu. Dema Fatmayê xwarin çêdikir, her der tevlî hev dikir, tiştê ku belav dikir jî kom nedikir. Derûdor komî serhev kirin ji min re dima. Dolme çêkiribûn, şand çar mewziyan; Mizgefta Qurşunlu, mewziya xweser, Mînareya Bi Çar Lingan, Qeredenîz. Remziye dîsa bertek nîşan dabû; "Fatma ji mewziyan re xwarin çêdike, dema ev çar mewzî neçin û ji

xwaringeha giştî xwarin negirin, jinên li wê derê xwarinê çêdikin dê dev ji xwarin çêkirinê berdin, di encam de wê mewzî bê xwarin bimînin". Jixwe Fatma û Remziyeyê qet ji hev hez nedikirin. Min jî ji Fatma re digot, binêre Remziyê rast dibêje, lê kî guhdar dike. Mal bi temamî weke qehweyekê lê hatiye; yanî ji bo hevalên li mewziyan nobedê nagirin bibû cihê xwarin xwarin û îstirehetê. Di vê navbera de me jî dolmeyên xwe xwaribûn, li mitfeqê tevî Umît, Fatma û Bedran rûniştibûn.

Bedran li mitfeqê li ser mînderê rûniştibû. Diviyabûye Bedran ne li Sûrê bûye, armanc wî ew bûye ku were Sûrê û vegere, lê dema qedexe ranebûye neçar maye li Sûrê bimîne. Bedran ciwanekî lewaz, çav û biriyên wî reş û esmer bû. Timî ji min re weke bi sêr be dihat, ew jî ji Komalên Ciwan bûye. Qadro bû, pir jî dişibiya kesekî saf, dema dibêjim saf dixwazim bêjim kesekî paqij bû. Hevalên wî timî lê bawer dikirin ku cinên Bedran hene. Min qehwe çêkir, weke her tim bûyî, Bedran jî qehwe vexwar. Me hemûyan berevajî kir. Bedran jî berevajî kir û ji bo me îqna bike ku em ji ti kesî re nebêjin qederekê hewl da, "ez di bextê we de ji kesî re nebêjin min fal daye vekirin". Me jî gotibû, temam. Li derve hatin û çûnek, qerebelixek peyda bibû. Lez û bez, dengek! Em jî bezin û çûn û lê mêze kir. Deng ji nexweşxaneyê dihat. Dema min li ser darbestê Rêber dît, di cih de bezîm odeya ameliyat-destwerdanê. Ez, kekê Cengîz û Remziye li wê derê bûn. Digotin ji lingê xwe derb girtiye. Ji beriya vê jî ji heman lingê xwe parçeyek girtibû, lê tiştekî cidî tine bû. Min di cih de ji ser maseyê meqesa mezin girt aliyê çepê yê pantolonê Rêber qut kir. Me lê nêrî ku gule ji jorê ranê wî ve lê ketiye û derketiye, lê tiştek bi hestî nekiribû. Rewşeke bê dirûtin tine bû. Me di cih de pansuman kir û pêçend. Me ew bir mala me, li odeya piştê nivînek raxist, derziyeke êşbir û îltihabê zuwa dike lê xist. Digot, "ti tişt bi min nehatiye, divê ez biçim mewziyê". Me got, temam, îro îstireh bike, tê sibê biçî. Ji bo ku em ji wî re xwarin amade bikin em çûn mitfeqê. Dema em li mitfeqê bûn, min dît

çendek heval ketin mala me. Di gel hemûyan çekên M-16 û M-15 hebûn. Min ji xwe re go, bila xwarin bimîne ya herî baş ez çayê bibim hindûr. Min çay dem kir, qedeh rêz kirin û ketim hindûr, ez kê bibînim baş e, bî ez vî nas dikim; Çiyager jî pir mabû heyirî, fikirîm û min go çi karê wî li vê derê heye. Dema min termê şehîdan biribû şehîdgeha Sîsê min Çiyager dîtibû. Li wê derê fermandar bû. Ji Kercosa Êlihê bû. Yanî Torî bû. Bejna wî ne kurt û ne dirêj bû. Xwediyê laşekî lewaz bû. Çavên wî keskê kesk bûn. Her tim dikeniya, ew qas jî xwediyê kesayetiyeke giran bû. Kêfiyeya wî pir lê dihat. Bi texmîna min ew jî gerîlayekî 15-16 salan bû.

Li cem wî Doğan hebû. Nasnavê Doğan Delîl bû. Ew jî ji Sîsê hatibû. Ji Ferqînê bû. Ne kurt û ne dirêj bû, biruyên wî rast û çavên wî kurîşk bûn, xwediyê fîzîkeke lihevhatî bû. Min cara destpêkê ew didît. Tu nabêjî ew ji berê de min nas dike. Keça xalê min hevsera birayê wî bûye, ji wî ez fêrî van tiştan bûm. Ti kesî nedizanî Doğan dê kengî çi bertekê nîşanî kê bide. Lê her ku mirov ew nas dikir, dihate fêmkirin ku ew kesekî qederekî hanekbaz û sempatîk e. Li rex wî, Elî rûniştibû. Navê wî jî Xemgîn bû, dirêj, lewaz, çav kurîşk û bi simbêl bû. Dişibiya hevalekî pir bêdeng. Min yek bi yek destê hemûyan guvaşt, merhaba dayê. Çiyager ji bo biçim derve banî min kir û got, “ma dikarî yek deqîqe werî derve?”. Min jî got, temam. Em derketin derve. Got, “nasnavê min ê li vê derê Harûn e. Min jî got, temam û li ser zêde kir; lê hevalê Harûn dixwazim tiştekî bi we bişewirim. Wî jî weke bêje, “erê”. Serê xwe hêjand. Min got, diviyabû ez ne li Sûrê bama. Min herêma xwe terikandiye. Li navçeya erkdar bûm eger derbara min de rapor binivîsin, ji bo min baş nabe. Wî ji min re got; “ti kes nikare derbarê te de rapor binivîse. Tê ji wan re bêjî, ez li cem gelê xwe û li cem hevalên xwe bûm, hûn li ku bûn”. Dilê min rehet bibû. Gotina xwe domand, “heval ez ê ji te re tiştekî bêjim, tu hatibûyî wê qadê ji bo bibî gerîla, ji ber ku tu hevserok bûyî û kurekî te yê astengdar hebû me tu negirtî gerîla. Vayê cihê te yê gerîlabûnê,

ma tu amade yî tevî me bimirî, lê paşde kişîn tine ye”. Min jî jê re got, ez amade me bi we re bimirim. Got, “wê demê em biçin hindûr, rewşayê Rêber bipirsin û çaya xwe vexwun”. Em ketin hindûr, me li gel hevalan sohbet kir û rewşayê Rêber pirsî. Paşê Harûn, Doğan, Elî û di pey wan re jî Bedrî (Baytar) çûbû. Min sibeyê pansumana wî kir û çû mewziyê. Bîranîneke komîk a Rêber hebû. Berpirsiyarê mewziya Mînareya Bi Çar Lingan bû. Rojeke diçe mewziya Afad wan. Tebî ji ber ku tarî ye hevalên wî, wî nas nakin. Jê dipirsin: “Tu kî yî?”. Dibêje, “ez, heval ez im”. Heval dibêjin, “tu kî yî?“. Dibêje, “ez im, Rêber”. Heval dibêjin “kîjan Rêber?”. Ew dibêje, “Rêberê Mînareya Bi Çar Lingan...” ji wê rojê ve navê ‘Rêberê Mînareya Bi Çar Lingan’ li ser wî ma.

Sibê me taşte xwar. Ez her roj piştî taşteyê diçûm nexweşxaneyê. Ji ber ku êdi şer giran bibû. Li ser banê nexweşxanê gelek paç hebûn. Elî ji Bedrî re gotibû, “komînîst, hemû paçên li ser ban daxe jêr”. Komînîst jî, derincoka li hewşê da ber dîwêr û bi derincokê ve hilkiş û paç yek bi yek avêtibûn hewşê. Nava hewşê qederekê tije paç bibû. Piştre daket jêr û hemû ji nav hev derxistin. Min jê re got, tê van çi bikî? Wî jî got, “ez ê yên herî dirêj bidim aliyekî, heval dê wan bi kolanan de daliqînin”. Min pirsî ku dê çima wisa bikin. Bersiva min da û got, “ji bo ku dema di kolanan re derbas dibin helîkopter wan nebîne”. Nûman hat û dest pê kir ji bo bi makînaya dirûtinê bi hev de bidûre paçên biçûk bide aliyekî. Piştre hevalê Elî hat û got, banî Mezlûm û Umît bikin”. Bedrî banî her duyan kir. Elî ji wan re got, “êvarê dema heval paçan daliqînin alîkariya hevalan bidin”. Wan jî got, “temam”.

Dest pê kiribû dinya tarî be. Ji nişka ve Bahozê mezin û Zagros bi qîr û qerebelixekê yeke/î di nava bataniyeyê de pêçandî anîn. Di cih de me deriyê odêya destwerdanê vekir. Min, Remziye û kekê Cengîz lepik xistin destê xwe, bataniye vekir. Bataniye di nava xwînê de mabû. Gule ji hinaroka rûyê ketibû hindur, di pişta serê wî re avêtibû. Ne li ser hişê xwe bû.

Wisa xuya bû, dilê wî pir kêm lê dida. Dibe ku ji min re wisa dihat. Kekê Cengîz got, “mir”. Min dilê wî guhdar kir û min got, kêm jî be dilê wî lê dide, min li ser jî zêde kir ku em di cih de derziya adrenalînê li zendê wî bidin. Me di nav parasûyên wî re derzî derbas kir û adrenalîn li dilê wî da, lê ti feydeya wê nebû. Şehîd bû. Navê wî Serhat Doğru (Ararat) bû. Qirnas bi kar dianî. Serhat di nav avayiyekê de mewzî digire, sê tîmên taybet dikuje, dibêje “li yekî din jî bidim” lê sekvanekî dijmin cihê wî tesbît dike û li wî dide.

Bahoz ciwanekî ne kurt û ne dirêj, çavşîn û lihevhatî bû. Bi Kurdî nedizanî. Di cih de got, kefyeyê Serhat bidin min”. Min kefyeya Serhad da wî. Serhat ciwanekî bejndirêj, girs û pir lihevhatî bû. Cihê jidayikbûnê Çermik dinivîsand lê ji Erganî bûye. Elî tiştên taybet ên Serhat dan min, û got dema qedexe rabû tê bidî malbata wî”. Li ser wî nasname û fotoxrafê keçeke ciwan, tizbiyek, kêrek û 70 lîra derket. Paşê hevalan got, “ew keça xalê wî ye û jê hez dikir”. Hevalan Serhat girtin û birin mala li rex nexweşxaneyê. Wê derê, maleke du qat bû, ser girtî û vala bû. Li wê malê broşeke hemamê danîbûn. Dê tije av bikirana û hevalên şehîd bişustana. Serhat li malê danîn. Ji bo ku pişik termê şehîd texrîb nekin Bedrî mifte kir, mifte xist berîka xwe. Piştî kêliyekê hevalê Çiyager hat cem min. Got, “heval, li wekîlekî/ê bigere, bêje, şehîdek heye hewce dike ew bên û bibin”. Min jî telefon vekir, li numereyên telefonên li gel xwe nêriya, da bizanim telefona kîjan wekîlî/ê heye. Tenê ya Ziya hebû. Ji ber ku telefonan li hindur nedikişand çûm hinekê pêş, cihê ku gelaş tê rijandin. Ji min re got, “ez li Enqereyê me, li Nursel bigere”. Min got, li gel min tine ye. Di vê navbera de, saet derûdora 2-3 bû. Got ku ew ê bi mesajê bişîne. Mesaj hat, li wê numareyê geriyam. Dema Nursel derket ser telefonê min jê re got, şehîdekî me heye, navê wî Serhat e, hewce ye hûn werin û bibin. Wê jî got, “temam, ez ê li walî bigerim, pê re hevdîtinê çêbikim, agahî bidim te”. Min jî jê re got, em ê termê şehîd bînin gel Mizgefta bi Çar Lingan, hinekê derbasê pêştirê

Mizgeftê bikin, hûn ji wê derê bigirin. Bersiva min da û got, “ez ê sibeyê saet di 10’an de li te bigerim”.

Sibê di cih de min dest pê kir li malan bigerim û jinan kom bikim. Lê ti kesî nedixwest bê. Hema min etekek li xwe kir. Tebî, min di jiyaa xwe de ti car etek li xwe nekiribû, eşarpeke spî min avêt ser serê xwe û min got, ez diçim hûn jî dê bên, ev ê ku şehîd ketî dibe ku zarokê we jî bûya. Piştre tevî min, em bûn 8 jin. Nursel Li min geriya û got, “dê du jin bên û şehîd bigirin bînin ambûlansê”. Me jî ji mizgeftê tabûtek anî. Ma Serhat xistê. Min li ser çavên wî nêrî. Ya Star, ma dema mirov şehîd dikeve wisa xweşik û lihatî dibe? Pir ecêb mayibûm. Nursel got, “ji beriya ji ez we re bêjim derkevin, hûn bin hûn bin dernekevin, ji ber ku beriya ewlekariya kolana hûn jê tên bigirim li we nagerim”. Deh deqîqe derbas bibûn zengê telefonê lê da. Ez li herî pêşiya tabût bû, ji ber ku hewce bû ez hêzê bidim jinên bi min re tên. Me tabût rakir, heya bi mewziya Mînareya Bi Çar Lingan anî. Piştre me li mewziyê derbas kir. Em nêzîkî 20 metro meşiyan û ji beriya em bigihîjin mewziya li herî pêş, me tabût li ber darabayekê danî, piştre em paşde zivirîn. Tirpe tirpe dilê min e, lê ez ji xwe re dibêjim divê ez tirsa xwe nedim derve. Ji ber ku ev jin hêzê ji min distînin. Bi meşeke xweş me xwe gihand mewziya Mînareya Bi Çar Lingan û jixwe, min nefeseke kûr stend. Dema me xwe gihand Mizgeftê min dît Çiyager, Doğan û Elî li wê derê li benda me ne. Min got, me hişt. Spas kirin û çûn. Em jî vegerîn malên xwe. Ez jî hatim mal. Jixwe ji bo min jî bibû rojeke ku bi hatin çûna zêde telefonan derbas bûyî. Difikirîm ku ji beriya biçim malê rêya xwe bi nexweşxaneyê bixim, eger tiştekî bê kirin tine be derbasî mal bim û razêm. Min carekê lê nêrî Rêber li gel Şervan sekiniye û bi lez û bez dibêje “zû zû hin tiştan bikin”. Serçavên Şervan di nav xwînê de bûn û dinaliya û digot, “çavê min, çavê min. Dîsa em grûba sê doxtoran (Remziye, kekê Cengîz û ez) me destpêkê serçavên wî paqij kir û hewl da ku em bizanin ji ku derê derb girtiye. Dema me çavê wî vekir me

dît ku di nav spîkê çavê wî de parçeyekî hesin heye. Kekê Cengîz parçe derxist vê piştî ku me pansuman kir û jora çavê wî bi bandajê girt, me ew razand nivîna li odeya li pêşberê odeya destwerdanê. Xuya bû pir êş dikişîne. Li gorî Şervan digot, ji Cizîrê bû, hê birayekî wî yê din jî li qadê bû, yanî gerîla bû. Şervan jî çûbû tevlî bibû û piştî perwerdeyê hatibû şandin vê derê. Hevalekî bê tirs bû û hevalekî girêdayî têkoşînê bû. Ketibû şer, dema dijmin wendahî dayibû, dest pê kiribû li ser hev bomber biavêje û parçeyekî bombeavêjê li çavê wî ketibû.

Qederekê bibû dereng. Ez û Remziye li bexçeyê nexweşxaneyê rûniştin û me cixare kişand û piştre derbasî mal bûm. Fatma razayî bû. Umît jî hê ji mewziyê nehatibû. Di çêkirina mewziyê de alîkariya kovboy Harûn dida. Navê wî yê li qadê Serxwebûn bû. Ew jî ji Komalên Ciwan bû. Li zankoyê beşa tedawiya fîzîkî xwendibû. Lê nedikariya xwînê bibîne. Pê re jî nexweşiya pênceşêra cîgerê hebû. Hevalekî bejndirêj, girs, pir hanekbaz bû. Timî li serê wî şapqayekî kovboyan hebû; ji ber wê her hesî jê re digot Kovboy Harûn . Li Sûrê bîranîneke wî hebû. Dema destpêkê qad hate qontrolkirin, hevalan agahiya du jinên li Sûrê dikevin malan û dizî dikin girtibûn. Fêr bibûn ku dê bikevin kîjan malê. Kovboy Harûn ketiye hemama mala ku diz bikevinê û li hêviya dizan ma da ku qaşo li ser sûc wan bigire. Jinên diz ketine malê û zêr birine. Harûn ê me hê di hemamê de ye! Dema ji hemamê derketiye, dîtiye ku dizan ji mêjve zêr birine û çûne. Hemû hevalan ev çîrok digotin û dikenîn. Lê her çendî ew jin peyda kirin û ji Sûrê derxistin jî lê careke ketibû ser zimanê hemû hevalan. Min jî qederekê hanekên xwe pê dikir û jê re digot, hevalê Harûn bawer im hemam pir li xweşiya te hatiye.

Dîsa rojekê Kovboy Harûn diçe ku li ser polîsên li Otêla Qlasê mewzî girtine sizme bike. Lê mêze dike ti kes tine, nîv paket cixare û şekirê li wê derê bûye digire û tê. Carekê jî dema Harûn di mewziya xwe de xwarin çêdike, dibîne leşkerek li

pêşberê wî ye. Her du jî çekên xwe dikişînin. Harûn ji leşker re dibêje, "binêre, tu gune yî, gule neavêje". Fermandarê leşker talîmat didê û jê re dibêje, "ez ji te re dibêjim gule berde". Leşker dibêje, "fermandarê min lê zilam dibêje, gule bernede. Li ser vê yekê fermandar, leşker dide aliyekî û tam dema dixwaze gule berde Harûn li wî dide û wî dikuje. Jixwe piştre jî hefteyekê êrîş ji mewziya kovboy Harûn qut nebûn.

Werhasil êdî dema razanê hatibû. Sibê şiyar bûm, saet nêzîkî 8'an bû. Umît nû ket hindur, her derê wî di nava axê û tozê de mayibû. Di cih de xwe dirêj kir û raza. Min jî li aliyekî cixare dikişand û li aliyekî jî ji bo bêm ser hemdê xwe min tupê biçûk anî da ku ji xwe re qehweyekê çêbik; min tup anî û qehwe çêkir û vexwar. Saet dihat 10'ê. Rabûm çûm nexweşxaneyê, ti kes tinebû. Min jê re gotibû dema çavê te çêbibe tê dest pê bikî bibînî. Lê bê hêvî bûm, min ev jê re negotibû.

Saet nêzîkî 13:00'yê dibû. Kekê Cengîz û Remziye jî hatibûn. Me maseyek û kursî jî li hewşê danîbûn. Li cihê nexweş heyî me cixare nedikişand. Ez, kekê Cengîz û Remziye li hewşê em rûniştibûn. Ji nişka ve Çekdarê Mezin ket hindur. Dest pê kir qîr bide û bêje "darbest, darbest". Li cem me darbestekî bi rengê leşkerî hebû, pir jî qeyim bû. Hevalan ji ser dijmin rakiribûn. Me di cih de ew dayê. Piştî kêliyekê Çiyager, Doğan, Elî û Çekdarê Mezin bi darbestê hevalekî birîndar anîn. Hevalekî zêde ne girs bû, weke qeyim be xuya dikir. Ne li ser hişê xwe bû. Hema me lepik xistin destên xwe. Min di cih de jetokaîn kişand derziyê. Kekê Cengîz hewl dida bi paçên ser birînan xwîna ji serê birîndar dihat bide sekinandin. Remziye ji bo dirûtinê, ta û derzî amade dikir. Dema min li serê wî mêze kir min dît ku ji nava serê wî heya bi paş guhê wî birînek vebûye. Ya Star dilê min nagire, lê diviyabû min alîkarî jî bikira. Texmînî, birîn bi qasî 10 cm dirêj û 7-8 cm jî kûr bû. Dilê wî lewaz lê dida, min di dilê xwe de digo, ev heval dê şehîd bikeve. Goştê serê wî derketibû derve, hestiyên serî parçe

bibûn. Kekê Cengîz di cih de serûm lê da. Min jî hindurê serê wî paqij kir. Min piştre ji bo bitewize derziyên tevizandinê li her derê birînê dan. Remziye dest pê kir bidûre. Paşê me ew bir odeyê. Her çendî zehmet jî bibû, me dest wer dabû. Navê heval Dilêr bûye. Nabêjî maneya dilêr Egîd bûye. Nasnavê wî yê li qadê Şervan bûye. Ew jî gerîlayê HPG bûye. Berpirsiyarê malzemeyan bûye. Mêze  kiriye, dijmin gule dibarîne li ser hevalan, hevalên xwe dane aliyekî û gule li ber serê wî teqiyaye. Ji saya vê, hevalên xwe rizgar kirine. Hevalan cilên Dilêr guherîn. Û paçê nexweşan lê girêdan. Ji ber ku ne li ser hemdê xwe bû û dê nekarîya biçe tuwaletê. Dilê Dilêr pir lewaz lê dida û tansiyona wî pir bilind bû. Hevalê Çiyager banî min, kekê Cengîz û Remziye kir. Got, “rewşa wî çawaye?”. Min got, dibe ku em heval wenda bikin. Keke Cengîz, got, “na, ti tişt pê nayê. Min got, lê tansiyona wî pir bilind e dibe ku her kêliyê xwîn biçe ser mêjiyê wî. Hevalê Çiyager got, “yanî em çi bikin?”. Min ji hevalê Çiyager re got, eger mimkun bibe, hewce dike heval ji qadê bê derxistin. Wan jî got, “ji ber ku dijmin hawîrdora me girtiye ev yek ne gengaz e”. Hevalê Çiyager got, “em nikarin hevalekî qadro teslîmî dijmin bikin” û çû.

Êdî me li nexweşxaneyê nobed digirt. Êvarekê min û êvarekê jî kekê Cengîz dima. Wê şevê nobeda kekê Cengîz bû. Remziye nobed nedigirt. Ji ber ku keçeke wê ya du salî hebû, navê wê Bêrîtan bû. Hevserê Remziye jî di zindanê de bû. Çar zarokên wê hebû, du kurên wê li mala bavê wê bûn, du keçê wê li gel wê bûn. Remziye hemû heval nas dikirin. Ji ber ku ew 17 sal bûn li Sûrê rûdinişt. Hevalên dihatin Sûrê destpêkê diçûn mala wê. Hemû karên wan wê pêk dianîn. Hevalê Çiyager û Doğan di nîvê şevê de hatin rex me. Gotin, “ma heval tu dikarî werî?”. Çûm, em derbasî nexweşxaneyê bûn. Kekê Cengîz û Remziye jî li wê dere bûn. Ji me re gotin “Dilêr amade bikin”. Û li ser jî zêde kirin, “ji ti kesî re ti tiştî nebêjin, em ê îro wî derxin, lê eman eman bila ti kes nizanibe, nexwe heval û Dilêr dikevin rewşeke zehmet, heta dibe ku şehîd jî bikevin. Me jî

got, temam. Me Dilêr amade kir, hevalan tabûtek anîn, me Dilêr xist nav tabût. Min û kekê Cengîz jî em ketin binê tabût, me alîkariya wan da. Dema em hatin cihekî diyar, hevalan ji min re gotin, “tu û kekê Cengîz paşde bizivirin, êdî em ê bibin”. Ji bo ku hevalekî qadro dê xelas bûya em zêde kêfxweş bibûn û her wisa em vegerîn nexweşxaneyê.

‚Ji nexweşxaneyê çûm mal, razam. Saet 02:00 yan jî 03:00 bû. Hevalê Doğan û hevalê Mezlûm (İsa Oran) banî min kirin. Rabûm, min fêm kiribû tiştekî nebaş heye. Ji min re gotin “telefona xwe jî bigire û bê”. Çûm. Hevalê Doğan got, “dema hevalan hevalê Dilêr dibirin dijmin ferq kir û bi ser wan de gule reşand û ji ber vê yekê, hevalan Dilêr li wê derê hiştin û hatin. Hevalê Doğan, li Azadê ku qodroyekî herêmî bû û berpirsiyarê Sûrê yê qada civakî bû geriyaye lê Azad di cih de telefona xwe girtibû. Hevalê Doğan û Hevalê Mezlûm jî ji min re gotin, “li wekîlan bigere bila heval ji wê derê bistînin”. Li wekîl Nursel geriyam, got, “em ê di vê şevê de çawa bigirin, hewce dike em agahî bidin ambûlansê”. Em li wekîl Sibel geriyan, got “li 112 bigerin bila ambûlans bê”. Li wekîl Çağla geriyam, got “em ê amadekariyên pêwîst bikin û li we bigerin”. Li ser vê yekê, hevalê Doğan got, “dîsa lê bigere”. Lêgerîm, ji min pirsîn ku hevalê birîndar li ku derê ye. Min jî ji hevalê Doğan pirsî, Dilêr li ku derê ye, li ku derê hiştine. Wî jî got, “li Fîskayayê, li cem Şelaleyê ye, di nav tabût de ye. Min jî di telefonê de heman tişt dubare kirin. Piştre vekîlan ji min re got, “li hevserokê DBP yê ya Yenişehirê ya fîskayayê bigere”. Ez jî li Murat (hevserokê DBP’ê ya Yenîşehir) geriyam. Dema kire minemin, hevalê Doğan got, “ji wî re bêje eger tiştek bi heval bê bila ew ji xwe re bifikire dê çi bibe”. Min jî heman tişt ji Murat re gotin. Got “temam” û telefon girt.

Êdî ti çareseriyên me nemayibû. Dubare li Nursel geriyam, şewirmenda wê derket. Ji min pirsî û got “ma li 112’yê bigerim?”. Min jî got, lê bigere. Tebî, piştî ku min ji hevalan pirsî min got, lê bigere. Min carekê lê nêrî doxtorê/a

ambûlansê li min digere, dipirse ku birîndar li ku derê ye. Ez jî hewl didim tarîfa cih bikim. Piştî ku min telefon girt, dubare zenga telefona min lê da, ez fikirîm ku dibe ku hevalê birîndar girtibin ji bo wê li min digerin. Hema min deng li hevalê Doğan û Mezlûm kir. Min got, telefon lê dide, gotin, "bersivê bide". Min telefon vekir, eminiyet bû, yanî polîs li me digeriya. Bi navê min deng li min kir û dest pê kir pirsan ji min bike, "birîndar çend salî ye, di ku derê xwe de birîndar bûye, kî ye?". Min dengê telefonê dabû haparlorê. Herî dawî ji min re axaftinên wisa kirin, "ma çi karê te li wê derê heye, mala te ne li wê derê ye". Hevalê Mezlûm pir ecz bû, telefon ji dest min girt û li ser polîs qut kir. Û got bersiva telefonê nede, bataryaya wê derxe". Min jî wisa kir. Bataryaya telefonê derxist û hevalê Mezlûm bi awayekî pir bi eczî dest pê kir biaxife; "şewirmenda Nursel Telefona te da wan. Çima dibêje, nave te çi ye, tu kî yî?".

Çûm mal. Saet bibû pêncê sibê, di cih de razam. Sibeyê çawa rabûm, çûm nexweşxaneyê. Li bendê bûm her kes xemgîn be lê her kes dikenî. Çûm odeyê, çi bibinim baş e, Dilêr razayî bû. Çawa dibe, tansiyona wî jî sererast bibû, bedena wî vegerîbû rewşa xwe ya asayî. Min jî ji şabûnê qîrek da, min got wisa çawa bû ev? Tu nabêjê, ji dûr ve Çekdarê Mezin û Mezlûm li Dilêr mêze dikin, di nava tabût de rabûye ser xwe û rûniştiye, li derûdora xwe nêriye û dubare xwe dirêj kiriye, lê bi şiklekî ne li ser xwe ye van tiştan dike. Hevalê Mezlûm gotiye, "Dilêr jiyan dike", Çekdarê Mezin çûye û ew li pişta xwe kiriye, dema dijmin ferq kiriye, dest pê kiriye gule bireşîne. Di nava avê de du saet dilêr li ser pişta xwe ragirtiye, piştre ew bi pişta xwe heya bi cihekî aniye, dema êdî hatiye wê rewşê ku nikare Dilêr rabike, dijmin ew ferq kiriye û dubare dest pê kiriye gule bireşîne, Çekdarê Mezin jî hiştiye û hatiye. Paşê, bêyî agahiya Çekdarê Mezin hevalê Mezlûm çûye û Dilêr aniye nexweşxaneyê. Dema Çekdarê Mezin hatiye û gotiye, "min nekarîbû Dilêr bînim" û xemgîn bûye, hevalê Mezlûm gotiye

“Dilêr li odeyê razaye”. Çekdarê Mezin xwe alandiye Mezlûm û ew maç kiriye. Navê Mezlûm yê malê İsa bû, qadroyê Komalên Ciwan bû, bê tirs bû, çavgirtî diçû her derê. Çekdarê Mezin bejndirêj û bi kîlo bû. Li Kobanê şer kiribû. Hevalekî saxlem û qewîm bû. Di singa wî de parçeyekî ji şer mayibû hebû. Hin caran diêşiya. Kekê Cengîz di cih de serûm da Dilêr. Em hemû kêfxweş bûn, hem hevalekî qadro şehîd neketibû û hem jî neketibû destê dijmin.

Di vê navberê de li ser Mizgefta Qurşunlu zêde zêde êrîş hebûn. Mayinên me nediteqiyan. Ji her kesî bû ku kûçikên dijmin ên bi navê K-9 qeblo dikojandin, lê ne wisa bû. Di nav me de ajanek hebû, hevalan ajan girtin. Ajan di pêşberê 200 lîrayê de qeblo qut kirine û di pêşberê her agahiyê de jî 150 lîre girtiye. Di lêpirsîna xwe de ev tişt îtiraf kiribûn. Bavê wî/ê ajanî/ê jî ajan bûye û di DİSKİ de kar dike. Navê wî jî Şêxmûs bûye. Dema mayinên li Mizgefta Qurşunluyê neteqîn dijmin hê zêdetir giraniya xwe dabû ser mewziya vê derê û bi awayekî hê dîn û har bûyî êrîş dikir.

Berpirsiyarê mewziya Mizgefta Qurşunluyê hevalê Mustafa (Hogir) bû. Ji Komalên Ciwan bû û ji fermandarên wê derê bû. Pir wêrek bû, bêtirs bû, lihevhatî û rûliken bû. Li gel Mustafa, Agir, Faruq û Hecî jî di vê mewziyê de şer dikirin. Dema mirov li Mustafa mêze dikir baweriyeke mezin jê distand. Her cara dihate nexweşxaneye li saeta xwe dinêriye û digot, “hûn ê piştî sê rojan bimirîn”. Her roj heman tişt digot. Rojekê min jê re got, ma hevalê Mustafa ev sê rojê te naqedin”, li min mêze kir û got, “em bi vê baweriyê 90 roj jî li ber xwe didin”. Dijmin timî bi marşa ‘Tirkiyem’ êrîş dianî ser Kuşunluyê. Hin caran jî di megafonên aqreban de ezan dixwendin. Ezan jî nîvçe dixwendin, nedidomandin. Hemû dijminên êrîşê Mizgefta Qurşunluyê dikirin, ji xwe re digotin ‘tîma Esadûlah’, ji DAIŞ’ê bûn. Li gorî ku hevalan bi xwe bihîstine hinek jê bi Erebî diaxifîne. Hevalê Çiyager her roj 5 deqîqe jî be, dihate nexweşxaneyê rêya xwe bi nexweşxaneyê

dixist, pirsa hevalan dikir, bi wan re eleqadar dibû, wisa diçû mewziya xwe. Li ser hemû mewziyan digerî, qet nedisekinî. Li ku derê mewziyeke zêde bi êrîşê re rû bi rû dimîne hebû, diçû wê derê. Bawer nakim di jiyana xwe de careke din mirovekî wisa bibînim. Wisa çar bi çar, bi Rêbertiyê re, bi hevalên re girêdayî, bê tirs û ewqas jî kesekî baldar û hişyar bû. Di pêvajoya ku li Sûrê mayime de heyranê wî dimam. Ma mirovek evqas hesas û hişyar dibe, di vê astê de tê hezkirin, evqas biaqil û xwediyê kesayetiyeke kamil dibe! Ez ê di jiyana xwe de ti carê wî ji bîr nekim...

Ji nişka ve kesekî girs, bejndirêj ku deriyê nexweşxaneyê bi lingê xwe vedike kete hindur. Navê wî Yilmaz bû. Ji Komalên Ciwan bû. Ciwanê li pişta xwe kiribû li odeya destwerdanê danî ser darbestê. Ciwanê birîndar di 16-17 saliya xwe de bû, bejndirêj û kesekî lewaz bû. Parçeyekî bombeavêjê îsabetê qirika wî kiribû. Navê wî Botan bû, her kesî jê re digot, “Botanê Biçûk”. Botan li Elîpaşayê rudinişt. Li vê derê jî şer dike. Çeka bi navê Pompali (pompalı) bi kar dianî. Min, kekê Cengîz, û Remziye me dest bi destwerdanê kir. Weke her tim bûyî, min derziya tevizandinê kişand nav enjektorê, derûdora birîna di qirika wî de vebûye û nava birînê derzî lê da. Êdî birîn tevizîbû. Kekê Cengîz amûrek girt, hewl da eger hebe di nava birînê de parçe derxe lê ti tişt nedît. Remziye derzî û ta amade kir û dest pê kir birînê bidûre. Piştî ku ev kar xelas bûya dê me cilên Botan biguherta, pansuman bikira, qirika wî bipêçanda û bibira razanda. Nivîn tine bû, li ser yekê Dilêr, li ser ya din Şervan razayibû. Me di cih de nivîneke din anî û raxist. Botan jî me li ser wê dirêj kir. Botan pir tirsiyabû û temênê wî jî biçûk bû.

Êdî rojên me tije tije diborîn. Her ku şer gur û geş dibû, kar û xebata me jî giran dibû. Ez ê îro li nexweşxaneyê bibûma nobedar. Diviyabû heya bi sibeyê ranezama. Ji ber ku Dilêr ne li ser xwe bû. Dema sibe bibû, Rêber ji bo guherîna pansumanê hatibû, lê mirûza xwe kiribû. Bi rastî timî rûliken bû. Min fêm

kiribû tiştek qewimiye. Min ji Rêber pirsî ku gelo tiştek heye. Got, “ti tişt tine”. Piştî kêliyekê Remziye hat, ji min re got, “Mezlûm û Delîl şehîd ketiye”. Çawa dibû, çawa du qadro bi hev re şehîd diketin, min fêm nedikir. Şehîd Delîl berpirsiyarê mewziya Sûka Mast (Yoğurt Pazarı) bi tena serê xwe li wê derê disekinî. Tenê li cem wî çar zarokên biçûk diman: Bucuruk (Bücürük), Qedir (Kadir), Cûdî, û Qivirciq (Kıvırcık). Ev zarok pir biçûk bûn lê dilê wan mezin bû. Hevalê Delîl bêtirs bû, bi tena serê xwe diçû sizmeyê. Dijmin ti carî nikarîbû çavê wî bişkîne, ji mewziya wî ditirsî. Li mewziya Sûka Mast sîstemê pir wendahî didan. Delîl gotiye, “ji Dibistana Seretayî Ya Cumhuriyetê dengê dijmin tê, ez ê biçim sizmeyê”. Mezlûm jî jê re gotiye, “bi tena serê xwe tu diçî ku derê, neçe”. Ji Mezlûm û hevalên din re gotiye, “eger hûn bitirsin neyên”. Mezlûm gotiye, “ez jî têm”. Her du heval çûne û ketine hindurê Dibistana Cumhuriyetê, ber bi aliyê deng tê ve meşiyane. Carekê jî dîtine ku ti kes tine. Li wê derê dijmin dengê qeyd kirî bi cih kiriye. Di wê gavê de dijmin ji piştê ve li her duyan gule reşandiye. Termên wan û çekên wan jî, li bexçeyê dibistanê (Dibistana Seretayî Ya Cumhuriyetê) hiştine. Dema Rêber hewl daye wan ji wê derê bistîne, dijmin gule reşandiye lê tiştek pê nehatiye. Dijmin li gel termên hevalan kemîn daniye. Her roj dema hevalan ev dîmen didîtin ji qehr û eciziyê ji mirinê xerabtir li wan dihat. Xembariya negirtina termên hevalan pir giran bû. Hevalê Çiyager û hevalê Doğan ji min re gotin, “li wekîlan bigere, navên şehîdan bide wan, bila agahiyê bidin malbatên hevalên şehîd û bila termên hevalan ji destê sîstemê bistînin”. Li Nursel geriyam. Min navên hevalê şehîd da û min got, termê du hevalê şehîd ji dibistanê bigirin. Nurselê got, “ez ê piştî kêliyekê li te bigerim”. Piştî kêliyekê li min gerî û got, “eminiyet dibêje, li dibistanê cenaze tine ne, li Mizgefta Qurşunlu cenaze hene”. Min jî got, li Qurşunluyê cenazeyên me tine ye, eminiyet derew dibêje. Min dubare jê re got, termên hevalên me li Dibistana Seretayî Ya Cumhuriyetê ne.

Cenazeyên li Mizgefta Qurşunluyê yên dijmin bûn. Hevalan 7-8 polîs kuştibûn. Sîstemê ji bo ku heval wan nestînin, wê derê bombebaran kiribû û ew cenaze di bin xirbeyan de mayibûn. Ne sîstemê û ne jî hevalên me dikarîn wan cenazeyên dijmin bigirin. Lê hevalan karîbûn du çekên wan bigirin. Ji çekan yekê derbe xwaribû. Hatim û min axaftina xwe ya li gel wekîlan ji hevalê Çiyager re vegot. Wî jî nirxandineke wisa kir, sîstem dê hevalan nede, kemîn biavêje, li bendê ne ku em bistînin, em ê nekevin vê xefikê”. Em rûbirûyê dijminekî pir hov û dirinde ne, ew êdî li ber çavê min dijminekî herî kirêt, bêrehm e, bi xwe awayê bûye dewlet ê DAIŞ’ê bû.

Dîsa deriyê nexweşxaneyê vebibû. Du heval ketibûn bin çengê hevaleke bejin dirêj, lewaz, çav mezin. Weke leyistoka zarokan bileyize, li ser yek lingê xwe hilbazdida û dihat. Nasnavê wê Zozan bû. Ji Komalên Ciwan bû. Wê jî parçeyek li paniyê ketibû û wisa birîndar bibû. Ji lingê wê pir xwîn dihat. Lê dikeniya, digot “ez ê negirîm”. Di cih de Remziye got, “ay Zozan” û destpêkê xwe li wê aland, piştre dest bi tedawiya wê kir. Di pey re ji bo pirsa Zozanê bikin du hevalên jin jî ketin hindur. Yek ji wan Nûda bû, ya din jî Şenda bû. Şenda bejnkurt bû, qirnas pir baş bi kar dianî. Wê jî li Kobanê fermandarî kiribû. Miroveke mukemel bû. Sekvana ku dewlet lê digerî ya bi navê Rosa ew bû. Yekane kêmasiya wê kurtbûna wê bû. Ew jî ji bo ku şer bike ne astengek bû. Di vê navberê de Remziye paniya Zozanê dirûtibû. Diviyabû em ji bo vê hevala jin jî malekê peyda bikin. Me Zozan li mala me hişt. Piştre min û Remziye deriyê qatê yekemîn ê avahiya çar qat ku li pêşberê nexweşxaneyê bû, şikênand û em ketin hindur. Di destpêka malê de salonek fireh hebû. Li aliyê rastê mitfeq, li aliyê çepê odeyek, li gel odeyê odeyeke din hebû. Me odeya duyemîn paqij kir. Li odeyê du kanepe jî hebûn. Me li ser kanepeyekê çarşafek raxist û balgîf û bataniye danîn ser. Pişre me Zozan girt û bir wê malê, li ser kanepeyê dirêj kir. Jinda li cem Zozanê dê bimaya. Malbata Jindayê li Sûrê rûdinişt. Ew jî qadro bû.

Hevaleke bejnkurt û lewaz bû. Jînda di heman demê de keça xaltîka Mezlûm (DİHA) bû. Mezlûm (DİHA) li cem xaltîka xwe ku dayika Jînda bû û li qatê sêyemîn ê avahiya ku me Zozan bi cih kiribû, rûdinişt.

Çûm malê, êdî mala me bibû cihê razana hevalan. Hevalên dema wan a îstirehetê hatine, dihatin mala me û radizan. Hevala Nûda ji min re got, “tu, Fatma û Umît ji xwe re malekê peyda bikin, vê derê qerebelix bû, hem jî dema birîndar zêde bin, dibe ku nexweşxane têrê neke”. Min jî got, temam. Li aliyê din Remziye, du keçên wê û kurekî kekê Cengîz Emîneya hevsera kekê Cengîz, li heman malê diman. Bombeyan boriyên avê yên li ber mala wan teqandibûn, av bi kolanê de diherikiya. Hevala Nûda, ji Remziye re jî gotibû, “ji xwe re malekê peyda bikin, lê malên hûn dibînin bila nêzîkî nexweşxaneyê bin”. Min jî ji Fatmayê re got, malekê bibîne. Dema mirov ji nexweşxaneyê derdiket li aliyê rastê, tam li hemberê maleke du qat hebû, ew peyda kiribû. Remziye jî hema li rexê me, maleke du qat a bi hewş hebû, ew dîtibû. Di qatê jêrî de di nav hewşe de du ode, mitfeq û hemam, tuwalet hebû. Mala ku Fatnayê dîtibû, deriyê wê girtî bû. Banî Harûn kir, derî wê bişkênanda. Dema Harûn  derî dişkênand, derî ji binî de ji cih derxistibû. Fatmayê banî min kir. Ji bo em li malê binêrin, em ê çûbana. Em çûn, min deriyê derve girt û danî aliyekî. Dema mirov ji hewşê diket hindur li aliyê rastê tuwaletek, li gel tuwaletê hemam, li hemamê sobayek hebû. Li rexê hemamê, li bin derincokê, li wê derê jî makîneya cilşûstinê û makînaya firaqşûstinê hebû. Derincok gilover bû. Dema mirov ji derincokê ber bi jor ve derdiket hem tengtir dibû û hem jî hemû pelpelokên wê ne weke hev bûn. Li jor li aliyê çepê odeyek, di hindurê odeyê de telewziyonekî plazma hebû. Li rexê odeyê odeyeke din hebû. Tije tişt bû. Ji bo rûniştinê ne destdayî bû. Li tenişta wê odeyê mitfeqek hebû. Lê di vî qatî de av tine bû. Em neçar bûn avê ji jêr bînin. Em ê li odeya destpêkê rûniştana.

Ez, Fatma û Umît çûn malê û me tişt û çenteyên xwe girtin, zivirîn û me xwe bi cih kir. Di hindurê odeyê de pencereyek hebû. Wê pencereyê li naxweşxaneyê mêze dikir. Eger tiştek biqewimiya me dikarî di cih de bibezin wê derê. Min ji Umît re got, tu li ranzayê razê, ez û Fatma li erdê nivînên xwe raxin û razên. Me vesaziya li malê jî çêkiribû, êdî telewziyona me ya plazma jî hebû, me dê karîbana nûçe û film temaşe bikirana. Lê heya bi wê demê nema, roja duyemîn elektrîk hate qutkirin. Êdî li Sûrê elektrîk tine bû. Me êvaran mûm pê dixist. Li nexweşxaneyê luks pê dixist. Niha pirsgirêka me ya herî girîng, me dê telefon çawa şarj bikirana? Li nexweşxaneyê jenerator hebû, her çendî kêm jî be benzin hebû. Lê me dê aku dema hevalêkî/e birîndar hebûya vekira û bi kar bianiya. Dema em li malê rûniştibûn, min di pencereyê de li derve dinêrî. Hevalan kesek ku di nava bataniyeyê de ye rakiribûn. Di cih de bezîm xarê û pêyva kekê Cengîz ku digot "şehîd ketiye" hat guhê min. Ketim odeya destwerdanê. Li ser darbestê ciwanekî ku pişta serê wî parçe bibû, dirêj kirî bû. Nasnavê wî Dewran bû. Min nedizanî heremî ye yan qadro ye. Bi rastî zêde girîng jî nebû. Hevalê Çiyager hat û pirsî, got, "rewş çi ye?". Me jî got, şehîd ketiye. Ji min re got, "li wekîlan bigere bêje em ê şehîd derbixin". Ez jî li Nursel geriyam. Ji min re got, "ti kes, yanî dayik naxwazin bên û bigirin". Dema ku min sedem pirsî, got, "dibêjin dema polîs ser me qotrol dike, dest li her derê me dide". Min rewş ji hevalê Çiyager re got. Tiştek negot û çû. Min jî tiştek negot, hinekê hizirîm pir ecz bibûm.

Di cih de çûm cem hevala Nûda. Min got, eger ev naxwazin termên me bigirin, em jî êdî cenazeyên xwe neşînin, em li vê derê bispêrin xakê. Wê jî wisa bersiv da; "ev ne biryarek ku em bi tenê bistînin e, em li gel hevalê Çiyager, Doğan û Elî biaxifin, biryareke şirîk em bistînin, piştre em ê ji te re bêjin". Hevalan termê hevalê Dewran li mala teniştê naxweşxaneyê danîn. Bedrî dîsa derî girt, mifte kir. Hevalê

Doğan banî min kir û got “ji wekîlan re bêje, êdî em ê cenazeyên xwe neşînin, li vê derê veşêrin”. Ez jî li Nursel geriyam ev biryara hevalan stendiye ragihandê. Hevalê Doğan ji Bedrî re got, “me cihek diyar kiriye, biçin û gorê li wê derê bikolin. Bedrî bêr û qazme û yek girte gel xwe, çûn ku gorê bikolin. Piştî ku xelas kirin, tevî bavê Jîndayê şehîd şûstin û erkên olî pêk anîn. Di demek ku helîkopter tine ye de birin û veşartin. Roja din gotin ku hevaleke jin şehîd bûye. Ez û Remziye çûn mala li tenişta nexweşxaneyê û me lê mêze kir. Min ev hevala jin cara destpêkê didît. Ji ber ku timî serçavên wê girtî bû. Gule li serê wê ketibû û şehîd ketibû. Navê wê Sarya (Rozerîn Çukur) bû. Bejndirêj û çîl û spî bû. Dema hevalan pirsî û got, “kî dê bişo”, min got, hevalên şehîd ên jin dema ji Kobanê dihatin nexweşxaneyê min dişûstin. Min û Remziye, hevalan Sarya şûst û kefin kir. Me ew jî li gel hevalê Dewran veşart.

Pevçûn zêde bibûn û şer giran bibû. Dest pê kiribûn tangan jî bi kar bînin. Li gorî ku me bihîstibû 10 hezar tîmên taybet û 16 hezar leşker şandibûn Sûrê. Her kes ji hev dipirsî ku qedexe dê kengî rabe. Di vê navbera de dijmin jî pir wendahî dida. Bê îstisna her roj hejmara kuştiyên dijmin ji kêmtirî 10’an nedibû. Pir wendahiyên wî hebûn. Her ku wendahî dida weke dîn û harbûyî êrîş dikir. Bombe û mîsket li hawîrdora me diketin. Niha diviyabû em hê zêde bi baldarî tevbigeriyana. Di vê navberê de ez jî fêrî keleşê bibûm. Rojekê hevalê Mehsûm (YPS) çeka xwe paqij dikir, dema wî çek ji hev derdixist min lê mêze dikir. Bi baldarî keleş ji hev derxist, yek bi yek parçe paqij kirin û li hev siwar kir. Piştre min jê re got, ma dikarî keleşê bidî min? Da. Min jî keleş ji hev derxist û siwar kir. Got, “kê fêrî te kir?”. Min jî got, te, min li te temaşe kir û fêr bûm. Piştre çend gule bi min da berdan. Hevalê Mehsûm jî herêmî bû. Ne kurt û ne dirêj bû. Timî li gel Rêber digeriya. Zarokê Rêzan (Bağlar) bû. Malbata wî jî li gel Partiyê bû. Dizanîn ku li Sûrê ye jî.

Her ku şer giran dibû li kolanan meşîn jî xeter bibû. Hevalan dest pê kiribûn dîwarên malan bişkînin û ji bo derbasbûnê jixwe re rê vedikirin. Dijmin jî teqlîda me dikir. Wan jî dema nedikarîn bi pêş de bên, dîwarên malan dişkênandin. Tebî dema hevalan dengên wan dibihîst êrîş dikirin û di encamê de hê zêdetir wendahî didan. Dema her roj em şiyar dibûn, me dibihîst malbatekê terka Sûrê daye. Jixwe zêde malbat jî tine bûn.

Hewce bû ez biçim nexweşxaneyê û pansumana Botan biguherim. Ew jî çi ye! Qirika Botan weke dawûlekê lê hatibû. Digot, "êdî nikarim nefesê bistînim. Hevalê Doğan ji min re got, "biçe banî Fatma bike". Ez çûm, min banî Fatma kir, hevalê Doğan jê re got, "tê Botan bibî gel we, R. bi nexweşiya wî re eleqadar dibe û tu jî xwarina wî çêdikî û paqijiya wî dikî. Fatma got, "temam". Fatmayê Botan bir cem me. hewce dikir, destpêkê werimîna qirika wî min daxista. Min dirûtina di qirika wî de jê vekir, weke avê îltihab herikî. Hewce dikir ez kêlên dirûtinê vekirî bihêlim. Min dubare bi paçên didin ser birînan pêçand. Sibê û êvarê min derziya ji bo zuwakirina îltihabê lê dida. Fatmayê Botan  li ser ranzayê bi cih kir. Ji Umît re jî min got, tu jî weke me nivînekê raxe erdê û razê. Di vê navberê de Umît sazek peyda kiribû. Dizanî lê bide jî. Êdî ji bo me her roj li sazê dida. Stranên dizanî digot. Elektrîka me tine bû, lê êdî sazê me hebû.

Ez li DBP'ya bajêr geriyam. Min sicîla hevala Sarya da, bajar (DBP) jî, wekîl jî pir bê xem bûn. Em li wan negerîna, qet li me nedigerîn û agahî nedistendin. Di vê navberê de hevala Nûda ji lingê xwe birîndar bibû. Gule li erdê ketibû, parçeyê wê li ling ketibû û di aliyê din re derketibû. Min derziya tevizandinê li lingê Nûda da û Remziye dirût. Me hevala Nûda girt û bir mala Zozan lê dima. Hevala Nûda jî li ser kanepeya din bi cih kir. Êdî ji bo razanê, ji bo îstirehetê jî dem tine bû. Çûm malê. Umît jî diçû mewziya Sûka Mast. Li gel hevalan nobed digirt. Ber bi sibeyê ve dihat, heya bi nîvro radiza. Êvarê

dîsa diçû mewziyê. Tebî her mala diçûmê, min li gel xwe pişik jî dibir. Ji ber ku pir biçûk bû û sîstemê pişik jî dikuştin. Her roja derbas dibû, hejmara pişikên li Sûrê kêm dibû û pişika me bê parastin bû. Dema Umît li mal di hemêza Umît de, û dema ku ez li mal di hemêza min de radiza.

Dinya sar bû û ji ber ku elektrîk tine bû, me nedikariya sobayan pê xin. Her kesî dest pê kiribû soba datanîn. Remziye û kekê Cengîz Li nexweşxaneyê sobeya komirê danîbûn, lê min nedizanî sobeyê pê bixim. Min digo, ez ê sobeyê pêxim lê min ditemirand. Her kesî ji min re digot, "tu sobayê pê nexe". Lê tevî van hemû neyîniyan jî dema em bi hevalan re dihatin gel hev, em dikenîn, me hanek dikirin. Ya ku Rêbertiyê digot, bawer im tiştekî wisa bû, "jiyana di nava şer de". Em jî tevî hemû neyîniyan fêrî jiyanê bibûn. Herî kêm ji bo min wisa bû. Divê navberê de rêyên diçûn mewziyan dihatin guherîn. Dema ku hevalê Çiyager ji me re gotibû, "hevalên tên gel we zêde nexin nav sohbetê, di cih de bişînin mewziyê", me jî gotibû temam.

Di ser re demeke kurt derbas bibû, hevalê Çiyager, Doğan û Elî hevalekî birîndar ê bejin dirêj dianîn nexweşxaneyê. Em hemû beziyan nexweşxaneyê. Nûda bi lingê xwe yê birîndar hat nexweşxaneyê. Navê vî hevalî, Qesab bû. Li mewziya Qeredenîzê dima. Bi qasî min ji şîveya wî fêm kiribû ji Mêrdînê bû. Gule piştî li hedefa xwe dikeve diteqe li ranê wî ketibû. Bedrî jenerator xebitand. Lambayê seyar vekir, hewşa nexweşxaneyê ronî bû. Min, kekê Cengîz û Remziye me lepik xistin destê xwe. Min dîsa derziya tevizandinê kişand enjektorê. Çar derziyên tevizandinê lêdan. Dema cihê birînê min derzî dikir, derzî li tiştekî req û hişk diket. Min ji kekê Cengîz re got, dibe ku gule di nava birînê de be. Di vê navberê de zêde xwîn diherikî. Kekê Cengîz ji demarê derziyeke tevizandinê lê da. Piştre bi mûçinikê ji nava birînê parçeyek derxist. Em matmayî man, parçeyên hestî bûn. Ew parçeyê req û hişk hestiyê Qesab bûn. Guleyê hestî parçe parçe kiribû. Hevalê Çiyager banî me

kir û got “em çi bikin”. Min jî got, em heval derxin, hewce ye platîn bê xistin ling. Hevalê Çiyager vê carê berê xwe da Qesap; “tu çi dibêji , em ê te derxin derve?”. Qesab axifî û got, “ez ê li vê derê bimirim, lê xwe naxim nav lêpê dijmin”. Hevalê Çiyager li me zivirî û got, “çi hewce ye bikin, em heval naşînin ti derê”. Piştî ku me ya hewce dike kir, lingê wî bi daran destek kir. Serûm jî lê girê da. Piştre me bir mala em berê lê rûdiniştin a li hemberê nexweşxaneyê. Hewce dikir hin kes lê binêrin, ji ber ku birîndar bû. Me banî Senîha kir û jê re got, tê her roj taşte û xwarina Qesab bidiyê. Pansuman û derziyên wî jî, me dê her roj biçûna bikirana.

Şer hê jî girantir bibû. Çawa em ji nexweşxaneyê yan jî ji malê derdiketin bombe dibarîn. Ji helîkopterê em didîtin û qoordînat didan, ji Otêla Clas bi ser me de bombe û guleyen doçqayê dibarîn. Fatma nedikariya bêje Otela Clas, digot, Qirnas”. Dema wisa digot em hemû dikenîn.

Êdî hejmara birîndarên me zêde dibû. Hevalê Çiyager ji hevalan re digot, bêquralî nekin, kolanan bi kar neynin”. Lê belê ji ber ku rehet bû, kolan bi kar dianîn. Di destê her kesî de fenerên destan hebûn. Fener weke zêrê zer bû. Ji ber ku rê, mal û kolan tarîbûn. Ti kesî fenerê xwe nedida kesî. Lê me hevalên brîndar jî li ber fenerê tedawî dikirin. Tevî hemû van tiştan em bextewar bûn. Me li hev bawer dikir. Min ji Remziye re got, ez ê biçim malê hinekê razêm û îstirehet bikim, derketim.

Hatim mal. Umît û Fatma li malê bûn. Min pansumana Botan guhert, derziya wî kir. Fatma xwarina wî amade kir. Me ji xwaringeha giştî xarin nedigirt. Fatma li malê çêdikir. Me xwarina xwe xwar. Fatma Ev du roj in firaq neşûstibûn. Min hemû daxistin hemama li xarê. Ava germ a li ser sobayê û fener jî girte cem xwe. Ji wan derincokên xwaromaro daketim jêr û min hemû firaq şûstin. Ji bo em firaqa derxin jor, ji bo alîkarî bide, min banî Umît kir. Me firaq li mitfeqa qatê jor danîn û em derbasî odeyê bûn. Fatma Tupê biçûk anîbû odeyê, çaydan danîbû ser, dê çay çêbikira. Ez jî li gel sobeyê rûniştim. Min

got, ma tu ji me re hinekê li sazê nadî? Wî jî mirûza xwe kir û got, “dibe”. Umît ji Semsûrê bû, xwendekarê refa çaran a hiqûqê bû. . Timî digot, “baş bû êz hatim Sûrê, qet ne poşman im”. Ciwanekî saxlem bû, min timî weke kurê xwe lê nêrî, Delalî nêzîk bûm. Ji ber ku Umît kurê yekana yê dayik û bavê xwe bû. Weke dayikekê, hinekê bi hestiyarî tevdigeriyam. Lê balkêş e, di seranserê dema ku li Sûrê mayime de zarok û hevserê min nehatibû bîra min. Eger van tiştên ez dinivîsînim bixwînin dê ecz bibin, lê rastî ev bû. Dibe ku dema min tine bû li ser wan bihizirim yan jî jixwe li Sûrê gelek zarokên min hebûn, bi wan pêwîstî tine bû. Gelek malbat ji ber rewşê ditirsîn û bi fikar bûn lê ez pir aram û rehet bûm. Dibe ku bi salan li jiyaneke wisa gerîbim. Çima bextewar bûm? Gelo dibe ku ji bo kêrî tiştekî dihatim be? Hesten min hatibûn çewisandin, min li vê dere bi rehetî xwe îfade dikir. Gelo evîna PKK’ê ev bû? PKK’ê mirov digirt û dibir, fêrbûn çêdikir. Piştî ku me strana xwe guhdar kir, me nivînên xwe raxistin û em razan.

Sibeyê çûm nexweşxaneyê. Min bihîst hevalê Doğan birîndar bûye. Doh bi şev piştî ku ez çûm malê birîndar bûye. Kekê Cengîz û Remziye tedawiya wî kiribûn. Min ji Bedrî pirsî ku hevalê Doğan li ku derê ye, got, “li gel Nûda wan e”. Di cih de ji bo biçim gel Nûda wan ji nexweşxaneyê derketim. Ketim hindurê avahiyê. Du bi du pelpelokên derincokê hilkiştim, min derî vekir û ketim hindur. Bêyî ku Nûda û Zozanê bipirsim min ji hevalê Doğan re got, derbasbûyî be, çawa çêbû, ji ku derê xwe birîndar bûyî? Wî jî got, tiştekî pir girîng tine ye, parçayê bombeavêjê li lingê min ket, parçeyek di nav hestî de maye, parçeyek jî li ranê min ketiye û derketiye”. Dubere min got, derbasbûyî be. Piştre min rewşa Nûda û Zozanê pirsî. Gotin “em baş in”. Lingê Nûda qederekê werimî bû, min jê re got, timî tevger bike. Wê jî got, “eger pê baş be, ez ê tevger bikim”.

Dema em wisa diaxifîn li ber nexweşxaneyê dest pê kir dengê qerebelixêyekê bê. Ji malê derketim û çûm nexweşxaneyê. Hevalekî bi navê Xêyrî, parçe li her derê laşê

wî ketibûn. Serçavên wî, zik lingên wî, di her cihê xwe de birîndar bibû. Xêyrî qirnas bi kar dianî, qadro bû. Ji grûba ferqînê bû. Ji Dêrîka Mêrdînê bû. Me di cih de cil û bergên wî derxistin û laşê wî paqij kir. Me herî kêm di bîst cihên wî de dirût, lê birînên wî di rû de bûn, ne kûr bûn. Me jê re got, weke bêjingê li te hatiye. Hevalê Çiyager hat û ji min re got, "legenekê û hinek avê bîne". Destên Xêyrî dê bişûsta. Min got "ez ê bikim", qebûl nekir û dubara ji min re got, "av û legenê bîne". Min jî av û legen anî. Ji ser destê Xêyrî saet derxist, zendên wî hilmalişt û destên Xêyrî şûst û zuwa kir. Serçavên Xêyrî bi destmala ter paqij kir, piştre jî pê re esprî kir. Min jî li wan temaşe dikir.

Her diçe min rêzeke mezin dida hevalê Çiyager, zêdetir heyranî wî dibûm. Ma ev hesasbûna ku nîşanî hevalê xwe dida, cûdatir kê dikarîbû nîşan bide? Bi rastî jî milîtanek bû. Xuya bû, tiştê jê re ruhê PKK'ê dihate gotin ev bû.

Êdî hêdî hêdi serumên me diqediyan. Derziyên me yên tevizandinê û xwînê didin sekinandin jî kêm mabûn. Ji her hevalê/î re me digot, malên hûn dikevine eger hebe derman bînin. Her hevalê/a dermanê peyda dikir, dixist poşet dianî. Me Xêyrî jî li odeyê di nivînekê de bi cih kiribû. Şervanê ku ji çavê xwe birîndar bibû, deng li Bedrî kir û got, "ji bo min ji ew tiştê ku qorsan didin ber çavên xwe yê bi yek çavî ye çêbike". Pişre berê xwe da hevalê Çiyager û got, "ez baş im, dixwazim biçim mewziyê. Hevalê Çiyager li me zivirî û pirsî, "ma dikare biçe?". Me jî ew bi awayê, eger serma lê nede dikare, bersivand. Hevalê Çiyager got "em ê sibeyê bên û vesaziya te çêbikin" û çû.

Mewziya Mizgefta Qurşunluyê hinekê bi paşde hatibû. Tangan her der hildiweşandin. Ji ber ku qebloyên wan dihate qutkirin jî mayin nediteqiyan. Tevî ku hevalên li wê derê zehmetî dikişandin, sîstemê wendahî didan. Êdî Mizgefta Qurşunlu li nîvengê bû. Ne hevalên me dikarîn biçin û ne jî dijmin dikarî bikevê.

Dijmin bi topan û bi bombeavêjê li Mizgeftê dida, bi şiklekî aşkere dîrokek tine dikir. Paşê jî di çapemeniyê de nûçeyên bi awayê, "terorîstan Mizgefta Qurşunlu ya dîrokî hilweşandin" belav dikirin. Ewqas bêşermî jî zêde bû. Hem erda me, dîroka me, malên me dagir dikir, hem jî em weke terorîst îlan dîkir. Kî terorîst e? Em yan dewleta xwediyê zêhniyeta dagirkerî? Aşkere ye dewlet bû. Êdî me bi çavên xwe her tişt didît û dizanî. Ji ber ku em şahidên vê berxwedana dîrokî bûn.

Ez û Remziye Em dubare çûn cem Nûda. Em li gel hevalê Doğan runiştibûn. Hevala Nûda ji min pirsî, "paşnavê te Kavak bû ne wisa? Min got, rast e. Ji min re got, "ma tu serokê berê yê bajarê Stênbolê nas dikî? Min got, rast e ew birayê min ê mezin e. Pir kêfxweş bû, li ser girêdana wî ya bi têkoşînê axifî. Li pêşberê vê nêzîkbûnê li aliyekî kêfxweş bûm û li aliyê din jî hestek ku weke li ber sîbera malbatê diminîm û keda min nayê dîtin bi min re peyda bû û min her du hest jî di zikhev de jiyan kirin.

Min nîqaş guhert û ji hevalê Doğan pirsî ku rewşa wî niha çawa ye, êşên wî hene yan na. Hevalê Doğan got, "ez ê te, Remziye û kekê Cengîz bişînim Qendîlê, hûn ê sê mehan perwerdeya tibê bibînin û bên". Remziye got, "zarokên min dê çawa çêbin?". Hevalê Doğan jê re got, "wan jî li kampa zarokan bihêle, bila li wê derê perwerdeyê bibînin". Min û Remziye ji hevalan xatir xwest û em vegerîn nexweşxaneyê.

Dema em vegerîn li nexweşxaneyê li maseyê hevalekî bejn dirêj û lewaz rûdinişt. Ew jî hem ji Ferqînê bû û hem jî ji grûba ferqînê bû. Ji ber ku pir dirêj bû her kesî jê re digot "kurê Xweda". Çeka qirnas bi kar dianî, sekvan bû. Çapemeniya dewletê digot, "sekvanê Îtalî li Sûrê ye". Ji ber wê yekê hin hevalan jê re digot, "Çeqel Qarlos". Nasnavê wî Rodî bû. Rodî nerehet bû. Cîgera wî ya reş îflas kiribû. Lê dîsa jî weke şêran şer dikir. Qirnasa di dest de bi temamî li bejna wî dihat. Min jî

her dema ew didît jê re digot, kurê Xweda çawa yî? Ji min re digot, “baş im keça xweda”.

Dema em bi Rodî re eleqadar dibûn ji deriyê nexweşxaneyê Zagros û di bin çengê wî de hevalekî zêde ne kurt û ne dirêj û lewaz ketin hindur. Navê hevalê birîndar ku Zagros ketibû bin çengê wî, Penaber bû. Penaber ji Ferqînê bû, herêmî bû. Dema li Ferqînê qedexe rabibû hatibû Sûrê. Li gel wî bombe teqiyabû, parçeyekî kevir li ling ketibû. Zêde zêde xwîn wenda dikir. Goştê di binê çongê wî de kun bibû, dişibiya birîneke biçûk, lê çima evqas xwîn diherikî? Me jora lingê wî girêda. Remziye derziyek ku xwînê dide sekinandin lê da. Min jî lingê wî tampon dikir, lê min pir didewisand. Penaber ji min pirsî ku ez çima evqas didewisînim. Min jî got, divê herikîna xwînê bidim sekinandin. Me piştî bi pênc deqîqeyan xwîn sekinand. Me lingê wî bi awayekî baş şidand. Piştre me derziya êşbir lê da û bir ser cihê wî. Min ji Penaber pirsiya ku maneya navê wî çi ye. Wateyeke wê ya çi xweş hebû. Fatmayê nedikarî bêje, “Penaber”. Digot, “Pîmapen”. Her cara wisa digot heval dikenîn. Fatmayê digot, “ma hûn çi dikenin, zimanê min nagere”. Zagros jî, navbera tiliya wî ya mezin û tiliya şehadetê qut bibû. Hewce dikir em navbera tiliyên wî paqij bikin û bidûrin. Wî jî digot, “hewce nake, eger hûn bidûrin nikarim bi kar bînim” û destûr neda ku em bidûrin. Me jî pêçand, tevî Rodî çû mewziyê.

Nexweşên me zêde dibûn. Vê jî nîşan dida, şer pir giran dibe. Tebî, dijmin wendahiyên xwe nedidan çapemeniyê. Tenê li mewziya Mizgefta Kurşuluyê nêzîkî 100’î wendahî dayibû. Lê me radyo guhdar dikir, digot, “3-4 kes mirine”.

Ji nişka ve Afad bi qîrkirinê ket hindur, digot “darbest, darbest” û dikir hawar. Min darbesta kesk ku me ji ser dijmin rakiribû girt. Ez ê jî li gel Afad biçûma. Nasnavê Afad li qadê Piling bû, navê wî yê malê Mahmut Oruç bû. Hevalekî hanekbaz, bêtirs bû. Her cara ku dihat nexweşxaneyê digot, “pîrka min qurbana we be”. Afad got, “neyê”, min bi israr got,

ez ê bêm. Derketim kolanê, hinekê em bi pêş de çûn. Afad ji min re got, “di vê kolanê re bi lez derbas be Clas Otel vê derê dibîne”. Ez jî bi bezînê derbas bûm û me xwe gihand kolana din. Ev kolan nêzîkî mewziya Zagros wan bû. Li kolanê hevalekî ku li erde hebû. Li gel wî jî sê hevalan dipa. Tevî Afad me xwe gihande wê derê, min dipirsî ku kî ye, ne kî ye û min lê mêze kir Rojhat e. Ez û Rojhat bi hev re hatibûn Sûrê. Li Kayapinarê rûdinişt, nû zewicî bû. Ji hevsara xwe ya pênc mehî re gotibû, “ez ê biçim Stenbolê bixebitim” û hatibû Sûrê. Navê wê yê malê Gündüz Akşemet bû. Ne şaş bim yan ji Hazro yan jî Pasûr (Kulpê) bû. Dema em hatibûn Sûrê telefona xwe girtibû û dabû min. Min jê re got, “Rojhat tiştekî te tine ye, tê baş bî”. Bi hevalan re me xiste nava darbestê lê Rojhat timî digot, “ez ê şehîd bikevim”. Me ew anî nexweşxaneyê. Li odeya nexweşxaneyê me razand darbestê. Di pêşiya ranê wî de du gule lê ketibûn. Ji bo ku em cihê guleyê bibînin me ew zivirand. Cihê guleyan di ranê wî de birînên mezin vekiribûn, hestî şikênandibûn. Kekê Cengîz nêrî û got “lingê wî şikestiye” û li ser zêde kir; “destpêkê lingê wî bidûrin û piştre bipêçin”. Rojhat qîr dida û digot, “av, av”. Min jî digot, na av tineye. Rojhat, li ber min digerî û digot, “R. ez bi qurbana te bim hinek av”, cîgera min dibû ker û parçe. Wî av dixwest û min nedida. Min derziya tevizandinê kişand enjektorê û li herêma birînê xist. Remziye jî malzemeyên dirûtinê amade kir. Remziye didûrî û min jî goştê derketibû ji derve didewisand hindûr. Rojhilat hê jî qîr dida û digot, “av, av”. Piştî ku Remziye qedand me lingê wî pêçand. Kekê Cengîz Hinek ava fêkî xiste qadehê û dayê. Rojhilat çawa vexwar vereşî. Me banî hevalan kir, me got alîkarî me bikin em Rojhat bibin ser cihê wî. Hevalan alîkariya me da û me Rojhat bir. Qet nedikarî di cihê xwe de bitebite, her diperpitî. Çûm cem wî, “Rojhat binêre tiştekî te tine ye, tê baş bî. Wî jî digot, “lingê min diêşe, lingê min diêşe, ez ê şehîd bim”. Min jî hewl dida wî aram bikim.

Ez û Remziye derketin hewşê û her yekê ji me cixareyek pê xist û dest bi kişandinê kir. Umît jî rêya xwe bi nexweşxanêyê existibû. Ji cixareyê ya mayî min da Umît. Kekê Cengîz banî Umît kir û got, “bê alîkariya min bide, ez ê binê Rojhat girêbidim”. Dema Umît alîkariya kekê Cengîz dikir Hecî kete hindûr. Li pişta wî hevalekî birîndar hebû. Hecî, hevalekî bejnkurt, çavkesk û genimî bû. Li mewziya Mizgefta Qurşunlu dima. Ferqînî bû. Ji grûba ferqînê bû.

Hevalê li pişta wî Yilmazê Biçûk bû. Gule li beşa jor a serî ketibû. Di cih de me li ser darbestê dirêj kir, destpêkê ji bo em birînê bibînin me bi permatîkê serê wî qusand. Ji ber ku gule li cihekî nazik û heses ketibû. Heya ku qusandina porê wî qediyabû, min çar permatîk guherindibûn. Lê Yilmazê Biçûk tevgerên ecêb dikir. Piştre min ji Hecî re got, ma nerehetiyeke cuda ya Yilmazê Biçûk heye? Wî jî gotibû, “pê re nexweşiya Sarayê heye”. Piştî qusandina serê wî, derziya tevizandinê min amade kir. Remziye malzemeyên dirûtinê amade kir. Piştre kekê Cengîz li birîna serê wî mêze kir. Lê Yilmazê Biçûk xwe pir dijdand. Her ku wî xwe dijdan mêjiyê wî derdiket jor. Kekê Cengîz got, “zû birînê bidûrin”. Remziye didurî û min jî her ku mêjiyê wî derdiket bi tiliya xwe bi hindur ve didewisand. Nûda û Doğan jî hatibûn nexweşxaneyê. Piştî ku dirûtin qediya ez û Remziye , me berê xwe da doğan û got, binêre we çi li me kir, her yek ji me bû qetileke bêrehm, qesabekê. Doğan jî wisa bersiv da; “baş e, baş e, eger ne ji we bûya dê kê ameliyat bikirana. Di vê navbera de kekê Cengîz serê Yilmazê Biçûk pêçand, cil û bergên wî guhertin, lê hê jî deng ecêb derdixist, tevgerên ecêb dikir, çavên wî wer dibûn. Kekê Cengîz diyar kir ku ew ê îşev li nexweşxaneyê bimîne.

Rojeke bi pir hatin û çûn derbas bibû, pir jî westîbûm, ne fîzîkî jî bibe ji aliyê mêjî ve pir westîbûm. Ez Remziye û Umît ji nexweşxaneyê derketin. Remziye çû mala xwe, ez û Umît, em hatin mala xwe. Min pansumanayê Botan guhert. Werimîna qirika wî daketibû. Di vê navberê de Botan cixare

berdabû, êdî nedikişand. Piştî ku min derziya wî kir, min û Umît li ser tiştên diqewimin nirxandin pêş xistin. Fatma çûbû Nûda wan. Ji me re got, “Nûda got, divê hûn mala xwe biguherin”. Mala me zêde dihate bomberbaran kirin, banê wê dar bûn, her cara ku guleyên bombeavêjê lê diket ax diweşî. Umît derketina ji mal qebûl nekir, got, “na em dernakevin”. Min jî got, temam eger Umît çi dibêje, bila wisa be. Me nivînên xwe raxist û em razan. Bû sibe û ez çûm nexweşxaneyê ji ber ku vê carê diviyabû kekê Cengîz biçûya malê û razaya. Nivînên Rojhat û Yilmazê Biçûk vala bûn. Min ji kekê Cengîz pirsî ku Rojhat û Yilmazê Biçûk li ku derê ne. Got, “şehîd ketin”. Min got, çawa dibe, jixwe me dizanî Yilmazê Biçûk dê şehîd bibe lê Rojhat! Birîna Rojhat ne giran bû. Tenê lingê wî şikestibû û min dest pê kir bigirîm. Min got, li ku derê ne? Got, li mala tenişta nexweşaneyê ne. Ez a ku li cem ti kesî nedigirî, yan ji her kesî dûr li goşeyekî yan jî bi şevê di nava cihê xwe de bi dizî digiriyam, lê niha aşkere digiriyam. Di cih de çûm mala tenişta nexweşxaneyê, di nava bataniye de du cenaze hebûn. Min ser Rojhat vekir, eniya wî ramûsand û giriyam. Vê carê ez difikirîm ku min neheqî li Yilmazê Biçûk kiriye, min eniya Yilmazê Biçûk jî ramûsand û ser girt. Piştre min lingê Rojhat vekir û lê nêriya, reş û şîn bibû. Dibe ku min hewl dide fêm bikim ka çawa şehîd ketibû.

Hatim nexweşxaneyê, min ji kekê Cengîz pirsî, lingê Rojhat şîn şîn bibû, çima? Wî jî wisa bersiv da, “guleya lê ketibû bi jahr bû”. Elî hate nexweşxaneyê, tiştên şexsî yên Rojhat û Yilmazê Biçûk dan min û got, “dema qedexe rabû tê bidî malbata wan”. Di nav tiştê Rojhat de bazbendeke ji morikan hatiye çêkirin hebû. Li ser nivîsandibû, “Miçê”. Yek ji gerdaniyek hebû, li ser nivîsandibû “Zeyno”. Di nav tiştên Yilmazê Biçûk de jî çaxmaxekî biqilif, saeteke ser destan û kêrek hebû. Van hevalên şehîd ji malbatên xwe re ev tiştên xwe û berxwedaneke bilehengî dihiştin.

Êdî dest pê kiribû Doğan jî sax bibe. Ew jî hat nexweşxaneyê, ji Bedrî re got, "du goran bikole, şehîdan jî bişon, êvarê dema helîkopter nagerin em ê bibin bispêrin xakê". Bedrî jî got, "temam" û çû. Harûn (Çiyager) û şef hatin nexweşxaneyê, di nava bataniyê de birîndarek hebû. Şef, timî li gel Doğan digeriya, qet bawerî nedida min. Pir diaxifî, hanek dikir û pir pesna mirov dida, eger mirov aşkere bêje, dişibiya kesekî fêlbaz. Şef dikir qîr û hawar, digot, "alîkari bikin". Ez, Remziye , kekê Cengîz û Doğan beziyan; ya star, ev Şenda bû. Remziye dest pê kir bigirî, "Şenda, Şenda". Me Şenda li odeya destwerdanê li ser darbestê berda. Di cih de me lepikên xwe xistin destê xwe, me dest pê kir em pantolonê wê qut bikin. Me rextê wê ji ser rakir. Gule tenê li lingên wê ketibûn. Her derê lingên wê vebibû. Destpêkê kekê Cengîz qontrol kir û got, her du lingên wê şikestine. Lingekî wê di jorê çongê de, lingekî wê jî di jorê ranê wê de şikestiye". Min jî, derziya jetokaîn kişand çar enjektoran û dest pê kir li herêmên gule lê ketine bidim. Remziye jî herêmên tevizîne didûrî. Li hewşê Çiyager û Doğan sekinîbûn, Elî û Nûda jî hatibû. Me hemû birînên di lingên Şenda de dirûtin. Êdî me nedikarîn ti cilan jî lê bikin, ji ber ku dê me her du lingên wê tevahî bipêçandana. Kekê Cengîz deng li Bedrî kir û "ma dikarî heşt darên rast amade bikî". Bedrî ji qasayên sûkê 8 parçe anîn. Kekê Cengîz li daran pembo aland, piştre li jêr, jor, bin û serê her lingî 4 dar danîn û qeyîm pêçand. Dema kekê Cengîz li Şendayê serum girêda me jî bataniye avêt ser. Hem tazî bû û hem jî ji ber derziya xwîn sekinandinê diqerisiya. Di vê navê de di serê min de pirs dihatin û diçûn. Ev gule ji nêzîk ve lê ketibûn. Dijmin ji evqas nêzîk ve gule avêtibûn lê çawa Şendayê bersiv nedayibû? Lingekî Şendayê min, lingekî wê Remziye girt, kekê Cengîz jî bi milê wê ve girt û me bir mala Nûda lê dima. Jînda nivînek raxistibû erdê, me danî ser nivînê û bataniyeyek avêt ser, lê Şenda ji ber êşên xwe dinaliya. Heval jî ketin hindur. Ti kes nediaxifiya, rewşeke ecêb hebû. Ne Doğan, ne Çiyager û ne Elî nediaxifîn, her kes bi

awayekî bêdeng rûniştibû. Min û Remziye , me hewl dida em fêm bikin Şenda dê di kîjan pozisyonê de rehet be û em wê bi wî awayî di nivînê de bi cih bikin. Piştre em hinekê rûniştin . Jînda çay çêkiribû. Bi qedehên li ser tepsiyê kete hindur, me çayên xwe vexwarin, ez derketim û hatim malê. Remziye li wê derê ma. Ez fikirîm ku Remziye jî weke min ji bûyerê ket nav şik û gumanan. Êdî me fêm dikir birîndariya Şenda çawa çêbûye. Piştî ku hatim malê, Fatma çû ji bo xwarin amade bike. Min li gel Umît ev mijar parve kir. Em li gel Fatmayê li ser mijarên rêxistinî yên wisa nediaxifîn. Baweriya Umît bi min hebû. Ji min re got, “eger fikra te ev be tê maneyê ku hin tişt hene”.

Fatmayê xwarin danî, bamyayê ku Umît jê hez dikir çêkiribû. Min jî ji tiştên şêrîn hez dikir. Ji min re got, “min pudîng çêkiriye”. Ev amadekariya çi bû? Got,”îro serê salê ye”. Em li ser xwarinê rûniştin. Min, Fatma, Botan û Umît me xwarin dixwar. Bahoz û Rêber ketin hindur. Bahoz ji lingê xwe û Rêber jî ji singa xwe bi parçeyên bombeyê birîndar bibûn. Bahoz herêmî bû. Ciwanekî çavkesk û lihevhatî bûn. Li Şehîtlikê rûdiniştin. Min li birînên wan nêrîn. Zêde tiştekî wan ê cidî tine bû. Tenê parçe hinekê goştê wan qut kiribû û derbas bibû. Min pansumana wan kir. Ew jî runiştin, me xwarin xwar. Me piştî xwarinê pûdîng xwar. Deh deqîqe mabûn ku saet bibe donzde. Me ji Rêber re got neçe, piştî kêliyekê dê bibe dawiya vê salê, em bi hev re bin. Piştre me çay çêkir û vexwar. Saet li 12’yan derbas dibû. Me ev sala bi Rêber qedandibû. Em di nav evqas tişt de jî bextewar bûn. Em mirovên çawa bûn. Heval şehîd diketin em digirîn; dema em diçûn gel birîndaran bi moral û rûliken em diçûn. Êdî me dikarî em bikevin her modê, dema em dihatin malê jî me li sazê dida û li ser rojê nîqaş dikir!

Rêber ji Umît xwest li sazê bide. Wî jî got, “kîjan parçeyê bêjim?” Bahoz got, “Hey lê çûka ser darê, bêje”. Umît jî li sazê da û got. Min ji Umît cara yekemîn e bi Kurdî parçeyek guhdar

dikir. Çi xweş digot, tebî eger tu her roj pê ‘Dinyaya derewîn’ bidî gotin, nikarî tiştekî din guhdar bikî!

Rêber çû, Bahoz jî li cem me ma, lingê wî diêşiya. Me nivîn raxistin, ode biçûk bû, me nedikariya çar nivînan raxin, ez û Fatma li cem hev razan, Bahoz û Umît di nivînên cuda de razan. Sibê bû. Êdî ez sibeyan ji beriya qehwe vexwum dernediketim ji derve. Piştî min qehweya li ser tûpê biçûk çêkir, çûm nexweşxaneyê. Nûda, vesaziya Çîğdemê (Siyajîn) li nexweşxaneyê çêkiribû. Piştî çûm nexweşxaneyê kekê Cengîz ji bo razanê çû mal. Ez û Çîğdem em li hewşa nexweşxaneyê rûniştin û me sohbet dikir. Wê got, “êdî nasnavêmin Siyajîn e”. Tevî ku her kesî digot, min dîsa jî digot, Çîğdem.

Fatma hate nexweşxaneyê. Got, “min di mencelekê mezin de av daniye ser sobeyê, eger av germ be, were serê xwe bişo”. Min got, temam. Çîğdemê ji bo pirsa Şendayê bike çû gel Nûda û hevalên din. Remziye hat, piştre Jînda hat, ji min û Remziye re got, “Şenda banî we dike”. Me fêm kir ji bo çi banî me dike. Me di cih de paçên nexwaşan, lepik û destmalên ter girt cem xwe û em çûn Nûda û hevalên din. Hewce bû em binê Şenda paqij bikin. Dema min hewl da Şendayê bi pişta wê bigirim û rakim, qîr dikir û digot “diêşe”. Pişre Remziye hat “tu binê Şenda paqij bike ez ê wê rakim, dizanim wê çawa rakim. Min paçê binê Şendayê derxist. Piştî ku min paqij kir, min paçekî nû bi cih kir. Piştre ez û Remziye hinekê em rûniştin û me çay vexwar.

Lingê Nûda hineke din çêbibû. Zozanê jî dikarî pêlî lingê xwe bike. Zozanê ji Nûda re got, “vesaziya min çêbike, ez ê biçim mewziyê”. Hevalên jin li mewziya xweser dinêrîn. Şenda, Zozan, Delal, Dîcle-Adar, Bêrîtan, Bêrîvan, Zîlan, Dewrîm, hevalên jin ên li mewziya xweser dinêre bûn. Nûda, ji Zozanê re got, “hineke din bisekine, bila lingê te tam çêbe, ez ê te bişînim mewziya xweser”. Zozanê mirûza xwe kir. Nûda hewl da wê rehet bike û got, Zozan rûyê xwe tirş neke, dema tu sax bûyî ez ê te bişînim mewziyê”.

Ez rabûm, min got, ez ê biçim nexweşxaneyê. Remziye jî got “divê ez şîr bidim keça xwe” û çû. Keça Remziyeyê, Bêrîtan, 20 mehî bû, şîrê diya xwe vedixwar, ji ber wê yekê Remziye çû malê. Ez zivirîm nexweşxaneyê. Piştî kêliyekê Fatma hat û got, “av germ bû”. Çûm malê, min mencela ser sobayê girt û anî hemama li jêr. Fêner jî min girt cem xwe. Tevî ku roj bû hindur tarî bû. Min av amade kir û serê xwe şûst û çûm nexweşxaneyê. Li nexweşxaneyê Çîğdem kir qîr û got, “ma tu wisa li nexweşan dinêrî?”. Min jî got, min emanetê Bedrî kiribû û min li ser zêde jî kiribû ku ev der ne cihe nîqaşê ye. Tu nabêjî Bedrî li nexweşxaneyê nesekiniye. Dilêr xwestiye rabe ser xwe, ketiye erdê. Xêyrî bi wê birîndariya xwe banî kekê Cengîz û Remziyeyê kiriye. Ez pir ecz bibûm. Çîğdem li gel hevalên xort qîr dikir û ew jî li zora min diçû. Bi şiklekî ecz çûm mala ku Nûda û hevalên din lê diman. Min bûyer ji Nûdayê re vegot. Wê jî got, “Çîğdem hevaleke nû ye dibe ku kêmasiyên wê hebe”. Got, “ez ê li gel wê biaxifim, tu biçe nexweşxaneyê”.

Ez ê jî, ji mala Nûda wan diman derketama û bihatama malê, lê min li pêşiya malê Doğan û Şef dît. Min ji Doğan re got, tê vesaziya min li mewziyekê çêbikî? Binêre dikarim çek jî bi kar bînim. Doğan jî got “ez ê bikim”. Ez jî çûm malê. Ji Doğan ti deng derneket. Demekê Andok (Ekremê Mezin) hate gel me. Jê re digotin, “Andokê mezin. Digot, “ji Lîcê me”. Navê wî yê malê Ekrem bû, ne kurt û nedirêj bû, lewaz bû. Min timî ji wî re digot, Andokê virek. Tiştê dikir pir diwerimand. Li gorî wî gotiye, bi dijmin re rû bi rû hatiye, li dijmin xistiye. Dema fermandarên dijmin gotiye, “li me didin” Andok jî, ji wê derê qîr daye û gotiye, “ha ha, ez li we didim!”. Me ji hevalan pirsî, gotin, “tiştekî wisa tine ye”. Lê dîsa jî hevalekî ku axaftina mirov guhdar dike bû. Min ji Andok re got, min bibe mewziya xweser. Got, “temam”. Min amadekariya xwe kir, cil û bergên xwe saxlem kirin, ji ber ku mewzî vekiribûn, sar bûn. Destpêkê ez û Andok li kolanan meşiyan, tarî bû, li hin cihan,

fener vedikir û li hin cihan jî digirt. Piştre em ketin bexçeyê dibistanê. Andok got, “divê tu li vê derê xweş bibezî, ji ber ku dibe ku termal kamera me bibîne. Andok li pêş û ez jî li pey wî em xweş bezîn. Piştre em li dibistanê, ji dîwarê hatiye şikênandin derbas bûn û ji dibistanê derketin. Ne şaş bim navê dibistanê Silêman Nazîf bû.

Piştre em di nava malan re derbas bûn, ji odeyekê em derbasî odeyekê û piştre em derbasî odeyeke din bûn, herî dawî me deriyê odeyekê vekir, hevala Delal li wê derê bû. Nav odeyê pir tarî bû, pirsî û got, “ma çi karê te li vê derê heye?”. Min jî got êdî ez ê li vê mewziyê bimînim. Delalê fener da çavê min û got, “tê cixarê bikişînî? Min got, ez ê bikişînim. Hevalên din jî di nivînên ku li erdê raxistibûn de radizan. Delalê berê xwe da Andok û jê re got, “agahî bide Çiyager, bêje R. li vê derê ye. Andok çû û piştî 10 deqîqeyan hat. Got, “Çiyager ji min re gotiye R. bibe nexweşxaneyê, ew ê piştî kêliyekê bê nexweşxaneyê û li gel R. nîqaş bike”. Rabûm, Andok li pêş û ez li pey wî, bi bez em bi şûnde zivirîn. Dema em hatin nexweşxaneyê Remziye li wê derê bû. Em hinekê axifîn. Min jê pirsî ku Şenda çawa bûye. Şenda di tîma bi tevger (hareketli tim) de bû, her roj li ser hemû mewziyan digerî. Remziye ji min re got, “lê ji ti kesî re nebêje, bila morala hevalan xera nebe”. Min got, temam. Wê domand, “Şenda diçe mewziyê, nizane wê mewziyê rêya xwe guhertiye. Heval dibêjin qey dijmin hat. Deng lê dikin, Şenda ji bo ku dijmin nebihîze, hêdîka dibêje “heval ez im”, heval dengê wê nakin û gule direşînin. Bûyer ev e. Piştî kêliyekê hevalê Çiyager hat, pirsî “ma li mewziya xweser çi karê te heye? Min jî got, min ji hevalê Doğan re gotibû, dema agahî nehat min jî vesaziya xwe bi xwe çêkir. Li ser vê yekê dubare pirsî, “ji wê agahiya min heye, hevalê Doğan hanek li gel te kiriye, ma te bi cidî girt?”. Min jî got, belê min bi cidî girt. Ji min re got, “tu li nexweşxaneyê hewce yî”. Piştre berê xwe da hevalan û got, “êdi çûne mewziyan qedexe ye, Remziye tu jî di nav de yî. Hevalên sivîl ên li

nexweşxaneyê dimînin dê neçin mewziyan". Ez ji xwe re wisa fikirîm berê min dikarî biçim mewziyan, xuya ye mewzî bi êrişeke zêde zêde re bû bi rû ne, hevalê Çiyager ji ber wê yekê mewzî qedexe kiriye.

Deriye nexweşxaneyê vebû, hevalê Rêber bi Afad re ketin hindur. Ez, hevalê Doğan, Remziye, kekê Cengîz ber bi Afad ve beziyan. Me di cih de bire odeya destwerdanê. Me li wê dere kêfyeya wî ji sukra wî derxist. Ji guhê wî xwîn dihat. Ji bo em birînê bibînin. Me xwîn paqij kir. Gule di ber guhê wî re ketibû hindur, di paş guh re derketibû û ketibû sukra wî, dema di patikê re derketibû, milê wî qut kiribû. Guleyekê çar cihên laşê wî kun kiribû lê zerereke mezin nedayibû laşê wî. Dema me birîn paqij dikir hevalê Doğan got, "lepikan bixin dêstên xwe da ku mîqrop nestîne". Me ji kelecanê xistena destê xwe ya lepikan ji bîr kiribû. Di cih de me lepik xistin destên xwe. Min dîsa derziyên tevizandinê amade kir û lê da. Remziye jî birîn dirûtin, me piştre birîn pêçandin. Afad hewl dide mayinê biteqîne mayin nateqe, dema dibîne qablo qut bûye dijmin gule direşîne ser wî. Bi vê rewşa xwe ya birîndar ji qatê duyemîn jî dikeve lê dîsa jî dikarê xwe xelas bike. Çi hevalekî saxlem bûye? Tevî ku lewaz bû, li ser piyan tedawî dît, lê nedikarî sukra xwe bizivirîne. Me Afad girt û bire gel Nûda wan. Em hemû rûniştin.

Radyoyeke hevala Nûda hebû, nûçe guhdar dikirin. Hevalên jin pir bi rêkûpêk bûn, pir jî paqij bûn. Di wî şerî de jî serê xwe dişustin, timî cil û bergên xwe paqij radigirtin. Di radyoyê de digot, "Sûr dê bê dayin 'TOKİ'yê". Hevalê Afad bi wê rewşa xwe ya nexweş digot, "eger 'TOKİ' bikeve Sûrê ez ê mayin bixim binî û biteqînim. Nikarin li ser xwîn û qîmetên me xwe bidin jiyan kirin, em ê qebûl nekin". Min di dilê xwe de heq dida wî. Rabûm ser xwe, min got ez ê biçim malê. Rêber jî tevî min rabû. Em ji malê derketin. Rêber li jêr ji min re got, "ji Fatmayê re bêje bila ji Afad re meftûneya kundiran çêbike. Afad ji wê xwarinê pir hez dike". Rêber çû mewziya xwe û ez

jî hatim malê. Ji Fatmayê re min got, meftûne çêbike. Got ku wê li malekê kundir dîtiye û Umît girte rex xwe û çû. Kundir anîn. Wê şevê Fatma meftûne çêkir û ji hevalê Afad re bir. Dema gotiye ku Rêber daye çêkirin, pir kêfa wî hatiye. Fatma hate malê, got, “min malek dîtiye û hewşa wê jî heye, em ê sibeyê derbasî wê malê bibin. Botan êdî bi temamî dest pê kiribû baş bibe. Min jê re got, “Botan êdî tu sax bûyî, dikarî biçî mewziyê. Botan dest pê kir bigirî û bêje “ax zikemin, of zikê min”. Pir tirsiyabû. Ji ber ku pir ditirsiya, nedixwest biçe mewziyê. Me xwarina xwe xwar. Min û Umît me benikek girt û me dest pê kir bi pişikê bileyizin. Ez jî fêrî diziyê bibûm. Cihê ku ez diçûmê, eger min şîr bidîta, min dixwest û distend, hin caran jî min didizî. Min dianî û dida pişikê. Îşev kêf kêfa Fatmayê bû. Got “ez ê fireqan bişom”. Dema wê fireq dişustin min bûyera Şendayê ji Umît re got. Wî jî got, “divê ev bûyer neyê vegotin, neyê bihîstin, bila heval xemgîn nebin”. Min jî got, jixwe dê neyê bihîstin. Piştre Fatma kete hindur û got, fireq qediyan, tu jî çay çêbike”. Min jê re got, ez û tu, em pir li hev çûn, dema ji vê derê derketim ez ê awûqatekî/ê bigirim û te berdim. Got, “bî keçê mêjî reşê, ev çi gotin e”. Ez keniyam û çûm tupê biçûk anî odeyê, çaydan danî ser. Dema av keliya min çay dem kir. Piştî ku me çayên xwe vexwarin me nivîn raxistin û razan.

Çawa em sibeyê rabûn destpêkê me qehweyek çekir û vexwar. Piştre em çûn li wê malê mêze bikin. Mal li kolana pêşberê avahiya ku Nûda ew rûdiniştin, li aliyê rastê, ne mala destpêkê, mala duyemîn bû. Deriyê malê girtî bû. Dubare zivirîm malê. Fatma ji bo banî Bedrî bike, çû. Bedrî dê derî bişkênanda. Remziyeyê banî min kir û got, “em ê biçin Şendayê”. Piştî ku em çûn nexweşxaneyê û me malzemeyên hewce dike girtin, em çûn rex Şendayê. Me binê wê paqij kir. Hê jî êşên Şenda pir bûn. Ji ber ku nedikarî jêra pişta xwe bide tevger kirin. Piştre min berê xwe da Remziyeyê û min got, em ê îro derbasî maleke din bin. Nûda jî got, “ji bo we baş dibe, ew

mal diweşe, êdî ji bo we xeter e. Ez jî rabûm hatim malê. Min cil û bergên me û tiştê xwarinê, dermanên Botan komî ser hev kir. Umît jî bataniye girtin. Min destpêkê pişik û cilên me girtin. Sê selikên cilan hebûn. Dema ji malê derketim, zivirîm aliyê çepê, li aliyê hemberê, mala duyemîn bû.

Ji deriyê derve ketim hewşeke mezin. Hewş çar goşe bû. Li hewşê cihê daran hebû. Komir, dar, qarton û gelek tiştên bên pêxistin hebûn. Li aliyê çepê yê hewşê, li beramber deriyekî hesin ê bi cam hebû, lê camên wê hatibûn şikênandin. Dema mirov ji derî biketa hindur saloneke navberê, li aliyê rastê tuwalet, li beramberê wê hemameke biçûk hebû. Tam li hemberê salonê mitfeqek hebû. Li aliyê rastê saloneke biçûk, li hemberê wê derê odeyeke biçûk hebû. Baş bû. Herî kêm daketin û hilkiştina derincokê tine bû. Em derbasî odeyeke mezin bûn, li odeyê pencereyeke li hewşê dinêre, di binê pencereyê de kanepeyeke, li rex wê sêpaya telewziyonê, tam li hembera wê dîsa kanepeyek hebû. Li aliyê çepê li cihekî nêzîkî derî sobeyeke komirê hebû. Herî kêm dê derdê me yê sobeyê nebûya. Li ber dîwarê çepê, li erdê sê mînder hebûn. Min tiştên ji dest xwe berdan û dest pê kir malê paqij bikim. Min mînder sererast kirin, tiştên zêde komî ser hev kirin. Tiştê min kom kiribû, ji bo şewtandinê min danî ber derî. Piştre derbasî mitfeqê bûm. Fireqên kif girtî û mencel hebûn, min hemû xistin kîsekî û avêtin xirbeyekî li hemberê malê. Li odeya biçûk kîlîm hebûn. Min li solona navberê û mitfaqê kîlîm raxistin, lê av nediherikî. Tiştên min kom kiribûn min avêtin sobayê, mencel danî ser sobayê û hinek ava min li hemamê dîtibû xiste mencelê. Di ve navbera de Fatma, Umît Botan  jî tiştên mayibûn anîn. Di vê navbera de hem ode û hem jî av germ bû. Min ava germbûyî girt û bir rijand ser boriyên li hewşê. Ji sir û seqamê borî cemidîbûn. Dema ava di nav boriyande heliya, min xortima li hewşê girt bi boriyê ve kir, borî ji cama şikestî kişand tuwaletê. Me qet av qut nedikir. Eger me bigirtana wê dîsa bicemidiya. Êdî di nav malê de ava me jî hebû.

Li vê malê erzaq hebûn. Xuya bû ji mêjve hatibû terikandin. Me li malê hinekê titûn jî dîtibû. Ev titûn ji bo me weke derman hat. Ji ber ku êdî hêdî hêdî tinebûna cixareyê xwe dida hîskirin. Wê rojê neçûm nexweşxaneyê. Seranserê rojê bi malê re eleqadar bûm. Dema min dest bi karekî dikir diviyabû min biqedanda. Ya din ji cihên nerêkûpêk nerehet dibûm. Diviyabû cihê ez lê, rêk û pêk bûya; nexwe nerehet dibûm. Di nava vî şerî de jî min ev taytmendiya xwe didomand.

Êvarê, li dêvla ku em xwarinê çêbikin, me taşte xwar. Umît saza xwe jî anîbû. Digot, “heval dê elektrîkê bikişînin”. Lê dê ji ku derê bikişandana? Li Sûrê li ti derê elektîk tine bû, tiştekî wisa pir baş dibû. Ji ber ku me nedikariya telefonê bi kar bînin, şarjên me tine bûn. Dayik û bav û xwîşka Umît nedizanin ew li Sûrê ye. Tenê xwîşka Umît ku li Eskişehîrê dixwîne û hevalê wî yê malê yê li Stenbolê dizanibûne.

Di ve navberê de hevalê Çiyager pêxistina agir li mewziyan qedexe kiribû. Dinya pir sar bû, berf jî dibariya. Min soz dabû keça Remziye ku sibê li cem wê bi berfê bileyizim. Birîndarên me hebûn, lê wendahiyên me kêm bûn. Lê dijmin pir wendahî dida. Dema heval dihatin gel hev, em kêfxweş bûn; em dikenîn, me hanek bi hev dikirin û ji hev hêz digirt. Te digo qey ev der cîhaneke cuda bû. Gelo kîjan devera cîhanê bû? Mirovên çendî xweşik û bedew hebûn, hevalên çendî xweşik hebûn. Her ku min li vê derê ew nas dikirin ji xwe re min digo, ez çendî bişens im. Qet min nexwest ew kêlî xelas be. Dibe ku ji adrenalînê re jî kêfa min dihat. Dibe ku min hewl dida îsbat bikim, kêrî tiştekî têm. Kîjan rast e, lê tenê tiştekî dizanim; dilê min rehet bû û kêfa min li şûnê bû.

Werhasil, Umît Saz xist destê xwe, dest pê kir lê bide. Fatma Strana ‘Cîran’ jê xwest, wî jî lê da. Êdî min nedigot, strana min lê bide, lê herî dawî lê dida. Di vê navbera de me qewhe çêkir û vexwar. Êdî dema razanê bû. Li ser kanepeyekê Botan, li ser kanepeyekê ez, li ser yekê Umît, Fatmayê jî li erdê nivînek raxist û em razan.

Sibê dengê lêdana derî hat. Bedrî banî Fatmayê dikir. Fatma rabû. Bedrî jê re got, “her kes wê du legen hevîr bike”. Hevîrê dihate stran hevalan dibir firinê, bi xwe dipahtin. Piştre ew nan li ser mewziyan, li nexweşxaneyê û li ser me û li ser Remziye wan belav dikirin. Ez jî rabûm, min qehweyek çêkir û vexwar. Min Botan şiyar kir, jê re got, îro biçe mewziyan li mewziyan bigere, hinekê sohbet bike, tê vebî. Ji ber ku diviyabû me hêdî hêdî tirsa Botan bişkênanda û ev jî bi çûna cem hevalan dibû. Piştî ku Botan ji min re got, “temam”, ez ji malê derketim û çûm gel Remziye wan. Min ji keça Remziye Şevîn û kurê kekê Cengîz, Talat re got, cil û bergên stûr bixin ber xwe, xwe baş bijdînin em ê bi berfê bileyizin . Zarokan xwe baş şidandin û hatin. Di vê navbera de Mezlûm (DİHA) jî hatibû. Wî jî dema zarokan bi berfê dileystin, fotoxrafên wan kêşandin, dê bişanda ji DİHA’yê re. Şarja Mezlûm qet xelas nedibû. Ji ber ku li gel hevalê Doğan digeriya û li rex wan jî jenarator hebû, dikariya telefona xwe şarj bike. Hin caran vedikir, nûçe temaşe dikirin. Mezlûm ji ber çapemeniyê li Sûrê bû. Umît jî weke çapemeniya Dem-Gençê hatibû, lê Mezlûm li gel Umît qet parve nedikir. Şarja Umît jî tine bû. Digot, “êdî ez ê eleqadar bi çapemeniyê re ti tiştî nekim”.

Min hinekê li cem zarokan bi berfê leyist, paşê derbasî nexweşxaneyê bûm. Dema li malê bûm hevalêkî birîndar anîbûn. Hevalekî bejndirêj û girs bû. Navê wî Kemal bû, nasnavê wî Welat bû. Ji Xinisa Erzeromê bû. Qadroyê HPG’ê bû, sê sal bûn ku gerîla ye. Gule li pişta Kemal ketibû. Kekê Cengîz destwerdana wî ya destpêkê kiribû, pişta wî girêdayî bû. Kemal digot, “nikarim nefesê bistînim, bêhna min diçike”. Gule ji piştê derneketibû û di laşê wî de mayibû. Timî xwîn vedireşiya. Ketim bin çengê wî. Min ew derxist hewşê. Me li hewşê hêdî hêdî çend tur avêtin. Piştre min Kemal bir heya bi deriyê tuwaletê. Dema derket, ketim bin çengê wî, bir ser nivînê. Ji bo ku dema vedireşe ne bi erdê de bi legenê ve vereşe, min legeneke biçûk danî rex wî.

Paşê Remziye hat. Me amadekariya xwe kir û em çûn Şendayê. Piştî ku me paqijiya Şenda kir, em hatin nexweşxaneyê. Remziye got, “heval dê elektrîkê bînin nexweşxaneyê. Min got, çawa? Bersiv da, “ji mala nêzîkî dijmin. Hevalan dê li ser wê malê sizme bikira û qeblo girêdana û bi awayê li ser hevgirêdanê, heya bi nexweşxaneyê bianiyana. Hevalan li malan li prîzên sê fîş lê swar dibin û qeblo digeriyan. Me jî herî kêm 200 metroya dîtiye da hevalan. Dê bi hev ve girêdana. Hevalê Doğan hat, ji Bedrî û me re got, “ji bilî we dê ti kes telefon şarj neke”. Li ser axafitina xwe zêde kir, hevalên li mewziyan dê telefon bi kar neynin. Bi piraniya hevalên herêmî telefonên wan hebûn. Hin caran li gel malbatên xwe diaxifiyan, êdî ew qedexe bû. Dîsa, rêveberiyê ji her 15 rojan carekê vesazî çêdikir. Cihê hevalan dihate guherîn. Her roj di navbera 5-6’an de tekmîlên xwe digirtin. Di nava vî şerê giran de jî rêkûpêkî û disiplîna xwe ji dest bernedidan.

Hevala Nûda û Zozan baş bûyibûn. Li ser mewziya xweser bomberdimaneke giran a tangan hebû. Cihê mewziya hevalan hatibû guherîn. Hevalên jin dê li mewziya Mînareya Bi Çar Lingan mêze bikirana. Cihê herî saxlem ew der bû. Hevalên xort derbasî mewziya xweser bibûn. Hevala Dîcle-Adar jî dê li mewziya Sûka Mast (Yoğurt Pazarı) mêze bikira. Hevala Dîcle-Adar hevaleke pir xweşik a jin bû. Min ew berê li Şehîdgeha Pirejman dîtibû. Te digo , qey ev heval hemû hatine bijartin. Yên herî xweşik û bedew, yên herî biaqil, yên herî baş hemû tevlî gerîla bibûn.

Dîcle-Adar, kurê xalê min nas dikir. Ew jî di çalakiya qereqolê Başnik (Başnık) de tevî çar hevalên xwe şehîd bibû. Nasnavê wî Amed Serxwebûn bû. Hevala Adar-Dîcle diyalogên xwe yên bi wî re vedigotin. Hevalê Afad jî kurê xalê min nas dikir. Navê wî yê malê Bayram bû. Afad ji wî re Bayroyê Ereb digot. Di înternetê de dîmeneke wî hebû, li wê derê tevî hevalên gerîla leyistoka Aware dileyistin. Di vê navbera de hevalan dest pê kir qebloyê bikişînin nexweşxaneyê

û piştî 10 deqîqe li nexweşxaneyê elektirîk hebû. Ya star, ronahî çi xweş bû. Hema bêje nêzîkî du mehan min wisa ronahî nedîtibû. Êdî her tişt safî û zelal bû. Êdî min dikarî telefona xwe şarj bikin, li nûçeyan binêrim. Hevalê Rêber ket hindûr. Zendê xwe digirt. Dema min jê pirsî ku çi li zendê wî hatiye, got, “di zendê min de platîn heye, dema ji bombeavêjê direvîm, li erdê ketim, diêşe”. Pir êş dikişand. Remziye hevîr kir û da ser zendê wî û pêçand. Piştî ku wisa kir jî xuya bû pir êşê dikişîne.

Remziye ji min re pirsî, “te Bahoz, Merwan û Şoreş dît? Min jî got, doh li gel me bûn, lê min îro nedît. Got, “reviyane”! Pir xemgîn bûm. Ji ber ku min ji Şoreş re digot, kurê min. Ez, Remziye û hevalê Rêber çûn mala Emîneyê, em pir birçî bibûn. Emîne hin tiştên ji bo taşte amade kir, me xwar. Min ji hevalê Rêber re got, tu pir pişika min ecz dikî, li wê didî, ji ber wê yekê wisa li zendê te hat. Wisa bersiva min da, “ma çi eleqaya wê heye?”. Min jî hanekên xwe pê kirin û got, pişik nifir dikin ji ber wê yekê. Ji wê rojê şûn de hevalê Rêber destê xwe neda pişika min. Paşê rabûm hatim mal.

Umît çûbû mewziya Sûka Mast (Yoğur Pazarı). Tevî Çekdarê Mezin nobed digirt. Ew jî bi derengiya şevê hate mal. Botan jî li mewziyan geriyabû. Ketibû yek-du malan û ji xwe re pêlav, pênûsên rengîn û pêleyistok anîbû. Min ji Botan wisa pirsi, temam min pêlav fêm kir, pêwîstiya te pê heye, lê ew boyax, ew pêleyistok ji çi re ne? Dema wî jî wisa gotibû, “malbata me pir feqîr e, qet pêleyistokên xwîşk û birayên min tine, ya din jî ji ber pênûsên rengîn mamoste pir bi xwîşk û birayê min de xwe ecz kiribû, ji ber wê yekê ez ê van ji xwîşkên/birayên xwe re bibim”, agir bi kezaba min ketibû. Tiştek hat di qirika min de venîşt, ji bo negirîm min bi zehmetî xwe digirt.

Umît hate mal. Got ku ew di mewziyê de pir kêfxweş bûye, hin heval pir komîk bûne. Îro jî qediyabû, lê dijmin qet nedisekiniya, bi şevê qet nedisekiniya. Em ewqas fêr bibûn, êdî dengê çek û topan weke dengê mûzîkê ji me re dihat. Botan

got, “ez ê sibeyê biçim mewzıyê. Piştre me nivînên xwe raxistin û em razan. Sibeyê Botan û Umît çûn mewziyê û ez jî çûm nexweşxaneyê. Fatmayê dê hevîr bistra. Ji ber ku îro roja nançêkirina hevalan bû. Dema ez çûm, kekê Cengîz jî ji bo razanê çû mal; ji ber ku ji êvarê de nobedar bû. Di vê navbera de hevalê Afad jî binê hevalê Şervan diguhert. Xêyrî jî êdî dest pê kiribû biçe mewziyê. Rêber hat, got, “hê jî pir dieşe”. Min zendê wî vêkir, hevîr zuwa bibû û bi pirça wî ve mayibû. Dema min derdixist destê wî diêşiya, min ji Bedrî re got, ava germ bîne. Bedrî di mîsînekî de ava germ anî. Min hinek ava sar xist di nav de û şîregerm kir, min li hevîrê li ser zendê wî dikir ku nerm bibe û bêyî ku biêşîne derkeve. Nêzîkî nîv saet pê re mijul bûm û min derxist. Remziye cils (alçı) amade kir, me li zendê wî pêçand. Piştre çû mewziyê.

Hevalê Cemal daxuyanî dabû. Min pir meraq dikir. Gelo ji bo Sûrê çi gotibû. Li nexweşxaneyê telefon bikaranîn qedexe bû, lê min vekir û li twîterê nêrî. Oxweş!, hevalê Cemal çi xweş axifîbû. Welatparêzên dixebitîn rexne dikir. Yên li Ewrûpayê rexne dikir, digot ku dê tola gel bê stendin; dê Sûr nekeve. Axaftineke çi xweş bû. Çûm cem hevalê Çiyager. Li gel Nûda wan bû. Min ji hevalê Çiyager re got, hevalê Cemal pir xweş axifiye, eger em wê axaftinê binivîsin, li hemû mewziyan bixwînin ji bo hevalan dibe moraleke mezin. Wî jî got, “temam, temam binivîse û bîne, ez ê li mewziyan bidim xwendin. Ez çûm mal, min telefon vekir. Ne hemû jî be, min cihên girîng ên nivîsa hevalê Cemal nivîsand. Bir gel hevalê Çiyager û dayê. Destpêkê bi xwe xwend piştre, hevala Nûda xwend, paşê dan Zagros û Dewrîm (xort). Hevalê Dewrîm ji Rojhilat bû. Nasnavê wî yê li qadê Raman bû. Heval Dewrîm, kaxiz qulupand, pişre careke din qulupand, ji nişka ve Zagros jê stend got, “ka xwendina te tine bû” û dest bi xwendinê kir. Tebî hemû heval tevde keniyan.

Ez rabûm çûm nexweşxaneyê. Pir xwîn ji lingê Penaber dihat. Kekê Cengîz tampon li lingê wî girêdida. Min pirsî, çima

xwîn jê tê? Got, “yan demar qut bûye yan jî dibe ku hê kevir di hindur de be. Piştî kêliyekê xwîn sekinî. Kekê Cengîz dubare lingê wî pêçand, bir ser nivîna wî. Ji bo tuwaletê, kekê Cengîz pet şîşeyek dayê û got, “dikarî bi vî de bikî”. Êvarê, hevalê Rêber tevî hevalekî hate mala me. Got, “em hatine qehwe vexwun. Ev heval, hevalekî bejndirêj û lihevhatî bû. Navê wî Çinar bû. Gerîlayê HPG’ê bû. Sabotor bû. Min nedizanî sabotaj çi ye. Hevalê Çinar zêde nediaxifî, dema pirs dihatin kirin, bersivên kurt û zelal dida. Piştî qehweyên xwe vexwerin çûn mewziyan. Min ji Umît pirsî, sabotor çi ye? Wî jî got, “kesê mayin çedike”. Dema min dubare pirsî ku çawa tê çêkirin, wî got, “nizanim”.

Şev biderengî, min û Umît, me li twîterê mêze dikir. Dest pê kir rûye me bikene. Li ser qaraqola bazarê çalakî hatibû lidarxistin û qereqol bi erdê re bibû yek. Me dîmenên wê dîtin, em pir kêfxweş bûn. Paşê me li şîroveyan nêrî. Li binê wêneyê hevalê Cemal, dinivîsand, “tu dizanî, dema dibejim dikim”. Yeke/î din jî digot, li her derê gerîla diqerise, qereqolan pê dixe. Ji ber ku gerîla li gelek cihan çalakiyên hemwext li dar xistibû. Min jî di cih de şîrove nivîsand; li Sûrê govend tê kişandin. Em wê şevê ji kêf û şabûnan qet nerazabûn.

Sibê zû çûm ji hevalê Çiyager re min hemû vegot. Hemû pir kêfxweş bûn. Bi rastî jî bûyereke pir kêfxweşiyê bû, morala me bilind bibû. Mirov dikare bêje em bi ser xwe ve hatibûn. Êdî me dizanî dê li derve Gerîla çi bike. Dema em dihatin cem hev, em li ser çalakiyan diaxifîn, em kêfxweş dibûn heval hê zêde bi mewziyên xwe ve dihatin girêdan. Lê li gel vî dijminî exlaq tine bû. Mal hildiweşandin, hewl dida wisa bi pêş de be. Lê tiştekî ku dijmin ji bîr dikir hebû, li pêşberê wî gerîlayên bawerî û îradeya wan mezin hêbûn. Bi tiştên nexuya ve şer dikir.

Nexweşxane jî zêde zêde dihate bombardimkirin. Mala hevala Nûda wan û ya me jî dihate bombekirin. Ji ber ku dijmin bi tangan li avahiyên bilind dida. Bêyî ku bisekine du yan jî sê

rojan, li qatên jor ên avahiyan dida, piştî ku qatê jor hidilweşand qada xwe ya dîtinê firehtir dikir. Vaye, dema qatê jor ê avahiyên nêzî me hildiweşiya jî, ji Clas Otêlê em rehetir didîtîn. Bi çekên bombeavêj û doçqeyê lê didan. Êdî herêma ma bi xetere bibû. Heval Doğan ji Remziye re gotibû, "ji bo nexweşxaneyê cihekî peyda bikin". Min jî ji Remziye pirsî û got, em ji bo nexweşxaneyê li ku derê cihekî peyda bikin? Got, li nêzîkî mewziya Harûn li cihêkî, jixwe dê piştî kêliyekê bê, em ê biçin". Min jî got, "tu û kekê Cengîz biçin, ez ê li nexweşxaneyê bimînim. Di vê navberê de hevalekî nave wî Serhed birîndar bibû. Hevalan anî. Serhed qadro bû, ji Komalên Ciwan bû. Hevalekî bejnkurt û paqij bû. Ji Ferqînê bû û ji Grûba ferqînê bû. Gule li tenişta wî ketibû û ji singa wî derketibû. Li tenişta wî kuneke mezin hebû û xwîn jê dihat. Zerer dida kezeba wî. Me hewl dida em xwînê bidin sekinandin, nedisekinî û xwîn hewce bû. Dema me jê pirsî grûba wî ya xwînê dizane yan na, got, "dizanim". Hevalê Doğan got, "xwîna min jê re dibe". Me ji hevalê Doğan xwîn girt û da Serhed. Me xwîn jî dabû sekinandin. Me birîna wî pêçand, bir ser nivînê. Ji ber vê yekê karê peydakirina nexweşxaneya nû jî, ji sibeyê re ma. Ji ber ku hê nexweşekî me yê din ê hewce bû em lê mêze bikin hebû.

Êdi dema em diçûn mal li aliyê pencere hebû em rûnediniştin. Dibe ku di cih de bombe, kevir yan jî parçeyên camê biketa hindur. Cihê em rudiniştin jî bi xetere bibû. Heval Doğan, Remziye û kekê Cengîz çûn ji bo nexweşxaneyê cih peyda bikin. Di vê navbera de dengên ambûlansan nedisekinîn. Miriyên, polîs, tîmên taybet û leşkeran dibir. Li aliyê Deriyê Mêrdînê (Mardîn Kapı) hevalan mayin teqandibûn. Pir wendahiyên dijmin hebûn. Heya bi êvarê dengê ambûlansan qut nebû. Hevalan digot ku nêzîkê 50 kuştiyên dijmin hene, lê radyo digot 2 yan jî 3...

Remziye hat û got, "me ji bo nexweşxaneyê cihek peyda kiriye, ez û tu bi hev re biçin, em lê binêrin û hûn jî bo xwe

cihekî peyda bikin, lê bila nêzîkî nexweşxaneyê be. Em bi Remziye re çûn. Aliyê hemberê yê Mizgefta Hasirliyê (Hasırlı Camî). Avahiyeke çar qat a li ser sê daîreyan bû. Em ji deriyê destpêkê yê li aliyê rastê ketin hindur, tam li hemberê tuwalet hebû, li aliyê rastê odeyek, li keleka odeyê mitfeqek û li rexê mitfeqê hê odeyeke din û saloneke fireh a navberê hebû. Xwediyê malê, mal vala kiribû. Tenê sarincokek (buzdolabı) hebû. Ew jî elektrîk tinebû. Li odeyê karyoleyeke zarokan, li erdê kîlîmek û telewziyonek hebû. Di vê navberê de bi tangê li wê mala ku me elektrîk kişandibûyê jî dayibû. Êdî elektrîka nexweşxweneyê jî tine bû. Min û Remziye , me got gelek karê bê kirin heye. Ya din jî diviyabû em mala li kelekê jî ji bo Şenda amade bikin. Dê me du mal di yek carê de paqij bikirana. Ti kesî din ê ku bike tine bû. Min û Remziye tiştê kêr nedihat me avêt ji derve. Paqijiya malê heya bi êvare berdewam kir. Me dê piştre jî li du odeyan jî sobe daniya û hemû hevalên nexweş li rex hev li van odeyan bi cih bikirana.

Em çûn nexweşxaneya din. Êrîş birîndar bibû, ew anîn. Hevalekî bejn dirêj û girs bû. Gule li lingê wî ketibû û derketibû. Êrîş şervanekî herêmî bû û ji Ferqînê bû. Ew jî ji grûba ferqînê bû. Kekê Cengîz tedawiya wî kiribû, bi cih kiribû. Di vê navbera de hevalê Rêber û hevalê Elî ketin hindur. Got, “hevalê Elî derb girtiye”. Gule li milê wî ketibû. Min di cih de derziya tevizandinê lê da. Remziye jî dirût. Kekê Cengîz hewl dida serumê lê girêbide, hevalê Elî nedihişt, ecz dibû; digot, pir kêm seruma me maye, serum nedin min”. Piştî hewldanên mezin ew îqna kir ku serum bidinê. Me hevalê Elî bir gel Şendayê. Piştre min, Umît û Remziye me dest pê kir nexweşxaneyê komî ser hev bikin. Min derman dixistin naylonên mezin ên çopê. Min, Umît, Remziye, me her yek bi poşetekî encax heya bi saet sêyan nexweşxaneyê bibin cihê wê yê nû. Keke Cengîz nexweş dibirin. Piştî ku xebata guhertina cihê nexweşxaneyê xelas kir, kekê Cengîz got ku qatê yekemîn

ê teniṣta nexweşxaneyê ji me re peyda kiriye. Ez, hevalê Doğan, Fatma û Umît em çûn li malê binêrin.

Dema mirov diket malê saloneke navberê, li aliyê rastê odeyek, li odeyê desteya paldankan (koltuk) û camekan hebû. Hemû camên odeyê şikestî bûn. Li rex odeyê mitfeq, li rex mitfeqê odeyeke biçûk, di hindurê odeyê de ranzeyek, kanepeyek û ya din jî sêphaya telewziyone hebû. Di vê odeyê de pencereyeke biçûk ku li valahiya avahiyê dinêre hebû. Li aliyê çepê yê salona navberê jî tuwalet û hemam hebû. Tam li hemberê odeyeke nivîstinê ya mezin, di nav de cihê nivînan û taxima nivînan hebû. Di odeyê de deriyekî din hebû. Ew deriya bi cihekî biçûk ê ji bo daran ve vedibû. Ser wê vekirî bû. Me biryar da em li odeya biçûk bimînin. Hewce bû em sobeyê daynin. Ji ber ku dinya pir sar bû. Min got, Umît tu li ranzaya jor, Fatma li ranzaya jêr, ez jî li ser kanepeyê razêm; Fatma em tiştê xwe yê li mala din bînin, di vê odeyê de bi cih bikin. Ez çûm nexweşxaneyê. Me ji Bedrî  re got, sobeye dayne. Li her du odeyan jî me sobe danî. Li mala rex, li her du odeyên wê jî me sobe danî. Niha, dor hatibû ku em Şendayê bînin lê çawa? Her du lingên wê jî şikestîbûn, diviyabû me pir heses bianiya. Hevalê Çiyager ji Şef re got, darekî dirêj bîne”. Şef jî qepaxa dolabekê derxistibû, dirêj û hinekê jî fireh bû. Me jî etekek li ber Şendayê kir, ji ber ku lingên wê di cilsê (alçı) de bûn nedikariya ti tiştî li xwe bike. Heval Çiyager, bataniyeyek raxist, dar xiste nav, li ser wê bataniyeyeke din raxist û balgîfek danî aliyê ku serê Şenda bê wê derê. Piştre me Şenda bi awayekî heses danî wê darbestê. Me dest pê kir heşt kes Şendayê  rakin û bibin. ji bo Şendayê me qaryoleyeke yek kesî peyda kiribû, nîvenga wê qaryoleyê bi şiklekî gilover kun kiribû. Me nîvenga nivîna ku dê me danîba ser jî, me bi heman şiklî kun kiribû. Me Şenda anî û li ser ranzayê danî. Şenda pir qîr dida û digot, “diêşe, jan dide”. Me hevalên xurt ji odeyê derxistin, eteka li ser Şendayê derxist û weke ku ranê wê bê ser cihê me di nivînê de kun kiriye, me bi cih kir. Me paçên

nexweşan xistin binî. Êdî dema Şendayê bi bin xwe de bikira, me dê ji wê kuna gilover bikişanda û bixista legenê. Dê hinekê kêmtir êş bikişanda.

Jînda û Xezalê tiştên Şenda xistibûn çantayan û anîbûn. Xezal ji Stenbolê tevlî gerîla bibû. Pir dikeniya. Min digot, Xezal wê dest bi ken dikir. Şendayê ji Xezalê re got, “wê çeka min bide”. Xezal ji nav qilif, tabance derxist û da Şendayê. Şenda ew li ber serê xwe danî. Nûda jî tiştên xwe li odeya din bi cih kir.

Piştre em çûn nexweşxaneya li teniştê. Li odeyekê Qesab û Penaber hebûn. Îsmaîl û Berxwedan jî birîndar bibûn. Îsmail ji Mûşê bû, hevalekî bejndirêj û girs bû, ew qadro bû; parçe li lingê wî ketibû, di nav hestî de sekinî bû. Hevalê Berxwedan jî qadro bû; hevalekî bejndirêj û lewaz bû. Ew bi xwe ji Mûşê bû. Guleyek li lingê wî ketibû; me bi zehmetî xwîna ji paniya wî diherikiya dayibû sekinandin. Ji beriya vê Berxwedan bi şaşitî gule berdabû lingê xwe, me birîna wî pêçandibû û şandibû mewziyê. Niha, rewşa wî hê cidî bû, qederekê paniya wî vebûyibû. Tevî vê Berxwedan pir diaxifiya û hanekên xwe dikirin. Me Îsmaîl, Berxwedan û Kemal danî. Remziye û kekê Cengîz Li qatê jor rûdiniştin. Remziye jî Şervan û Serhed biribûn mala xwe, lê hê dermanên nexweşxaneyê nehatibûn bicihkirin.

Li mala kevn a Remziye jî Çinar mewzî girtibû. Li wê derê dê xebata sabotajê bimeşanda. Min ê çawa derman û dolab, bi cih bikirana? Elektirîk tine, mûm tine, tenê di destê me de fenerên biçûk hene. Min dolab li salona navberê de bi cih kirin. Maseyeke plastîk hebû. Min ew jî li wê salonê bi cih kir. Li ser wê, tiştên acîl ên weke, tendiroyot, paçê pêçana birînan, meqes, lasqeyê birînan, neşter danîn. Hem pir westiyabûm û hem pir birçî bibûm. Remziye û Umît jî weke min bûn. Ez û Umît, çûn malê. Fatma soba danîbû, boriya wê di pencereya biçûk re derxistibû. Ode bi roj jî tarî bû û hewce dikir mum bê pêxistin. Hevala Nûda ji Fatmayê re gotibû,

“xwarina nexweşan tê çêbikî, çi hewce bike tê ji Zozanê bixwazî, dê ji te re peyda bike. Ji ber, Zozan berpirsiyara lojîstîkê bû. Tevî malbata Jînda, Mezlûm (DİHA) nêzîkî nexweşxaneyê ji xwe re malek peyda kiribûn. Senîha Jî malek peyda kiribû. Dîsa, yek jî Cano hebû. Pênc zarokên wî hebûn. Wan jî malek ji xwe re dîtibûn. Cano li mewziya dêrê dima. Ew bi xwe Qereçî bû lê alîkariya hevalan dida. Hevalê Doğan û Elî li qatê jor ê avahiyeke du qat yê malek ku hinekê diket nav kolana biçûk a lihembera nexweşxaneyê bû, diman.

Werhasil çûm malê û piştî ku min xwarin xwar razam, lê pişik derketibû ser ranzaya jor, di hemêza  Umîd de razayibû. Ji nişka ve dengê derî hat. Bedrî banî min dikir; “hevala R... were nexweşxaneyê, birîndarek heye”. Çawa ji nav nivînê derketim û min şimika xwe xiste lingê xwe û bezîm nexweşxaneyê. Hevalê bi Rêber bi awayekî bi kelecan qîr dida û digot “zû, zû”. Derdor tarî bû, me hê bi xweşikî derman bi cih nekiribûn. Mehsûm Polat birîndar bibû. Me li ser darbesta salona navberê danî. Mehsûm Polat ji Rêber re digot, “aram be, tiştek tine”. Kekê Cengîz ji nişka ve bi ser Rêber de kire qîr, “ka tu ji vê derê derkeve”. Ji zendê wî pir xwîn diçû. Me hema di cih de qazaxê wî qut kir. Destê wî, hevalê Cahîd digirt. Cahîd hevalekî bejndirêj û lihevhatî bû. Ji Komalên Ciwan bû. Pir kamil bû, zêde nediaxifiya. Min derziya tevizandinê kişand enjektorê, lepik xistin destê xwe û fenera di destê Cahîd de jê stend, Remziye malzemeyên dirûtinê amade dikir. Kekê Cengîz li birînê mêze kir û got, “gule li enîşka wî ketibû, hestiye enîşka wî qut kiribû, piştre jî ji goştê pişta wî derketiye”. Min ji Cahîd re got, fenerê bigire û li min bigire, derziya tevizandinê li enîşkê bidim. Kekê Cengîz ji demarê derziyeke xwînê dide sekinandin kir. Piştre min fener girt, Remziye dest pê kir birînê bidûre. Piştî ku xelas kir Fatma hat, got, “ez ê Mehsûm Polat bibim malê û bi taybetî lê binêrim. Min jî Remziye jî me hinekê bertek nîşan da, lê guh neda me. Di vê navbera de hevalê Dewrîm (xort) hat. Hevalên nexweşxaneyê bertek nîşan dan û

gotin, “ma çima Mehsûm Polat layiqê xizmeta taybet e, em bêqîmet in?”. Hevalê Dewrîm, banî Rêber kir û got, “ev tevgera wê ne rast e, Mehsûm Polat bîne nexweşxaneyê. Rêber Mehsûm Polat anî nexweşxaneyê û me razand ser nivînê.

Di vê navbera de rewşa hevalê Kemal her diçe xerab dibû, zik diwerimî û req dibû. Pir êş dikişand, her xwîn vedireşiya. Çar serumên me yên 150 ml mabûn. Me yek jê da hevalê Kemal û ew bir danî odeyeke mala ku lê Şenda dima. Min qrem di zikê wî dayibû, baş mist dayibû. Li ser zendê wî bi deqandinê bi Tirkî nivîsandibû, “neden” û li ser destê wî jî, Kurdiya wê nivîsandibû. Min jî jê re got, hevalê Kemal ma te çi xweş daye deqandin, te li ku derê daye çêkirin? Ji min re got, “ez deqandinê dizanim, min nivîsand”. Min got, dema birîna te sax dibe li ser zendê min jî binivîse ‘Yan Mirin Yan Azadî’. Bi şiklê, “dema ez sax bûm ez ê ji te re binivîsim” bersiv da. Min jê pirsî ku ev çend sal bûne ew gerîla ye. Got, “sê sal”. Lê dema min jê pirsî ku ew ji ku derê ye, got, “ev pirseke rêxistinî ye ez ê bersiv nedim”. Min jî got, temam û min dawî li sohbetê anî.

Êdî hewce bû, biçim malê û îstirehet bikim. Çûm malê û razam. Sibeyê şiyar bûm û çûm nexweşxneyê. Min Bahoz, Jiyan û Şoreş dît, pir kêfa min hat û ji wan pirsî; ma hûn li ku bûn? Gotin, hevalê Elî vesaziya me li cihekî din çêkir, ji ber wê yekê em nikarin zêde bên û biçin. Rastiya mijarê wisa bûye; glî û gazincên van hevalan li ser sîstema nobedê û li ser hin hevalan hebûne, çûne gel hevalê Elî gilî û gazincên xwe kirine. Hevalê Elî jî vesaziya wan li cihekî din çêkiriye.

Di vê navbera de hevalê Çinar, hin caran rêya xwe bi cem me dixist û çay vedixwar. Umît jî dest pê kiribû êdî biçe gel wî. Mijara sabotajê fêr dibû. Min jê re gotibû, Umît, ez ê jî li rex te bêm, fêr bim. Wê jî gotibû, “were”. Lê hevalê Çinar ewqas bê deng bû, min gotibû dibe ku nerehet be û ez neçûbûm. Di vê navbera de hevalê Doğan û Elî ji deriyê nexweşxaneyê ketibûn hindur. Li rex wan Andoqê Biçûk hebû, birîndar bibû, ew anîbûn. Andoq hevalekî bejnkurt û lewaz bû. Ji ferqînê bû. Ne

şaş bim qadro bû. Gule di singa wî re ketibû hindur û di pişta wî re derketibû, nedikariya nefesê bistîne. Min jî bi destekî xwe fener û bi destê xwe yê din jî seruma me lê girêdayibû digirt. Kekê Cengîz û Remziye tedawiya wî dikirin. Dema qediya me ew bir odeyê, razand ser nivînê.

Nexwşên me zêde dibûn, tevî ku em nû bi cih bibûn li ser kolana nexweşxaneyê bomberdimaneke zêde zêde hebû. Dema em derdiketin kolanê, em bi dîqet tevdigeriyan. Gava bombe dihatin avêtin tenê yek nediavêtin, li ser hev herî kêm 50 lib diavêtin heman cihî. Diviyabû ji ber wê yekê em hê baldar û hişyar bûna.

Dema em çûbûn destpêkê kolanên Sûrê tije pişik bûn, lê niha em kitomito rastî wan dihatin. Dijmin pişik jî dikuştin. Erd tije miriyên pişikan bû. Hevalê Çiyager, Doğan û Elî banî min kirin û gotin ku doxtoreke/î nas dikim heye yan na. Dema min got, heye, ji min re gotin; “lê bigere, rewşa hevalê Kemal pê bide fêmkirin, rewşa me jî bêje û bipirse ku dikarin çi bikin û çawa dikarin tedawî bikin. Hevaleke min a ku bi malbatî me hev nas dikir hebû: Pinar, hevserê wê doxtor bû, tenê min dikarî li wî bigerim. Lê min nedikarî di telefonê de bêjim, Kemal birîndar bûye. Baş e min ê bigota çi? Min ê bigota, ez birîndar bûme. Min telefon vekir, lê gerîm û min jê re got, doxtor guleyek li pişta min ket, zikê min diwerime, nikarim nefes bistînim û timî xwînê vedireşim. Wî jî got, “rewşa te pir qritîk e, di hinava te de cihekî te, xwîn jê diçe, divê di 24’saetan de ameliyat bibî, nexwe tê bimirî”. Min dubare jê pirsî, hewce dike ez niha çi bikim. Piştî ku doxtor got, “qet tiştên rohn venexwe, timî bila serum bi te ve girêdayî be û divê di cih de ji Sûrê derkevî”, min jê re got, divê tu qet ji Pinar û hevalên navçeyê re ti tiştî nebêjî. Û min telefon girt.

Hatim gel hevalê Çiyager û tiştê doxtor ji min re gotiye, jê re got. Min got, eger hevalê Kemal ameliyat nebe dê di 24 saetan de şehîd bikeve. Hevalê Çiyager got, ma ti rêyên din tine?”. Min got, tine ye. Gotin, “temam” û çûn. Di vê navbera

de tang qet nedisekinîn. Hin mewzî 2 yan jî 3 mal paşve kişiyabûn. Lê dîsa jî hevalan berxwedaneke mezin nîşan didan. Sîstemê zêde xwe diwerimand û_digot, “me li Sûrê 279 terorîst kuştin” û wisa di çapemeniya xwe de propagande dikir. Bi temamî berevajiya wê rast bû. Bêyî zêdekirinê di 100 rojan de dijmin nêzîkî 550-600 wendahî dayibû. Li Sûrê bi qasî li ti derê nedayibû, dijmin wendahî dayibûn. Bawer dikir ku li Sûrê bi sedan gerîla hene, lê xwe dixapand. Li hemberê wî, îradeyeke bihêz û têkoşîneke bihêz hebû. Dibe ku kêmasiyên me zêde bûn, lê me hewl dida kêmasiyên hene jî bi awayekî din temam bikin. Min dixwest her kesê ji xwe re dibêje “ez şoreşger im” yan jî “ez kurd im” ev têkoşîn bidîta.

Em li malê razayibûn, saet du yan jî sêyê şevê bû, ji nişka ve dengê lêdana derî hat. Bedrî, qîr dida û digot, “Hevala Remziye ”. Min got çi ye, çi qewimî? Got, “were, yek qîr dide û dibêje, ez Metîn im. Dibêje ku ew hevserê te ye. Ka were carekê lê binêre kî ye ev, tu nas dikî yan na? Tevî Bedrî derketim ber derî, qîr dike û dibêje, “ez Metîn, ez Metîn, hevserê R. me, R. birîndar e”. Min got, rast e ev hevserê min e. Min deng lê kir û got, Metîn ez li vê dere me. Tebî derûdor tarî ye, min got, ber bi vê derê ve were. Min mêze kir, hevserê min û li cem wî zilamekî bejn dirêj, di destê wan de darbesteke ji paç. Dema pirsî û got “ma tu birîndar î?”, min got na hevalekî gerîla birîndar e. Ji min re got, “em biçin”. Ez difikirîm ku dê min bibe, lingên min direcifîn. Min ê cara yekemîn rêz nîşanî xwe bida û sekneke serbilind nîşan bida û min got, ez nayêm. Bawer im ez li Sûrê fêrî sekna serbilind jî bibûm, edî min stuyê xwe xwar nedikir. Xuya bû ku ya min timî xwestiye bikim ev bûye. Di maneyekê de min qeyd û bendên xwe dişkênandin û min gava destpêkê avêtibû. Hesteke çiqas xweş bû. Hevserê min got, “dê çi li rewşa me bê, em ê çi bikin? Min wisa bersivand; “dema qedexe rabû ez ê derkevim”. Tebî min xwe li hevserê xwe jî aland. Dema hevserê min got, “zarok şeperze bûne, dema bihîstin hemûyan dest bi girî kirin”, min ti bersiv

neda. Gelo ev tiştekî çawa bû? Psîkolojiyeke çawa bû? Gelo ez bibûm keseke bêrehm, keseke bêruh, min hestên xwe wenda kiribû? Tenê tiştê ku ez dihizirîm hevalên li Sûrê bûn. Hevserê min got, “lê, ez ê ji polîsan re bêjim çi?”. Piştî ku min jê re got, bêje ez lêgerîm min nedît, tevî ew kesê pê re hatibû çûn.

Çawa ku me li Sûrê dîrok dinivîsand, min di jiyana xwe de jî dîrok dinivîsand û ne poşman bûm. Piştî ku ew çûn Bedrî ji min re got, “hevala Nûda banî te dike”. Çûm cem hevala Nûda. Ji min rewş pirsî û got, “hevserê te hatiye, ma rast e, çawa hatiye?”. Min bi vî awayî ew bersivand; wekîlan ji bo min gotine ku ew birîndar e û ji walî destûr girtine. Dubare pirsî û got, “ma hevalên me nedîtine?”. Min got, na. Li ser zêde kir; “xwaziya te agahî dabûya me, dibe ku me tiştek bigota, agahî bişanda derve”. Heqê wê hebû, lê ez jî mafdar bûm. Min gotibû, bila hevserê min zûka bi şûn ve vegere, ji bo birina min bila israr neke. Ji ber vê yekê ketibûm kêmasiyê, Min agahî nedayibû hevalan. Min kêmasiya xwe piştre ferq kiribû. Çima nabêjî, piştî ku ez li doxtor geriyabûm, ew jî li navçeyê geriyabû, gotibû “R. giran birîndar e” û navçeyê jî ev agahî dabû, sosyal medyayê. Telewziyon û radyoyan kiribû nûçe. Dema zarokên min bihistibûn perîşan bibûn, hevserê min jî di navê de. Paşê, Sîbel, hevserê min û zarokên min çûbûn ji walî destûr girtibûn. Bi vî awayî hevserê min karibû bikeve Sûrê. Bûyer ev bû. Min dizanî heval dê xwe bi min de ecz bikin. Ev pirsgirêkeke mezin bû; di cih de ez li Sîbelê geriyam, min got, hûn dikarin ji bo min ji walî destûr bistînin, ma çima ji bo hevalên şehîd nikarin bistînin? Û min telefon girt û çûm mal. Min digot, Umît, Fatma, rabin hevserê min hatiye Sûrê. Lê ji wan deng dernediket. Piştre Fatmayê bi şiklekî xew li ser, “bi şev xewn nayên gotin, ne baş e, bila sibe bibe wê demê bêje”. Min fêm kir ev ê ranebin. Min jî li ser nivîna xwe li ser kanepeyê, xwe dirêj kir. Vê carê tiştek li mêjiyê min asê ma. Hevserê min bi qîr û hewar tê û hevalên li mewziyan çawa

nabihîzin. Wê demê lewaziyek hebû. Dema li ser van dihizirîm di xew re çûyime

Dema bû sibe, min tiştên doh bi şev hatine jiyankirin ji Umît û Fatmayê re got. Destpêkê bawer nekirin, dema çûn nexweşxaneyê û heman tişt hevalan got li min bawer kirin. Hevalê Doğan hat, got, “ma Hevala R. tu evqas bi qîmet î, ji bo te ji walî destûrê dikarin bistînin lê ji bo hevalên şehîd nikarin bistînin. Min got, min doh heman tişt ji wekîlan re gotiyê. Sûcekî min tine ye, ez jî li vê derê bi we re me. Got, “temam” û çû.

Di vê navberê de rewşa hevalê Kemal hê jî xerabtir bibû, zikê wî hê jî werimî bû û reş bibû. Dema Remziye diçe gel hevalê Kemal, Kemal dibêje, “benekî bidin min ez ê xwe daliqînim. Yan min ameliyat bikin yan jî benekî bidin min ez xwe daliqînim”. Remziye pir bi bandor bibû. Li ser vê yekê diçe cem hevalê Doğan û dibêje, “em ê hevalê Kemal ameliyat bikin”. Hevalê Doğan û Çiyager hatin û gotin “ameliyatê hûn ê bikin”. Min qebûl nekir. Min got, naxwazim bibim sedema mirina hevalekî qadro. Remziye got, “wê demê ez ê bi tena serê xwe bikim”. Dema min got, malzemeyên me kêm in, tupe me yê oksîjenê, tiştên wî bitewizînin, serum tine ye, em ê nikaribin bi vî awayî ameliyetê bikin, Remziye got, “hevalê Kemal dê di nav 24 saetan de şehîd bibe, qe nebe bila şenseke wî hebe”, min got, temam.

Li gel hevalê Kemal kekê Ekrem dima. Êvarê wî li Kemal dinêrî. Kekê Ekrem li Sûrê dima û temenê wî li derûdora 45’an bû. Min ji kekê Ekrem re got, îşev ti tiştî nede Kemal; av jî nedê. Got, “temam”. Bû sibe, me di cih de dest bi amadekariyê kir. Remziye li qatê jor ê nexweşxaneyê rudinişt. Got, “em ameliyatê li mala me li odeyekê bikin, ji ber ku hevalên birîndar wisa bibînin ne baş e”. Dema wisa got, me wisa biryar girt, darbest derxist qatê jor. Me hemû malzemeyên pêwîst in birin qatê jot. Tupê oksîjenê lê serikê wê tine bû. Min, Remziye û kekê Cengîz me tam xwe xistibû modê doxtoran. Kekê

Cengîz weke doxtoran talîmat dida, ez û Remziye jî hemşîre. Destpêkê em fikirîn ku gule dibe li ku derê be. Li gorî ku gule li aliyê çepê yê piştê ketibû, me dê aliyê wî yê çepê vekirana. Kekê Cengîz aliyê çepê Kemal xizik kir. Di vê navbera de Bedrî  li ber destê me bû, em çi dixwazin dide me. Min jî derziya tevizandinê kişand enjektorê, li cihê xêz kiriye da. Remziye malzemeyên dirûtinê amade radigirt. Me geleşdankek mezin jî anîbû. Me dê malzemeyên ku me bi kar dianîn bixista nav.

Kekê Cengîz neşter girte deste xwe , dest pê kir cihên min tevizandiye qut bike, çerm qut kir. Di binê çerm de tebeqeyeke bez hebû, ew jî qut kir. Goştekî sor derket, dest pê kir wî jî qut bike, piştre hinekê firehtir kir. Ya Star, aveke tevî pîsatiyê bêhn jê tê dest pê kir biherike. Dikarim bêjim, zêdetirê nîviya wê gelaşdankê mezin bi vê tije bû. Tebî em di vê navbera de hevalê Kemal jî qontrol dikin ka dijî yan na. Min li hevalê Kemal mêze kir, min dît, got, “oxxx!” rehet bibû. Piştre me zivirand li ser teniştê, ji ber ku ew ava qet nemîne. Niha, diviyabû em gule bibînin. Me cihê bi ameliyatê vebibû baş qontrol kir, me nekaribû gule peyda bikin. Ji nişka ve kekê Cengîz got, “roviya wî kun bûye”. Lê hevalê Kemal hê dijiya. Remziye di cih de roviyên wî dirûtin, me zikê wî, baş bi tendiriyotê paqij kir. Em pir zêde kêfxweş bûn, em di wê astê de kêfxweş bûn. Piştî paqijya hindurê wî xelas bû, Remziye dest pê kir cihên hatine qutkirin bidûre. Piştî karê dirûtinê qediya, me ji Bedrî re got, tupê oksîjenê nêzîk bike, kêm jî be bila oksîjenê bistîne. Di vê navbera de bomberdimaneke wisa dest pê kiribû, cam dişkestin, mal dihêjiya. Tevî vê jî me digot, ‘me bi ser xist, me bi ser xist’ û em şad dibûn. Me ji nişka ve ferq kir lêdana dilê hevalê Kemal lewaz dibe û em wî wenda dikin. Şûna şadbûnê, xemgînî û têkçûna moralê girtibû. Me çi kir jî me nekarîbû xelas bikin! Lê hin caran dihizirim û dibêjim xwaziya em hê werek tevgerîbana û me ev ameliyat bikira. Hin caran jî dibêjim hêrî kêm nefeseke rehet stend û wisa şehîd ket.

Ez, kekê Cengîz û Remziye , em pir xemgîn bûn. Piştre me cixareyek pê xist û me dest bi axaftinê kir. Me hewl dida em pê bêhna xwe derxin: herî kêm nefeseke rehet stend û wisa şehîd ket. Bila ev ji me re bibe ders, em ê di nexweşên ji vê bi şûnde hê bi zanebûn tevbigeriyane.

Niha em difikirîn ku em ê çawa vê bi hevalê Doğan û hevalê Çiyager re bêjin. Çawa ku me ji hevalan re rêz digirt û me ji wan hez dikir, me nedixwest ew xwe bi me de ecz bikin. Me ji Remziye re got, tu bêje. Got, “temam”. Di saetên dereng ên şevê de hevalan, hevalê Kemal sipartibûn xakê. Ji hevalên dipirsîn re, me hewce didît em vebêjin, me digot, ne sûcê me ye, jixwe dê şehîd biketa. Dibe ku me ne dixwest baweriya wan bi me kêm nebe. Hevala Nûda şevê li mala Şendayê dima. Rojekê ji min re got, “ez ê îşev li cem we bimînim”. Min jî got, temam. Bi hevala Nûda re destpêkê me rêya xwe bi Doğan wan xist, me hevalê Elî pirsî. Li gel hevalê Elî , kekê Ehmed dima. Kekê Ehmed li Sûrê dima, hevsera xwe û zarokên xwe şandibû. Ew bi xwe û birayê wî Îhsan li Sûrê diman. Çek negirtibûn destê xwe, erka wan ew bû ku çi hewce bibe, peyda bikin. Ne berpirsiyarê lojîstikê bûn lê dema cixare peyda dikirin li ser her kesî parve dikirin. Berpirsiyarê lojîstîkê Berat bû. Berat ciwanekî ji Sûrê yê lihevhatî û girs bû. Dema dest pê kiribû li Sûrê qad bê qontrolkirin tevlî YPS bibû. Piştî Berat Zozan jî dest pê kiribû li lojîstîkê binêre. Me rewşa tendirustiya hevalê Elî pirsî. Kekê Ehmed ji me re çay anî. Piştî ku me çaya xwe vexwar ez û Nûda çûn malê. Umît û Fatma li malê bû. Dema wexta razanê hat min ji Umît re got, ti li cihê min li ser kanepeyê razê, bila hevala Nûda li ranzayê jor, Fatma li ranzaya jêr û ez ê jî li erdê nivînekê raxim û razêm. Gotin, “temam”. Hevala Nûda li ranzaya jor, Fatma li ranzayê jêr xwe dirêj kirin. Min û Umît, me soba pêxist. Umît, ji cem hevalê Çinar qebloyên antêna telewziyon anîbû. Min û Umît, me dê qeblo tazî bikirana. Em li erdê rûniştin û me dest pê kir bi kêrê maketan qebloyan tazî bikin. Me dê ji nava qebloyê têlên sifir

derxistana. Hevala Nûda şiyar bû, goreyên xwe derxist, got "ode pir germ e". Ji bo ku ode sar be me derî vekir. Hevala Nûda raza. Vê carê Fatma, rabû û got, "ode pir sar e". Vê carê jî me derî girt. Piştî ku her du jî razan weke bersiva hev bidin dest pê kirin bikin xirexir.

Ez û Umît, em hem dikenîn û hem jî me qeblo tazî dikirin. Wê şevê me heya bi saet şeşên sibeyê qeblo tazî kirin. Saet di şeşê de, ji bo li ser mewziyan bigere hevala Nûda qirnasa xwe girt û çû. Umît derket ranzaya jor û xwe dirêj kir. Ez jî li ser kanepeyê razam. Em wê rojê heya bi piştî bi nîvro razan. Jixwe roj û şeva vê odeyê tine bû. Heta bi roj jî tarî bû. Çûm nexweşxaneyê. Mala Remziye hatibû bombekirin. Dîwar kunkunî bibûn. Li wê derê kesekî extiyar hebû, ji ber ku lingên wî kangren bibû nedikariya bimeşe. Ji bo ku lê binêre xalê Salih ku li Sûrê rûdinişt dabûn gel. Xwarina wî jî didayê. Hevalan tenê şer nedikirin; ewlekariya nexweşxaneyê dihizirîn, em dihizirîn, nexweş dihizirîn, sivîl û zarok difikirîn û hewl didan her awayê tedbîrên ewlekariyê bistînin, pêdiviyên wan pêşwazî bikin. Me digot, em pir diwestin, lê ev heval çawa li ser lingan diman? Ev hêzeke çawa bû? Her tişt hizirîn û li ser lingan mayin ne tiştekî hêsan e. Di vê navbera de Remziye, mala xwe bir cihekî li hemberê wan. Piştî çend rojan dîwarên wê malê jî kunkunî bûn. Kekê Cengîz, zarokên wê û du nexweş bi zehmetî rizgar kirin. Di heman demê de li nexweşxaneyê jî didan. Remziye got; "hevalê Çiyager dibêje ku ew ê nexweşxaneyê ji vê derê bibin, ji bo me û nexweşxane li malên dest dayî digerin". Min ew wisa bersivand; ma em ê dîsa bar bikin.

Qada me her diçe tengtir dibû. Me Mizgefta Qurşunlu wenda kiribû, Dibistana Silêman Nazîf jî wenda kiribû. Tangan şev û roj êdî mal hildiweşandin, qet nedisekinîn. Dîsa jî me kêm şehîd dabûn. Dijmin weke dîn û har bûyî bû, teknoliyên xwe yên dawî li ser me diceriband. Anons dikirin ku em teslim

bin, hevalan wisa bersiva wan didan; “em ê teslîm nebin, eger hin kesên teslîm bin hebin ew jî hûn in, hûn teslîm bin”.

Li pêş kolana li hemberê nexweşxaneyê avahiyeke çar qat hebû. Li pişta van avahiyan jî avahiyeke çar qatî ya mezin hebû. Ev avahî her qatê wê ji çar daîreyan pêk dihat. Dema ji avahiyê, mirov dikete hindur li rastê du, li çepê du daîre hebûn. Derincokên wê di nîvenga avahiyê de bûn. Hevalê Çiyager got, “di vê avahiyê de bi cih bibin, nexweşxaneyê jî bînin vê derê û bila li qatên jor jî ti kes bi cih nebe, bi xetere ye. Remziye û kekê Cengîz di daîreya aliyê rastê de bi cih bûn. Me dê keleka wê jî bikira nexweşxane. Ji me re gotibûn ku hûn jî di mala destpêkê ya li çepê bi cih bibin. Mala li teniştа me jî, weke rêya derbasbûnê dihate bikaranîn. Hevalan ji bo derbasbûnê, diwarên wê malê şikênandibûn. Ji cihên hatine şikênandin û vekirin, çûyina mala Çinar, mewziyên Mînareya Bi Çar Lingan (Dört Ayaklı Minare), Sûka Mast (Yoğurt Pazarı) jî dihate pêkanîn. Di heman demê de ew mal cihê ku agir dihate kirin, nan û xwarin lê dihate çêkirin bû. Li cihê ku Remziyeyê bi cih bibûna, tiştên malê hebûn. Nexweşxane jî ji binî de vala bû. Di ketina nexweşxaneyê de saloneke navberê ya mezin, tam li beramber odeyeke, li aliyên wan ên rast û çepê jî odeyeke biçûk hebû. Me dê odeya biçûk a li aliyê rastê weke cihê ameliyat-destwerdanê, odeya li aliyê çepê û hemberê jî weke cihê nexweş bimînin rêk û pêk bikirana. Diviyabû, min, Remziye , Umît û kekê Cengîz, destpêkê me nexweşxane paqij bikirana. Di binê derincokê avahiyê de depoyê avê hebû. Av nedihat, ji musluxa wan av nediherikî. Umît ji depoyê avê av dikişand, min jî nexweşxane dişust. Kekê Cengîz û Remziye jî ji qatên jor kîlîm, nivîn, balgîf û bataniye dikişandin. Piştî ku me nexweşxane şûst, tiştên ji jor hatine anîn, me raxist. Niha, pêwîst bû tiştên ku me li nexweşxaneya berê bi kar dianîn û hevalên birîndar bianiyana. Lê diviyabû em vî karî di demek ku helîkopter ne li ser me ne de bikin.

Me, Qesab li mala Senîhayê bi cih kir. Senîha jî li Sûrê hevseroka komala hemwelatî Ya Wekhev û Azad bû. Zarok û hevserê xwe şandibû. Ew bi xwe mabû. Li rex wê jineke ciwan û zaroka wê hebû. Ew jin, jineke hatibû xistin bû. Partiyê ew rizgar kiribû. Senîha li wê xwedî derketibû, mala xwe pê re parve dikir. Ji Senîha re digot “daye”. Min, Umît, Remziye me dest pê kir em malê bibin cihê nû. Me bi zehmetî mal guhert. Diviyabû dema em di hin cihan re derbas dibûn, bi lez derbas bûna. Ji ber ku em bi ber dîtina sekvanên dijmin diketin. Kekê Cengîz dîsa nexweş dianîn. Me hemû tişt anîn. Me dê sibe biçûna û ew apê extiyar ku lingê wî kangren bibû bianiya. Beşek derman jî li mala ku apê êxtiyar tê de dima bûn. Di qatê binî yê mala ku hevalê Elî û Doğan diman, odeyek hebû, ew jî ji bo Şenda hate amadekirin. Anîna Şendayê pir zehmet bû. Ji ber wê yekê Şendayê jî pir êş kişandibû. Lê me di dawiyê de anî. Bedrî li her du odeyên nexweşxaneyê sobe danîn. Niha, hewce dikir em rûnîn û erk parve bikin. Me xwest hevala Nûda bê û ji me re civînekê li dar bixe. Ji ber ku Fatmayê pir dikire pitepit. Ez, kekê Cengîz, Remziye, Fatma û Bedrî, me li odeya ameliyatê civîn li dar xist. Di civînê de me li ser pirsgirêkên nexweşxaneye nîqaş kir. Kekê Cengîz got, “ez û R., em nexweşên xwe diyar bikin, bila nexweşên her kesî diyar bin. Me ev nêrîn qebûl kir. Fatma dê xwarina nexweşan çêbikira, Bedrî û Dirêj dê paqijiya nexweşxaneyê bikira. Dirêj, berê di mewziya de bû, dema birîneke sivik li zendê wî vebibû, pir tirsiyabû. Ji ber vê yekê hevalan jî vesaziya wî li nexweşxaneyê çêkiribûn. Kekê Ekrem dê bi şevê li gel nexweşan nobed bigirtana. Di maneyekê de êdî me pirsgirêkên bi nexweşxaneyê re eleqadar jî çareser kiribûn.

Pêwîst bû em jî mala xwe biguherin. Umît dîsa li dijî derdiket, lê hevalê Doğan dixwest em cihê xwe biguherin. Cihê em diman dest pê kiribû bibe cihekî bi xetere. Hem jî hevalê Çiyager vesaziya Umît jî çêkiribû. Umît êdî dê li gel hevalê Çinar fêrî sabotajê bibûya û li cebilxaneyê mêze bikira. Çûm

daîreya hemberê û ji bo paqij bikim min li malê mêze kir. Sê ode û saloneke wê ya navberê ya mezin hebû. Di salona navberê de ji seriyekê heya bi seriyê din cihê tiştên malê lê datînin û cihê pêlavan hebû. Mal ji binî de vala bû, tenê dolebeke kevin a ku du derî li ser bû hebû, cuda jî ti tişt tine bû û hemû camên wê şikestibûn. Min hemû mal şûst, ji qatê duyemîn ê avahiyê min mînder anîn, li pencereyê danîn. Piştre min dolaba bi du derî li pêşiya pencereyê danî. Min ji qatê jor etajereke çar çavî anî, ew jî li ber pencereyê danî. Paşê Fatma Soba danî, me kîlîm raxistin erdê. Sungerên dirêj me anîn. Balgîf, bataniye anîn odeyê û raxistin. Min maseyek jî peyda kiribû. Me ew jî bi awayekî dest dayî bi cih kir. Li odeyê du pencere hebûn. Li avahiyeke li hembera pencereya din mêze dikirin. Min li salona navberê kîlîm raxist. Tiştên mitfeqê mabûn. Fatma Ew jî li malan peyda kiribû anîbû. Piştî ku me mitfeq rêk û pêk kir, em çûn mala kevn, di serî de pişik û çente, cil û bergên me, telefon û batarya me anîn.

Min jî dixwest fêrî sabotajê bibim. Sibeyê piştî ku Fatmayê xwarina nexweşan dayê, min jî pansumanên wan dikir û dermanên wan dida. Êvarê, piştî xwarinê min dermanên hevalên birîndar didê, di cih de ji kunê derbasbûnê ya mala li rex derbas dibûm, diçûm gel Çinar û fêrî sabotajê dibûm. Jixwe fêrî tazîkirina qeblo bibûm, min niha jî plakayên qarton weke du parçeyên wekhev qut dikir û bi awayê were beramberê hev, di wan de kun vedikir, ji kunan qebloya sifir derbas dikir û qut dikir. Piştre min ji aliyê serî ve dubare têlên sifir derbas dikir. Li nîvenga wê plaqaya qarton jî kun vedikirin, ji bo têl li hev nekevin, ji piştê ve girêdida. Piştî ku min ev kar xelas dikirin ji şimikên naylon çar parçe qut dikirin, bi awayê ku parçeyekî naylon were her goşeyekî, bi têlên sifir bi bi hev ve girêdida, parçeyê din dida ser û keviyên wan girêdidan. Tebî yên min çêdikirin hin mezin û hin jî biçûk derdiketin. Lê me bi Umît re çêdikirin. Paşê jî me du hilco bi tiştê ku me çêkirî bû ve dikir. Me ew hêsinê gilover û dirêj ê di nîvenga hilcoyên cilan de

digirt û dikir pênc parçe. Binê wê me bi çakûç, baş dikir yek. Valahiyeke biçûk dima. Me ji wê derê têkilheviya gubre û şekir tije hindur dikir. Piştî ku fitîl bi cih kir û derûdora wê barût berdayê, me pambo û aliyê plastîk ê enjektorê dixistê. Li ser laskeyên mezin ên qehweyî bizmar radixist û dizeliqand. Paşê jî me weke ku ti dere wê vekirî nemîne, li derdorê dialand. Êdî mayina bi pêlîkirinê diteqe amade bû.

Êdî her tişt bi min hê bi kêfxweşî dihat. Min hin tişt hildibirandin û van tiştan pêdiviyên hevalan pêşwazî dikir. Êdî min nedikarî bi xweşikî razêm. Di her firsenda peyd dibû de min bêhna xwe li gel hevalan (hevalê Çinar) berdida. Jixwe Umît li gel Çinar dima, dema ez diçûm çay dem dikir, me dest pê dikir mayinên bi pêlîkirinê diteqin çêbikin. Hin caran jî Umît Tevî Ferqîn diçû kolandina tunelê.

Ferqîn zewicîbû û pênc zarokên wî hebûn. Ji Bismîlê bû. Hevalekî bihêz bû. Çek jî baş bi kar dianî. Jixwe ji mewziyê dihat diçû kolandina tunelê. Heya bi sibê tunel dikola. Piştî ku ew diçûn bi temamî qeblo tazî kirin û mayin çêkirin ji min re dima. Min bataryayên bi çar pîl, bi pênc pîl, bi heşt pîl çêdikirin. Ji bo şarja telefonê jî batarya çêdikir. Ji bo cîhazê jî min bataryayên bi pênc pîlan çêdikirin. Rojekê hevalê Doğan hat, fenera destê xwe da ser odeyê, got, “çawa yî hevserok û piştre jî gotibû, “na, na, min efû bike min ê bigota çawa yî xanima bombeçî...” . Pir keniyabûm. Piştî hevalê Doğan, min got, dema mirov bixwaze dikare her tiştî fêr bibe, lê hewce ye xwestek hebe. Di vê navberê de Çinar mayinên qabloyên wan dihatin qutkirin û nateqin dianî. Me ji nû ve gubreyên wan bi kar dianî.

Êdî karê nexweşan heya bi êvarê diqediya. Di saet heştê de diçûm gel Çinar. Çinar zêde nediaxifiya. Umît, ji bo ku bide kenandin li gel Çinar pir hanek dikir. Çinar hin caran diçû mewziyê û hin caran jî diçû kolandina tunelê. Ewqas diwestiya, hin şevan li ser piyan di xew re diçû. Xuya bû pir kêfa Çinar ji Elî re nedihat. Terza hevalê Elî dikaribû hin caran mirov

bişkîne, lê Çinar ev nedida der. Mirovekî wisa birêxistin bû. Radyoyekî Çinar hebû, min ji wê derê guhdarî nûçeyan dikir.

Rojekê min ji Umît re got, telefona radyo peyda bike, ez ê di weşana zindî de biaxifim. Umît Numara da min, ez jî li radyo gerîm. Tebî ji derve ez li gel radyo di weşana zindî de diaxifim, lê wisa dengê teqînê tê, felaketek e. Spîker jî dengê bombeyan dibihîst. Min ji spîker re got, ez dixwazim stranekê ji gelê Amedê re bişînim. Dema pirsî ku ew kîjan stran e min wisa bersiv da, ez strana "Em bernadin vê dîlanê" ji bo hemû gelê Amedê dixwazim. Tiştê dixwazim bêjim em ê dest ji berxwedana Sûrê bernedin. Paşê jî çûm û min ji hevala Nûda re ev got. Li gel hevala Nûda taybetmendiya jibîrkirinê hebû. Ji ber wê yekê timî Jînda bi xwe re digerand.

Wê rojê dîsa Afad rêya xwe bi nexweşxaneyê xistibû. Ji ber ku nexweşxane li ser rêya hevalan bû hemû heval di wê derê re derbas dibûn. Dema Afad derbas dibû dîsa got, "pîra min qurbana we be" û bi ken û hanek rêya xwe domand û çû. Êvarê Remziye got, "Afad şehîd bûye. Paşê ez çûm gel hevalan, min got, çawa dibe? Hevalê Afad sê çeteyên tîmê taybet dikuje, piştre dinêre li derûdorê kes tine ye, dibêje "ez ê çekên ser van çeteyan rakim". Dijminê di kêmînê de ji piştê ve lê reşandiye û şehîd ketiye. Pir xemgîn bibûm. Ji bo hevalan wendahiyeke pir mezin bû. Hevalekî pir wêrek bû. Çiyager hem pir xemgîn bû û hem jî zêde ecz dibû. Çima binpêkirina quralan pêk dihat? Di her carê de digot (hevalê Çiyager), "bêquralî nekin". Gelo hevalan çima qural bin pê dikirin, gelo di wê kêliyê de ti tişt ferq nedikirin, êdî nizanim ji çi ye.

Rojekê min nexweşxane paqij dikir, carekê min dît hevalekî bejnkurt, tîpê wî pir komîk, keleşa wî li mil, her du destên wî li jor, ji nexweşxaneyê kete hindur, tiliya herî biçûk a destê wî yê rastê qut bibû û ew girtibû û anîbû. Got, "tiliya min qut bûye". Weke qet nêşe bû, nedigot, "ox" jî. Navê wî Serhildan bû. Herêmî bû, lê reftariyên qadroyekî deh salan nîşan dida. Me tiliya wî girt û dirût. Qet dengê xwe dernexist.

Min û Remziye me got, dibe ku tiliya te weke berê nebe, sax nebe. Wî wisa bersiv da, “hê neh tiliyên min hene”. Li nexweşxaneyê nema, di cih de çû mewziyê. Pir pê bandor bibûm. Min û Remziye ji hev re got, çi ciwanekî wêrek e. Min pir ew teqdîr kiribû û min ev hizirên xwe ji hevalê Çiyager re jî gotibûn. Wî jî got, “dizanim, lê ez ji te re tiştekî bêjim? Û piştre domand, tang avahiyan hildeweşîne, heval di nav wan xirbeyan de mewzî digirin”.

Tê bîra min, rojekê Bedrî got, min hin derman dîtinê, ka bê mêze bike, dibe ku antîbiyotîk bin”. Ez çûm, min nêrî hemû boyexên sprey bûn. Hatim, ji hevalê Rêber re min wisa ev bûyer vegot, “Bedrî dê ev boyax weke antîbiyotîk in bida we! Rêber yek ji boyaxan xiste destê xwe, berê xwe da hevalan û got, “hevalno ji Almanyayê antîbiyotîkên me yên nû hatin”. Piştre me bi wan spreyan li ser dîwêr, nivîs nivîsand. Min nivîsandibû, ‘nêzîkatiya li Rêbertiyê ji bo me sedema şer û aşitiyê ye’, Rêber nivîsandibû, “Em ne terorîst in, Kurdên ku asîmile nabin in” û Cotkar jî nivîsandibû, “PKK’ê romanek ku neqediyayî ye”. Cotkar ji Bismilê bû. Çavên wî ne şîn, lê zer bûn. Dijmin propande kiribû ku ajanê Rûsan e.

Hevalan gotin ku dijmin li nexweşxaneya kevn daye û şewat derketiye. Çiyager ji min re got, “ji Umît re bêje bila bikêşîne û ji çapemeniyê re bişîne”. Min ji Umît re got û wî jî got, “temam”. Tevî Umît çûm nexweşxaneyê. Dîwarê wê kunkunî bibûn, qatê jor jî şewitîbû. Em derketin qatê jor, li odeya ku ew apê extiyar ê lingên wî kangren bûne dima, tiştek nema bû. Tenê hesinên ranzaya wî mabûn û dema min li ser qaryoleyê wî, hestiyên apê extiyar dît hêrs û kîna min zêdetir bû. Êdî ev dewlet ji rê derketibû. Bêyî ku bizane çi dike êrîşê her derê dikir. Weke kûçikên birçî ku benê xwe qut kirî ne, bû. Umît pir jê bandor bibû û li vê sîstemê, li vê dewletê nelet dikir.

Rojê Îhsan (Cesim Kaya) hat nexweşxanyê. Ji Komalên Ciwan bû. Ew jî bejndirêj û ciwanekî lihevhatî bû. Dema li

hiqûqê dixwend tevlî bibû. Pir kêfa min jê re dihat; min pir dişiband birayê xwe yê şehîd ketibû. Serçavên wê pir dişibîn birayê min. Her ku min ew didît, min digot, 'birayê min'. Birayê min jî gerîla bû. Sala 2011'an li Dêrsim-Pilemûriyê (Pülüm) şehîd ketibû. Ji ber wê yekê min pir cuda li Îhsan (Cesim Kaya) mêze dikir. Pir hanekbaz bû. Li gel Umît hev nas dikirin, li heman dibistanê xwendine.

Cotkar ji bo pansumanê biguhere hate nexweşxaneyê. Min li tiliya wî nêrî, bêhn jê dihat. Tiliya wî negirtibû. Min kêliyên dirûtinê vekirin û tilî derxist. Ji nişka ve Botan kete hindur, got, "dijmin xuya dibe". Cotkar tiliya xwe avêt û keleşa xwe girt û çawa çû li du çeteyên dijmin da. Cotkar piştî du saetan dîsa hat û got "tiliya min girêbidin". Baweriya min a ji bo wî hê jî zêde bibû. Ev çi wêrekî bû, nekarîbû êşa xwe jî jiyan bike. Girêdaneke çawa bû ev, diyar e bawerî û îradeya rast ev bû. Layiqê wê ye ku mirov pesna wî bide.

Zagros, hevalê Dewrîm (yê xort) anî nexweşxaneyê. Serçavên Dewrîm ji parçeyên keviran nediyar bûn. Her du tiliyên wî jî hinekê hatibûn birîn. Min, Remziye û kekê Cengîz, tedawî kir lê hevalê Dewrîm pir xemgîn xuya dikir. Ti car wisa tevnedigerî. Pir wêrek bû, min serçavên wî paqij kirin, min derziya tevizanidinê li tiliyê da. Remziye tiliyên wî dirûtin. Ji nişka ve Dewrîm giriya. Min got, çi bû? Got, "ne tiştek e, ji ber ku min mewziya xwe berdaye digirîm". Lê min bawer nekir. Ez fikirîm ku li gorî ku hevalê Dewrîm digirî tiştek bi hevalê Çiyager hatiye. Nexwe Dewrîm hevalekî qet nagirî, girînê rexne dike bû. Me tedawiya wî xelas kir û ji nişkê ve hevalan banî me kir. Gotin, "hevala Nûda birîndar e". Dema me pirsî ku li ku ye, gotin "li mala Çinar e". Ez, Remziye û kekê Cengîz di cih de em çûn mala Çinar. Di nav bataniye de bû. Min û Remziye bataniye vekir. Laşê wê parçe parçe bibû. Ev kesa weke fêrişteyan çawa dibû şehîd diket. Nîviya serçavên wê tine bû, lingên wê şikestibû, goştê wê ji hev vebibû lê tiliyên wê, ew porê wê yê dirêj hê disekinî. Hevalê Doğan, Elî , Çiyager

Zagros û Hebûn hemû digiriyan. Hebûn jî qadro bû. Hanekbaz bû, qet ji mewziya xwe dernediket, mirovekî pir mikemel bû. Cara destpêkê dema heval digirîn min didît. Ez û Remziye jî digirîn. Hevala Zozan hat û got, “bila her kes ji hindûr derkeve”. Xwe li Nûda aland û giriya. Û radyoya Çinar girt û avêt erdê. Di şehadeta hevala Nûda de tiştekî bala min dikişand hebû. Min ji hevalan pirsî ku çawa çêbûye? Gotin “tangê lê daye û ji dewisînê wisa bûye”. Lê vê gotinê bawerî nedida min. Ji ber ku hevalek ku bi vî awayî şehîd ketibû ji Kobanê anîbûn. Li nexweşxaneyê min şûstibû; ev heval bi pêlî mayinê kirinê şehîd ketibû. Min dîsa pirsî, gelo dibe ku mayin be? Hevalan got, “tiştekî wisa tine”. Hevala Nûda birin mala li tenişta nexweşxaneya kevn. Min û Remziye, me jî kefen, pembo, lifik, sabûn û lepik girt, û em çûn. Me dê şehîd Nûda bişûstana. Dayika Jînda dê alikariya me bida, lê dayika wê pir ditirsiya. Me jî je re got, tu tenê avê germ bike, em ê ya din bikin. Me şehîd Nûda şust û kefen kir, lê pir xemgîn bûm. Min digot, mirineke bi vî awayî heq nekir. Me wê rojê agahî da, wê êvarê şehîd Nûda spartin xakê, lê ji bo min fêrîşteyeke bêmirin bû. Dilê ti kesî nedişkênand, hevaleke pir baş bû, pir!

Êvarê hevalek anîn nexweşxaneyê, birîndar bû. Navê wî Xebat bû û ji Pasûrê (Kulp) bû. Tangê lê dayibû, bi bandora dewisînê kevir li zendê wî û lingê wî ketibûn û birîndar bibû. Ne di asteke dirûtinê de bû. Me pansuman kir, lê zêde nedikariya zend û lingê xwe bi kar bîne. Ji ber dewisînê dest û lingên wî zerer dîtibûn, nedikarî bi temamî destên xwe biguvişe.

Bû sibe, Xeyrî anîn. Sekvanên dijmin li Xeyrî dabûn. Gule li aliyê guzekê ling ketibû û hestî şikênandibû. Kekê Cengîz di cih dest werda birînên wî û piştre xist cilsê. Di vê navbera de Remziye ji min re got, “em biçin R. em ê hem pansumana dewrîm nû bikin û hem jî binê Şenda paqij bikin”. Min got, temam. Me malzeme girtin û em zivirîn aliyê çepê. Li beramberê kolanê hevalan deriyekî biçûk vekiribûn. Min ji

Remziye re got, derbasbûna di vê derê re danaqurtînim lê hevalan çêkiriye, dîsa jî em ê tê re derbas bin. Remziye xwar bû û li pêşiyê, bilez derbas bû. Min jî xwe xwar kiribû li pey wê dibezîm. Ji nişkê ve bi şewatekê hesîm û min dît ji zikê min dumanek radibe. Min got, zikê min, zarokên min kêliyekê ji ser xwe ve çûbûm. Min carekê mêze kir Çiyager li pêşberê min e. Destpêkê li birîna min mêze kir, piştre got "were te bidim pişta xwe". Min li Çiyager nêrî weke tayê rihanê dirêj û zirav e; li xwe nêrîm, jineke 75 kîlo... Ya din jî diviyabû min lewazbûna xwe neda derve, bi awayekî bihêz bisekinîma, diviyabû min ev jî nîşanî wan bida. Min got, na, jineke şoreşger dema dikeve divê bizanibe rabe. Dîsa ji min re got, "were ez te bidim pişta xwe", min jî got, ez şoreşgerek im, dikarim xwe bi xwe rabim. Tebî li hevalan dinêrim nikarim qîr jî bidim, ji bo min qîr kirin lewaziyek bû, lê ji dilê min qîrkirin dihat, lê xurûra min a feodal derdiket pêş. Çiyager got, "wê demê rabe". Ji zendekî min Çiyager, ji zendekî min Remziye  girt, rabûm ser lingan, hewl didim bimeşim, lê hem zikê min û hem jî lingê min zêde zêde dişewite. Hinekê meşiyam. Heqî hat. Heqî jî hevalekî penceşêra mîdeyê pêre heye. Ji nişka ve ez li pişta xwe kirim û ji wan cihên hatine kunkirin ez derbas kirim û birim gel Şenda û li odeyê danîm. Şenda xwest, ez destê wê yê dirêj kirî bigirim. Got, "ji min hêzê wergire, ji te re hêzê dişînim. Heval ji odeyê derketin. Min got, dikarim niha qîr bidim. Tam jî di wê kêliyê de derî vebû û Elî kete hindur, dîsa min li xwe daneynî ez qîr bidim. Ji bo li birîna min binêre kekê Cengîz  hat. Gule di ranê min ê rastê re ketibû hindur, piştî ku derketibû, zikê min jî kun kiribû û derketibû, li dîwêr ketibû û teqiyayî bû. Parçe jî li lingê min ê rastê ketibûn. Ji ber wê yekê wisa dişewitî. Kekê Cengîz destpêkê tevizand, piştre cihê ku guleyê zêde vekiribû dirût. Min got, zikê min nedirût, eger bidûrî nikarim rabim û rûnim. Wî jî pansuman kir û qedand.

Şendayê ji min re got, "li vê derê bimîne, bila Xezal li te mêze bike". Hizirîm, dê kê li nexweşan mêze bikira, kê

alîkariya Çinar bida? Min got, “heval tu sax bî, divê ez biçim, ez baş im. Rabûm, kekê Cengîz alîkariya min da. Dîsa bi meş em ji rêyeke din hatin nexweşxaneyê. Remziye derziyek li min xist, derbasî mal bûm. Min xwe dirêj kir û razam. Heval yek bi yek dihatin hêdî hêdî meşiyam û çûm nexweşxaneyê, min pansumanên hevalên nexweş nû kir û dermanên wan dayê. Dema ez dîtim pir kêfa wan hat, gotin “tu çima rabûye ser piyan” û xwe ecz kirin. Min jî bi hanekî ji wan re got, divê ji bo we bibim mînak û îrade çi ye nîşanî we didim û min li ser zêde kir, şerm bikin, zû sax bin. Piştre derbasî mal bûm. Hevalê Çiyager hatiye pirsa min. Got, “gazî tu li ku derê yî”. Min jî got, divê hêzê bidim nexweşan, min xwest min li ser lingan bibînin; ne ez bêbiryar bûm, lê lingê min bêbiryar bûye. Dema dengê bombeyan tê diêşe. Wî jî li min mêze kir û keniya, piştre rabû û çû mewziya xwe.

Di vê navberê de çûm gel Çinar. Çinar got, heşt mayinên bi pêlîkirinê diteqin hewce ne, çar jê bila biçûk bin. Min ji Bedrî re got, ji min re kontrplak peyda bike. Wî jî pişta taxima odeya razanê derxistibû û anîbû. Lê têlên me yên sifir kêm bûn, min go destpêkê yekê çêbikim piştre ez ê yên din çêbikim. Ez û Çinar em rûniştibûn me mayinên bi pêlîkirinê çêdikirin. Min ji hevalê Çinar re got, Înşele hevala Nûda pêlî mayina min çêkiriye nekiribe; eger wisa be ez ê azabê wijdanê bikişînim. Wî jî gotibû, “na, ne mayina te bû, me berê çandibû û hem jî Nûda bi xwe gotibû li wê derê biçînin. Ez bi vî awayî ji aliyê wijdanî ve rehet bibûm û hem jî min gumana di  dilê xwe de safî kiribû.

Êdî qada me jî teng bibû û her kesî tiştek digot; li derve 200 gerîlayên HPG li bendê ye, dê dorpêçê bişkînin û bi doçqeyê bikevin hindur û ji bo me rêyeke bi ewle vekin, em ê tê re derbasî Elîpaşe bibin. Heta hin hevalên herêmî digotin, “ma hûn dizanin, hevalê Baran hatiye”, hinekan jî digot “Masîro hatiye”. Bi awayekî xwezayî em jî kêfxweş dibin. Em dibêjin, dema tên bila derzî û serum bînin. Tebî ev hemû vala

derketin. Xeyela Elîpaşe jî vala derket. Her diçe xeyalên me vala derdiketin.

Êdî hevalan hêviyên xwe bi tunelê ve girêdabûn. Lez didan tunelê. Umît, Ferqîn, Mezlûm, kekê Ekrem, kekê Ehmet, Ronî di binê dêrê re tunel dikolan. Rastî avê hatibûn. Her ku jê av vala dikirin ji nû ve tije dibû. Me hemûyan çenteyên xwe amade kiribûn. Tiştên xwe yên taybet xistibûnê û di rewşeke amade de radigirtin. Dikarîbû her kêliyê karê tunelê bihata biserxistin. Sibeyekê hevalan got, "dijmin li laşer daye, êvarê guleyek li destê Laşer ketibû. Kekê Cengîz, û Remziye dest bi têdawiyê kiribûn û destê wî dirûtibûn. Laşer ji Ferqînê bû, lê ti kesî nedizanî, ya din jî Azadê Biçûk ê li cem me jî birayê Doğan bû. Ji bilî min, Remziye û rêveberiye ti kesî nedizanî. Min xwest ez Laşer bibînim. Ji ber ku li nexweşxaneyê hevalên birîndar pir bûn çûm cem Çinar. Min ew pirsî. Got, "baş im, lê ne dema birîndariyê bû". Laşer qirnas bi kar dianî û pêwîstiya hevalan pê hebû.

Dotira rojê Îhsan (Cesim Kaya) birîndar bû. Ez çûm, min lê nêrî. Gule ji aliyê rastê yê sukra wî ve ketibû hindur lê ne xuya bû. Min baş lê nêrî, li binê guhê wî yê rastê werimînek hebû. Me fêm nekir ku çi ye. Ji nişka ve dengekî qîr û girînê hat. Ber bi nexweşxaneyê ve bezîm. Zagros û çend hevalan di nava bataniyeyê de hevalek dianîn. Hevalê ku hilgirtibûn Şevger (Armanc). Şevger ji Kerboranê bû. Hem digiriya û hem jî qîr dikir û digot, "tang hat, dê me hemûyan bikujin". Min ji hevalan pirsî; ev heval qadro ye? Hevalan jî got, "belê". Sedema pirskirina min ew bû ku hevalên qadro wisa tevnedigeriyan. Digot "doxtor" û xeber didan. Tangê li Şevger dayibû. Ji ber dewisînê patika wî kun bibû, lingên wî ji çar cihan vebibû, hestiyê bin çongê wî jî şikestibûn. Min û Remziye, me li derziyan nêrî tenê çar mabûn û ev çar derzî jî encax têra Şevger dikir. Min derziyên tevizandinê anîn û li hemû cihên birîndar dan. Remziye patika wî dirût, lê Şevger hê jî xeberên pîs dikir. Remziye Hişt, çû. Kekê Cengîz alîkariya

min da, min hemû birînên lingê wî dirûtin. Kekê Cengîz bi penseyekê hestiyê binê çongê wî dehf da hindur, min jî dirût. Piştî ku hemû xelas bûn hevalan ji Şevger re gotin “bê îrade”. Ti kesî nedixwest li Şevger binêre, min girte ser xwe. Ji bo ku rewşa Şevger bipirsin Çiyager, Doğan û Elî hatin. Dema Şevger hevalê Çiyager dît dest bi girî kir. Çiyager bi dilrehmî destê xwe da serê wî, xwest wî aram bike. Got, “Şevger li te nayê, me bihîst tu ji doxtoran re xeber didî”. Wî jî got, “ez ne li ser hemda xwe bûm”. Hevalê Çiyager berê xwe da min û got, “R. ez ji te re çîroka Şevger bêjim”. Min jî got, guhdar dikim. Axaftina xwe wisa domand, “Şevger li qadê, nasnavê hevalekî bû. Di pevçûnekê de du gule lê ketin. Yek li qirika wî ket û derket, ya din jî li piştê ketibû, pir xwîn jê diçû. Lê qet dengê heval dernediket, qîr jî nedida. Ew hevalê Şevger sax bû. Piştî du mehan, di şerekî de şehîd ket. Ji ber wê yekê Şevger navê wî girt, lê piştî ku sax dibe em ê vî navî jê bigirin. Şevger, ne layiqê navê xwe ye. Her kes dikare bibe gerîla lê her kes nikare bibe qadro. Heta min jî nekariye xwe bigihînim asta qadrotiyê” û piştî ku dawî li axaftina xwe anî û tevî hevalên pê re bûn ji wê derê çû. Di yek carê de Çiyager ez matmayî dihiştim. Hezkirina min a ji bo wî hê jî mezintir dibû. Min digot, xweziya sed kesên weke Çiyager hebûna têra vê rêxistinê dikir, lê ez jê piştrast im ku heye lê ez tenê rastî yekî hatibûm. Ma ez ê karibim careke din bi mirovekî wisa giranbiha re rû bi rû bimînim ez wê jî nizanim, dem wê nîşan bide.

Ez jî çûm cem Îhsan (Casim Kaya). Min baş li sûkra wî nêrî. Li cihê werimî bû, tiştekî hişk hebû. Min banî kekê Cengîz kir, min got, were lê mêze bike, dişibe gule, wî jî got, “ne gule ye, dibe ku parçe be”. Min got, gule ye, wî got, “na”. Min got, çi ye bila ew be, niha em çi bikin, ji bo tevizandinê derziya me tine ye. Wî jî got, “bêyî tevizandinê dikare bê kirin”. Me Îhsan bir odeya ameliyatê. Bi qestûkan min got, divê em sukra te bitevizînin. Lê ya di enjektorê de av bû, ne derziya rastîn bû. Di kêliyekê de min derzî lê da û derxist û min got, temam. Kekê

Cengîz neşter xist destê xwe û dest pê kir qut bike. Piştre mûçinik xiste nav cihê vedaye, got, "li tiştekî hişk dikeve". Dema hemû ev dibûn Îhsan negot "viq" jî. Piştre bi neşterê hineke din veda. Ji ber êşê ji Îhsan xwêdan diherikî. Lê deng ji wî dernediket. Kekê Cengîz dawî dendika guleyê derxist. Tiştekî metal û renê wê girî bû. Îhsan lê mêze kir û got, "dendika guleyê ye". Piştre da min û got "sala bê xwîşka min dê biçe tevlî bibe, dema qedexe radibe tê bidî wê". Min jî jê girt û xiste berîka xwe. Îhsan got "ez baş im, dikaribû serê xwe bizivirîne. Me cihê ameliyatê girêda û çû mewziyê. Tevî ku me jê re got, îstirehet bike, got "ne dema wê ye" û çû.

Ji nişka ve me dît Rêber, Zozan û Qivirciq anîn. Dijmin gule avêtibû wan, parçeyên guleyan lê ketibû. Zêde tiştekî Zozanê tine bû, lê Qivirciq, parçe li pişta wî ketibû. Min bi mûçinikê hindurê birînê qontrol kir, parçeyekî biçûk hat, min kişand, hestiyê wî birîbû. Qivirciq li gel Şehîd Delîl dima. Fotoxrafê Şehîd Delîl di berîka xwe de digerand. Navê malê Qivirciq Cihat morgül bû. Çarde salî bû û hê zarok bû. Digiriya û av dixwest, digot "ez birçî me. Me got, em heya bi demekê tiştekî nedinê, dibe ku ji hindur ve herîkîna xwînê pê re hebe. Lê ji pişta wî pir xwîn dihat. Derziyên me yên xwînê didin sekinandin nemabûn. Paçên me yên pê birînan dipêçin jî nemabûn. Me paçên zarokan qut dikir û dida ser birînê. Qivirciq roja dawî ji me re got, ez ê biçim cem Delîl (Mesut), ji dev û difnê xwîn hat û şehîd ket. Ji bo ku bişon û bispêrin xakê hevalan ew bir. Hevalê Çiyager yên temenê wan biçûk hemû anîn û li gel me hiştin: Kadir, Cûdî, Bucuruk (Bücürük), Rambo û Qehreman. Lê Fatma Timî bi zarokan re şer dikir. Êdî ji gilî û gazincên wan hevalê Çiyager bêzar bibû.

Me carekê nêrî ji odeya nexweşxane agir derdikeve. Dîwar kunkunî bibûn. Me bi zehmetî nexweş ji odeyê derxistin. Hevalê Çiyager pirsî, "em niha çibikin? Min got, em nexweşan bibin cem me û me wisa kir. Piştre dema bombardiman sekinî, me nivînên li nexweşxaneyê jî anîn, hemû li rex hev li odeya

me raxistin û nexweş bi cih kirin. Şevger pir ez bêzar dikirim, heya bi sibeyê nedihişt razem, timî digiriya. Digot, “dayê R. sukra min diêşe” û digiriya. Hevalên birîndar ên li odeyê digotin, “derew dike, dema tu nebî, nagirî, dema te dibîne digirî”. Lê heyfa min bi wî dihat. Ya din jî şevê digot, “destê min bigire”. Rojekê hevalê Doğan ji min re got, “dema Şevger ji te re dibêje “destê min bigire, zileyekî lê bide”.

Êdî ji bo mayinên bi pêlî kirinê diteqin tela sifir hewce bû. Min qebloyên antênê dianî bi hevalên birîndar didan tazîkirin ku tiştekî pê mijûl bin hebe. Ya din jî ji tazîkirina qeblo ruhê min derdiket. Ez pir mijûl dikirim. Şevekê Harûn hat. Min mêze kir heval li ser tiştekî nîqaş dikin û digotin “elçaxno”. Min pir mereq kiribû, gelo mijar çi bû? Çûm gel Remziye , ji ber ku Remziye, kesa ku herî zû agahî werdigire bû. Dema me ji bo mêze kirine birîndar di navbera xwe de parve kiribûn, Şenda ketibû para Remziye  ji ber wê yekê Remziye  ji beriya min bi agahiyan dihesî. Çi ecêb e, di nava şer de jî min dixwest kurûpistan bibibîzim, agahî bistînim! Mirov tiştekî wisa ye... Dibe ku min dixwest, her tiştî bizanibim, ji hin tiştan bê par nemînim. Çûm gel Remziye  Min got, çi diqewime? Remziye  got, “Merwan, Cano û Şervan revîne”. Yanî teslîmî sîstemê bibûn. Mam heyirî. Merwanê elçax, bi ser de jî min pêlava xwe dabûyê. Her ku ew dihata bîra min hê jî hêrsa min zêdetir dibû. Lê destpêkê pir baş şer kiribû. Cano safekî Xweda bû. Şervan jî min qet nas nedikir. Rojekê Cano ji nişka ve ji Harûn  re dibêje “em biçin û vê aqrebê desteser bikin”. Harûn  dibêje “ em ê çawa bikin?”. Cano gotiye “em biçin li derî wê bidin û bêjin teslîm bin”. Hevalên ev gotin dibihîstin pir dikenîn. Dotira rojê dijmin dengê Merwan kêşandibû qeydê û anons dikir. Dengê Merwan olan dida û digot, “teslîm bin, dê tiştekî bi we nekin, hevalno teslîm bin”. Ya din jî girtina wan dijmin kêşandibû vîdeoyê. Hevalan ji min re gotin “telefonê veke em temaşe bikin, vîdeo

çawa kêşandine? Sîstemê ew bi kar anîbûn jî. Her ku hevalan temaşe dikirin digot, “wey elçaxno, wey”.

Piştî ku ew revîn bi şûn de li cem hevalên herêmî bêbiryarbûnek dest pê kiribû. Qada di bin qontrola me de pir teng bibû. Êdî heval hatibûn nêzîkî nexweşxaneyê. Min jî ji ber ku ode pir qerebelix e li odeya din nivînek raxistibû. Êdî me mayin, pîl û tûp tevî Umît li odeyê amade dikirin. Çinar jî dihat û diçû. Her pesna min dida, pir kêfxweş dibûm. Min hem hin tişt dikirin, hem alîkariya hevalan dida, hem jî dihatim serbilindkirin jî. Şevekê Rêber hat û got, “werin alîkariyê”. Dengê wî dileriziya. Dema ez, Remziye û kekê Cengîz rabû, got, “hûn neyên bila kekê Cengîz bê”. Kekê Cengîz çû. Lê encax karibûn piştî saetekê bên. Hevalekî birîndar anîn. Ev hevalê birîndar Agir bû. Ji Mêrdîn Qoserê bû. Guleyek li serê wî ketibû. Me di cih de ew anî ser darbesta li odeya ameliyatê. Mêjiyê Agir sekinî bû. Tenê hinekê dilê wî lê dida. Me deriyê odeya ameliyatê girt. Li odeyê ez Remziye , kekê Cengîz, hevalê Çiyager, Doğan û Rêber hebûn. Kekê Cengîz got, “tiştekî em bikin tine ye dê şehîd bikeve”. Me xwîna serçavên wî paqij kirin ew rûyê wî yê xweşik xuya bû. Min destê wî yê rastê, Remziye Destê wî yê çepê girt. Carekê bêhn da û stend, cara duyemîn bêhn da û stend, dema cara seyemîn bêhn da û stend ji devê wî hinek hilm derket û şehîd ket. Çavên wî vekirî mabûn, me çavên wî girtin. Piştre min destê wî, eniya wî û hinarikên rûyê wî maçî kir. Min û Remziye me dest pê kir em bigirîn, lê hestirên me bêdeng diweşîn. Agir serê xwe ji kuna ku di dîwêr de ji bo şer vedabûn derxistibû, sekvanê dijmin ê li Otêla klasê li serî wî dabû. Keloxa serê wî di sê cihan de vebibû. Dema ku dihatin sedema dereng mayinê ew bûye ku dijmin gule reşandine ser wan.

Agir şevekê berê ji Rêber re gotiye, “em van bêbiryaran bidin pêş bila hemû bimirin, dema em bimirin ev hemû dê teslîmî dijmin bin, û navê me biherimînin, ji ber vê yekê bila ev ji beriya me bimirin. Hevalê Çiyager ji min re got, “telefon bike

û agahiyên wî bistîne, tê ji me re bêjî”. Ez jî li yên navçeyê geriyam rewş ji wan re got, pir xemgîn bûn. Paşê hevalê Çiyager hat û got, ne pêwîst e tu lê bigerî, li ser wî nasnameya wî heye” û pê ve kir, “Hevala R. divê em cihekî alternafîf peyda bikin”. Min got, yanî cihekî çawa? Got, “mînak, em jêrzemîna avahiya li pêşberê nexweşxaneyê mêze bikin, em binêrin cihekî çawa ye, eger destdayî be dema li nexweşxaneyê bidin hûn û hevalên birîndar dê derbasî wê derê bibin”. Min got, temam em wê demê biçin mêze bikin. Ez, Remziye, hevalê Çiyager û Dewrîm (xort) em bi hev re çûn û me nêrî. Hevalê Dewrîm timî li gel hevalê Çiyager bû. Bi wî re bû. Em her çar çûn, me li qatê destpêkê yê avahiye mêze kir. Jixwe qatê destpêkê yê nexweşxaneyê û qatên destpêkê yên avahiyên li hemberê nexweşxaneyê saxlem mabûn. Her roj li nexweşxaneyê didan. Remziye ji hevalê Çiyager pirsî, “dê çawa çêbe? Hevalê Çiyager got, “ma ditirsî?”. Remziye , wisa bersiv da; “ditirsim lê ne ji bo xwe, ji bo zarokên xwe ditirsim”. Çiyager got, “te 35 salan jiyan kiriye, bes e” û keniya. Ma qe ez disekenim, diviyabû min xwe nîşan bida! Min got; “ez natirsim, bi vê rêxistinê baweriya min heye”. Piştre hevalê Çiyager got; **“Li gel mirovên weke we şehîd ketin pir tiştekî bedew e, şehadeta me dê bibe jiyana hevalên cuda. Em ê paşve nekişin, paşve kişîn teslimiyet e, teslimiyet jî îxanet e. Em ê xeyalên vî gelî vala dernexin. Heval li Ferqînê paşve kişîn, gel şikest, em ê vê li vî gelî nekin. Dibe ku îro ev berxwedana em dikin neyê fêmkirin lê di pêşerojê de her kes dê fêm bike. Hem em li vê derê berxwedaneke dîrokî li dar dixin û di vê berxwedanê de navê we jî dê hebe”**. Dema hevalê Çiyager diaxifiya min bi heyranî li wî guhdar dikir. Ev baweriyeke çawa bû, ev berxwedaneke çawa bû!

Digot ku ew ê ji bo gelê xwe bimirin, lê li Sûrê gel tine bû, gelo min jî fêm nedikir? Min li cem ti hevalên din ev helwest nedîtibû. Yanî li herêmê yan jî li qadê çi fêrî van gerîlayan dikirin, çi jê re digotin da ku sekneke evqas bihêz

raber bikin? Min got, ez jî amade me tevî we bimirim, ji we ne baştir im. Min lê nêrî, Remziye got, “ez naxwazim bimirim”. Hevalê Çiyager, li hevalê Dewrîm (xort) mêze kir û kenî, got, “ka em li wê jêrzemînê binerin”. Em çûn jêr zemînê. Binê avahiyê hemû jêrzemîn bû. Hem bi rutûbet bû, hem jî gelek tiştên kêr neyên, gelaş hebû. Ya din jî gelek dar hebûn. Umît û Mezlûm (DİHA) di nav wê jêrzemînê de tunel dikolan. Deriyê jêrzemînê li kolanê mêze dikir. Sekvanên dijmin jî ew kolan didîtin. Ji ber vê yekê em ê ji tunelê derbasî hemberê kolanê bûna. Agir dema ku di wê kolanê re derbas dibû gule li destê wî ketibû. Agirê biçûk hevalekî bejndirêj û lewaz bû. Ji diranên pêşiyê yek jî şikestî bû. Lê gule li hestî neketibû. encax di hefteyekê de dikaribû ev jêrzemîn bihatana paqijkirin. Tevî vê min di cih de got, em dikarin di du rojan de paqij bikin. Min digot, ez her tiştî dikim, lê min heval jî nedixapandin, min dikir. Çûm malê. Min kekê Cengîz û zarok girtin. Remziye, dê xwarin û nan çêbikira. Ji ber wê yekê nehat, em çûn. Umît û Mezlûm (DİHA) tunel dikolan. Me jî tiştên zêde yên di avahiyê de kom dikir û didan zarokan, wan jî derî diavêtin ji derve. Lingê min diêşiya, kulek dimeşîm. Lê sozek ku min dabû hevalan hebû, diviyabû min bianiya cih. Dotira rojê Mehsûm Polat û Agirê Biçûk hat alîkariya. Lê ji ber ku destekî wan birîndar bû, bi destê xwe yê din alîkarî dikirin. Piştî ku me jêrzemîn komî ser hev kir, me dar raxistin erdê û li ser daran jî kilîm raxistin. Jixwe zarokan jî gelek nivîn anîn me ew raxistin. Bedrî jî soba danî. Ji ber ku deriyê jêrzemînê li kolanê dinêrî, digot “em ê derî îptal bikin”. Me dê pencereya jêrzemînê fireh bikira û kevirên binê pencereyê bi levye derxistana û li şûna derî pencere bi kar bianiya. Êdî dikir jêr zemîn xelas bibe. Em westabûn.

Ji ber vê yekê hevalê Çiyager jî qederekê dîwar şikêkandibû, got, “îro bes em ê sibeyê berdewam bikin”. Ji ber ku hevalên birîndar li gel me diman, mal pir qerebelix bû. Derbasî odeya din bûm, min ê xwe dirêj bikira. Remziye hat,

paşê Mehsûm Polat hat. Mehsûm Polat berê xwe da min û got, “hevalê Îhsan şehîd ket. Weke ku dinya bi serê min de hilweşiya. Piştre kûr kûr giriyam. Min pirsa cihê wî kir. Got, “di destê dijmin de ye”. Giriyam, min got, wî ji destê dijmin derxin. Birayê min ji nû ve şehîd dibû, min heman êş jiyan dikir. Piştre ez çûm gel Çinar. Wî jî mayin çêdikir. Ji min re got, “were, bi xêr hatî, derbas be çendek batarya çêbike”. Rûniştim, min hem pîl çêdikir û hem jî ez digirîm. Min digot, wî heq nekir ku bikeve nav destê dijmin. Hem diaxifîm û hem jî digirîm. Dema hevalê Çinar ji min re got, “sedema şehîdbûna wî şaşitiya wî ye” ez ecz bûm. Min got, hem hevalê Îhsan şehîd ket hem tu dike sûcê wî, ka te pir ji wî hez dikir?. Hevalê Çinar jî wisa bersiv da; “ji beriya rojekê ew bi xwe ji hevalan re dibêje, neçin wê malê, dijmin li wê derê mewzî girtiye, piştî rojekê ew bi xwe diçe wê malê”. Hê girîngtir bû ku ew jiyan bike”. Di vê navbera de min ji hevalê Çinar pirsî, gubreya me qediya, em ê çi bikin? Piştî ku ji min re got, “tûpekî mezin ê neteqiyayî heye, ez ê wî ji te re bînim, li vê derê bihêlim, tu jî 10 çaydanan peyda bike û wan gubreyên amade ji tûp derxe û bixe çaydanan”, derbasî mal bûm.

Umît got ku wan tunela jêrzemînê qedandine û ew ê biçin kolandina tunela dêrê û çû. Hevalê Çiyager hat, di dest de hin belge hebûn. Banî Mezlûm (DİHA) kir û got, “van belgeyan bide çapemeniyê”. Ev belge ji ser polîsên mirine derketibûn. Yek ji belgeyan behsa Musa Çitilê ji JİTEM’ê bû, dikir. JİTEM’ê jî di operasyona li Sûrê de cih digirt. Mezlûm li DİHA’yê geriya fotoxrafên belgeyan kêşand û şand. Û piştre ji bo ku alîkarî bike çû gel Umît ez jî rûniştim û min dest bi girînê kir. Min digo, niha cixareke min heba dê çi baş bûya. Cixare tine bû, li gel ti kesî nemabû. Em ên cixare dikişandin me pir bêriya cixarê dikir. Dema bû sibe çûm jêr zemînê. Diviyabû min amadekariyên dawî jî bikira û xelas bikira. Min mêze kir li aliyê din ê kolanê Botanê Mezin derbas dibe. Mala wan li Sûrê bû. Bavê wî firinçî bû, ji ber wê yekê li firinê wî nan dipêjand.

Dema hevalan li Sûrê dest pê kiribûn qadê qontrol bikin, Botanê Mezin tevlî hevalan bibû. Lê malbata wî jê dest berdabû û ji Sûrê derketibû. Botanê Mezin qet malbata xwe efû nedikir. Digot “eger ez şehîd bikevim, ji malbata min re wisa bêjin, Xwedê bila bela xwe bide we, eger we zarokê xwe fikirîbana, hûn ê li Sûrê bimana”. Û li ser zêde jî dikir, “termê min jî nedin malbata min”. Botanê Mezin li aliyê din ê kolanê destê ji me re li ba kir û sekvanê dijmin li destê wî da. Hewl da xwe di cih de biavêje mala li kolanê, lê weke baranê gule dibarîn, ket cihê lê bû. Min qîr dida. Botanê Mezin ji cihê ketibû qet nedileqiya. Dijmin gule hiştin û dest pê kir bi bombeavêjê biavêje ser Botanê Mezin. Hevalê Çiyager hat. Firehiya kolanê tenê 3 metro hebûn. Min ji hevalê Çiyager re got, ez bilez bibezim Botanê Mezin bikişînim hindurê malê. Qebûl nekir.

Hevalê Doğan, Îsmaîl, Ronî Çekdarê Mezin ji tunela li jêrzemînê, derbasiyê aliyê din bûn. Hevalê Îsmaîl dixwaze Botan ê Mezin bikişîne, destê xwe dirêj dike lê sekvanê dijmin çawa dibîne gule diavêt. Ji ber vê yekê Îsmaîl jî birîndar bû. Dema gule li zendê Îsmaîl ketin, zendê wî şikest. Dijmin, tevî sekvanên xwe li ser hev bi bombeavêjên xwe ve bi ser hevalan de gule dibarand. Hevalê Ronî dest pê kir qîr bide, “heval birîndar heye, hevalê Doğan birîndar bû”. Ji ber bombeavêjê aliyekî tunelê hilweşîbû û heval li aliyê din asê mabûn. Û bi ser de jî birîndar bûn. Min û Remziye me dermanên hewce xistin poşet, eger me firsendek bidîta, em ê derbasî aliyê din bûna û li birînên hevalan mêze bikirana. Hevalê Dewrîm û Çiyager hatin. Ji min û Remziye  re got, “alîkariya min bikin”. Di binê bombebaranê de em derketin qatê duyemîn. Hevalê Çiyager berê xwe da me û got, “perdeyekê peyda bikin”. Me di cih de perdeyên wê malê ji pencereyê derxistin û kirin yek û me dest pê kir bidûrin. Me çar perde kirin yek. Hevalê Çiyager dest pê kir malê tevde, çakûçek peyda kir, çarşaf weke şerîdan qetandin û li hev girêdan. Piştre seriyê wê bi çakûç ve girêda û deng li hevalên aliyê din kir, “diavêjim aliyê we, bigirin”. Hedefa wî

ew bû, perde bikişîne nîvinga kolanê û cihê bi ber dîtina sekvanê dijmin dikeve bigire. Hevalan çakûç girtin û perde kişandin. Lê bombeavêj diavêtin ser perdeyê jî. Çeka hevalê Çiyager, M-16, li wê dere bû, ji bo nekeve min li cihekî din danî. Hevalê Çiyager got, “hevalek çeka xwe datîne ku derê bila deyne, qet cihê wê neguhere”. Dema min pirsî û got, çima? Wî got, “eger şerek biqewime lê heval li çeka xwe bigere û nebîne dibe ku şehîd bikeve”. Min got, temam, min fêm kir.

Hevalê Dewrîm got, “dive em bala dijmin bikişînin aliyekî din”, ez û hevalê Dewrîm, em çûn odeyeke din a malê û me mal da ber agir. Ji bo ku duman derkeve û dijmin nikaribe bibîne... Hevalê Çiyager ji min û Hevala Remziye re got, “biçin malê niha heval dê birîndaran bînin”. Nîvenga tunelê jî hilweşîbû. Ez û Remziye, hatin malê. Hevalan destpêkê hevalê Îsmaîl anîn. Zendê wî şikestibû, guleyê zendê wî şikênandibû derbas bibû. Derziyên me yên tevizandinê, ta û derziyên me yên tibî jî tine bûn. Bi ta û derziyên li malê ku me peyda kirine yên ji bo cil dirûtinê bûn, bêyî ku bitevizînin zendê hevalê Îsmaîl me dirût. Piştre me dar xiste binê zendê wî û bi eşarpekê girêda. Di vê navbera de hevalan, hevalê Doğan anîn. Me pantolonê hevalê Doğan qut kir, tenê di lingê wî yê rastê de 16 birîn hebûn, di lingê din de çar, di zendê wî de jî du parçe hebûn. Du parçeyên di lingê wî de di nava hestî de asê mabûn. Me zendê wî weke hevalê Îsmaîl bi ta û derziyên pê cilan didirûn dirût. Lê hevalê Doğan pir saxlem bû. Qet dengê xwe jî dernexist. Min di dilê xwe de digot helal be. Di her carê de van hevalên leheng dikarîn min matmayî bihêlin. Heyrantiya min her roja derbas dibe hê jî zêde dibû. Lê Botanê Mezin hê jî li wê derê bû.

Hevalan dar xistin cihê hilweşiyayî yê tunelê û Botanê Mezin anîn. Mêjiyê Botanê Mezin derketibû derve û pişikan hemû mêjiyê wî xwaribûn. Ya Star, mirov dikarîbû li beramberê dîmeneke wisa çi bêje. Bigirîma û min qîr bida nabe, negirîma min bi xwe nedikarî. Min li beramberê vî

dijminê zalim hê zêde kîn û nefret digirt. Lê tenê xwestekeke van hevalan hebû: Kurdistaneke xweser. Û ji ber ku ev xwestibûn jî wisa bi hovane dihatin qetilkirin. Hevalan Doğan birin mala xwe. Hevalê Îsmaîl jî birin mala Qesab, yanî mala Senîha. Remziye got, R. Em biçin cem Şendayê". Pişti ku min pirsî û got çima, min li ser zêde kir, ji ber ku hevalê Doğan nû çûye, ne hewce ye em îro pansumana wî bikin. Ji ber ku wê jî gotibû, "em ê li Şendayê binêrin" em bi hev re çûn. Dema ku êşên wê dest pê kirine, bi xwe nekariye, bi çaxmaq paçên li ser birînên xwe dane ber agir. Xezalê di cih de ferq kiriye û temirandiye. Tebî me hinekê xwe bi Şendayê de ecz kir. Wê jî got, "van paçan derxin, êş dikişînim. Dema heval şehîd dikevin ez li vê derê kêrî tiştekî nayêm". Digot, "xwaziya ez şehîd biketama". Me paçên wê guhertin, paç xiste binê wê. Me lingên wê ji nû ve pêçandin. Piştre ji min û Remziye  re got "ez wesiyeta xwe ji we re dibêjim. Eger şehîd bibim navê min ê malê nebêjin bila dijmin kêfxweş nebe. Ya din jî bila ti siyasetmedar û wekîl neyên ser min. Eger bên jî hûn ê wan biqewitînin. Tenê tu û Remziye  bên ser min". Min jî got, ma şehîdketina çi, hê tê li qadê xwarin bide me. Piştî ku ew aram bû, em hatin malê. Êdî qada me hê jî tengtir bibû.

Tenê rêyeke me mabû, ew jî tunela li dêrê bû. Me hêviya xwe bi wê ve girêdabû. Zêdebûna hevalên birîndar heval dixistin rewşeke zehmet. Êdî mala Çinarê Sabotor jî dihate bombebaran kirin. Hin caran Çinar sobe jî pê nedixist, ji ber ku êdî kê ji me sobe pê dixist bombe lê dibarîn. Mewzî jî di navê de hevalê Çiyager soba û agir pêxistin qedexe kiribû. Hevala Bêrîtan hat. Bêrîtan hevaleke herêmî bû. Dema biçûk bûye, dayika wê terka wê dayibû, pîrika wê ew mezin kiribû. Berê madeyên tevizandinê bi kar aniye , dema hevalan nas dike, ji hemû fêrbûnên xwe yên xerab dest berdaye. Li gel hevalan di mewziyê de dima. Bêrîtanê ji min re digot, "zêdetir ji dayika xwe, ji te hez dikim". Ji min re digot, "dayê, dayê". Her cara dihat ez hemêz dikirim û bi caran ez maç dikirim. Hinekê jî

zimanê wê giran bû û qebe diaxifiya. Lê pir dilpaqij bû. Heval Bêrîtan, got, “hevala Bêrîvan şehîd ket û di destê dijmin de ye”. Ew jî ji Komalên Ciwan bû. Pir hevaleke bêdeng bû. Zêde ji axaftinê hez nedikir, wisa pir nedihat nexweşxaneyê jî. Timî di mewziyê de dima û dijmin bedena mirî ya vê hevalê jî teşhîr kiribû, weke Ekîn Wan di medyayê de weşandibû. Diviyabû li laşê jinekê ev nehatiba kirin. Hevalan digot, “rastiya dijmin ev e”. Min dest pê kir bigirîm, min got xwaziya cixarek niha hebûya ez hinekê rehet bûma. Bêrîtanê ji berîka xwe piçek titûn derxist û xist nav parçeyek rojnameyê, da min. Min jî ew cixare vexwar û hinekê aram bûm.

Min sibeyê zû pansumana nexweşan nû kir, piştre rêya xwe bi Remziye xist. Keça Remziye got, “dayika min çû mala Jînda”. Dema min pirsî çû çi, got, “hewan li dayika Jînda, dayê Fatma, ketiye”. Min jî di dilê xwe de got, eger tiştekî cidî hebûya banî min dikir. Dayê Fatma keseke pir baş bû. Destpêkê timî xwarina hevalan wê çêdikir. Remziye hat, min pirsî “ma rewşa dayê Fatma çawa ye, baş e? Got, “bi ambûlansê birin”. Min got, çawa yanî? Nabêjî, hewan li hewşa wan dikeve. Parçeyek li milê dayê Fatma dikeve, lingê wê parçe dibe. Jînda qîr dide û digirî. Rewşê ji hevalê Doğan re dibêje, banî ambûlansê dikin. Hevalê Doğan ji Jîndayê re dibêje, “binêre Jînda fermandara te Nûda şehîd ket tenê rondikek ji çavên te nehat xwarê, lê niha tu qiyametê radikî. Tu, Mezlûm (DİHA), kekê Ekrem bila wê bibin heya bi gel ambûlansê, piştre bila bav û xwîşka te wê bibin û biçin. Ew jî dibêje “temam”. Tebî hevalê Mustafa (Hogir), Dewrîm û Umît jî alikarî dikin. Dema ew ji hevalan dûr dikevin hevalê Dewrîm deng li Jînda, Mezlûm (DİHA) dike ku bizivirin. Jînda destê xwe li ba dike û dibêje “nazivirim”. Hevalê Mustafa (Hogir) ji Agirê Biçûk re dibêje “derkeve qatê jor, li Jînda û Mezlûm bide”, lê dema Agirê Biçûk derdikeve qatê jor dijmin gule direşîne. Ji ber vê yekê Agirê Biçûk nikare li wan bide, piştre hevalê Doğan anons dike agahî dide Sîsê.

Hevalê Doğan digot, “ev îxanetkar in. Eger ez jî wan nekişînim Sîsê bila ji min re jî nebêjin Delîl”. Hevalên herêmî ku ev dibihîstin hê jî bê biryar ketibûn. Hevalê Çiyager ev rewş ferq kiribû û hê zêde moral dida birîndaran. Tebî, ev, bi pratîka xwe dikir; bi lêdana xwe ya li dijmin dikir. Hevalê Dewrîm hat û got “R. were, hevalê Mustafa (Hogir) birîndar bûye”.”. Em bezîn. Hevalê Mustafa kêfyeya xwe li ser rûyê xwe digirt. Ji serçavên wî xwîn dihat. Min û Remziye  di cih de serçavên wî paqij kirin. Min mêze kir, li eniyê û li ser mijangên wî li pênc cihan birîn vebibûn, tiştekî birîbû. Ne kûr bû. Hevalê Mûstafa pir hanekçî bû, dema ez dîtim got, “R. destê min bigire”. Min jî destê wî yê rastê girt. Got, “Remziye destê min bigire”. Piştre ji hevalê Dewrîm re got, “were ji te re jî ez wesiyetê xwe bêjim”. Dema got, “bavê min bişîne hecê, kefyeya min bide dayika min” me dest pê kir em hemû bikenin. Hevalê Mustafa teqlîda Şevger dikir û digot, “destê min bernede R. nexwe xewa min nayê, nikarim razêm...”. Tebî ez, Dewrîm û Remziye jî, em dikenîn. Li ser axaftina xwe zêde kir, “bawer im ji ber ku min hûn kenandine û hûn kêfxweş kirine êdî hûne çend rojan îstirehetê bidin min”. Me jî got, na, ti tiştekî te tine, îstirehet jî tine, hema niha biçe mewziyê” û piştî wê hevalê Mustafa got “ev dijminê elçax dîsa nekarîbû min bikuje” û dawî li sohbeta me anî.

Em bi kêfxweşî û bi ken diçûn mirinê. Tiştekî ecêb bû, lê rastî ev bû. Êdî tunela ku hêviya me bû li ser Umîd mabû û di nava avê de tunel dikolan. Di sir û seqamê de şilopilo dibûn. Dîsa ber bi destê sibeyê Umît bi awayekî şilopilo hatibû. Ji min re got, R. ma dikarî ji min re cil peyda bikî. Heya cilê min hişk dibin”. Ez jî lê gerîm, pantolon peyda kir, lê min nekarî gomlek yan jî qazax peyda bikim. Min badiyê pembe yê Fatma da Umît û got “heya cilên min zuwa dibin tişt nabe ez ê li xwe bikim”. Lê bi rastî jî ew badiyê pembe bi xwe bi laşê Umît ve zeliqî bû. Min go, bila çayeke germ vexwe û hinekê germ be, min çaydan danî ser tûp.

Di vê navberê de hevalê Hebûn hat, Çinar jî hat. Nabêjî Umît berê hanek li gel Hebûn kirine û gotiye “ez kesekî nerm im, ma hûn çima rêzê nadin tercihên mirovan?”. Ew xapandiye. Agahiya min jî ji vê rewşê hebû. Min li hevalê Hebûn nêrî, min badiye ser Umît nîşanî wî da. Hevalê Hebûn mirûzên xwe kirin. Xwe bi xwe diaxifiya, “çi karê vî li Sûrê heye, şeytan dibêje keleşê rake, berde serê vî, ma zilam nêr û mê dibin? Ez, Umît û Çinar ji kenan zikopişto bûne. Di dawî de min bi xwe nekaribû û min got, Umît rastiyê bêje, nexwe hevalê Hebûn ê ji te şaş fêm bike. Wî jî ji Hebûn re got ku ji ber cilên wî tine bûne ev li xwe kirine, ew ne kesekî wisa ye û hanek kiriye. Vê carê me hemûyan dest bi ken kir. Lê hevalê Hebûn êdî li Umît bawer nedikir. Ji ber ku hema li gel hemû hevalan hanekên xwe dikirin û senaryo diafiranandin. Rojekê Umît ji Çekdarê Mezin re dibêje, “ketibûm destê mafyayê, bi min esrar dan firotin û min xwe avêt ber bextê Partiyê, Partiyê ez xelas kirim û şandim Sûrê”, hevalê Çekdarê Mezin jî bawer kiriye. Paşê dema dibihîze hanek kiriye Çekdarê Mezin jî pir dikene.

Rojekê kekê Ehmed hat û got, “agirê hevalê Doğan pir zêde ye, derziye bigirin û werin”. Min û Remziye derzî rakir û em çûn. Bi rastî jî wisa bû. Me derziya wî lê da, pansumana wî guhert. Hevalê Doğan banî Fatma kiriye. Jê pirsî ye, “lingê min diêşe ma ti dermanên tu dizanî yên pîrejinan tine ye? Fatma jî dibêje tebî dizanim”. Fatma di nava rûn de pûl bîber, bîberê reş û nane sor dike, piştre li lingê hevalê Doğan dide. Dest pê kiriye lingê wî bişewite û agirê wî derketiye. Ez û Remziye , me dest bi ken kir. Min ji hevalê Doğan re got, em bêjin Fatma dîn e, tu çima bi ya wê dikî? Ez hem diaxifîm û hem jî min kenê xwe pê dikir. Got, “min çi dizanî min go, ez ê pê sax bim”. Di vê navberê de hevalê Mustafa hat. Hevalê Doğan got, “Mustafa ka ji R. Re bêje tu nobeda ku derê digirî? Hevalê Mustafa berê xwe da min û got, “hevala R. ev rêxistina me jî cihên pîroz her dide min. Destpêkê Mizgefta Qursunlu, paşê dêr, û niha jî nobeda tuwaletê daye min”. Ez ji aliyekî ve

dikenîm û ji aliyê din ve min pirsî, çawa yanî? Wî got, “mîrat xwedanê tuwalet li cihekî wisa stratejîk e eger bikeve destê dijmin dibe ku li me bide, lê niha di destê min de ye ez li wan didim”. Hevalê Mustafa saza li dîwer girte destê xwe. Hevalê Doğan got, “ka ji me re li stranekê bide em guh bidinê”. Min jî pirsî, “ma dizanî lê bidî? Dema hevalê Mustafa got, “ez pênc meh û çar rojan çûme qursa sazê, lê nizanim lê bidim”, em hemû keniyan. Piştî ku me hinekê hanek kir û em keniyan em hatin malê. Êvara dereng Umît hat û got “hevalê Mustafa şehîd ketiye û ketiye destê dijmin. Di wê kêliyê de hanêkên me li gel hevale Mustafa dikirin di ber çavên min re derbas bûn. Navê malê yê hevalê Mustafa, Farûq bû. Li Zankoyê beşa dîrokê dixwendiye. Mirovekî pir wêrek û bi xweşikî ranediza, îstirehet nedikirî bû. Şervanekî çar bi çar ku pratîkeke pir baş pêşkeş dikirî bû. Hevalên li vê derê şer dikirin hemû ji hev wêrektir û tirs çi ye nizane bûn. Şehadeta hevalê Mustafa li gel min xemgîniyeke mezin pêş xistibû. Min ji xwe re digo, hewce nedikir mirovên bi rûmet ên wisa bimirin, lê xuya bû ku şer tiştekî wisa bû. Bêyî berdêl hin tişt nedihatin qezenckirin.

Saet derûdora pêncê êvarê bû, Remziye bi girî kete hindur û got ku Dîgor şehîd ketiye. Dîgor hevalekî bejndirêj, lewaz û çavkurîşk bû. Ji Stenbol-Komelên Ciwan hatibû, li wê derê rûdinişt. Bi eslê xwe ji Dîgora Qersê bû. Ji ber vê yekê nasnavê xwe kiribû ‘Dîgor’. Navê wî yê malê Mutluhan bû. Yek ji hevalên li Sûrê mayine û xwe pêş xistine, bû. Dîgor ji Remziye  re digot, “dayê”. Remziye  pir jê hez dikir. Destpêka ku qad hatibû girtin jî Dîgor birîndar bibû. Dema hevalê Çekvar birîndar dibe, mirinê digire ber çavên xwe, bombe diavêje dijmin û hevalê Çekvar xelas dike. Wê demê birîndar dibe. Tevî wê, hevalê Çekvar bernade, lê paşê ji ber ku rewşa hevalê Çekvar giran e heval wî derdixin derve. Sîstem bi qasî çar saetan wî li erdê dihêle, piştî şehîd dikeve digire ambûlansê. Piştî ku Dîgor baş dibe, di pratîkê de dest pê dike hê baştir bibe û hê wêrek tevdigere. Dema termê Dîgor li ber dêrê disekine

dijmin nêzîkî sed guleyên bombeavêjê diavêje ser. Dema hevalê Armanc hewl dide wî bigire ji lingê xwe sivik birîndar dibe. Armanc ciwanekî herêmî yê 15 salî bû, lê ji bo ku Dîgor bigire, mirinê digire ber çavan, lê nikare, paşê heval termê Dîgor distînin û li Sûrê vedişêrin.

Remziye ji bo Dîgor digiriya û digot, "ji beriya şehîd bikeve Dîgor timî digot, dema em bimirin em ê bibin fêrîşte û bifirin". Remziye timî ev gotina Dîgor dubare dikir û digiriya. Di vê navberê de hevalê Hecî hevalek li ser pişta xwe anî. Ev jî hevalekî herêmî bû, nasnavê wî Egîdê Biçûk bû. Ji Ferqînê bû û tangê lê dayibû. Gelek kevir hatibûn serçav û çavên wî. Navê Egîd ê malê Yusuf Boz bû. Me li çavê wî mêze kir, kevir ketibû çavê wî yê çepê. Eger me kevir derxistana dê çavê wî biteqîya. Çavê wî yê çepê nedidît. Me di cih de pansumana wî kir û anî mala me, li ser nivînê dirêj kir. Dengê Egîdê Biçûk pir xweş bû. Ji bo bi êşa xwe nehese her stran digot.

Me dê sibeyê pansumanên hevalê Doğan û Şenda bikirana. Dema ku ez û Remziye diçûn me dît heval di nava bataniyê de hevalekî tînin. Me xwe nêzîk kir, me go gelo bîrandar heye, dema em pirsîn, hevalan got, "Egîdê Mezin şehîd ketiye". Egîdê Mezin hevalekî bejndirêj û girs bû, qadro bû. Dema di kuna ku tê de şer dikirin de serê xwe derxistiye û mêze kiriye, dijmin gule reşandibû û şehîd ketibû. Me serçavên wî vekirin û mêze kir, gule li çavê wî ketibû, çavekî wî tine bû. Egîdê mezin berê jî birîndar bibû, lê birîna wî sivik bû, min xwestibû derman bidimê, qebûl nekiribû. Gotibû "bila ji hevalên giranbirîndar re bimîne. Paşê ji min re gotibû ku ew mamosteyê erdnîgariyê bûye û maaşa xwe ya sê mehan wergertiye û tevlî bibû. Ne şaş bim ji Pasûrê (Kulp) bû. Navê wî malê nayê bîra min, lê paşnavê wî Tekîn bû. Pir xemgîn bibûm.

Ez di wê ferqê de bûm ku êdî qada me pir teng bûye. Dijmin li mala me jî dida û êdî tang pir nêzîkî me bibûn. Min dizanî em ê hemû şehîd bikevin lê min dizanî ev rêxistin van

mirovan û van qadroyên xwe yên bi rûmet li vê derê terkî mirinê nake.

Rojekê Umît ji kolandina tunelê hat û got, “êdî me deriyê tunelê dît”. Em pir kêf xweş bûn. Her kesî ji xwe re çente peyda kir. Dema di tunelê re derbas bûna ji bo astengî dernexe em pir mijûl bûn. Di çenteyê min de jî tiştên hevalên şehîd hebû. Êdî me ji xwe re xeyal diafirandin. Dema em derketana me dê destpêkê cîger bixwarana, lê min ê hemû rûn bixwara. Hevalê Çiyager li Sîsê dê em biezimanda. Paşê em ê biçûna Qendîlê û me dê hevalê Cemal bidîtana. Di van kêliyan de em pir kêfxweş bûn. Me her roj li ser xeyalên xwe, xeyalên nû zêde dikir. Umît keça dildabûyê dê bixwesta, eger nedana me dê birevanda. Şevekê birayê kekê Ehmed, İhsan hat. Bataniye xwest. Min pirsî ku ji bo çi dixwaze. Got, “Baran şehîd ketiye, em ê pê hilgirin”. Ez nizanim hevalê Baran herêmî bû yan qadro bû lê hevalekî giranbiha bû. Dîsa, pir baş serê hevalan çêdikir. Hema bêje porê hemû hevalan wî qut kiribû. Ji beriya rojekê porê Umît qut kiribû. Wî jî qural bin pê kiribûn û di kuna ku tê de şer dikin de mêze kiribû. Hevalê Çiyager ew hişyar dikirin, lê hin caran hevalan dikarîbûn rehet tevbigerin.

Hevalê Çiyager digot, “dîmenên malên tên wêrankirin bikêşîne û bide medyayê. Êdî Sîbel zû zû li zengê telefonê dida û navenda giştî ya HDP’ê jî li min digerî. Ji navenda giştî ya HDP’ê İdris Baluken digot, “navnîşanên hevalan bide, dema dewlet bê em ê bikin mijara bazarê”. min mesaj hevalê Dewrîm (xort), re xwend, min got hûn çi dibêjin. Wî jî got, “ka adres bidê, em binêrin dê karibin çi bikin”. Zarok li cem min diman.

Rojekê Qedir bi qîr û hawar kete hindur, di pey wî re Bucuruk, bi girî hat. Serê Qedir Heya bi binê guhê wî vebibû. Me serê wî bi ta û derziya asayî dirût, parça jî li zendê wî ketibû û derketibû. Piştre me zendê wî jî pêçand. Me piştre zendê Bucuruk jî dirût. Me ew jî birin gel me. Fatma her dikire pitepit, “ez ê van çawa têr bikim”. Min qet ev gilî û gazincên wê nedikir pirsgirêk. Tangê li ser hev li mala me jî dida. Piştre

hevalê Dewrîm hat û got, “hema niha li navenda giştî ya HDP’ê bigire, bêje li nexweşxane dayine”. Ez jî lê gerîm û min got, zarokên birîndar hene, pir li nexweşxaneyê didin. Wan jî got, “em ê niha çareser bikin”. Di nav nîv saetê de lêdana nexweşxaneyê sekinî. Paşê dîsa li min gerîn û gotin zarokên birîndar bikêşîne vîdeoyê û bişîne. Min ji hevalê Çiyager pirsî, wî jî got, “bişîne, dengê şer, dîmenên malên hatine vêrankirin bikêşîne û bişîne”. Min zarok hemû kom kirin, min birînên wan nîşan didan û diaxifîm. Umît vîdeo dikêşand û dişand. Navenda giştî jî diweşand.

Dîsa ez li gel Sibel diaxifîm. Hevserokê DBP’ya bajêr Yê Amedê A... Ş... telefon stend û got, “em wan sivîl, birîndar û zarokan derxin”. Min pirsî; çawa? Got, “destûrê nadin em bikevin hindur, em jî heya cihekî bên û anons bikin, tu jî zarokan bîne wê derê, em wan derxin”. Min jî got, divê ez ji hevalan bipirsim. Hevalê Dewrîm (xort) hat, min jê re got. Wî jî got, “jê re li telefonê bide, ez çi bêjim dubare bike”. Min telefon vekir, piştî ku min ji A... Ş..: re got, “bêcidiyet, jixwe re cidî be, jixwe anonsê ku tu dibêjî dijmin her roj dike. Çi ferqa te ji dijmin heye?” Min telefon girt. Min ji hevalê Dewrîm re got, “Êdî ez ê çawa li A... Ş... binêrim? Wî jî got, “serê te dê bilind be, ya rast ew e ku yên ku evqas roj ji bo Sûrê ti tişt nekirine serê xwe dê nizm bikin” û çû. Dema li mala hevalê Çinar dan, wî jî tişt xist nav dolabên li salona navber. Êdî mala me bibû, cihê malzemeyên rêxistinê jî, her kêliyê mal tije heval dibû. Me mayin û malzemeyên din xistin mitfeqa nexweşxaneyê. Ji ber ku ji bo hemûyan cihê me tine bû. Hin heval dihatin guleyê çeka pompaliyê dixwestin, hin dihatin ji bo cîhazê bataryayên ji pênc pîlan hatine çêkirin dixwestin. Bûn malzemeçî çiqas zehmet bûye. Hevalê Hecî hat, tupekî biçûk xwest min û Umît me çêkir û dayê. Di vê navberê de wê jî bêjim, êdî Umît nediçû kolandina tunelê. Weke dijmin zanibe em ê li wê derê tunel bikolin, tenê bombe dibarand ser wê derê. Ti kesî nedikarî serê xwe jî ji wê kolana ku tunel lê dihate

kolandin derxe. Yanî hêviya me ya dawî tunel jî nemabû. Em mabûn li holê, êdî cihekî em biçînê tine bû.

Hevalê Çiyager wan jî di qatê destpêkê yê jêrzemîna ku me paqij kiribû de mewzî girtibûn. Ji ber ku hem qadeke cuda nema bû û hem jî ji ber ku tang hatibû wê kolanê, ji wê avahiyê kolan didîtin. Êdî di navbera tang û me de avahiyek û kolanek mayibû. Li gel hemû hevalên birîndar hevalê Elî axifî, hemû hevalan gotin ku ew dixwazin biçin mewziyê. Ji derveyê Penaber û Şevger hemû, bi awayekî kulek çûn mewziyan. Ji nişka ve hevalan bi lez û bez hevalek anîn. Ev, hevalê Rustem bû. Herêmî bû. Hevalekî bejndirêj û girs bû. Digot ku ew ji Ferqînê ye, li Seyrantepeyê rudinîn. Tangê li lingê wî dabûn û ligê wî qederekê vebibû. Remziye bêyî bitewizîne lingê wî dî dirût, lê dema werimî min dirûtin vekir. Bi miçûnikê li nava birînê min mêze kir. Parçeyeki mezin ê guleyê tangê derxis. Piştre hêdî hêdî werimîna lingê wî dest pê kir dakeve.

Dijmin li Mizgefta Qurşunluyê ala xwe çiqandibû û tê de doçqe bi cih kiribû. Ji wê derê li cihê ku em lê bûn dida. Lêdana wî min fêm kiribû lê çima ala xwe çiqandibû! Weke ku Sûr welatekî cuda be û ew jî hatibûn dagirkirinê, li cihên stendine jî ala xwe diçikand. Em ji bo wan, ne hemwelatiyên vî welatî bûn. Jixwe timî marşa Mehterê didan megafonê. Dibe ku zêde filmên li ser Osmaniyan guhdar kiribin. Lê tiştek ji bîr dikirin; di pêşberê pereyan hatibûn şer, hevalên li vê derê bi îrade û dilê xwe şer dikirin û bêyî ku bi ti berjewendiyê bifikirin. Ma li beramberê hezeke wisa kîjan dewleta faşîst dikaribû xwe ragire.

Hevalê Çiyager, li hemberê avahiya odeya ku em diman mewzî girtibû. Ez jî derketim pencereyê û min got, “terorîstên birêz teslîm bin, eger hûn teslîm bin em ê cixarê bidin we. Min du-sê caran dubare kir. Hevalê Çiyager li min mêze kir û got, “çi dibêjî?”. Min got, ne tiştek e, te ji min re gotibû vîdeo bikêşîne ez jî vîdeo dikêşînim. Piştre dest pê kir bikene. Min jî pirsî; li gorî we eger dijmin cixareyê bide min, ez bêbiryar

dikevim? Wî jî got, “na, na, tu bêbiryar nakevî”. Bi vî awayî em weke du ciranan, bi hev re axifîbûn û keniyabûn.

Di vê navberê de hevalê Çiyager ji hevalên mewziyê re gotibû, “hûn ê bi lingekî bimeşin”. Ji ber ku lingê hevalê Xeyrî şikestî bû û bi yek lingî dimeşiya. Em nebêjin ‘meş’, hildipekiya. Ji ber wê yekê dema hevalan, hevalê Xeyrî didîtin ji bo jê re bibe moral, hildipekîn.

Hevalên birîndar, Berxwedan, Mahsum Polat, Xeyrî, Çiyagerê Biçûk, Armanc, Xebat, Egîd , Azadê Biçûk çûn mewziyê. Piştî kêliyekê teqînek çêbû, dengê teqînê pir nêzîk bû. Hevalê Çiyager ji Zîlanê re gotibû, “biçe û mayinekê bixe nav paletên tangê, Zîlanê jî, bi cih kiribû. Zîlan ji Qersê bû. Ji Komalên Ciwan bû. Çavên wê baş nedidîtin. Hevalan tam hefteyekê li berçavkan geriyan. Hemû berçavkên li malan peyda kirine anîn, di dawî de yek li çavan bû, êdî dikariya bibîne.

Hevalê Dewrîm (xort) bezî û hat, got “mitfeqa nexweşxaneyê dişewite, jê agir derdikeve”. Di cih de cebilxane û mayin hatin bîra me. Em du yan jî sê saniyan wisa di cihê xwe de sekinîn. Di pey re me got mayin û me baz da. Dema min baz da hevalê Dewrîm û Remziye  jî hatin. Gava ku hevalê Dewrîm ji depo av dianî û hewl dida agir bitemirîne, ez, Remziye  û Çiyager ku piştre hat jî me cebilxane kişand salona navberê. Dema hevalan dîtin em alîkarî dikin moraleke mezin stendin û pir kêfa wan hat.

Hevalê Çiyager banî min kir û got, “R. em çi bikin?”. Cara destpêkê bû min hevalê Çiyager wisa didît û bi min dişewirî. Min jî got, ma dê çi bibe, dê ti tişt nebe, em ê malzemeyan bibin vê jêrzemîna li jêr. Piştî ku min got, hem wê derê hê bi ewlehî ye, hem li mala me jî dixin, ez ê jî nexweşan bigirim û derbasî wê derê bim, min li ser zêde kir; lê carekê li gel Remziye  biaxifin, ji ber ku Remziye  dibêje ku ew sibeyê saet di 6’an de ji Sûrê derkeve. Eger ew derkeve dibe ku heval

bê biryar bikevin, min banî Umît kir û got, hevalê Çiyager dibêje malzemeyan bikişînin jêr. Wî jî got, “temam”.

Hevalê Çiyager jî Doğan û Elî girte gel xwe û li gel Remziye û kekê Cengîz di odeyê de axifîn. Hevalê Çiyager ji Remziye re gotiye “çend rojan bisekine em ê te bişînin”. Remziye jî gotiye “temam” û qebûl kiriye. Min û Umît li dîwarê nexweşxaneyê kuneke tê re derbasbûnê vekir, em ji wê derbasî hewşekê dibûn. Mirov ji hewşê derbasî jerzemînekê, ji zêrzemînê dîsa derbasî hewşekê, ji hewşê derbasî odeyekê, ji odeyê derbasî mitfeqekê dibûn û ji mutfaqê di deriyekê re derdiket kolanekê. Min û Umît, me karîbû encax di du rojan de mutfaq û odeyê paqij bikin. Bi doçqeyê li mala me jî didin. Hevalê Çinar tûpekî mezin anîbû, neteqiyabû. Gubreya di hindurê wî de rutûbet girtibû. Min û Umît, me gubreya bi rûtubet derxistibû û li odeyê li ser paçekî raxistibû û li mala me didan. Ew tûp jî li odeyê bû. Ma me dê çawa derxistana? Laşer hat û di cih de xwe xwar kir bi yek destê xwe tûp anî. Me piştre gubreya zuwa bûye tije tûpê kir. Min ji hevalê Çinar re got, dibe ku ev tûp bi yek funyeyekê neteqe, li vê tûpê du funyeyan siwar bikin. Weke ku yê sabotor ne Çinar bûye , ti tiştî nizane, tiştê ku ez di du mehan de fêr bûm, min ji wî re vedigot. Hevalê Çinar li min mêze kir, keniya û got, “te xwe tam daye ber sabotajê”. Min jî bi vî awayî bersiv da; ma xwendevana kê me, tebî xwendevana te me.

Fatma jî dikire pitepit. Pir bi ser Penaber de dikir qîreqîr, digot, “tu tirsonekî ji ber wê yekê nikarî rabî ser piya”. Penaber digot, “biçe ji ser serê min. Lê dema Fatma dest pê dikir biaxife, nedizanî bisekine. Penaber nedikarî rabe ser piyan. Dema radibû di cih de xwîn ji lingê wî dihat. Ji cihê xwe dirêj kirî, eminiyeta keleşa xwe vekir, li Fatmayê rast kir, hema min xwe avêt ser û jarjora keleşê derxist. Lê di keleşê de guleyek hebûye. Min keleş li jor rast kir û di wê kêliyê de teqiya. Guleyê diwar şermixand û li jêrê ban ket û parçeyên wê belavî der û dorê bûn. Parçeyekî biçûk lingê min şewitandibû û ji xêra

xwedê tiştek bi ti kesî nehatibû. Remziye hat, bi ser Fatmayê re de kire qîr, got, "dawiya dawî te ew jî dîn kir". Min jî, hem bi Fatmayê re û hem jî bi Penaber re xwe bi ser her duyan de ecz kir. Paşê hevala Arjîn hat, çek girt û li odeya din li gel Fatma çi axifiya nizanim. Remziye, Penaber bir mala xwe.

Min jî zarok û Şevger birin qatê jêrzemîna ku min û Umît Paqij kiribû. Lê cihê derbasbûna hevalan di odeya em diman re derbas dibû. Me nedikarîbû xwe dirêj bikin. Gava her heval derbas dibû em radibûn û rûdiniştin. Tevî ku heval bi lez di hewşê re derbas dibûn, helîkopteran didît. Ji ber vê yekê jî hem bi bombeavêjê li jêrzemîna ku em lê diman û hewşê didan û hem jî mayinên weke qutiyan berdidan. Di vê navberê de ez li gel Med Nûçe bi Erdal re rojane diaxifîm û min rojane agahî didan. Êdî ez zû zû li gel Sibel diaxifîm. Min her şev ji zarokan re çîrok digotin. Di hemêza min de radizan. Rojekê Qedir ji min pirsî û got, "eger em jî weke li Cizîrê di jêrzemînê bişewitin, dayika min dê çawa min nas bike?". Umît jî bersiv da û got, "wê demê em ê bi têlên ji sifirê navên we binivîsin û bi sukra we de bikin". Li ser vê yekê min jî bi têlên ji sifirê, navên hemûyan nivîsand û bi sukra wan ve kir. Me navê Qedîr jî nivîsand; bi sukra wî ve kir û fotoxrafê wî kêşand û da çapemeniyê.

Rojekê min ji hevalê Dewrîm (xort) re got, ez bi samimiyeta te bawer dikim û dipirsim, gelo vê rêxistinê hêviya xwe ji we qut kir yan jî we rest kişand û serî hilda û mirin tercih kir? Wî jî got, ne weke te ye, me dikarîbû ji beriya vê derkevin, lê me nedizanî ku dê evqas êrîş bikin, eger me zanîbana me li gorî wê gubre, mayin û cebilxane amade dikir. Piştre jî me pişta xwe da tunelê, ew jî nebû. Elîpaşe jî vala derket. Êdî em ê heya şehîd bikevin şer bikin". Min jî dubare pirsî; ma hûn ê bi şehîdketinê berteka xwe nîşan bidin? Kenî û got, "em ê ji bo vî gelî û ji bo Rêbertiyê Şehîd bikevin. Van tiştan nefikire. Gerîlayek dema diçe cihekî, mirinê digire ber çavên xwe û diçe, wê hesabê nake ku dê ji wê derê bi saxî

derkeve, eger bi saxî derkeve jî weke mucîzeyek be li vê mêze dike". Min dîsa got, lê hevalê Cûma gotiye "derkevin". Dewrîm wisa bersiv da; "cihekî ku em derkevinê tine ye, qadeke wisa jî tine ye, jixwe rêyeke derketinê jî tine ye".

Şevekê, hevalê Çiyager bawer im hizirîbû ku ez razame, li gel Arjîn û Harûn diaxifiya. Min di nav nivîna xwe de xwe dirêj kiribû û lêhîf heya bi serê xwe kişandibû. Ji wan re digot, "eger hûn bêbiryar ketibin, biçin û xwe radestê dijmin bikin". Wan jî digot, "em bêbiryar neketine". Mijar çi bû, nizanim lê hevalê Çiyager pir bi ser wan de kiribû qîr. Dibe ku ji bo lidarxistina çalakiya fedaî hevalê Çiyager tengav dikirin û ji ber wê yekê bû, lê min sedema wê ya rast nedizanî û paşê jî min qet nepirsî. Hevala Dîcle-Adar ketibû, lingê xwe êşandibû. Me sabûn hûrhûrî kir, spîkê hêkê û xwê xiste nav û li lingê wê da. Ew jî bi awayekî kulek çû mewziyê.

Senîha jî ji zendê xwe birîndar bibû, lê tiştekî wê yê cidî tine bû. Rojekê li ser jêrzemînê ewqas bombebaran pêk anîbûn û ewqas gaz avêtibûn, êdî me nedikarî bitebitin. Bombeyên bi her awayî û gazên bi her curê diavêtin. Hem laşê me dişewitî û hem jî me nedikarî em nefes bistînin. Em hemû ji ser xwe ve diçûn. Hevalê Çiyager hat, di hindurê odeyê de di mencelekê de agir hilkiribû û em şiyar kiribûn. Wê rojê min go, ez ê bimirim.

Min berê xwe da hevalê Çiyager û got, ev cara yekemîn e bêbiryar bûm. Min got, bila ez biçim hembera Otela klas, sekvanê dijmin li min bide lê bila ez vê gazê nekişînim. Wî jî got, dişibe madeyên kîmyewî...". Lê hê bi zehmetî nefes distend û êdî tûpê me jî tine bû. Me di mencelê de agir dikir û çaydan datanî ser û çay dem dikir. Ard jî nemayibû, me nedikarîbû em nan lê bixin. Hevalan kîsek ard peyda kiribûn, Remziye  û Emîne ji bo Şendayê ew ard jî bikirana nan. Me dê hevala Şenda, Zozan û hevalê Dilêr û Qesab her çar li jêrzemîna avahiyek ku hilweşiyaye bihîştana. Nan û hin tiştên xwarinê, bombe, keleşên wan, tûpekî biçûk daniya cem wan.

Hevalê Çiyager û hevalê Elî hatin ji min re gotin, “li wekîlan bigere û ji wan re bêje em ê sivîlan derxin”. Ez jî li Sîbel geriyam û min heman tişt got. Me dê jina ciwan a li cem Senîha û zorêkê wê û apê êxtiyar bişandana. Ji nişka ve hevalan gotin ku guleyê doçqeyê li çongê Êrîş ketiye. Çongê Êrîş parçe parçe bibû. Hevalê Elî got, “em Êrîş derxin. Dê Îhsan û xalê Salih... Êrîş derxistana. Sîbel got “min ji walî re gotiye, bila derkevin”. Ew, dema ambûlansê dibînin, Êrîş wisa li wê derê de dihêlin û diçin ambûlansê. Min lê nêrî ji derve dengê Êrîş tê, qîr dide û dibêje “alîkarî bikin”. Hevalê Elî hat û ji min re got, “R. ma tu dixwazî îşev rehet razê?”. Min pirsî, çawa? Got, “em Fatma û Bedrî bişînin, bila Êrîş bigirin û biçin, tu jî rojeke bê Fatma derbas bike”. Min jî got, temam.

Cara duyemîn li wekîlan geriyam, min xwest ambûlans bişînin. Fatma Êrîş, Bedrî bi hev re derketin. Di vê navbera de hevalan got, “hevalê Hecî şehîd bûye. Piştre diyar kirin ku Andoq (Ekremê Mezin) birîndar bûye. Ji nişka ve Delal hat, du tiliyên wê jî qut bibûn. Tangê lê dayibû, sekvanên dijmin li Hecî dayibûn. Hevalê Çiyager got “em ê hevalên herêmî yên birîndar hemûyan bi rêzê derxin”. Me lingê Andoq bê tevizandinê dirût. Me dê Andoqê (Ekremê mezin), Rustem, Penaber, Ferqîn, Egîd, Azadê Biçûk, Armanc, Cûdî, bi dorê derxistana. Dema hecî derdixin, li zendê Çiyagerê Biçûk ku Hecî hilgirtibû didin. Hem ji walî destûr hatiye girtin û hem jî şehîd hilgirtiye. Tevî vê dijmin li ser hevalan direşîne.

Hevalê Elî got, Umît tu jî alikarî bide. Umît Alîkarî da. Ew jî derketibûn. Hevalê Çiyager got, bila zarok bimînin em ê zarokan li gel R. derxin, eger ne wisa be dê R. înfaz bikin. Min jî dest pê kir bigirîm, min got ez dernakevim. Ji min re got, “xwe amade bike, tu, Remziye , kekê Cengîz û zarok dê bi hev re derkevin; ew tiştên hevalên şehîd ên li gel te ne bişewitîne û telefona xwe nebe, xetê bişkîne”. Di telefona min de fotoxrafên hevalan hebûn. Min da Baran û jê re got, eger derkevî li navçeyê bihêle. Min xeta xwe jî şikênand. Piştre min cilê xwe

guherîn. Eşofmanê leşkerî ku hevalan daye, min li xwe kir. Min destpêkê hevalê Doğan ramûsand, piştre Elî lê hê ez digirîm. Min, Zagros, Dewrîm (xort), Çinar, Dîcle-Adar, Dewrîm, Delal, Bêrîvan, Zîlan, Arjîn yek bi yek hemû ramûsandin. Piştre min xwe li hevalê Çiyager aland, giriyam, got, “çima tu digirî. Min jî got, hûn bi min re xaîn bûn, ka em ê bi hev re bimirana. Wî jî got, “pêwîst e tu derkevî van tiştan vebêjî û binivîsînî. Dema min got, lê hûn ê bimirin, ji min re got, “em ê nemirin şehîd bikevin. Piştî ku got “ji tiştên te kiriye û ji bo keda te, ji bo her tiştî sipas” lê vê ji bîr neke û wisa bêje; tevî hevalên herêmî ku şer dikirin em şêst kes bûn. Ew arteşa seyemîn a cîhanê bi van şêst kesan nekarîbû, vê bêje” û axaftina xwe qedand. Giriyam, min ew hemêz kir û hinarikên rûyîn wî min ramûsand.

Em li wekîlan geriyan, ez, Remziye Kekê Cengîz, hevsera wî, kurê wî, Talat, du keçên Remziye, Rambo û Qedir em derketin. Lê dema derketim min ji bo her tiştî xwe amade kiribû. Min di dilê xwe de digot, dibe ku ev dijmin te înfaz bike, heta dibe ku tecawiz jî bike. Min ev hemû girtibûn ber çavan. Min ji bo ya herî xerab xwe amade kiribû. Em derketin, pejna kolanan jî nedihat. Her der bibû girgokên ji çîmentoyê, hemû avayî, xanî hilweşîbûn. Şewq girtin çavên me û gotin “destpêkê zarok”. Ji dûr ve gotin “zikê xwe vekin. Zarokan vekirin. Piştre banî cem xwe kirin. Di destên Qedir de ala spî hebû. Min gotibû, ez ala spî naxim destê xwe. Yek bi yek banî hemûyan kirin. Ez û Emîne di hindur de mabûn. Min di dilê xwe de gotibû, baş e, herî kêm dema banî min dikin, Remziye, zarok, û kekê Cengîz Li wir in. Tebî banî min jî kirin, şewq dan serçavên min, gotin “montê xwe derxe, qazaxê xwe rake jor, zik û pişta xwe nîşan bide û piştre ber bi me ve bimeşe. Lê ji ber şewqê çavên min ti der nedidîtin. Dema leşkerekî navê min pirsî, polîsê li rex wî di cih de navê min got. Al daliqandibûn dîwêr. Li wê derê Remziye, kekê Cengîz û zarok tine bûn. Ez birim pêş wan alan û gotin “ala spî bigire”. Kamera jî vekiribûn

qaşo dê min bigirin kamerayê. Min jî got, ma tiştê herî dawî ku hûn li min bikin çi ye, ne guleyek berdan serê min e? Ti pirsgirêka min li gel alan tine ye lê ez nikarim ala spî bixim destê xwe û li pêşiya ala we vîdeo bigirim. Jixwe wê gavê jî derûdora min tije polîs û leşker e. Polîsekî serçavên wî girtî hem xeber kirin, hem jî pahinek li lingê min da û got, "dema ez te bibim qereqolê dizanim çi ji te bikim".

Leşkerekî hat û ji min pirsî ku ez ji ku derê me, min ji wî re got, ez ji Amedê me. Wî polîsî dîsa pahneke li lingê min da. Piştre leşker dîsa pirsî ku ez ku derê me. Min got, ez ji Diyarbekirê me. Dema pirsî û got "ma Zagros tu yî", min jî got, bi qasî dizanim Zagros navê çiyayekî ye. Wî polîsî dîsa pahnek li lingê min da. Êdî ez bi lingê xwe nedihesîm, lê qet niyeta min tine bû ku ez li hemberê wan xwe bitewînim jî. Piştre polîs bi porê min girt û li pişta aqrebê, termê Hecî yê di nav bataniyekê de nîşanî min da. Ya Star, bi cenaze leyistibûn, heta çavên wî jî derxistibûn. Polîs ji min re got, "te ev kuşt". Min jî got, we kuşt, ma min gule berda, we berda. Dema got "te çek da destê van, min jî wisa bersîv dayê, çawa min daye, ez li Sûrê asê mam. Dema ez ber bi xirbeyê ve birim Emîne hat, bêhna min derket. Ti tişt ji Emîne re negotin. Emîne pirsa hevserê xwe, kurê xwe û Remziye kir, gotin ku wan ew birine, navendê.

Destê min ji piştê ve kelemçe kirin, anîn merkezê. Remziye û kekê Cengîz hatin, zarokên wan ji wan girtibûn avêtibûn yurdê. Ji nişka ve Umît û bi çar hevalan re anîn. Min nedikarî çav û rûyê Umît bibînim, reş û şîn bibû û werimîbû. Dibe ku pir lê dabin. Min got, Umît çawa yî? Wî jî qet polîs bi ti tiştî negirtin û got ku pir li wî dayine. Polîs qîr da û got, "axaftin qedexe ye? Kelemçeyên destê her kesî vekirin û avêtin cihê binçavkirinê. Destên min venekirin û bi tena serê xwe, bi awayê destê min ji piştê ve girêdayî avêtim cihê binçavkirinê. Min digot, hûn çima destên min venakin, digot "yê te ne hewce ye, bila îro girêdayî bimîne". Destên min ku heya bi sibê wisa mabûn zêde werimîbûn.

Polîs ji min pirsî; “ma di Tîpa D Ya Zindana Diyarbekirê de ti kesê te heye?”. Dema min jî got, belê heye; dubare pirsî ku kî ye. Min jî got kurê birayê/xwîşka min Dewrîm Kavak e. Dema pirsî ku gelo ew qadroyê çiya ye yan jî qadroyê bajêr e, min jî got, ez nizanim hûn bi xwe fêr bibin. Heya ku awûqata min hat rewşê bi vî awayî berdawam kir. Awûqata min Pinar hat û piştî ku got, “muwekîla min mafê xwe yê neaxifîne bi kar tîne”, polîs ji odeyê derket. Pinarê got; “Dewrîm û pênc hevalên wî ji zindanê reviyan”. Ji aliyekî ve min hemû êşên kişandine ji bîr kirin û ji aliyekî ve jî dihizirîm ku gelo weke li Çewlîgê bûye dubare dê bên girtin jî min dest pê kir jê fikaran bikim. Ji ber ku Dewrîm berê ji Çewlîgê jî reviyabû, lê belê hatibûn girtin. Ew pêvajoyeke pir ne xweş bû. Piştre Pinarê got, “gihaştine cihê xwe, dê daxuyanî bidin û bidin medyaya sosyal”. Êdî ez pir bextewar bum. Heval jî xelas bûna dê pir baş bûya. Jixwe hevalê Doğan gotibû, “eger em derkevin em ê li Sîsê hev bibînin, eger em nikaribin Azad Ferqîn dê li gel we têkilî dayne”. Lê di ser re deh roj derbas bûn û me di rojnameyan de nûçeyên şehadeta hevalan dixwend. Min êşeke mezin dikişand. Lê ez ê timî wan di kêliyên wan ên herî kêfxweş de bînim ber bîra xwe û heya ku çavên min vekirîbin ez ê ti car wan ji bîr nekim.

# ŞEHÎDÊN BERXWEDANA SÛRÊ



Nasnav: **ÇIYAGER HÊVÎ**
Nav û Paşnav: **CÎHAT TÜRKKAN**
Navê Dayikê: **Seliha**
Navê Bav: **Abdullatîf**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Êlîh/1982**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Êlîh/2005**
Qad: **Behdînan**
Asta Xwendinê: **Zanko Qedandiye (Beşa Bîrkarî)**
Dîroka Şehadetê: **12.03.2016**



Nasnav: **NÛCAN MELETÎ**
Nav û Paşnav: **SONAY ENGÎN**
Navê Dayikê: **Eyşe**
Navê Bav: **Memed**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Meletî/1978**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Amed/2009**
Qad: **Amed**
Erk: **Fermandara Tabûrê:**
Qadên Mayine: **Xebatên Kovara Özgür Halk 2006 2009, Xinêre 2009-2010, Gare 2010-2013, Rojava 2013, Amed 2015**
Perwerdeyên Dîtine: **Mezlûm Doğan-Dibistana Navendî Ya Partiyê, Şubeya PAJK'ê 2010, Akademiya Şehîd Îbrahîm 2015 (Dewreya Şehîd Berxwedan Varto)**
Dîroka Şehadetê: **30.01.2016**





Nasnav: **RÛKEN ŞER ELÎ**
Nav û Paşnav: **MIZGÎN KOÇYÎĞÎT**
Navê Dayikê: **Xatûn**
Navê Bav: **Memed**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê**: Gundê Şer Elî –Ferqîn Amed/...**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Îzmîr/2011**
Qad: **Amed**
Erk **: Fermandara Taximê**
Qadên Mayine: **Metîna, 2012-2013 Heftanîn, 2013 2014 Rojava, 2014 Garê, 2015 Amed**
Perwerdeyên Dîtine**: Metîna-Şervanên Nû 2012, Dibistana Operasyonê Ya Şehîd Qehreman/Akademiya Şehîd Mahîr 2014 ( Dewreya Şehîd Derya), Akademiya Şehîd Bêrîtan (Dêwreya Şehîd Madûra)**
Asta Xwendinê: **Amadeyî Terk**
Dîroka Şehadetê: **02.12.2015**






Nasnav: **ADAR KERBORAN**
Nav û Paşnav: **DÎLBER BOZKURT**
Navê Dayikê: **Emîne**
Navê Bav: **Remezan**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Amed/2014**
Qad: **YPS**
Erk: **Şervan**
Qadên Mayine: **Amed/2014**
Asta Xwendinê: **Dibistana Navîn Qedandiy**
**:**
Dîroka Şehadetê: **12.03.2016**





Nasnav: **AMED AZAD**
Nav û Paşnav**: MEMED MUTLU**
Navê Dayikê: **Ferîde**
Navê Bav: **Qedrî**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Amed/1997**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Kobanê/2014**
Dîroka Şehadetê: **24.12.2015**





Nasnav: **AZAD JIYAN ARAS**
Nav û Paşnav: **MEMED TUTAL**
Navê Dayikê: **Serwet**
Navê Bav: **Yasîn**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **.../2014**
Dîroka Şehadetê: **12.03.2016**





Nasnav: **BAHOZ AGIR**
Nav û Paşnav: **WELAT BÎLEN**
Navê Dayikê: **Balkiz**
Navê Bav: **Memed Tahir**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Mêrdîn-Qoser/1994**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Mêrdîn-Qoser/2014**
Qadên Mayine: **Bakur**
Asta Xwendinê: **Zanko Terk**
Dîroka Şehadetê**: 05.02.2016**





Nasnav: **BERXWEDAN KARKER**
Nav û Paşnav: **MURAD GÜNDÜZ**
Navê Dayikê: **Sebîha**
Navê Bav: **Memed**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Amed/1995**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Wan-Çiyayê Spî/2014**
Qad: **Rojava-YPS**
Erk: **Şervan**
Qadên Mayine: **Metîna 2013, Rojava-2014**
Perwerdeyên Dîtine**: Metîna-2013-Metîna- Perwerdeya Şervanên Nû ( Dewreya Şehîd Xebat)**
Asta Xwendinê: **Amadeyî**
Cih û Dîroka Şehadetê: **21.08.2015**





Nasnav: **BOTAN AMED**
Nav û Paşnav: **ERHAN KESKÎN**
Navê Dayikê: **Xetîce**
Navê Bav: **Sedat**
Cih û Dîroka **Jidayikbûnê: Amed/1998**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Amed/2015**
Qad: **Rojava-YPG**
Erk: **Şervan**
Qadên Mayine: **Amed 2015, Rojava (Kobanê) :**
Perwerdeyên Dîtine: **Amed-Şervanên Nû-(Dewereya Şehîd Dîcle)**
Asta Xwendinê: **Dibistana Seretayî Qedandiye**
Dîroka Şehadetê: **Sibata 2016'yan**



26. 3. 2015




Nasnav: **BRUSK**
Nav û Paşnav: **ÖMER TALMAÇ**
Navê Dayikê: **Kevser**
Navê Bav: **Mehfuz**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **2013/Xakurkê**




Nasnav: **DELÎL AMED**
Nav û Paşnav: **ERKAN BURAKMAK**
Navê Dayikê: **Naşîde**
Navê Bav: **Omer**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Amed-Ferqîn-Gundê Çorlûk**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Amed/2009**
Qad: **Zagros**
Erk **Şervan**
Qadên Mayine:**Gare 2009, Zagros2010**
Perwerdeyên Dîtine**: Gare-Perwerdeya Şervanên Nû 2009**




Nasnav: **ÊRÎŞ MORDEM**
Nav û Paşnav: **ÎSA ORAN**
Navê Dayikê: **Zahîde**
Navê Bav: **Memed**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **1994/Elazığ**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **.../2013**
Qadên Mayine: **Marmara, Dersîm**
Asta Xwendinê: **Zanko Terk**
Dîroka Şehadetê: **26.12.2015**







Nasnav: **GELHAT FERQÎN**
Nav û Paşnav**: MEZLÛM KARAKOÇ**
Navê Dayikê**: Îlmiye**
Navê Bav: **Latîf**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Amed-Ferqîn/1995**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Amed/2015**
Qadên Mayine: **Heftanîn 2015**
Perwerdeyên Dîtine: **Perwerdeya Yekîneyên Herêmî Heftanîn 2015**
Dîroka Şehadetê: **12.03.2016**





Nasnav: **HEQÎ CÎLO (ARARAT)**
Nav û Paşnav: **SERHED DOĞAN**
Navê Dayikê: **Sakîne**
Navê Bav: **Cûma**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Amed-Çermûg (Çermîk)/1996**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Qendîl/2015**
Qad: **Qendîl**
Erk**: Şervan**
Qadên Mayine: **Qendîl 2015**
Asta Xwendinê**: Zanko Qedandiye (Karûbarên Birêvebirina Otelan)**
Dîroka Şehadetê: **22.12.2015**





Nasnav: **HARÛN WELAT**
Nav û Paşnav: **CESIM KAYA**
Navê Dayikê: **Yildiz**
Navê Bav: Qasim
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: Qers-Kaxizman/1992
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: Stenbol/2013
Qadên Mayine: Tirkiye-Bakur
Rewşa Xwendinê: Zanko Terk (Hiqûq)





Nasnav: **HARÛN AMED**
Nav û Paşnav: **SEYDA CEGERXWÎN ÖZBEK**
Navê Dayikê: **Nezîre**
Navê Bav: **Abdulah**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Amed/1992**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Amed/2015**
Dîroka Şehadetê: **02.04.2016**



Nasnav: **HESEN SERDAR**
Nav û Paşnav: **SEZGÎN DEMÎROK**
Navê Dayikê: **Remziye**
Navê Bav: **Memed**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Amed-Lîce/1997**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **2014**
Dîroka Şehadetê: **24.12.2015**





Nasnav: **XÊYRÎ DÛRMÛŞ**
Nav û Paşnav: **MERWAN KAYA**
Navê Dayikê: **Gulistan**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Amed-Çinar/1996**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **.../2014**
Erk: Şervan-Sekvan





Nasnav: **HEBÛN**
Nav û Paşnav: **ÖMER ATMACA**
Navê Dayikê: **Meryem**
Navê Bav: **Cemal**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Mûş-Kop (Bulanik) 1991**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Amed/2014**
Dîroka Şehadetê: **12.03.2016**





Nasnav: **HOGIR AMED**
Nav û Paşnav: **FARUK KAÇMAN**
Navê Dayikê: **Meqbûle**
Navê Bav: **Mansûr**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Amed-Ferqîn/1990**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Amed-2012**
Qadên Mayine: **Bakur, Amed 2015, Rojava (Xebat Yekeya Tevlîkirinê), Dibistana Operasyonê Ya Şehîd Mawa (Dewreya Şehîd Rênas)**
Perwerdeyên Dîtine: **Akademiya Şehîd Elî Çîçek (Dewreya Şehîd Kurtay) 2013, Dibistana Operasyonê Ya Şehîd Mawa (Dewreya Şehîd Rênas Amed)**
Asta Xwendinê: **Amadeyî Terk**
Dîroka Şehadetê: **Sibata 2006’an**





Nasnav: **JIYAN ŞER**
Nav û Paşnav**: ÇÎĞDEM ÎLDEN**
Navê Dayikê: **Ferîde**
Navê Bav: **Ehmed**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Amed-Lîcê/1982**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Botan/1997**
Dîroka Şehadetê: **02.04.2016**





Nasnav: **KARKER AMED**
Nav û Paşnav: **FERHAD DOĞRU**
Navê Dayikê: **Hemdiye**
Navê Bav: **Nasir**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Amed/1995**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Amed/2012**
Qad: **Zap**
Erk**: Şervan**
Qadên Mayine**: Gare 2012-2013**
Asta Xwendinê: **Amadeyî Terk**





Nasnav: **MERWAN AMED**
Nav û Paşnav: **CÜNEYT YENÎ**
Navê Dayikê: **Eyşe**
Navê Bav: **Siri**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Amed/1989**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Amed/2008**
Qad: **Amed**
Erk: **Fermandarê Bolîkê**
Qadên Mayine: **2009-2010Gare, Zap, Zagros (Eyaleta Cîlo), 2013 Zap, Amed 2014**
Perwerdeyên Dîtine: **Akademiya Mehsûm Korkmaz (Dewreya Şehîd Reşîd Serdar, Zagros) 2010-1011**
Dîroka Şehadetê: **24.12.2015**





Nasnav: **MEZLÛM (BERXWEDAN) SERÊÇIYA**
Nav û Paşnav: **FERDÎ AYDEMÎR**
Navê Dayikê: **Emîne**
Navê Bav: **Kemal**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Gundê Köprüyolu-Kop (Bulanik)-Mûş**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê**: Stenbol/2015**
Qad: **Rojava-YPG**
Erk: **Şervan**
Qadên Mayine: **Gare 2016**
Perwerdeyên Dîtine: **Gare-Perwerdeya Şervanên Nû (Dewreya Şehîd Baran Dêrsim)**
Asta Xwendinê: **Dibistana Seretayî Terk**





Nasnav: **MIZGÎN NÛDA (BÊRÎVAN)**
Nav û Paşnav: **ASYA TAŞÇI**
Navê Dayikê: **Mewlîde**
Navê Bav: **M. Elî**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: S**êrt/1993**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Meletî/2014**






Nasnav: **PILING ÊRÎŞ**
Nav û Paşnav: **MAHMUD ORUÇ**
Navê Dayikê: **Bedîa (Hediye)**
Navê Bav: **Asef**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Amed-Sûr/1993**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Amed/2010**
Qad: **Amed**
Erk: **Fermandarê Taximê**
Qadên Mayine: **Metîna 2010-2014, Gare 2014**
Perwerdeyên Dîtine: **Akademiya Şehîd Îbrahîm (Dewreya Şehîd Memed Salih) 2014**
Asta Xwendinê: **Amadeyî Terk**





Nasnav: **RAMAN EWRÎM (DEWRÎM)**
Nav û Paşnav: **BEHMEN TENHA**
Navê Dayikê: **Besê**
Navê Bav: **Esrafîl**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Kotol/1990**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **.../2008**
Dîroka Şehadetê: **Adara 2016'yan**





Nasnav: **RÊBER VARTO**
Nav û Paşnav: **EHMED GÖKALP**
Navê Dayikê: **Mîhrîban**
Navê Bav: **Memed Şîrîn**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Mûş/1999**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Amed/2015**
Qad: **Amed**
Erk: **Şervan**
Qadên Mayine: **Amed/2015**
Perwerdeyên Dîtine: **Perwerdeya Şervanên Nû (Dewreya Şehîd Aslan) 2015**
Asta Xwendinê: **Amadeyî Terk**
Dîroka Şehadetê**: Adara 2016'yan**






Nasnav: **RIZGAR ÇEWLÎG**
Nav û Paşnav: **BESTÎ TURANLI/BESTÎ TASALI**
Navê Dayikê: **Esma**
Navê Bav: **Îbrahîm**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Çewlîg/1993**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **.../2010**
Dîroka Şehadetê: **15.03.2016**





Nasnav: **RIZGAR AMED**
Nav û Paşnav: **MESUT SEVÎTEK**
Navê Dayikê: **Hediye**
Navê Bav: **Esad**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Amed/1992**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Amed/2015**
Qad: **Amed**
Erk: **Şervan**
Qadên Mayine: **Amed 2015**
Perwerdeyên Dîtine: **Perwerdeya Şervanên Nû Amed 2015 (Dewreya Şehîd Dîcle)**
Dîroka Şehadetê: **26.12.2015**





Nasnav: **SERXWEBÛN TATOS**
Nav û Paşnav: **ÖMER KENDALCI**
Navê Dayikê: **Seltenat**
Navê Bav: **Xalis**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Erzerom/1998**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Erzerom/2015**
Dîroka Şehadetê: **18.03.2016**





Nasnav: **SERXWEBÛN ZAGROS**
Nav û Paşnav: **ŞÜKRÜ CAN**
Navê Dayikê: **Hemîde**
Navê Bav: **Mensûr**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Colemergê-Çelê/1989**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Amed/2013**
Dîroka Şehadetê: **12.03.2016**






Nasnav: **STÎ JIYAN MAK**
Nav û Paşnav: **CÎHAN YILMAZ**
Navê Dayikê: **Lahiya**
Navê Bav: **Abdulhelim**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Amed-Bismîl/1994**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Bolu/2015**
Asta Xwendinê: **Zanko Terk (Îktîsad)**
Dîroka Şehadetê: **09.03.2016**





Nasnav: **ŞERVAN TOLHILDAN**
Nav û Paşnav: **CUMALÎ KELEŞ**
Navê Dayikê: **Helîme**
Navê Bav: **Farûq**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Agrî-Patnos/1993**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê**: Amed/2015**





Nasnav: **BAHOZ (ŞOREŞ) AMED**
Nav û Paşnav: **MAHSUM POLAT**
Navê Dayikê**: Eyfer**
Navê Bav: **Ûsif**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Amed/1994**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Amed/2013**
Qad**: Gare**
Erk: **Şervan**
Qadên Mayine: **Gare 2013**
Asta Xwendinê: **Dibistana Navîn Qedandiye**
Dîroka Şehadetê: **Adara 2016'yan**







Nasnav: **TAMARA ŞÎLAN SÎPAN**
Nav û Paşnav: **ZEHRA ORUÇ**
Navê Dayikê: **Bêzar**
Navê Bav: **Memed Emîn**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Amed-Bismîl/1997**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Edene/2015**
Dîroka Şehadetê: **Adara 2016'yan**


YPS-JIN



Nasnav: **WELAT ÇIYA**
Nav û Paşnav: **HAKAN ASLAN**
Navê Dayikê: **Melîke**
Navê Bav: **Elî Riza**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Erzerom-Qereyazi/1992**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Amed/2015**
Dîroka Şehadetê: **23.01.2016**


KATİL AKP



Nasnav: **XEMGÎN HEREKOL (ROJ)**
Nav û Paşnav: **MUHAMED EMÎN EROL**
Navê Dayikê: **Teberik**
Navê Bav: **Abdurehîm**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Mûş/1984**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Denîzlî/2005**
Qad: **Amed**
Erk: **Fermandarê Bolîkê**
Qadên Mayine: **Xakûrkê 2005-2008, Zap (Muxebereya Roj-Biryargeha Navendî) 2008-2010, Metîna 2011, Xakûrkê 2013**
Perwerdeyên Dîtine: **Akademiya Mehsûm Korkmaz (Dewreya 19.) 2010-2011, Akademiya Heqî Karer (Dewreya Şehîd Jiyan Ehrez)**
Asta Xwendine: **Zanko Terk (Mihendiziya Elektrîk Elektronîkê)**
Dîroka Şehadetê: **12.03.2016**





Nasnav**: ZANA**
Nav û Paşnav: **ERDAL TEKÎN**
Navê Dayikê: **Stî**
Navê Bav: **Hisên**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Amed-Pasûr**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Amed/2014**
Dîroka Şehadetê: **22.02.2016**





Nasnav: **ZELAL XERZAN (ZOZAN)**
Nav û Paşnav: **ŞÜKRAN ALPATA**
Dîroka Şehadetê: **Adara 2016’yan**





Nasnav: **ZÎLAN**
Nav û Paşnav: **EVÎN ERKMEN**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Qers-Dîgor**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **.../2015**
Dîroka Şehadetê: **13.03.2016**


SİDAR MARKET

Nasnav: EGÎD (MEZLÛM)
Nav û Paşnav: SILÊMAN YAKIŞIR
Navê Dayikê: Meryem
Navê Bav: Îzet
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: Amed-Sûr/1994
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: Amed/2013
Dîroka Şehadetê: 27.11.2015

Nasnav: AZAD
Nav û Paşnav: UĞUR BURAKMAK
Navê Dayikê: Naşîde
Navê Bav: Omer
Erk: Yekîneya Herêmî
Dîroka Şehadetê: 12.03.2016



Nasnav: BAHOZ CUDÎ
Nav û Paşnav: MAHSUM GÜRKAN
Navê Dayikê: Şene
Navê Bav: Memed
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: Amed/1994
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: Amed/2013
Erk: Yekîneya Herêmî
Dîroka Şehadetê: 12.03.2016

Nasnav: BARAN
Nav û Paşnav: BARIŞ KURT
Navê Dayikê: Emîne
Navê Bav: Şaban
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: Amed/1996
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: Amed/2015
Erk: Yekîneya Herêmî
Dîroka Şehadetê: 21.02.2016




Nasnav: **HACI GERNAS**


Nav û Paşnav**: ÛSIF**

Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Amed/...**

Erk : **Yekîneya Herêmî**



Nasnav: **ÇEKWAR**
Nav û Paşnav: **ÇEKWAR ÇUBUK**
Erk: **Yekîneya Herêmî**



Nasnav: CEGERXWÎN
Nav û Paşnav: FURKAN ERKAPLAN
Navê Dayikê: Rabîa
Navê Bav:Abdulbehrî
Erk: Yekîneya Herêmî

Nasnav: ÇEKDAR
Nav û Paşnav: YUNUS SÜSLÜ
Navê Dayikê: Hamas
Navê Bav: Remezan
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: Amed/1995
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: Amed/2013
Dîroka Şehadetê: 03.03.2016

Nasnav: DÎGOR
Nav û Paşnav: AKÎF MUTLUHAN YILMAZ
Navê Dayikê: Hulya
Navê Bav: Fehrî
Erk: Yekîneya Herêmî
Dîroka Şehadetê: 16.02.2016


Nasnav: FELAT AMED
Nav û Paşnav: SÎNAN DUMAN
Navê Dayikê: Neşîde
Navê Bav: Zulkuf
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: Amed-Lîcê/1995
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: Amed/2014
Dîroka Şehadetê: 12.03.2016



Nasnav: **DEWRAN AMED**
Nav û Paşnav**: REMEZAN ÖĞÜT**
Erk: **Yekîneya Herêmî**
Dîroka Şehadetê: **30.12.2015**



Nasnav: **XAZAL**
Nav û Paşnav: **GÜLİSTAN AYSAL**
Navê Dayikê: **Fîrdews**
Navê Bav: **Feyzulah**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Bedlîs/1995**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Amed/2013**
Erk: **Yekîneya Herêmî**
**Dîroka Şehadetê: 27.11.2015**



Nasnav: HARÛN
Nav û Paşnav: EYÜP YILMAZ
Erk: Yekîneya Herêmî

Nasnav: KENDAL
Nav û Paşnav: EŞREF POLAT
Navê Dayikê: Gülsüm
Navê Bav: Osman
Cih û Dîroka Jidayikbûnê:
Cih û Dîroka Tevlîbûnê:
Erk: Yekîneya Herêmî
Dîroka Şehadetê: 12.03.2016

Nasnav: QIVIRCIQ
Nav û Paşnav: CÎHAT MORGÜL
Navê Bav: Cahît
Erk: Yekîneya Herêmî
Dîroka Şehadetê: 04.02.2016

Nasnav: ROJHAT
Nav û Paşnav: GÜNDÜZ AKŞEMET
Navê Bav: Abdulah
Dîroka Şehadetê: 10.01.2016



Nasnav: **RODÎ**
Nav û Paşnav**: M. ABDULAH YALVARMAZ**
Navê Dayikê: **Kezîban**
Navê Bav: **Remezan**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **.../1993**
Dîroka Şehadetê: **12.03.2016**



Nasnav: **SARYA**
Nav û Paşnav: **ROZERÎN ÇUKUR**
Navê Dayikê: **Fehriye**
Navê Bav: **Mistefa**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Amed/1998**
Erk: **Yekîneya Herêmî**
Dîroka Şehadetê**: 08.01.2016**

Nasnav: BRUSK
Nav û Paşnav: YILDIRIM BAŞKURT
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: Amed-Lîce/1999 (2000)
Erk: Yekîneya Herêmî
Dîroka Şehadetê: Adara 2016'yan

Nasnav: ZINAR
Nav û Paşnav: MEMED DEMÎREL
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: Amêd/...
Erk: Yekîneya Herêmî
Dîroka Şehadetê: 03.12.2016

Nasnav: BÊRÎTAN
Navê Dayikê: Meryem
Navê Bav: Îzet
Cih û Dîroka Jidayikbûnê:
Amed-Sûr (Fîskaya)
Cih û Dîroka Tevlîbûnê:
Amed/2013
Erk: Yekîneya Herêmî
Dîroka Şehadetê: 12.03.2016

Nasnav: BRUSK
Nav û Paşnav: AZAD KAYA
Navê Dayikê: Fîdan
Navê Bav: Henifî
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: Amed-Lîcê/1993 (1994)
Erk: Yekîneya Herêmî
Dîroka Şehadetê: 12-13.03.2016



Nasnav: **XERZÎ**
Nav û Paşnav: **XALID GÜNEŞ**
Navê Dayikê: **Rehîme**
Navê Bav: **Zeynedîn**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Amed-Ferqîn/1995**
Erk: **Yekîneya Herêmî**
Dîroka Şehadetê: **12.03.2016**



Nasnav: **YILMAZ HISÊN**
Nav û Paşnav: **TURGAY GÎRÇEK**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Amed/1997**
Cih û Dîroka Tevlîbûnê: **Pêvajoya Berxwedana Kobanê**
Erk: **Yekîneya Herêmî**
Dîroka Şehadetê: **13.01.2016**



Nasnav: **QESAB ÇINAR**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Amed-Çinar**



Nasnav: **BAHOZ**
Nav û Paşnav: **OĞUZ YILMAZ**
Navê Dayikê: **Aynûr**
Navê Bav: **Qutbedîn**
Cih û Dîroka Jidayikbûnê: **Amed/1996**
Erk: **Yekîneya Herêmî**
Dîroka Şehadetê: **12.03.2016**

## DI PÊVAJOYA BERXWEDANÊ DE SIVÎLÊN JI ALIYÊ DIJMIN VE HATINE QETLKIRIN

***Tahîr Elçî (li Cizîr-Şirnex hatiye dinyayê, di dîroka 28.11.2015'yan de hate qetlkirin)**

***Ebdulezîz Taruk (di dîroka 10.12. 2015 hate qetlkirin)**

***Ezîz îlhan (di sala 1969'an de li Amedê hatiye dinyayê, di dîroka 25.12.2015 hatiye qetlkirin)**

***Hêlîn Hesret Şen (di dîroka 10. 12. 2016 hatiye qetlkirin)**

***Fatma Ateş (di 20.02. 2016 de hatiye qetlkirin)**

***Melek Apaydin (li Elezîzê hatiye dinyayê, di dîroka 03. 01.2016'yan de hatiye qetlkirin)**

## ENDAMÊN YEKÎNEYÊN HERÊMÎ KU DI PÊVAJOYA BERXWEDANÊ DE TESLÎM BÛNE Û PIŞTRE HATINE QETLKIRIN

**AGIR AMED (REMEZAN USLU)**
**Cih û Dîroka Jidayikbûnê: Gundê Rîzê-Dara Hênê Amed/1999**
**Navê Dayikê: Serayî**
**Navê Bav: Xelîl**

**BERAT AMED (ÛSIF YÜRÜMEYEN**
**Cih û Dîroka Jidayikbûnê: Amed/1997**
**Navê Dayikê: Süslü**
**Navê Bav: M. Tahir**
**Cih û Dîroka Tevlîbûnê: Amed/2013**

**DEWRÎM**
**Cih û Dîroka Jidayikbûnê: Amed/...**

**XEBAT ANDOK (FIRAT ÇELÎK**

**Cih û Dîroka Jidayikbûnê: Amed/1991**
**Navê Dayikê: Xatûn**
**Navê Bav: Wezîr**
**Cih û Dîroka Tevlîbûnê: Amed/2013**

**BAHOZ**


HACI HAMIT CAMII






# Şehîd Rûken Amed





































































DEVR
ZOM















ME BI CIWANÎ DEST PÊ KIR
EM Ê BI CIWANÎ BI DAWÎ BIKIN